

NÜDEM

No 22 1997

Kovara Huner / Edebi ü Çandı

SAL 1
YEŞİMB

HEJMAR 1

HAWAR

Qomala Qurdî * Revue Kurde

15 GULAN 1932

HAWAR DERDIKEV!

Dî demeke kurt de wê hemû hejmarên HAWARê bi awayekî ji çavan dre baş, bi çapeke pedagojik, bi kaxezên spehî, bi cildeke mîna pirtûkeke pîroz û bi form û ebada Nûdemê di nava Weşanên Nûdemê de derkeye.

Ev cîda HAWARê ku ji 57 hejmaran pêk hatîye û li dor 1000 rûpelî ye, rûpelekî giring yê dîroka ziman û edebiyata me ye. Bêî xwendin û zanîna HAWARê, wê her tim kîmasyek di zanîna te ya ziman û edebiyata kurdi de hebe; lewma xwe ji xwendina HAWARê bêpar mehêle!

Piştî derketina HAWARê em ê li Stockholm, Uppsala, Kopenhagen, Oslo, Bruksel, Paris, Köln, Hamburg û hin bajarên din turneyên civînan Cébikin û HAWARê bigihînin desten xwendevanên kurd.

Tu jî vê mîzgîniyê bigihîne hevalê/hevala xwe û li benda derketina HAWARê be!

SAL 11
HEJMER 57

YEŞİMB
15 TEBAK 1943

ANNÉE 11
NÚMERO 57

DIMANCHE
15 AOÛT 1943

KOVARA KURDÎ ★ REVUE KURDE

HAWAR

NÜDEM

Kovara hunerî, edebî û çandî



Xwedî û berpirsiyarê giştî

Chief Editor

Firat Cewerî



Hejmar 22, sal 6

Havîn: 1997



Şerdên abonetiyê (salek)

Swêd: 240 Sek

Skandinaviya 280 Sek

Ewrûpa 100 DM

Amerika, Australia,

Kanada: 50 \$

Institution 290 Sek



Postgiro: 636 36 25-2

ISSN: 1103-1964



Wêneya bergê: Jan Zielecki



Pergala bergê û rüpelan:

Nûdem



Adres: NÜDEM


Termov. 52 2tr.

176 77 Järfälla-Sweden

Tel û Fax: 8-58356468

- 4 Ji bo çi kurd bi kurdî naxwinin ♦ FIRAT CEWERÎ
- 6 Hemîd Bedixan ♦ HEYDERÊ OMER
- 13 Du şîr ji ♦ SABAH KARA
- 15 Moliér ♦ FAWAZ HUSÊN
- 23 Du şîr ji ♦ BADAL RAVO
- 24 Necîb Mehfûz ♦ EMİN NAROZİ
- 26 Cihana Xwedê ♦ NECİB MEHFÜZ
- 37 Du şîr ji ♦ ROJEN BARNAS
- 39 Biranîke dîrokî ♦ ROHAT ALAKOM
- 42 Şerefname ♦ K MAZHAR EHMED Werger: ZIYA AVCI
- 52 Her warek... ♦ İ. OMERÎ
- 54 Şeva sar ♦ BEYHANÎ ŞAHÎN
- 63 Wênenê ji rojêñ zarotiyê ♦ ŞAHÎN B. SOREKLÎ
- 67 Ronî mîna evînê... ♦ MEHMED UZUN
- 84 Marks û Manifesto ♦ ŞEREFXAN CIZİRÎ
- 90 Delal: Musîk ji bo min jiyan e ♦ NÜDEM
- 98 Çend şîr ji ♦ XEBAT ARIF
- 101 Xemê û Xemgîn ♦ ŞEFİK KAYA
- 113 Du şîr ji ♦ SERKAN BRÜSK
- 114 Minaqeşeya li ser xîk û xî-yê... ♦ ARIF ZÈREVAN
- 125 Cihana Sofie ♦ J. GAARDER Werger: F. CEWERÎ
- 149 Evita û Madonna û Xelata Polar ♦ SULEYMAN DEMİR
- 154 Turkiskt kaffe ♦ MIHEMED DEHSIWAR

Ji bo çi kurd bi kurdî naxwînin?



FIRAT CEWERÎ

Iro hînbûna xwendin û nivîsandina zimanê mader ji bo her mîletî êdî ne bi tenê wezîfêk sexsi lê wezîfekê milî ye jî. Heç bi vê wezîfê ranebûne wezîfâ xwe a milî pêk ve ne anîne û bi kîrî mîletê xwe ne hatine...

Celadet Ali Bedir-Xan

We rojê ez û hevalekî xwe çûne restorantekê. Me ê tiştekî sivik bixwara, bîstekê sohbet bi-kira û paşê em ê biçûna malê. Piştî ku em rûniştin û me xwarin û vexwarina xwe xwest, me dît resamekî kurd û nas jî hat. Bi xwarin û vexwarinê re em li ser hunera wî, li ser hunerê bi giştî û li ser hin tevger û tendensên hunerî peyivîn.

Ew berî demekê ji Japonyayê hatibû, wî çend pêşangeh li Japonyayê vekiribûn û wê di nêzîk de li Japonyayê kataloga wî bihata weşandin. Ew evîndarê hunera xwe bû, lê ji rewşê pir bi gazin bû. Wî dixwest pir tiştan bike, lê îmkanê wî yê diravî tunebû. Ew li ser riya Kurdistanê bû, ew ê biçûya Silêmaniyyê û wê çend mehan li wir bima. Wî digot: "Ger sed hezar kronên min hebûya, min ê li Silêmaniyyê erdek bikiriya, min ê xaniyek di nav erd de lêbikira û min ê ew xanî mîna dibistanake huner ji bo hunerhezen kurdan bi kar bianiya." Çavên wî ne li peran û dewlemendiyê bû, lê wî dixwest Kurdistanâ wêranbûyi bi hunerê bixemilîne, wê spehî bike. Ji bo hunermend û hunerheze-kî ev xewneke xweş e, hîseke bêtarfî e.

Gava hevalê hunermend ji rewşê, ji dewlemend û partiyên siyasi, ji kurdan bi giştî gazina nehezkirin û fêhmnekirina hunerê kir, gazinê wî dan dilê hevalê min yê nivîskar jî; wî jî dest pê kir û behsa serpêhatiya xwe ya weşanvaniyê kir. Hevalê nivîskar berî çend salan weşanxaneyek ava kiribû, wî xwestibû bi pîvanên navneteweyî û bi awayekî profesyonel karê weşangeriyê bike; heta wî ji bo her pirtûkeke ku çap dikir jî, hînek pere dida nivîskarê pir-

tûkê û bi wî awayî, wî di hundurê çend salan de deh pirtûkên bi naverok û spehî derxistin. Li gorî agahdariyên hevalê weşangêr, ji her pirtûkekê pêncî lib jî nehatiye firotin. Loma hêviya wî şikestiye, wî dev ji karê weşanxaneyê berdaye, pirtûkên ku çap kirine li dezgehêن kurdan belav kirine û bi wê riyê xwe ji pirtûkan pak kiriye.

Heval aciz bûbû, bi henekî be jî digot, diviyabû min hemû kartonê pirtûkan li ser hev kom bikirana, bangî kurdan bikira û li ber çavêن wan agir bi pirtûkan bixista.

Gava min li serpêhatiyêن herdu hevalan guhdarî dikir, agir bi kezeba min diket. Rewşêke kambax û trajîk dihate ber çavêن min. Vê rewşa ha, axafineke bi telefonê anî bîra min. Berî bi demekê, hevalekî xwediyyê weşanxaneyekê ji Stenbolê ji min re telefon vekiribû. Min rewşa pirtûkan jê pirsibû. Ew pir bi gazin bû, demoralîze bûbû, di fûara pirtûkan ya Stenbolê de ku çend rojan dom kiribû, wî bi tenê deh pirtûk firtotibûn. Bi qasî nifusa welitekî Skandinavyayê kurd li Stenbolê dijîn; yanî li gorî statistikên ne fermî, li dor çar milyon (4 000 000) kurd li Stenbolê dijîn. Heval hêrs bûbû, destê wî li karê wî sist bûbû, hêviya wî şikestibû. Ji rewşa wî xuyabû ku ger wilô here ew ê dev ji karê weşangeriyê berde, qet nebe ew ê dev ji weşandina pirtûkên bi zimanê kurdî berde.

Dîsan, berî demekê, hevalek li ser navê weqfeke kurdî ji Tirkîyevê hatîbû Swêdê. Wî ji bo liserlingenmayina weqfê ji kurdêن li Swêdê daxwaza alîkariyê dikir. Yek ji daxwazêن wî, ji bo kursêن zimanê kurdî peydakirina du mamsoteyan bû.

Vê rewşa ha jî ez pir dame fikirandin. Pişti evqas xebat, evqas xwîn, evqas wêranî, evqas koçberî hê jî peydakirina du mamosneyen zimanê kurdî zehmet e. Ez nizanim, ger sibe du sibe ji nişkê ve hewcedariya me bi dehhezaran mamosîte çêbibe, em ê çi bikin?

Di rewşêke wilo xerab de, di rewşêke ku zimanê kurdî roj bi roj zindîtiya xwe winda dike û ber bi mirinê ve diçe de, hê jî piraniya çapemeniya me kurdan bi zimanê tirkî ye. Ew dibêjin, ger em weşanêن xwe bi kurdî derxin, wê kes nexwînin; kurd fêrî tirkî bûne û zimanê tirkî ji wan re hêsanter e.

Bala xwe bidin vê gotin e! Gelo ev ne piştgiriya politîkaya asîmîlasiyonê ye? Gelo ev ne li ser kurdan ferzkirina zimanê tirkî ye? Ji bo çi? Çima? Heta kengî?

Erê, heta rêberên me li vê rastiya dîrokî hayê nebin, heta ew bi girîngiye rola zimên nehesin, wê rewşa me jî weha be; her ku here wê bal û meyla li ser ziman û edebiyata kurdî kêmter bibe, wê weşanxaneyen kurdan yek bi yek nifteyê li deriyê xwe bixin û wê bi vê yekê tenê kêfa neyaran were.

Yê min ez nikarim bersivekê ji sernivîsa xwe re bibînim. Nizanim gelo, hûn dikarin?

Bi hêviya xweşî û şadiyê... ↗

Hemîd Bedirxan

HEYDERÊ OMER

Seva 29 nîsanê şevek tarî û sar bû, stêrkên esmên tev bi êş û şin bûn. Mirinê serê xwe hildabû, çavêن xwe digerand, ka dê kê bide ber xwe?! Dê bayê xwe yê sar bi ser kê de biweşîne?!

Mirinê berê xwe da nexweşxaneya zanîngeha Helebê û hilkişa qatê 7'an, hê-dî-hêdî ber bi odeya 739'an çû, li derî da û derbasî hundur bû. Hemîd Bedirxan ji ser nivînê xwe rabû, çend gavan meşıya, keneñî germ li ser rûyê wî baskên xwe veşand, te digot qey ew û mirin hevdû hembêz dikin, te digot qey mirin des-tûrê jê dixwaze. Hemîd vegeriya ser nivînê xwe û raket, awîrêن xwe li derdora xwe gerand û di dû re dil rawesta.

Berî şes heyvan Hemîd Bedirxan çûbû bajarê Helebê û berxwedana xwe li dijî mirinê dajot, li bijîjk û nexweşxanan dibû mîvan, lê nexweşiyê fersend nedâ ku ew careke din vegere gundê Şiyê, çavêن xwe ji dîmenê wê dagire û xatir bixwaze. Tevî vê jî gundê Şiyê dilsoz bû û roja 2'ê gulânê gundiyyêن xwe hemû, li kîlekêni rê, li benda vegera wî, şîndar û çav bi rondik, civandibû.

Dîroka Kesitî


Gundê Şiyê yekeke ji gundênen Kurddaxê, li rojavayê bajarê Efrînê, navbera herêma Kurddaxê dikeve. Xaniyêن malêن vî gundî bi persarê "Hesê Xidir" te hildikişin û bi dîmenenê xwe, pergala aborî, ku gundî tê de dijin, zelal werdigerin. Mirov jê tê-digihîje, ku kesen vî gundî, wek ên hemû gundênen devera Efrînê, cefakêş in, dostî û evîneke germ wan bi axê û zeviyê re girê dide.

Li vî gundê Şiyê H.B. di sala 1924'an de tê dînyayê, di zaroktiya wî de, bavê wî ji neçarî, di sala 1930'î de koçî gundê "Qiriqxane" dike. Vêcarê H.B. xwendina xwe li wir dest pê dike ta ku lisana toreya tirkî, ji zanîngeha Stenbolê werdigire.

Bedirxan zo salan ji temenê xwe, dûrî Şiyê derbas dike û dostanî û hevaltiyê digel sê rewşenbîrên pêşketî girê dide; Nazim Hikmet; helbesvanê tirk ê binavûdeng, ku ji dest zordarêñ tırkan, ji neçarî diçe Moskovayê û li wir dimire; Abidîn Dîno diçe Parîsê û Memduh Selîmê kurd jî ji neçarî baz dide û diçe Şamê û li wir dimire.

H. Bedirxan û her sê hevalên xwe, gelek êş û zorê ji destêñ tûraniyan dibînin û piräcar dibin mëvanêñ zîndanêñ wan. Bedirxan piştî ku xwendina xwe ya bilind li Stenbolê kuta dike, vedigere bajarê Edenê û wek rojnamevanekî, di rojnameya "Günaydinê" de dixebite û têkiliyêñ xwe digel hevalên xwe û partiya Komünîst a Tirkîyê didomîne.

Ji bo vê jî ew gelek caran tê girtin, lê gava çavşoriya faşîstêñ tırkan li wî tûj dibe, biryara vergera Şiyê distîne û di bin baskêñ şeveke ji şevêñ sala 1951'ê de sînorê navbera Tirkîyê û Sûriyê dibire û xwe davêje hemêza Şiyê û dostaniyeke germ, di navbera wî û mamoşteyê dibistana Şiyê Reşîd Ebdilreman de tê girêdan û ta mirina wî dom dike.



Hemid Bedirxan bi Memduh Selîm, Nazim Hikmet û Abidîn Dîno re hevalti kiribû.

Bedirxan wek zêrevanekî karkeran, li bajarê Hemê dixebite, da ku bikaribe li hemberî belengazî û birçîbûnê xwe bigire. Di wê demê de diçe bajarê Selemiyê jî û hêdî-hêdî hînî zimanê erebî, ku li ber destêن Reşîd Ebdilreman hîn bûye, baş bi destê xwe dixe û dostaniyê digel nivîskar û helbestvanên ereb girêdide.

Ew ji wê rojê û pê ve vedigere gundê Şiyê û li wir bi jinebiyeke bi navê Emîşê re dizewice. Lê zarokên wan çenabin.

Gava Bedirxan ji Şiyê bi rê dikeve û diçe bajarên Şam û Helebê, ew li ba dostan dimîne, ji ber ku wî xanî li van bajaran tunebû. Lê demek gelek dirêj li mala Reşîd Ebdilreman û Naza Xelîl, li Helebê.

Navê wî

Malbata “Hesê Xidir” ji berê û pêş ve li gundê Şiyê cîwar bûye û rîncberî kiriye. Lê malbateke xizan bû, cefakêş bû “Murad” ji neviyêن vê malbatê bû, ew bi “Elîfê” re zewicîbû û famîlyeke piçûk ji wan peyda bûbû; sê zarokên wan çêbûbûn; Osman, Hemîd û Elî.

Hemîd, di sala 1924'an de ji dayikê bûye, bavê wî “Murad” leng bû, loma jî jê re digotin “Kûto”.

Wek me berê jî gotibû, Kûto û birayên xwe, digel malbata xwe koça xwe bar kîrin “Qiriqhaneyê” û gava Hemîd, ji neçarî, ji ber zîlm û zora tûraniyan, piştî 20 salan vedigere gundê Şiyê, hingê bi navê “Hemîdê Kûto” tê naskirin. Lê navê wî çawan bû Hemîd Bedirxan? Çiroka wê yekê ev e:

Gava ew ji dayika xwe bû, navê wî “Hemîd” lê kirin, weha jî ew bi navê “Hemîdê Muradê Hesê Xidir” jî dihate navandin. Lê gava wî li Tirkîyê dest bi nivîsîna helbestan kir û di rojnameya “Günaydinê” de dînîvîsand, bi navê “Hemîd Aragon” xwe dide naskirin. Wî ev nav li xwe kiribû, ji ber ku dostaniyêke germ ew û helbes-tvanê fransî “Luis Aragon” digel hevdû standibû û ji hêla hunerî û ramanî ve jî ew ketibû ser riya Aragonê Fransayê. Lê gava ew vege riya Sûriyê û li gundê Şiyê care-ke din jîyan bû, ji ber ku gundê wan nêzîkî serxetê bû, wî xwest navekî din ji xwe re peyda bike, da ku ji pêş çav û guhêن hukûmeta tirk winda bibe û ew pê hay ne-bin ku Hemîd Aragon, an Hemîd Murad Hesê Xidir, li kêleka wan, li gundê Şiyê dimîne.

Carekê li Şamê, li mala Memduh Selîm çiroka navekî nû tê kirin û zîmanzan û xebatkarê kurd Celadet Bedir-Xan jî li wir bûye; hingê li gor pêşniyarên Celadet Bedir-Xan navê malbata “Bedirxaniyan” diyarı Hemîdê Kûto dike.

Ji ber ku ew bawer dike, ku Hemîd dê bikaribe bi xebata xwe ya toreyî, navê vê

malbatê di dîroka raman û toreyê de bidomîne û herwisan jî navê wî, ji wê rojê û pê ve, dibe Hemîd Bedirxan.

Helbest û Ramana H. Bedirxan

Tevî ku H. Bedirxan di radyoya Sûriyê de, di beşa tirkî de xwedîyê programekê bû, lê ev mirov wek helbesvanekî tê naskirin û helbestên wî ji rîgeha realizmê dernakevin.

H. Bedirxan di navbera herdu cengên mezin de çavêن xwe vekir û hate dinê, di wê demê de jî hin guhertinêن mezin li cîhanê çebûbû. Ji hêlekê ve şoreşa oktoberê bi serkêsiya Lenîn bi ser ketibû. Ramanêن marksîzmê, ku li dijberî împerializmê şer dike, hêviyek di dil û derûnêن gelên bindes de geş kiribû, ji hêleke din ve, gelên bindest, li pir deverên cîhanê şerê serxwebûnê li dijî dewletên dagirker gur kiribûn û gelek jî bi ser ketibûn. Tevgera Kemalîstan li destpêkê dostanî digel şoreşa oktoberê girê dabû û pê re jî ramanêن marksîzmê derbasî nava rewşenbîrêن tirkan bûbûn; nemaze jî Tîrkiye nêzîkî Sovyetê bû û pirê rewşenbîran xwe dan kêleka wan ramanan û çareserkirina dozêن gelên bindes û çîna cefakêş, li gor nêrinêن wê felsefê bawer kirin; cihê ku nivîskar xwe lê bîbîne, divê kêleka kesêن bindes û cefakêş be û her ku kedxwarî li welatekî têk biçe, li welatên din jî jar û qels dibe. Herwisan girêdanek di navbera dozêن gelên bindes de hate danîn.

H. Bedirxan mîjîyê xwe bi baweriyêن felsefa marksîzmê baş dagirtibû, lewre jî wî çareserkirina sergêren cîhanê di dijîtiya navbera çînêن civakî û serkeftina çîna jêr; a bindest de didit. Loma jî cihê xwe li kêleka karkeran, zehmerkêşan, belengazan, xi-zanan; kenê zarokan û hemû gelên bindes li dijî kedxwarî û împerializmê girtibû û govenda xebatê gur dikir û digor:

Hemû azadîxwazên cîhanê!
Li derûdora vî çiyayî, ka em bicivînin!
Li kêleka vî çemî...
û bi hev re, em bixebeitin,
Da xewnen me bi cîh bêñ
Bibin agir û xwîn,
agir û xwîn...

Hemîd Bedirxan cihê xwe li kêleka kesêن şoreşgêr didit, ji ber vê yekê jî bergehêن cografi li pêş wî nedibûn bend û sînor, ev rewşek ji rewşen ramanê ye, ji ber ku ra-

man, wek bermayekî mirovane, tu bend an sînorêñ bombekirî nikarin li pêş wê rabiwestin. Ji ber vê yekê, em dibînin hinek ji felsefa "Gîvara" di van gotinêñ H. B. de sayî diyar dibe:

Heger we dît gavêñ min giran in,
pê li min bikin,
û biçin pêş...

H. Bedirxan bi vî rengî dengê xwe digihîne çar kenarêñ cîhanê, tu dibêjî qey ew perçe dibe, perçeyêñ gewdê wî, ramanêñ wî li cîhanê tev belav dibil, ango tu dibêjî qey vî mirovî cîhan tev di xwe de civandiye. Her cihê ku zor û sitem lê heye, tu wî li wir dibînî, ku li dijî sitemê bi hêz rawestiyaye, her cihê ku nalînek jê tê ango qêrînek şoressgêrî lê bilind dibe, tu wî li wir dibînî, ku giyanê xebatê av dide û tûj dike:

Em in, ev kesên belengaz û cotkar û karker,
Dixebitin em digel hemû rûniştevanêñ zemînê,
Da ku em şevê bidin alî,
Li kuçeyêñ Bêrûdê û Nîkaraguwayê,
û li Elselvadorê,
û Diyarbekirê û Herranê...

Vêcar em dikarin bibêjin; helbestvanê me ne tenê ji bo xwe bû, jiyana wî ne tenê ya wî bû, xebata wî ji bo azadiya gelên bindest bû, ji bo serkeftina çîna jêr bû, ji bo pêkanîna jiyaneke bê zor û sitem, jiyaneke birûmet bû; lewre wî digot:

Ez dijîm ji bo gulê,
Ji bo Xezalê
Ji bo nanekî spî,
Ji bo rûmetê,
û kenê mendalan,
û xewnen jinebî û sêwîyan,
Dijîm ji bo şahîke basikbirî,
û şîna min
û ji bo çavêñ te yêñ zelal
- Ey dilbera min - ta roja rizgariyê!

Baweriya H. Bedirxan bi çavekî û xebata gelên jar û bindest bilind bû, wisan roja rizgariya gelên xebatkaran, di baweriyêن wî de, li cihê berz bû, loma jî digot:

Kuştanên gulan
Nikarin birêveçûna lehengan rawestûnin,

Ev wate pîrîcar li ba wî diyar dibe:

Çi hêzek zordar;
İmperyalîzm, sîyonîzm û faşîzm
Nikare birêveçûna me rawestîne
Karînên keda gelan bilind dibin
Wek pelên deriyan
Û wek çiyan

Ev carek din bi me dide bawerkirin, ku ramana li nik wî ne xewnêن helbestvanan bûn, belê di hişê wî de tamarêن kûr berdabûn û hêvî di dil û derûna wî de geş kiri-bûn.

Bêhêvîti di ferhenga H. B. de nîne, helbestên wî tev jiyan û hêvî jê diherikin, tê de dilivin û mirin di baweriya wî de ne ya dawiyê ye:

Hestiyêن xwe ji zemîn û demê re dihêlim
Goştê xwe ji kurmikan re dihêlim,
Û belki, bê ku ez bixwazim, dê wan têxin firinan,
EZ nizanim
Lê mîjî tev tiştêن ku tê de hene
Ji bo jidayikbûnên nû, di her nifşekî de dihêlim,
Dema berbang derdikeve ji dilê min,
Ji bo zarokan dihêlim.

Tevî ku H. Bedirxan digel sergêrên hemû gelên jar û bindest cefakêş û xebarkar di-jî û pê re mijûl dibe, belê ew bi rojhelatê, bi kelepora gelê kurd, xwe serbilind dibîne. Lewre jî dibêje:

Ji efsaneyên rojhelatê yên şîndar,

Ez têm ba te

Ji ba "Derwêşê Evdi",

û ji vê newala şîndar, ku bi xwînê hatiye avdan,

Ji çiyayê "Sîpanê"

Ji dengê "Siyamend",

Û dilê min parçekirî ye.

H. B. li gor baweriyên xwe yên ramanî, ku bingeha wan felsefa marksîzmê bû, li doza gel û welatê xwe kurd û Kurdistanê dinihêri û didit ku doza kurdan, wek ên hemû gelên bindest û dagirkirî, wê di riya marxsîzm û serkeftina wê re çareser bibe. Vê lomê jî pirîcar navê bajar û cîgehêñ kurdî, di helbestêñ xwe de dide kêleka welat û bajarêñ bindest û xebata kurd digel a hemû gelên xebatkar û cefakêşan didit. Wek çawan navê Dêrsimê û çiyayêν vê devera kurdî li nik çemê Mîkongê dibîne û ew Qamişlo, Cexcex û Xabûrê didin kêleka Seleminî û Kobayê.

Ji vê pê ve H. Bedirxan helbesta xwe bi zimanê kurdî jî nivîsandibû, wek çawan bi hersê zimanêñ tirkî, fransî û erebî nivîsandibû. Lê mixabin helbestêñ wî bi zimanê kurdî ne pir in û bi derengî hinek ji wan di kovarêñ kurdî de, an jî di mehrecan û şevbuhêrêñ toreyî de hatin weşandin û xwendin. Lê tiştê balkêş ew e ku H. B. rêça xwe ya ramanî û hunerî di van helbestêñ kurdî de berdewam dike û wan helbestan bi hêviyekê xurt û giran dinivîsîne:

Rêç dirêj û dûr e...

Zarok hûr in

Derd pir in,

Birîn kûr e...

Evîna azadiyê

SABAH KARA

1.

E'zanim ku tu nîn î
Lê ez bazê kemînê
Eger ku tu dikarî
Bi meşa xezalînê
Pê li dilê min bikî
Pê li çola evînê
Vaye ez li vira me
Ez nexweşê evînê
Û li hêviya te me
Li benda reqisînê

2.

E'zanim ku tu nîn î
Lê ez bazê kemînê
Eger ku tu dikarî
Mi mest bikî b'nêrînê
Çavê xwe yê du-kanî
Berdî dilê havînê
Vaye ez li vira me
Di nav agirê kînê
Ez li hêviya te me
Û li benda girînê

3.

E'zanim ku tu nîn î
Lê ez bazê kemînê
Eger ku tu dikarî
Bi kenê biharînê

Tu re'dan bîbarînî

Li axa agirînê
Vaye ez li vira me
Bi qelşê dilbirînê
Ez li hêviya te me
Û li benda kenînê

4.

E'zanim ku tu nîn î
Lê ez bazê kemînê
Eger ku tu dikarî
Neqş bikî peyivînê
Lêvê xwe yê şekirî
Bi min tu ramûsînê
Vaye ez li vira me
Bi mirara jehrînê
Ez li hêviya te me
Li benda peyivînê

5.

E'zanim ku tu nîn î
Lê ez bazê kemînê
Eger ku tu dikarî
Mi dîn bikî b'evînê
Porê xwe yê zêrînî
Bikî siya havînê
Vaye ez li vira me
Li ber deryê evînê
Ez li hêviya te me
Ji şerniyê ta ïnê

10, 11. 1996, Stolberg, Nêxweşxana Bethlehem

Porê şevê

Mirina min
bi dengê gîtarekê ye
Dengê gîtarê
ê ber bi huznê
Dema peyv dîl ketin
Di dilê min de
Dengê gîtarekê serî hildide
Loma mirina min dîlketinek e
Bi dilketina peyvan
bi gîtarekê.

Çima ti deng nayê ji hêla azmên
Ma melek ne bi peyvan
dipeyivin lê
Hew, peyv bilind dibin
ji gîtarekê?

Destê min bilind in ber bi azmên ve
Xwekuştina peyvan bi bêdengiyê
Dengê gîtarekê
di çola dil de
Mecnûn radipêçe
bi porê Şevê.

8-9. 03. 1997, Essen

Molière



FAWAZ HUSÊN

Sanoya komedî, berî Molière. Gotina komedî gotineke kevn e. Ew ji ferheng û hunera Yûnanîstanâ kevnare tê. Wek trajedyê, ew jî bi perestina Di-onysons, xwedayê meyê û xweşîyan ve girêdayî ye. Gotin bi gotin, meneya komediyê, bi yûnanî "stiranên Komos" e. Gava dibû wexta rezan û çêkirina sûlavê, ev stiran û henek dihatin gotin û kirin. Paşê komedî derbasî hundirê bajaran dibe. Bazîger, hin bi hin, şûna gundiyan digirin. Henek û stiran hin bi hin dikevin qalikê edebî.

Li bajarê Atenayê, di perçeyê duduyan de ji sedsala pêncan berî Isa, nivîskarê yûnanî Aristofan (445-385) bi komediyên xwe navdar dibe. Di şanoyên xwe de, ew rastî û qeşmeriyan tevhev dike, ew kemasî û biçûkiyên bajarvaniyên Atenayê dide ber çavan. Piştî Arîstofan, Ménandre (340-292 berî Isa) komediyê bêtir birûmet dike. Ew bi awakî giran dibe nigarkêşê civatê û kéfa temâşegeran bi kesên xwe diêne.

Piştî nivîskarên yûnanî, du nivîskarên romanî hunera komediyê berfireh dikan. Plaute (254-184 Berî Isa) û Terence (190-159 Berî Isa).

Li İtalyayê, şanoya kendar di sedsala şanzdehan de bipêş dikeve. "Komedîa dell'arte" li hemû şanoyên Ewropayê kêt dike. Tevnê van şanoyan gelekî sivik e. Bazîger li ser sehnê ji ber xwe ve tiştan zêde dikan, ew dev û lêvên xwe xwaromaro dikan, teqla didine xwe, her tiştî dikan ta ku bêtir kenê temâşegeran bi xwe bînin. Qiralên Fransayê, ji sala 1570î, derî li ber hundermendên İtalyayî û vî rengê şanoge-

riyê vedikin. Molière di desrpêka xwe de di bin tasîra vê babetta kenanînê de ye. Paşê, ew rêya komediya mezin li Parîsê li ber xwe dibîne û ew komediya fransî bi saya berhemên xwe dewlemend dike.

Jiyanâ Molière (1622-1673)

Rûmet û ciyê Molière de warê teyatroyê de herdem giran û bilind e. Molière hemû jiyanâ xwe li ser hunerê xwe dike. Ew hosteyê ken û rexnegiriyê ye. Eger ew bi zanebûneke mezin çewtiyê mirovan û nexweşiyê civatê li ber çavan radixe, ew pesnê zanebûn û baqiliyê jî dike. Ew moralist e, ew dixwaze civata xwar rast bike. Amanca wî ew e ku hemû mirov bi dilovanî û xweşî di civateke adilane de bijîn.


Molière ji malbateke birciwaziya biçûk e. Ew li bajarê Parîsê tê dunyayê. Navê wî yê rastîn Jean-Baptiste Poquelin e. Ew navê "Molière" ji xwe re dibîne gava dest bi karê şanogeriyê dike. Bavê wî ber û merşan ji bo qirêl çê dike. Daxwaza wî ew e ku piştî mirina wî lawê wî cihê wî bigire, jiyanekê misoger û bê serêş binase. Lê Jean-Baptiste di bîstsaliya xwe de xwe ji can û dil dide karê şanogeriyê. Ew komeke ji şes bazîgeran saz dike û navê wê dike şanoya navdar.

Li Parîsê ew biser nakeve û ji ber deynan dikeve zindanê. Gava derdikeve, ew biryarê dide biçe li derveyî Parîsê, li bajarên mezin û biçûk li başûrî Fransayê hûnermendiya xwe têkûztir bike. Ew ji sala 1645 ta 1658 li piraniya bajarên başûrî Fransayê digere. Ew Lyonê ji xwe re dike navend û navnîşan. Di sala 1658an de ew li bajarê Rouenê, bajarê Corenille, bi cih dibe. Ew birayê qiralê Louisê Çardehan ji xwe re dike pişt û bi saya wî vedigere Parîsê, bajarê xwe, beşê dawîn ji koça xwe ya dirêj. Di sala 1659an de ew biser dikeve û navdar dibe. Di duwanzdeh salên dûrî Parîsê de, ew fêrî gelek tiştan dibe, ew li ser rewşa mirovan kûr dibe. Ew bêtir hûnermendiya şanogeriyê jî dizane û rêya navdariyê li ber wî, dawiya dawîn, vedibe.

Lê navdarî piraniya caran teşqelete û serêşan jî bi xwe re peyda dike. Molière zehmetiyeke mezin ji ber serê berpirsyarên oldar dikişine. Ligel ku Louisê Çardehan bi xwe jî piştgirtiya wî dike, Molière ji ber agirê oldaran nake debar. Piraniya şanoyê wî di cih de qedexe dibil. Ji ber derdên oldar û xêrnexwazan, ew qels dibe, nexweşî li wî peyda dibil. Ew di ber xwe dide û berhemên xwe diparêze lê bêçare. Ew ne bi tenha serê xwe ye û berpirsiyariya grûpa wî li ser milê wî ye. Ew bêgav e pir binivîse û kar bike ta ku kesên li dora xwe xwedî bike.

Xweşikperestên qesmer (1659)

Bi vê şanoyê Molière biser dikeve. Di sedsala hivdehan de kesine hene dixwazin ku



her tişt xweşik, giranbuha û bilind be. Molière di vê şanoya xwe de qerfê xwe bi xuyê van kesan dike, wan di çavan de biçûk û kenawer dike. Di vê şanoyê de, Cat-hos û Madelon tê Parîsê û bawer dikan ku her tişt, wek di dastan û çirokan de, gerek xweşik û giranbuha be. Ew du camêran pîs dikan çîma ew herdu camêt bi çavekî ne pir mezin li wan nanerin. Ev herdu camêren sade dixwazin tola xwe hilînin û van herdu xweşikperestên gundî fêrî rastiya tiştan bikin. Ew berdestên xwe Mas-carille û Jodelet bi kincen xandar û malmezinan ji wan re dişînin. Ev herdu xweşikperest li ber dan û standin û axiftinê van herdu berdestan dev ji hev dimînin. Lê gava ew rastiya tiştan nas dikan, ew bêrûmet dibin û ji ber tevgerên xwe fehêd dikan. Ew tê digihêjin ku mezinbûn û biçûkbûna kesan ne bi kinc û gotinan in.

Dibistana Jinan (1662)

Xêrnexwazên Molière rexnên tûj lê digirin. Ew dibêjin ku ji bili qeşemerîyan, tiştêkî din ji Molière nayê. Ta ku Molière devê wan bigire, ew di sala 1662an de *Dibistana Jinan* dînîvisîne û ev berhem gelekî biser dikeve.

Mirovek heye tîrsa wî ya herî mezin ew e ku piştî ku ew jinekê bîne, jina wî rojekê wî bixapîne. Arnolphe cil û du salî ye. Ew navê De la Souche li xwe dike û Agnès dûrî jiyana tevlihev, li gundan, mezin dike. Ew dixwaze ku çavên wê tenê ji bo wî hebin, ku ew tucarî dilê xwe nebijîne mirovekî din. Lê rojekê xortek bi navê Horace tê. Gava Agnès çav lê dikeve, dilê wê bi baskên hezkirinê difire. Hemû tevgerên Arnolphe berbad dibin û şano bi zewaca Agnès û Horace tev dibe. Molière nişan dide ku ew ne tenê hostê kenanînê ye; ew xweş mirovan û civatê dinase. Ew dizane ku mirov çiqasî bixwazin rastiya xwe veşîtin dawiya dawî ew rastî, ew xwezayî, ê derkeve. Dawiya sextekariyan herdem tê, benê derewan kin e. Ev bawerî di hunermediya Molière de yek ji stûnê herî bingehîn e. Mirovê sextekar rûreş derdikeye, derewên wî dawiya dawîn derdikeyin.

Tartuffe (1664)

Ew komedî ji sê beşan, bi helbestî hatîye hûnandin. Ew di nav berhemên Molière de ciyekî mezin digire. Ogron mirovekî têr, zana û dilpaqij e. Rojekê, ew pêrgî Tartuffe tê û bawer dike ku di bin stûnê asmanan de mirov di ser vî Tartuffî re older û paktir tunene. Tartuffe xwe wek mirovekî zana û dilpaqij, xwedî dîn û baweriyeke bilind diyar dike. Ogron mirovekî sade ye û radibe hemû malên xwe li ser navê Tartuffe dînîvisîne, keça xwe lê mehr dike. Di rastiya xwe de Tartuffe mirovekî durû û Xwedênenas e. Ew li dora Elmîrê, kevaniya xêrzwazê xwe, digere û

destê xwe dirêjî wê dike. Jînik her tiştî ji mêtê xwe re dibêje û ji qesdî ve sozekê di-de Tartuffe. Orgon ji devê Tartuffe dibihiye ku ew ci însanekî bêrûmet û bênamûs e. Lê belê ew nikare wî biqewrîne, ji ber ku wî hernû mal û perên xwe li ser navê wî nivîsandî ye. Bi saya qirêl mirovê pîs digihêje pîsîtiya xwe, dawiyekê kambax dibîne. Mirovê rind, bi dilpakiya xwe, şad dibe. Molière bi vê berhemê texnan li sextekar û Xwedênenasan dike. Ew dibêje ku gelek mirov hene olê bikar tînin ta ku bigihêjin pîsîtiyên xwe. Ew ne dijî kesen ku bi rastî bi Xwedê bawer in. Lê kesen Xwedêgiravî dîndar û berpirsiyarên kelisê dijî wî û berhema wî radibin. Ew zor li Louisê Çardehan dikin ta ku ew vê şanoyê qedexe bike. Qiral bêgav dibe bi ya wan dike, digel ku ew ji Molière hez dike.

Molière di destpêka vê berhemê de dibêje ku daxwaza wî ya herî mezin ew e ku ew mirovan ji pîsîtiyan dûr bixe. Ew xêrxwazê mirovan û civatê ye. Armanca wî bi afirandina van berhemên kendar ne tenê kenanîna mirovan e. Na, Molière textore civatê ye, parêzgerê sinc û exlaqê ye. Ew tiliya xwe di ser birînan re dibe. Ew hêvî dike nexweşî û çewtiyan ji hundirê civatê rake.

Dom Juan (1665)

Serêşen ji ber qedexekirina Tartuffe Molière bêgav dikin ku ew şanoyeke din, piyesa Dom Juan bi lez û bez binivîsine. Naverok û tevnê vê şanoyê bi xwe gelekî kevn in. Ev babet cara yekemîn di edebiyata Espanî de peyda dibe. Molière bi xwe mijarê ji şanogerîya İtalyayî distîne. Ew gelek tiştan diguherîne û bi saya wî, kesê Dom Juan di hemû edebiyata ewropayî de belav dibe. Dom Juan doxînsistek e. Jinek têra wî nake, hemû jinêñ dunyayê têra wî nakin. Di destpêka şanoyê de ew ji berdes-tê xwe Sganarelle re rastiya xwe dibêje: ew derewan li jinan dike, sozan dide. Ew wan dixapîne, dibêje ku ew ê wan bike xwedî mal û jiyaneye bilind. Ew ji bo kêfa xwe dikare malên wan wêran bike, keçan ji keçanî bixe. Ew rojekê jî kalebavekî di-kuje piştî ku ew keça wî dixapîne. Paşê, ew li bajarekî rastî pûtê wî kalî tê. Ew qerfê xwe bi mirovê mirî dike û wî pûtî vedixwîne bê li bal wî şîvî bixwe. Wê êvarê, bi rastî, pûtê mirovê kuştî tê li deriyê wî dixwe, li ser masa wî rûdinê. Dom Juan tîrsa nava xwe vedîşêre lê gava pût bi destê wî digire, agirê dojehê bi canê wî dikeve. Pût jê dixwaze ku ew tobe bike, gazî dilovaniya Xwedê bike, lê Dom Juan tobe nake.

Dom Juanê Molière mirovîkî durû ye. Gava rê lê teng dibe, ew dikare derewan û her tiştî bike. Ew qerfê xwe bi bavê xwe dike û mirina wî dixwaze. Ew pirsa Xwedê û dojehê di ser guhê xwe re davêje. Ew ji dilê xwe tobe nake gava mirin tê dawiyekê ji ziyanêñ wî re deyîne.

Berhama Dom Juan ji şanoyê kenawer û komîk dûr dikeve. Gotinê Elvire ga-va ew bi ser Dom Juan radibe giran in û ew berhemê ber bi trajedyê dajon. Hêvi-ya Elvîrê ew e ku Dom Juan dev ji nepakiyê xwe berde û bide ser rêya rast. Le be-lê, ji aliyekî din, pevv û tevgerên Sganarelle naveroka vê berhemê bi xurtî ber bi komîdiyê dikişinin.

Molière rûyekî nû dide Dom Juanê kevin. Bi saya hunermediya Molière, ev ber-hem, wek ya Oedipus, Faustus, Orpheus, ciyekî mezin di edebiyata ewropayî de distîne.

Le Misanthrope an Mirovnehiz (1666)

Di hêwana Célimènê de, Alceste diyar dike çîma ew mirovnehiz e. Ew ji ber derew û durûtiya mirovan dûrî civatê dikeve. Alceste rastiya tiştan her gav dibêje û bi vê yekê jî, gelek serêşan ji xwe re peyda dike. Kesek ji ber xuyê wî jê hez nake. Dilê wî di Célimènê de heye lê ev xanim durû ye. Ew di mala xwe de qerfê xwe bi hemû mirovan dike. Her ku Alceste dike hezkirina xwe jê re eşkere bike, mirovek derbas dibe. Dawî, her kes tê digihêje ku kevaniya malê gotinê nepak li pişt wan hemûyan dibêje. Her kes jê dûr dikeve, tenê Alceste pê re dimîne. Ew ê wê mehr bike lê bi mercê ku ew dev ji jiyana xwe berde. Célimène dudilî dibe. Alceste jî dev jê di-qere û terka dunyayê dike.

Di vê şanoyê de Molière rexnan li dunyaperestinê, li jiyana çîna têr û xandarêن bajarî, dike. Eger zimanê van kesan hergav şîrîn e dilê wan piraniya caran reş e, ji rikê û nepakiyê dagirtî ye. Civata dunyaperstan li ser derewan tê avakirin. Ew cih nade hîsên bilind û nemaze hezkirina rastîn.

Çikûs (1668)

Di vê şanoyê de, Molière, wek her carê, rexnan li nexweşiyekê ji nexweşiyêن civatê dike. Ew qerfê xwe bi çikûşî û perestina peran dike. Mirovekî dewlemend bi navê Harpagon heye. Ew xwedî mal û zêç e. Law û keçekte wî hene. Ew bi ser pêncî salî ketiye. Ew ê keça xwe bide kalekî bi navê Anselme ji ber ku ev kalê hanê, bê rehel û bê pere, wê keça wî bike. Lê keça wî ji xortekî hez dike û wan biryar dane ku ew ê bibin jin û mîrê hev. Lawê Harpagon, Cléante, ji keçekte haltenik bi navê Mari-anne hez dike. Lê Harpagon bi xwe jî ê Mariannê bîne, bêyi ku ew bizanibe ku di-lê lawê wî di wê de heye. Xirboqî û girêkên vê şanoyê li ser lîstikên zimên û ken ava dibin. Dawiya dawîn, her kes digihêje miradê xwe. Lawikê ciwan Mariannê di-ke, xuşka ciwan dilberê xwe dike. Bavê çikûs û kal dîsa sindoqa xwe ya peran ya

ku hatiye dizin dibîne û pirsa zewaca xwe ji bîr dike. Ew tenê dixwaze ku sindoqa zêran lê vegere û ci dibe bila bibe. Kalê Anselme tê digihêje ku Marianna rewştenik bi rastî keça wî ye, ku xortê ku ji keça Harpagon jî hez dike lawê wî ye. Ew bi saya perên xwe kêfxweşiyê li dora xwe belav dike, şadiya herdu zarokên xwe ava dike. Kalê Anselme mirovki aqilane ye. Hîsên wî xwezayî ne. Ew dibîne ku tiştekî xwezayî ye ku xort û keçen ciwan bi hev re bin, ku bav ji zarêñ xwe hez bikin û deriyêñ bexteweriyê di rûyê wan de vekin.

Harpagon di wî tişti de tucarî nagihêje. Ew dûrî rastiya tiştan û xwezayê ye. Ew bi gihiştî ne li ser hişê xwe ye ji ber ku hezkirina bêpîvan ya peran dîlê wî kwîr dike. Trajedî û komedî du avin û dikevin nav hev de. Ew berhem dikarîbû bibûya trajedyek mezin eger Harpagon bigîhaşa daxwazêñ xwe û berdewam bikira. Kêsên mîna Harpagon dikarin di civatê de gelek malan wêran bikin.

Ev berhem, mîna piraniya şanoyêñ Molière, dikarîbû bibûya trajedî û dawiyêñ pir malkembax bi xwe re bianîna. Lê Molière hostê komediyê ye. Ew bi zanebûna xwe payaneke xweş dide berhema xwe.

Raman û nêrînêñ Molière

Molière bi parastina hîsên xwezayî û aqilmendiyê bang dike. Daxwaz û hîsên mirovan gerek ne pir xurt, ne gelekî qels bin. Ne nermita pir, ne hişkiya bêpîvan. Navend ji her tişti çêtir e. Eger hemû mirov guhêñ xwe bidin dengê xwezayiyê, ew ê giş bi xweşî bi hev re bijîn. Lê gava hîsek di nava mirovki de gûr dibe, ew mirov kwîr dibe. Ew dûrî rêya aqilmendî û terazûya cîhanî dikeve. Wek nimûne, hezkirina Harpagon ya bêpîvan xurt ji peran re wî kwîr dike, nahêle ku ew hîs û daxwazêñ xwezayî yên keç û lawê xwe fêm bike. Tartuffe, ji ber durûtiya xwe û hezkirina xwe ji bilindbûyînê te nikare jiyanekê aram bibîne. Alceste wiqasî mirovnehiz e ku ew nikare bawer bike ku di dilê mirovan de cirûskên xêr û xêrxwaziyê hene. Ev hemû kesên ku Molière pêşkêşî temasegeran dike dûrî jiyanekê sade û hîsên xwezayî ne. Jiyana bi wan kesan re dibe dojeh û hemû kesên li dora wan bi agirê wan dêşin.

Molière dibêje ku mirov gerek camêr be, li cihê xwe giran be, aqilmend be, mirov gerek nekeve nava hîs û xwestekên bêpîvan. Her mirov divê bi çarenûsa xwe, bi çîna xwe ya civakî razî be. Eger bermaliyek, an gundiyeck bixwaze wek xananbijî, helbet wê kenê mirovan bi wî bê. Eger kalek bixwaze şûna xortekî bigire, dergîstiya wî jê bistîne, helbet ew ê bibe qeşmer û temaşa.

Felsefa Molière felsefekê insanî ye. Molière guh li pirsên li ser olê nake. Dîn bala wî gelekî nakişîne. Daxwaza wî ew e ku ew nîşan bide ku bexteweriya mirovan di

civateke xwezayî û sade de ye, ne di tevliheviya hîsên xurt de ye. Molière dixwaze ku mirov bi zanebûn û bi pîvan di civatê de li xweşiyêñ dunyayê bigerin. Di baweriya Molière de, mirov dikarin bextewer bin beyî ku ew bi Xwedê û bi olê ve girêdayî û bawer bin.

Molière ji Racine û Corneille bêguman bêtir li dema xwe û hemû demên dîrokê kîr dike. Ew neynika jiyana dema xwe û ya hemû demên din e. Ew hergav mijareke biçûk heldibijêre û fireh dike. Berhemên wî ne li ser qehremanê efsanan an yên dîrokê ne. Ew ji nava gel in, ew mirovine sade ne. Ma ci ji Harpagon û Alceste û Jourdan û Dom Juan di civatê de bêtir!

Daxwaza serekîn ya Molière ne sinc an rastkirina çewtiyêñ mirovan e. Ew doza civateke rast û pak helbet dike lê amanca wî ya herî mezin biserketina berhemê ye. Ew hêvidar e bi hunermendiya xwe këfa temaşegeran bîne û rewşa xwe û ya hemkarêñ xwe xweş bike.

Molière di warê komediyê de bêguman yek ji nivîskarêñ cîhanî yê herî biserketî ye. □

Êdî bes e

BADAL RAVO

Ne çavêñ te
Min dihewînin
Ne hinavêñ te
Eşq û janêñ min diçerînin...
Êdî bes e!
Ne ez ez im,
Ewê ji tîrojka heyvê
Stivank vêhandin
Û sîngê te çiyayî pê nexşandî
Êdî bes e!
Ne ez ez im
Ewêñ pêlên rûbarêñ evîndar
Ewê ciwaniya heyva dildar
Kirine helbest û hozan,
Çavêñ te pê kildayin
Êdî bes e...

Welatê min

Ji bo te ey welatê min ê leyizî
Li jêr sîbera sêhrê û agir
Ji bo te ey welatê min ê birîndar
Rondika dirêjim
Rondikêñ min dibine çîra û fener
Ji bo te her û her rondika dê birêjim
Ta serbesû ji digel min
Rondika birêje...

Necîb Mehfûz

EMİN NAROZİ

Nivîserê Misrî yê bi nav û deng û pirralî Necîb Mehfûz (1912—) hê berî wer-girtina xelata nobelê jî hem di nav edebiyatvanê Misrî û Ereban de û hem jî di nav edebiyatnasên cîhanê de baş dihate nasîn, lê bêguman bi wergirtina xelata nobelê ya sala 1988'an re cihê wî yê nav edebiyatvanê cîhanê bilindir û bi rûmet-tir bû.


Çendî ku Necîb Mehfûz bi çîrokên xwe navdar e jî lê sêhevromanên (trilogiyê) wî yên bi navê Beyn el-Qesreyn (1956), Qesr eş-Şewq (1957) û Es-Sukkeriyye (1957) ku navê xwe ji kolan û taxên Qahîreyê girtine, di nav edebiyata cîhanê de cîhekî wan yê taybetî heye.

Necîb Mehfûz di van romanên xwe de jî wek pîrrîn berhemên xwe, gîranî daye ser gelşen civakî û malbatî, ew bi tevayî li ser jiyana civaka ereban û bi taybetî jî li ser ya xelkê Misrê rawestiyaye. Wî hem jiyana wan ya li hundurê malê û hem jî ya li derive bi awayekî zelal û vekirî û dûr û dirêj pêşkêşî xwendevanê xwe kiriye.

Ev serpêhatiya di destê me de ya bi navê *Dunyallah* jî mîna gellek berhemên wî yên din li ser beşek ji civaka karmendê Misrî û hawîrdorêñ daîreyêñ fermî ye. Ew serpêhatiyekê ku serê mehê wextê sitandina meaşan li karmendêñ daîreyekê qewimiye tîne zimêñ û pê re jî gellek bûyerêñ ku di nav civakê de çêdibin carna bi diyalogan û carna jî bi ceweta dîtinêñ rollgiran diyar dike. Necîb Mehfûz di bikaranîna zimêñ de jêhatî ye û haya ku jê tê hevoksazkirina zimanê klasîk bi awayekî serbest li zimanê erebî yê nûjen û nîvîskî tîne. Di berhemên wî de hevaxaftin û têkilî tev realist in.

Necîb Mehfûz di sala 1912'yan de hatiye dînyayê û di navbera salêñ 1939 û 1944'an de li Unîversîteya Qahîreyê beşa Filosofiyê xwendiyê.

Necîb Mehfûz serê pêşî bi serpêhatiyêñ dîrokî dest bi nivîseriyê kiriye û her ku çûye berê xwe fireh kiriye û gellek berhemên hêja dane. Ji bîlî van hersê romanên (trilogiyê) wî berhemâ wî ya pêşî ya *Hemas el-Cunûn*, ku cara pêşî di sala 1937'an de hatiye weşandin, ya *Emam el-'Erî* û ya *Qisset Haretîna* navdar in.*



Cîhana Xwedê

NECİB MEHFÜZ Ji erebî: EMİN NAROZİ

Bi ketina dergevanê daireya hukûmetê 'Emo İbrahim re hunduru tije jiyan bû. Wî camên daireyê yek bi yek vekirin, bêdil û ponijî dest bi sivnikkirina erda wê odaya fireh kir, di ber de jî wî hêdî hêdî û li qayde serê xwe dihejand, arçûmekêñ xwe fena ku tiştekî bicû dibir û dianî û pê re jî muyen spî yêr erçen û cêniķen wî dihejiyan, lê heçî di qoqê serî de tayek mû jî nemabû. Piştre ew li maseyan zivirî, dûmanâ ser wan paqîj kir, tiştên ser wan li hev rast kir, paşî derbasî odeya midûr bû, ji wir careke din li odeya mezin nihêri û çavêr xwe mîna ku li xwediyyê wan binihêre, li ser maseyan gerand. Carna besera wî vedibû û carna jî madê wî nexwêş dibû, lê dawî bisîrî çû û ji xwe re got: »Vêga jî em ê herin haziriya taştê bikin«.

Pêşî karibê arşîvê mîrza (birêz) Ehmed ku temenê wî gîhîştibû pêncî salî û mîna kalekî piştxûl bûbû, xwediyyê rûyekî neqîşandî û madekirî bû ku tê de tadehiya sal û zemanan xuya dikir, hate xêni. Li pey wî jî riñîskarê tipnivîsê (daktiloyê) mîrza Mustafa ku pirr dikeniya lê kenekî zorakî jî bo veşartina xemên xwe yê rojane, hat. Piştî wî Semîr yan jî çawa ku li idareyê dihate gotin »Mirovê Rengsirr» û Cindiyê ku ruyê wî hê qet jî xweşîya zarokiyê derneketibû, hatin. Mîrza Mustafa jî gustûl û saeta zêr di dest de, maşeya qerewat a zêrîn di ber de, bi kubarî kete hundurû û pê re jî Hemamê dilzîz î bejinzirav û sirrparêz hat. Paşê jî serokê İdareyê yê payebilind mameste Kamil, tizbiyek di dest de û digel giramî û cidîtiya xwe hate hundurû. Bi hatina wî re idare bi xişexîşa kaxez û dengê mirovan tije bû lê, kesî dest bi şolê xwe nekir. Midûr bi xwe jî bi telefonê mijûliya xwe dikir û rûpelên rojnameyan jî weke duruşm û alayan li hewa li hev diketin.

Lütfî ku çavêr xwe li nûçeyan digerand got:

– Wê îsal bibe dawiya cîhanê,

Dengê midûr jî ji ser telefonê bilind bû:

– Ma dê hîv bê girtin?

Di wê navê de Semîr jî kire gazî:

– Çima em xwe bi zewac û zarokan re diêşînin, va xortekî li ber çavên diya xwe bavê xwe kuştiye!

Herweha Ehmed jî bi dengekî ketî got:

– Ma ku derman li bazarê nebin ci kelkê nivîsına reçeteyan heye?

Di wê navê de çavên Cindî ji ser klînika pêşberî wan nediniqiya û ji kursiyê xwe zoq bûbû li pişta hemşireya almanî ya çûrik dînihêri û Lutfî jî li xwe ewle domand:

– Ji min bawer bikin, dawiya cîhanê ji hîzîrên we nêzîktir e!

Midûr destê xwe danî ser dengwergirê û bi dengekî fermanwarî ji Hemam re got:

– Dosyaya numreya 120/3-1'ê amade bike!

Piştre ew dageriya ser xeberdana xwe ya balkêş û Hemam jî bê ku serê xwe ji ser rojnameyê bilind bike di ber diranên xwe de got: »Korîma diya te kirî!«

Di wê navê de ‘Emo İbrahîm jî tevî bergeşike tije dageriya û dest pê kir sendawîçen fasûliye, îsot, penîr, helaw û tehîn li wan bela kir. Devê wan dest bi xwarinê kir, li heraliyî bû mîrtçemirrç lê çav ji ser stûnên rûpelan ranebûn. ‘Emo İbrahîm jî di dergehê idareyê de rawestiya, bi awayekî ecêb û bi çavine xumamî li nanxwuran dînihêri ta ku Ehmed bi dengekî devdagirtî bang kir:

– ‘Emo İbrahîm lîsteya meşan.

Mêrik çû. Piştî saetekê qerewat- û lewentefiroş (miskfiroş) ku herserê mehê dihate idreyê, kete xêni. Wî pertalên xwe li ser maseyê vekir û karmandan jî xwe dan dorê, lê nihêrin û lazımatiyen xwe jê girtin. Zilam bi niyeta ku dema wergirtina müçeyan (meşan) careke din bizivire ji odayê derket. saetek piştre rûnfiroş hate xêni ku deynênen xwe bide hev lê Mustafa keniya û bi zimanekî manedar jê re got:

– Raweste ta ku ‘Emo İbrahîm dagere.

Zilam bi pinepina lêvîn xwe yên ku hertim dixwendin, li ber derî rawestiya; tîpnivîs jî bi lez dişixulî û di wê navê de Samîr jî derbasî odaya Midûr bû ku hinek belgeyêن girîng nîşanî wî bide. Cara pêşî tavê ji paceya raserî meydanê da odaye û Cindî jî ji qasê carekê çavek davêt cama klînikê. Midûr ji bo şolekî gazî ‘Emo İbrahîm kir lê Mustafa ew agahdar kir ku ew hê ji maliyeyê neziviriye; li ser vê yekê Ehmed serê xwe ji ser dosyayan rakir û got:

– Zilam dereng bû! Gelo çîma ew dereng ma?

Herweha rûnfiroş jî rabû bi niyeta ku dîsa dagere, çû hinek daîreyen din, Ehmed jî çû derveyê odaye rast û çep li rê nihêri, piştre zivirî û got:

– Tu pêjn jê nayê, gelo ci tiştî ew bi paş xistiye?

Ew zilamê xirriyayî.

Piştî sê sactan êdî sebra Ehmed nema hat, ew ji cihê xwe rabû û bi dengekî bilind diyar kir ku dê ew here Malîyeyê li zilam ['Emo İbrahim] bigere. Demek dûvre ew bi madekî nexweş î xeyidî hat û got:

– Hê berî saetekê wî meaş girtine; gelo ew dîn bi kur ve çûye?

Lutfî pirsî:

– Ma wî mûçeyê xwe girtiye?

– Erê, kasedaran wusa got.

– Belkî ji bo bazarê çûye bajêr.

– Berî ku meaşen me bîne?

– Ev ne dûrî aqilan e, çiku herroj ew tiştekî nû dike.

Madekî nexweş xw berda ser ruyê wan, ruyê mudûr ku meaşê wî gihiştibû kîrta çaran, qermîçî û bêdengiyeke kurt xwe berda ser daîreyê ta ku Mustafa bi kenê xwe yê hercar bêdengî birri û got:

– Bînin ber çavên xwe ku wî ew di rê de dizî bin. Dengê kenekî wusa pirr hûrik mîna keserên nihêni ji hinekan hat, lê Lutfî domand:

– Yan jî bûyerek lê qewimî be.

Lê gava wî madê wan û nexwî dît rabû şora xwe guhert û got:

– Ew tişte ku îro pê li 'Emo İbrahim bike, pê li temamê idareyê dike.

Ehmed jî bi hêrs got:

– Ji bilî wanênu ku dewlemendiyek taybetî li pişta wan e.

Dilê gişan hebekî bi gotinênu wî xwes bûn lê Midûr bi xameya xwe ya parker ku di rojek xweş de pê hatibû perûkirin, li masê xist û daxwaza aramiyê ji wan kir; ya rastî wî endişeyênu xwe vedîşart. Bes digel vê jî dîsa Cindî pirs kir:

– Di vê rewşê de dê çi bibe ji diravan?

– Mîna rewşa diziyê?

Lê kesek nekeniya û Cindî jî pirsên xwe domand:

– Di rewşa qezayan de?

– Ew bi zor hatine dizîn, li cem polîs dimînin ta ku rastî derkeve holê, de bimire kero!

Lê xuya bû ku diyarê kenê bi tevayî qeliyabû, rû giş xemnak bûbûn û dem mîna nexweşîyeke giran pirr hêdî dicû, di wê navê de dengekî pirsî:

– Em vê sibeyê li ser ruyê kê rabûne?

Ehmed rabû çû daîreyan tev li 'Emo İbrahim geriya û dûvre bi ruyekî bêhêvî û kesirî zivirî.

Di vê bûyera ecêb de Mudûr li tiştekî ku nedikete dilê yekî ji wan, dihizirî. »Dê nifir giş lê bêne kirin û her cure manî dê bêtin qebûl kirin, ma jê pê ve ci tê kirin? Heçî Lutfî, jineke dewlemend li pişt e, Samîr yekî navdar e, lê hinek rebenên mîna Ehmed dê pirr pê bişen. Di wê navê de rûnfiros jî dageriya û berî ku devê xwe veke Midûr lê hate şotir û potiran:

– De raweste, qiyamet ranebûye û em li daîreyeke hukûmetê ne ne li kuçê.

Zîlam şaşmayî zivirî, hinek karmendên daîreyê din ku ji bo temâşê hatibûn, Xwestin ku yarıyan bikin lê hewayeke wusa xemnakî giran hebû ku tinaz di gewriyên wan de hiştin. Tasewasa dilê karmendan her ku çû zêdetir bû û destêwan hew kar girt. Ehmed keserek kişand û pê re got:

– Dilê min dibêje ku mesele jidil e, gelî alemê me rihet bîhêlin, piştre rabû ser piya û got »Ez ê herim ji dergevanê wezaretê jî bipirsim« û bi lez wunda bû, lê dûvre dageriya û bi dengekî hêrsbûyî kire qérîn:

– Dergevan eseyî dîtiye ku ew saet li dor 9'ê danê sibê ji daîreya wezaretê derketiyeye.

Li pey jî bi dengekî ketî domand:

– Xuyaye ku ji bûyerekê xerabtir e, ne mumkin e ku jiyana xwe bide bi sed û pêncî dused cunêhî (diravê misrî ye), qeza ye! Ey Xwedayê erd û esman ma kes li vî bajarî heye ku dawiya wî nehatîye?

Demek piştre Lutfî his kir ku carna hinek awir bi aliyê wî ve diçin û rabû bi dilekî guvişî got:

– Ev yek ji tifaqekê xerabtir e, belkî hûn meraq dikin bê ci bi min tê, lê ya rastî heçî jina min çendî ku dewlemend e jî lê yek mulîmekî [=1/1000 cunêh] bi tenê jî ji malê xwe nađe min.

Bi dehan lanet nihêni lê hatin kirin, tu kesî bala xwe nedayê û Ehmed ji keserek kişand û got:

– Hûn ji Xwedê bawer dikin? Bi wî Xwedayê bi tenê kim ez ji roja didoyê mehê ve diçim û têm û yek mulîmek jî di berîka min de nîne. Ne qahwe, ne çay ne jî bikarânîna tu wasîteyan, zarûyek di lîseyê de yek jî di unîversiteyê de ye û ji ber dibistana seretayî deynekî pirr li min heye, de îcar ez dê ci bikim ey Xwedayê gerdûnê?

Dema ku saet ji yekê bihûrî midûrê idreyê bi ruyekî xemnak û qermiçî rabû piya ji odeya xwe derket û got:

– Divê çavdêrê giştî bê agahdarkirin.

Çavdêrê giştî bi dilekî xemgîn li bûyerkê guhdarî kir û piştre pirsî:

- Digel vê gumanê jî ma ne mikûn e ku vegere?
- Ya rastî ez bi temamî bêhêvî me, saet jî tê diduyan. Çavdêrê giştî bi awayekî rexnegir got:

- Tu dizanî ku reftara we şas e û dijî birtyaran e. Midûr hinekî bêdeng û bêhêvî rawestiya û piştre kire minemin:

- Daîre giş wusa dikan.

- Çendî ku wusa be jî dîsa şâsiyek yeke din rast nadêre, ji min re raporekê binivîse da ku ez bidim serokê wezaretê.

Bes Midûr ji cihê xwe nelibitî û got:

- Pêwîstiya hemiyan pîrr bi meaşen wan hene, ev rewşike bêmînak e.

- Hûn ci ji min dixwazin ku ez bikim?

- Me tu meaş nesitandine û tu liste jî tîmza nekitine.

- Tişte bûye nayê inkar kirin û reva ji berpirsiyariyê tine.

Bêdengî dirêj bû. Midûr bû wek yekî wundabûyi, çavdêr pê re westiya û xwe bi hinek kaxezên ser maseya xwe mijûl kir ta ku midûr ji cihê xwe rabû û hêdî hêdî ber bi derî ve meşîya, li ber derketinê dengê çavdêr hatê ku dibêje:

- Xeberê bidin polîs.

Daîreya hukûmetê tev kişiya polîsxaneyê. Riya wan ku dê tê de derbasî odeya komsêr (serekpolîs) bibûna di nav hinek pîrekên ku çarmêrkî rûniştibûn, de dicû û li pêşıya wan jî qefleyek zilamên şerkir î bi xwînê lewîtî ku leşkeran ew dibirin hebûn. Di wê navê de ku ji pişteriyekî asêkirî ve zarîn û hawareke bi şewat dihat, [ew gihiştin odeya komsêr û] midûr mîrza Kamil jî bûyer ji serî heyâ binî jê re qise kir. Wî got ku: »'Emo İbrahimî dergevan e û 55 salî ye, hê ew deh salî bû gava kete ber xizmeta wezaretê û li çapxaneya wê şixulî, piştre ji ber ku bêemriya serokê xwe kir ew avêtin dergevaniyê, mehmizê wî yê eslî şeş cunêh in. Karmendê idareyê, digel hinek ecêbiyên wî yên mîna ku carna ne li hiş dipeyive yan têkilî tişte ku pê nekerîye dibe yan jî carna bêsedem li xwe digire û xwe davêje nav siyasetê, hemî jê xweş in. Tê gotin ku ew li taxa Derb el-Hulleyê li numreya 111'yan rûdinê û heyâ niha tu diziya wî derneketiye, tiştekî ku guman jê bêkirin nexistiye stuyê xwe.«

Piştî nivîsandina raporê Komsêr got: »Dê polîs pêşî eseyî bikin bê ka tu bûyer bi serê wî ve hatine yan na û piştre wê bidin pey rêça wî. Wê hingê karmendan ji çû-yinê pê ve tu rê ji xwe re nedît û rabûn mîna sermestên ecêberandî ji polîsxaneyê derketin. Dengên wan tevîhev bû, gîlî û gazinên wan ên li hember berpirsiyariya giran ku li malê li benda wan bû, dest pêkirin. Dilê hemiyan dixwest ku ji hev neqetin û pêkve gelşa xwe çareser bikin lê ji ber ku bivê nevê dê dawiyê ji hev biqeti-

yana, rabûn ji hev belabûn û heryek ji wan bi riya xwe ve çû. Midûr bi xwe dageriya malê û ji leyistika poker yan jî konken pê ve tû daxwaziya wî tinebû. Nivîskar Mustafa çû Deriyê Şe'riyye cem deyndêrên ku gava ew dikete tengasiyê, timî diçû bi faîzeke pirr pûl ji wan deyn dikir. Heçî Lutfi jina wî xwe da ber nefeqeyê malê lê diviyabû ku ew ji bo xercê xwe yê mehê, dekekê lê bike; Cindî ku xortekî ezeb bû û li cem bavê xwe dima biryar da ku ji bavê xwe re bibêje: »Vê mehê weke ku ez hê jî xwendevan bim min biqedîne!« Hernam bi xwe diviyabû ku jina xwe ya endamê komeleya cîranêن hêvişkar (teserrufkar) bîne rê ku digel xwekêmdîtin û bûna sedemê qirên û girinê jî, dîsa ji hevbeşan para xwe ya mehane ya kincan bixwaze û ji bo mûnetê malê xerc bike. Rewşa Semîr hebekî ji ya wan hêsayitir bû û ji ber vê jî dema ew bi tenê ma ji xwe re got: »Ger ku ne ji bertîlê bûna ez ê bikerima kuçeyeke rê jê nederket!« Ehmedê arşîvgêr ku hevalên wî hêviya sibelêbûnê jê nedikirin, ma dawî, ew bê armanc û bê ku haya wî ji der û dorên wî - ci mirov û ci wasîte - bimîne li rê meşîya û bi keser û madekî zer kete hundurû, xwe avête ser kursiyê pêşî ku gihîştê û çavêن xwe girt. Jina wî tevîbihna xwarinê çû bi ser ve û li derdê wî pîrsî:

– Ci bûye ji te?

Wî hema yekser got:

– Vê mehê meşê me tine!

Wê behitî got:

– Çîma? Xwedê me ji şer biparêze! Ne 'Emo İbrahîm beyaniyê mehmizê te anî!

Bi vê gotinê re zilamê me mîna wî kesê niqobûyî ku dawiyê bîhna wî derkeve, ji cihê xwe ferqizi û di wê navê de jina wî jî çû demedek kaxezêن maliyê tevî meşê wî giş anî. Ew wusa şâ bû ku hindik mabû ji hişê xwe here, wî herdu destêن xwe bi hewa ve rakir û ji dil û can du'a kir: »Xwedê qencyî bi te bike ey 'Emo İbrahîm! Wey 'Emo İbrahîm Xwedê xatirê te bigire!«

Polîsan avêt ser mala 'Emo İbrahîm ya Derb el-Hulle ku odayeke axîn î nizim bû û hewşike kevn î nîvdexle li ber bû. Ji doşikeke darîn (ji text), hesîrekê, sobeyeke, beroşekê, teyfikeke sac û jineke pîr î yekçav ku wek jina wî xwe da nasîn, pê ve tiştekî din tinebû. Dêma pîrsa mîrê wê jê hate kirin wê bersiv da ku li Wezaretê ye û rast û rast diyar kir ku haya wê ji diziya wî tine. Ji ebayekê pê ve tu cilêن wî tinebûn ew lê gerîyan tê de perçeyek pembuyê piçûk dîtin, jînik jî bi xwe re anîn û hatîn polîsxaneyê. Jina wî pîrr giriya kire qareqar û diyar kir ku haya wê ji rev û diziya wî tine. Wê qala jiyana wan ya pêkve kir û da zanîn ku ew di destpêkê de gellekî qenc bû û lawêن esîl ji wan re çêbûn: Yek ji wan karker e û li aliyê Erqê [kanala avê] dişixule lê ji çend salan û vir ve pêwendiyêن wan ji hev qutbûyî ne. Yek jî hê

dehsalî bû di qezayekê de miriye. Qîzeke wan jî bi karkerekî avahîyan re zewiciye û çûye jora Misrê, ew jî mîna birayê xwe yê karkerê Erqê ji wan dûr ketiye. Herweha wê li xwe danî ku 'Emo İbrahîm di van mehêن dawî de bi awayekî pirr xeter guheribû û pişri ku bûbû navsere nûçeya têkiliyên wî bi çitikfiroşa (bilîtfiroşa) cem qahweya Fuad re hate guhêن wê û ev yek bû sedemê şerê navbera wan yê zêdetir ji şerê gişen rûniştvanên taxa »el-Hulleyê«.

Sîxur çendeyekî çûn li qahweya Fuad bi cih bûn û piştre bi qefleyeke ecêb ji komma zarok û xortikên cixarefiroş tevî hinek cilakerên solan dageriyane beşê. Dema 'Emo İbrahîm ji wan re hate tarîf kirin hingê gişan ew naskir û gotin ku ew di van mehêن dawî de li ser kursiyê paşî yê rîbaza (pasaja) averê rûdinişt, qahweya xwe vedixwar û li keçika İngilîzî mêzedikir. Dawiyê diyar bû ku mebesta wan bi keçika İngilîzî ew lotofiroşa 17 salî yî porzer û çavşîn e ku di eslê xwe de ew jî cixarefiroş û cixareberhekar bû. Kêm û zêde hemiya ji li xwe danî ku dilê gişan, heya dilê hinek muşteriyên qahweyê yên rîzdar û nefspiçûk û şerîn jî, pê ve hebû.

Dilê 'Emo İbrahîm jî pirr pê ve bû, wî carekê gava ku di rê de derbas dibû ew dît û dema zaniya ku ew ji kozeçêra qahweya Fuad e, rabû li dawiya rîbazê ji xwe re cihekî ku herêvar wê lê bibîne, dît. Wî hertim gazî wê dikir berbiçav da ku çitikekê (lottoyekê) jê bikire, lê ya rastî ew lê dişixulî ku demeke dirêj wê li cem xwe bîhêle. Serê pêşî gava keçik bi şewta dilê wî hisiya ji wan re got û wan jî roj bi roj li pey wî casusî kir û pê tinaz û henekên xwe kirin, lê haya wî ji bayê felekê tinebû. Rojekê wê ew pê hesandin ku ew dixwaze bi wê re bizewice û pê re sozê jiyanake xweş î bêkul û xem û bê eziyet dide. Ew pirr kenîyan, ji aliyekî ve wan ew weke qeftekê (nukteyekê) dît lewra fikra zewacê qet nehatibû bîra wan û ji aliyê din ve ji li gor xeyalên wan ew ji endazeya zavatiyê pirr dûr bû.

Yekî ji wan bi henek got:

– Ew jî xwe weke yekî ji me dibîne!

Wê bi qurretî bersiv da:

– Lê ew zilamekî dewlemend e.

Ew careke din pê kenîyan, bes keçikê jî dev ji hatina qahweyê berda û piyê xwe ji herderî birri!

Dilê polisan qenc kete cih ku wan bi seriyeke werîs girtiye lê nizanibûn ku seriye din li Ebû Qîr e. Belê 'Emo İbrahîm li Ebû Qîr bû, ew li ber qeraxê deryayê bi dilekî xweş rûniştibû û awurên xwe di navbera deryayê û wê yasemîna ku gulancikên wê yên zêrin li ber bayê nesîm li ba dibûn, dibir û tanî. Erçena qusandî ji seriye ku di bin şasa spî ya mîna çirra şîr de veşartî bû, xuya dikir û kefa avê rengê xwe dabû

laşê wî. Yasemînê fistanekî nû yî paqij li xwe kiribû û cuwanî û xubiya wê jî mîna bû dilop û pijaqên aveke zelal. Ew bi rûniştineke malbatwarî û bi dilekî xweş i şad û memnûn rûniştibûn digel ku hewaya nîsanê ne bê zixtên sermayê bû. Cihê wan xir û xalî bû hem hê qilasikgir [kesen ku dikevin betlaneya havînê] nehatibûn û hem jî Yûnaniyêñ ku xwedî xanî bûn ji qeraxê dûr bûn.

Evîndariyê li dora vê rûniştina delal lotik dida û direqîşî, di çavêن ‘Emo İbrahîm de awurê bêrikirinê û yên dehşetê pêkve mîna ku cara pêşî ew bi çavekî zarokî û beriyê ji gunehan berê xwe bide cîhanê, diyar dibûn. Wî berê derya nedîtitbû, ji xwe di temamê jiyanâ xwe de ew ji taxêن Qahîreyê derneketibû û ji ber vê yekê jî ew deryaya pêledar, ew qeraxê mezin û ew esmanê ku bi ewrekî spî, wek guleke safî vegirtî bû, şaqiz kiribûn. Wî li dengê gurmîneke ku carna dihate bîrrîn guhdarî dikir û pê re jî bi şadî û dibxwesi bê rabûna lêvan ji ser hev, di ber xwe de dibişiri. Wusa xuya bû ku ew ji zincîra kul û kederêن xwe rizgar bûbû, di xewnekê de digeriya û bi kilamên dila yên bi şewat ku dilên bengî hertim digotin, şadi bû. Keçikê bi dilgeşî xwe li pêşberî wî dirêj kiribû, lê bêpêjniyekê jî bi melûlî xwe berda bû ser kopêن çavêن wê û ew giran dikirin.

Karmendê da'rema hukûmetê mîrza Lutfî ew bêhemdî li Ebû Qîr dît û naskir. Ew hersal havînê diçû li wê havîngehê dima, berî û pişti geşta xwe hertim ji hevalên xwe re qala spehîti, aramî û masiyên wê yên xweş dikir, ji ber vê yekê jî xem û xeyala ‘Emo İbrahîm pê tije bûbû û loma jî dawiyê riya xwe pê xistibû. Ew bi tiştên ku di meha hevhebinê de jê re lazim bûn mîna kinc, amûretên delaliyê, diyarı û pêwîstiyên kêf û xweşiyê, dagirî hatibû wê derê. Roja wî tev di navbera odeya raxistî ku kirê kiribû û qeraxê avê de derbas dibû, ji bilî evîn, temaşe, çıxarekişandin, xwarin û vexwarinê tu mijûliya wî tinebû. Diravêن ku wî di heftiyekê de xerc kir berê di salekê de xerc nekiribû û hê jî dîlketiya wî jî xwestinê têr nedibû, lê li nik wî, ji pêkanîna daxwaziyêñ wê bi leztir tiştek tinebû. Tewr û tevgera wê pîr xerîb bû, heyâ araç û haşhaş jî dixwest. Ew gellek bi pey pirsên vekirî ku êdî pê eziyet di-da, diket fena ku carekê jê pîrsî:

– Ev dirav ji te re ji ku tê?

Wî jî bi ken got:

– Ez dewlemend im

Wê di demeke ku araqê zora hişê wê biribû bi guman got:

– Ez tê digihijim.

– Xwedê dide te!

Ü weke dîna keniya û domand:

– Di devê te de ji çar diranan pê ve diran nemane, yek li jor û sisê li jêr in.

Ew ji kena wexta bifetisiya, weke ku xemgîniyekê ew germ kiribû lê wî xwe şad nîşan dida, şadiyeke ku pirr kesan dizanîbû bê dê çawa biqede. Wî ji weha û pê ve ji bo jidesdernexistina kamîraniya xwe ya heyî nikaribû bêhtir zor bida xwe û herweha ji bo ku nêgirtin ta ku mûlîmên dawî ji diravêن xwe xerc bike jî dîsa ji wusa û zahftir nikaribû zorê bidê ku stûna bextewariya xwe li benda ketina wê ya siruştî bimîne. Ji ber vê jî wî li ser bextewariya xwe dikudand, digel wan zehmetî û acizi-yên ku ji dilketiya wî derdiketin jî. Ji ber vê jî gava wê doza dîtina Îskenderiyeyê lê kir wî qut û birr nanakir û wê jî bi dekên kelepûrî yê dostaniyê got:

– Min ji te re got: »Ez tê digihîjim!«

Bersiva wî jî ew bû ku jê re xişrekî delal bikire, fêkî, şerab û çıxareyên qedexekirî bidê, ruyê wê yê sorgulî maçî bike, jê re bi henûnî bikene û bibêje:

– Ji xwe re li deryayê û li esmana binihêre, bi tişte ku li ber destê te ye şâ bibe ku koleyê te jî xweşbext bibe.

Wî diva ku ew [keçik] jî mîna wî dilxwêş bibe, heya berî çendeyekî ew serberjêr bû ji herrî û xwelyî pê ve tu tişte cîhanê nedidît yan jî bi tenê kul û kederên xwe didît, lê li vir tişten ku berê xeyal nekiribû dît. Wî avêtina rojê ya rengsirri, çûna wê ya ava di wan rengên ecêb i ber şeveqê de dît. Herweha wî li stêrên bêxew, hîva tî-rêdayî û asûyên bêdawî nihêrt. Wî ev gjî bi biriya (qeweta) evîna aferînende dît û xem xwar bê wê çawa piştî vê tadeyî bimîne.

Di destpêka meha hezîranê de qesleya pêşî ku zû hatibûn havîngehê li qeraxê deryayê xuya bûn; bi vê re jî dilê 'Emo İbrahîm çargopalî lê xist û jana dil weke mirinê bi ser ve girt. Di nêzik de dê bextxweşıya wî bi yek carê biçûya û ji bo vê ye-kê jî ew bi bextewariya xwe ya heyî bêhtir şâ dibû, lê çıxareyên wî jî ji hev vêdike-tin. Rojekê dema ew li dikanê bû dît ku karmendê İdareyê mîrza Lutfî li dawiya rê digel sîmsarek ji yên havîngehan xuya kir. Ji tirsa hindik mabû dilê wî bisekiniya, hema bi lez xwe avête kolana kêlekê û ji wir jî çû odeya xwe.

Lutfî hatibû wir ku mîna her havîn ji bo meha tîrmeh û tebaxê ji xwe re havînge-hekê kirê bike. Ji xwe piştî çend heftiyêن din êdî hem bi dirêjahî û hem jî bi berahî seranser wextê tijebûna qeraxê bû ku êdî cih jê re nedima, bi vê re jî dê destê bêhê-vitiyê deriyê wî bitiqtiqandina û wî bêmefer bihiştina. Xewna wî ya xwêş ya mîna van ewrêن bilezçûyî dê biqedîya û ew dildara wî ya ku digel xeyd, acizî, nerihetî û zimanê wê yê licç jî dîsa jê hez dikir, dê mîna kesera wî dev jê berda û biçûya. Erê wî pirr jê hez dikir û ji bo kamîraniya ku dabûyê û wî rihe xortaniyê ku xistibû ca-nê wî jê re spas dikir; Yezdan alîkarê wê be û wê biparêze.

Demek welê ew di odaya xwe de bi tenê ma, piştre rabû dest bi jimartina diravên xwe yên ku pê re mabûn kir û ew li ser singa xwe girêda. Hê wusa wî li ber derî hisa pêjnekê kir, berê xwe dayê ku wa ew e tê. Wî rabû pirs kir ku fêmbike bê ka wê ew dîtiye yan na lê di çavên wê de awireke nahs î şeyatanî dît. Ji ber vê yekê jî dema xwe li kêleka wê li ser doşkê dirêj kir xewa wî reviya û şeva wî di bêxewî û di nav fikran de derbas bû.

Di nav wan hizran de wî dengekî henûn ji nava dilê xwe bihîst ku jê re digot: »Diravan bidê û wê berde bira here«. Wî jê [ji deng] re got: »Roj li min zahf neçûne«. Wî [deng] jî dîsa got: »Diravan bidê û wê berde!« Ew pitkoka delal û jirêketî, gelo bavê wê kiye? Diya wê kiye? Carekê wê eşkere gotibû:

– Di dînyayê de tu kesê min nîne.

Ew jî wusa! Hê ew di wê fîkrê de pê hisiya ku tiştekî mîna mar, di tariyê de li ser laşê wî digeriya û hin bi hin mîna destekî diz ku ber bi diziya xwe ve here, bi jora laşê wî ve dixuşikî. Gelo ji ber vê yekê bû wê, dekbaziya xwe ya handar (teşwîqkar) zêde dikir ta ku bikeve xewê! Wey andêrê! Wî bi destê wê girt, di tarîtiyê de axînek kişand û piştre bêndegeyiekê dest pê kir. Bîstikekê dûvre wî bi xemgînî jê pirsî:

– Jê re.

Li pey jî bi navnotî :

– Kengê min daxwaziyê te neanîne cih.

Wê xwe avêt ser destê wî û bi hêrs gez kir ta ku axîn jê çû û bi şid ew daf da - ev cara pêşî bû ku sirtiyeke wusa li hemberî wê dikir - û bi lez rabû çû lembe vêxist, ode ruhnî kir. Pêşî li qevdika destê xwe ya bi xwîn nihêrt û dûvre got:

– Pitê, ev xerabî jî ji te!

Wê bi çavekî şermîkar gavikekê lê nihêrt û dûvre pişta xwe dayê. Wî jê pirsî:

– Tu çawa li diziya malê xwe dicadînî?

Wê poşmanî û diltengiya xwe pêkve ramî da lê dengê xwe nekir û wî jî peyva xwe domand:

– Ji xweşiya ku ez gîhiştimê û pêştir êdî heweseke min a din tine.

Di pey de kenekî dijwar kir û got:

– Heçî ji aliyê min ve Xwedê qencî û başiyê bide te!

Hema wê beyaniyê ew rabû wî pirrên mal û diravên ku pê re mabûn danê, boxçika wê da hev û ew bire êstegeha (stasyona) trênenê.

Ji wê gavê û pê ve wî dev ji Ebû Qîr berda, rewşa wir jî hêdî hêdî hate guhertin û hino hino xelk bi tirênan kişiyan havîngehan. Ew ji wir derbasî Îskendereyeyê bû, li wir demekê bêamanc geriya lê dûvre ha ku dît wa li ber deriyê mizgefta Ebû 'Eb-

bas e û kete hundur. Wî du rek'et sinetên ketina mizgeftê kirin û piştre berê xwe da dîwêr û rûnişt. Ew bi kirinêñ xwe pirr xemgîn bûbû, dilê wî ji ber poşmanîyeke kesnedî guvişî û di dilê xwe de gazi Xwedayê xwe kir: »Ji xwe ne mumkin e tu bi tiştê ku bi serê min de hat razî bî, herweha bi tiştê ku li herderî dibe jî. Belê keçikeke piçûk û delal û dîlruba, ev te memnûn dike? Ka ne zaroyêñ min, ma ev te kêfx-weis dike? Xelk ne ji bo tiştekî, lê bi tenê ji bo ku ez ji te hez dikim tadeyî dide min, ma ev te dilxweş dike? Ez xwe di nav milyonan de bi yek kujdarekê re his dikim, qê ev dilê te şâ dike?« Piştre wî dest bi giřî kir û rabû, dema ew hinekî ji mizgeftê dûr bû ji nedî ve dengek hatê: »Emo İbrahim!« Ew bihitî, bê viyana xwe, fitilî û dît ku ji wir ve yekî fena dêwekî serkeftî dibişire û ber pê ve tê; ji şela wî tê gihişt ku polis e û li cihê xwe xwesipartî rawestiya. Zilam bi girmilka wî girt û got:

—Te em li pey xwe pirr westandin, Xwedê jî te biwestîne. Dema ku polis ew da pêsiya xwe û ew jî bi çavekî sor û teslimbûyi li pêsiya wî meşıya, jê pirsî:

— Tu dikarî ji min re bibêjî bê ka ci bû ku di vî temenî de ev yek bi te da kirin ? Emo İbrahim keniya, piştre tiliyêñ xwe bi jor ve rakir, kire minemin û peyva: "Ellah" wek keserekê ji devê wî derket. □

* John A Haywood, *Modern Arabic Literature 1800-1970*, Lund Humphries, London, 1971, r. 207.

Litteraturens Världs Historia sekelskiftet första världskriget, ed. D. J. Billeskov Jansen, Hakon Stan gerup û P. H. Traustedt, editorê Swêdi Sven Rimman, Norstedt Förlag AB, Stockholm, 1973, 1991, Beşa edebiyata Erebî Frede Lökkegaard, r. 481-485.

**Ev mesele ji serpêhatiya Necîb Me'hfûz ya Erebî ku bi navê »Dunyallah« Cihana Xwedê, li çapxane ya »Dar el Misir Li 't-Tiba'e« li Qahîreyê derketiye - tarîxa çapê li ser tine -, hatiye wergerandin.

Ma xêr e li te!?

ROJEN BARNAS

Ma xêr e li te, Evdil-ezîz?
Ma xêr e li te, çîma,
Bi her seyî re direyî
Û dizûrî bi her gurî ra
Bi her qijikê re diqijî
Xêr e?
Çîra?

Karê se reyîn e
Zûrîn e yê gur
Xwendinek qijikê heye,
Ew jî
qijtîn e.

Hişê xwe li serê xwe bicvîne
Ne dawiya sa tê
Û ne ya gura
Ne ya qijikan tê
Ku tu wê dipêy
Tê bê xebat bimînî heta tu hebî
Tê karekî bera nekî ji xwe ra.

Çi xwede

Me ci xwede dîtin?...

Çi xwede...

Tu li ber wan

Hê gede.

Yê bûm bû, yê tîmseh bû, yê piling

Yê brûskên mirinê di dest

Ü gurmîna esmên ji ber pê diçûn

Ü heta

Yê ser-mirov

Lêbelê çarling.

Mêjva ye ku em geriyane

Li muzeya antîk a demên bûrî

Tu hê di dorê de yî ku

Bikarî herî

Gede!

Me gelek xwede dîtin

B'aqil be

Meke kelekel

Me xwede dîtin, sîsyarek

Me xwede dîtin, çeqel!

Bîranîneke dîrokî

ROHAT ALAKOM

Serefhanê Bedlisi (1543-1604) berhema xwe ya bi navê Şerefname di sala 1597'an de nivîsiye û îsal 400 saliya nivîsandîna Şerefnameyê tê pirozkirin. Ev pirtûka giranbiha di navbera salên 1868-1875'an de wek çar cild li St-Petersbourgê tercûmeyî zimanê fransizî bû, ev karê ha endamê Akademiya Urisetê Français Bernard Charmoy pêk anî, çawa Nikitin dibêje vî zanayî hemû jiyanâ xwe da vê wergera Şerefnameyê. Dema ez vê payîzê çûme Parîsê, ez li pirtûkxana Enstituya Parîsê bûm û min li pirtûkên wê mîze dikir, ev çapa kevn ya Şerfnameyê jî li wir hebû. Ev pirtûka niha kêm tê dîtin, bi navê »Cheref-Nameh ou Fastes de la Nation Kourde« (Şerefname an Pirtûka Tarîxa Milletê Kurd) hatibû weşandin. Dema min rûpelên hundirîn yê pirtûkê vekir, noteke bîranînê ya Qanadê Kurdo hebû, ji Joyce Blau' re pêşkêş kiribû û wusan tê xuyanê, Qanad ev pirtûk ji Joyce Blau re şandibû. Di binê vê notê de imza Qanadê Kurd heye û terîxa 16.8.1966'an hatiye nivîsin. Qanadê Kurdo di vê nota xwe de, giringbûna dîroka kurd û hêjabûna Şerefnameyê dide nasîn. Wek bîranînekê em li jêr van notên Qanadê Kurdo pêşkêşî xwendevanan dîkin.

Kerbal û herxara gizandîha - kurd-nas a eyan Coys Bilî, tawîra milîtê kurd dewlemente, lê na-hutîc nasaixîn ji zo milleten Evropayê, sêznamma me ewe, ke em tazîn û medenîyeta kurdan zîndest sidin nasaixîn. qediz û qîmetê wî di tazîn milete Prophilita manenda Silind Sîtin û Sînin ser gavan.

16.VII-1966.

GKurd

Leningrad.

CHÈREF - NÂMEH
ou
FASTES DE LA NATION KOURDE
par
Cheref-ou'ddine,
Prince de Bidlis, dans l'Ijâlèt d'Ärzeroûme.

Traduits du Persan et commentés
par
François Bernard Charmoy,

Conseiller d'Etat en retraite. Correspondant de l'Académie Impériale des sciences de Russie et de l'Académie de Stanislas de Nancy, ci-devant Professeur ordinaire de langue et de littérature persanes à l'Université Impériale de St.-Pétersbourg, chargé de l'enseignement du Persan et du Turk à l'Institut oriental du ministère des affaires étrangères, Bibliothécaire honoraire à la Bibliothèque Impériale publique, Membre des Sociétés asiatiques de l'Paris et de Londres, de la Société Royale des Antiquaires de Copenhague, et de celle des naturalistes de Moscou, Chevalier des ordres russes de Saint-Vladimir de la troisième classe et de Sainte-Anne de la seconde, avec les insignes en diamants.

Tome II, première partie.

Deo favente progredi, vel mori.

St.-Pétersbourg, 1873.

Commissionnaires de l'Académie Impériale des sciences:

à St.-Pétersbourg, MM. Eggers et Cie, H. Schmitz dorff et Jacques Issakof;	à Riga, M. N. Kymmel;	à Leipzig. M. Léopold Voss.
--	--------------------------	--------------------------------

Prix: 2 Rbl. 65 Kop. = 2 Thlr. 28 Ngr.

Şerefname di kudnasiya Sovyetê de

KEMAL MAZHAR EHMED / Kurmanciya wê: ZIYA AVCI

Tu xwendevanekî kurd an jî rojhilatnasek tune ku navê Şerefnameyê û Şeref Xanê Bedlîsî nebihîstibe. Heta niha bi gelek zimanî û bi dehan car kurt an dirêj di derheqê Şerefnameyê de hatiye nivîsandin. Bi gelemeperî rojhilatnasên Sovyetê û bi taybetî kurdnasên Sovyetê, qîmetek diyar û bîhaye kî mezin dane herdu cildên Şerefnameyê û nivîskarê wê. Hejmarek gelek zêde ji rojhilatnasên Sovyetê, ji bo nivîsandinên xwe yên lêkolîna dîroka Kurdistanê û ci jî yên ser warê din ên Rojhilata Navîn, gelek ji Şerefnameyê wergirtine. Di salên 30an de, ji rojhilatnas û kurdnas F. P. Rastopiçin⁽¹⁾ hat daxwaz kirin ku Şerefnameyê wergerîne rûsî. Lê belê, gelek mixabin, mirina bêwext musa'eda cîbicikirina vî karê zanistî yê pêwîst nekir.

Qîmetdana rojhilatnasên Sovyetê bi Şerefnameyê, di dawiya salên 30an de, gihiş bilindirîn derecê. Di vê navê re Beşa Kurdî Qismê Leningradê ya Unîvîrsitiya Rojhilatnasi ya Akademiya Zanyarî ya Sovyet, wergerandina Şerefnameyê ji zimanê farisi bi ser zimanê rûsî siparte Yefgina Vasiliva. Cîbicikirina vî karî, pêwîstî bi çend salên bêrawestandin bû. Di sala 1967an de, cilda yekem a Şerefnameyê hat çapkîrin⁽²⁾. Çend mehan piştî vê, karbidestê zanistî yê Unîvîrsiteya Gelên Rojhilata Nêzîk û Navîn a ser Akademiya Zanyarî ya Azerbaycana Sovyetê, M. Şemsî, bi xebata xwe ya bi navê "Şerefnameya Şeref Xanê Bedlîsî, Weke Çavkanîya Dîroka Gelê Kurd"⁽³⁾ ku ji bo lêkolîna Şerefnameyê amade kiribû û berhemê karekî bêwestan û çend salan bû, narneya doktorayê pê sitand. Ev herdu şanezayê han, bi awakî zanistî ketin nav kurayıya qîmeta Şerefnameyê û gelek milên wê yên ku nedihatîn zanîn û jiyana Şeref Xanê Bedlîsî cara yekê bi awakî rêk û pêkî xistin ber destêni rojhilatnasên xwe û yên derive. Bêguman, bi kurtî be jî behsa wan di pêşgotina çapa yekem a kurdî ya Şerefnameyê de, karekî di ciyê xwe de ye û pêwîst e.

Cilda yekem a Şerefnameyê ya bi rûsi 619 rûpel e⁽⁴⁾, tenê 412 rûpelên wê ji nivîsandina Şeref Xan bi xwe pêkhatiye. Yê din jî pêşgotin, paşgotin û kurte-behsek bi ingilîzî ku li ser kitêbê hatiye nivîsandin pêkhatiye. Ev hemû ji aliye birêz zanayê Sovyetî Y. Vasiliva ve hatine amade kirin.

Y. Vasiliva, di 55 rûpelên pêşgotinê de li ser girîngiya Şerefnameyê sekiniye û qîmeta wê ya bilind a zanistî diyar kiriye. Gelek zanyariyên din ên di vî warî de jî weşandiye ku piraniya wan ji aliye xwendevanên kurd de nedihatîn zanîn.

Di vê pêşgotinê de zanayê Sovyet, bi dirêjî behsa dîroka lêkolîna Şerefnameyê û destnivîsên wê yên kevin û ew kitêbxaneyên ku ev destnivîsên han tê de nin û gelek behsên din ên wek van babetan kiriye. Weke Vasiliva nivîsandiye, Hêrbilo, bi zimanê fransızî di sala 1776an de, di rûpelên 836 û 84ran a kitêba xwe ya bi navê "Kitêbxaneyên Rojhilat a Kultura Giştî" de cara yekê behsa Şerefnameyê gihandiye cîhana zanyarî ya rojava⁽⁵⁾.

Agahdariya Hêrbilo ya di derheqa Şerefnameyê de bi riya nivîsên gerokekî tirk ê bi nav û deng ê sedsala 17an, Katîb Çelebî ve çêbûye⁽⁶⁾. Pişti wî, J. Malcolm⁽⁷⁾ yekem Ewrupî ye ku destnivîsên Şerefnameyê bi desî xistiye. Malcolm, di warê zanistîyê de jî feyde ji Şerefnameyê wergirtiye. Wî di cilda diduyan a kitêba xwe ya bi nav û deng de, ku di derheqê dîroka İranê de ye, bê ku behsa navê kitêbê û nivîskarê wê bike, çend caran agahdariyên xwe ji Şerefnameyê wergirtine. Bêguman, di demek wisan de bikaranîna Şerefnameyê weke çavkanî ji aliye şarezayekî wekî Malcolm ve, belgeyek dîrokî ye ji bobihayê bilind û qîmeta mezin a Şerefnameyê. Bîst sal pişti J. Malcolm, dîroknivîsê fransî Etienne Marc Quatremère, di gelek ciyên kitêba xwe ya di sala 1836an de li Parisê bi na-vê *Dîroka Moxoliyên İranê* weşandiye, feyde ji Şerefnama Şeref Xanê Bedlîsî wergirtiye. Y. Vasiliva, bi dirêjahî behsa ciyê Şerefnameyê di nav rojhilatnasiya rûsi de kiriye. X. D. Fren, yekemîn zanayê rûs e ku di sala 1826an de, di rojnameke Peterborga paytext de behsa Şerefnameyê wekî "çavkanîyek dîrokî ya herî girîng" kiriye⁽⁸⁾.

Sê sal şûn de, cardin Fren di nivîsek xwe de behsa Şerefnameyê kiriye, di vê de daxwaz kiriye ku bi zûtirîn wext fransiziya wê bê weşandin û bê wergerandin ser zimanek Ewrupî. Bi qasek şûn de, zana û karbidestê Akademiya Zanyarî ya Rûsyâ, Vilyaminov Zirnov⁽⁹⁾, wezîfeya belavkirina Şerefnameyê bi fransî girt ser milê xwe û di sala 1860an de, cilda yekem bi pêşgotineke bîst rûpel a bi qîmet a bi zimanê fransızî ve belav kir⁽¹⁰⁾.

Du sal piştê vê, cilda diduyan jî bi pêşgotinek fransızî ya heft rûpelan ve hat

weşandin⁽¹²⁾. Cîbicîkirina vî karê han, ewqas dereceya zanistiya Vilyaminov Zirnov bilind kir ku, ji bo Akademiya Zanyarî wekî endamek çalak hat bijartin.

Vasiliva, beşike gelek bi feyde ya pêşgotina xwe ji bo behsa destnivîsên Şerefnameyê amade kiriye. Dibêje: hejmarêvan destnivîsan gelek zêde ne. Hejmarêvan berhevkirî yên destnivîsên Şerefnameyê, tenê yên di kitêbxaneyê naskirî yên cîhanê de, digihîjin 22 liban⁽¹³⁾. Ev jî bêguman, belgeyek din a girîngiya Şerefnameyê ye ku wisan dixuyê gelek ji kevin de dîqeta zanayan kêşeya û hejmarek zêde ji van li ser nivîsandine⁽¹⁴⁾.

Li gor wan zanyariyênu ku Y. Vasiliva kom kirine, kevintirîn, bi qîmettirîn û rasttirîn destnivîsa Şerefnameyê ya ku têzanîn, nusxeya bi destxetê pîroz ê Şeref Xan bi xwe ye ku bi navê "Şerefname Tarîxa Kurdistan" hatî nivîsandin û niha di Kitêbxaneya Bodleian a Unîversiteya Oxfordê de ye.

Ev destnivîsa han a bi qîmet a Şerefnameyê, 246 rûpel e û bi bîst wênêna anti-ke hatiye xemilandin, di dawiya meha Zilhicce ya sala 1005ê koçî (13yê Tebaxâ sala 1597ê zayîni) de, Şeref Xan nivîsandina wê temam kiriye. Yanê ev destnivîsa han yekem nusxeya nivîsandî ya Şerefnameyê ye. Ji ber ku Şeref Xanê Bedlisi di meha Tebaxê ya sala 1597an de nivîsandina cilda yekem û di meha Gulanê ya sala 1599an de jî nivîsandina cilda duyem xelas kiriye.

Nusxeya diduyan a bi qîmet a Şerefnameyê ew liba ku di Kitêbxaneya Giştî ya Lenîngradê de ye. Dîroka nivîsîna vê nusxeya han sala 1598 e û Şeref Xan bi xwe redakte kiriye û bi destê xwe yê pîroz muhra xwe ya taybetî lêxistiye. Gelek mixabin, çend ciyêñ kêm ên vê destnivîsê nemane. Hêjayê gotinê ye, ev destnivîsa han a Şerefnameyê yek ji wan berhemên bi qîmet a di kitêbxaneya bi nav û deng ya Sefewiyan de bû ku rûsan di wextê Sherê 1826-1828an de, ji Erdebîlê anîne bajarê St. Petersbourgê. Destnivîsek Şerefnameyê ya kevin di sala 1606an de, li bajarê Kilîsê ji aliyê Hesenê kurê Nûreddîn ve li ber nusxeya yekem a Şerefnameyê hatiye nivîsandin. 327 rûpel e û di Kitêbxneya Bodleian de ye.

Ji derveyê van, Y. Vasiliva behsa çend lib destnivîsên kevin yên Şerefnameyê, yên wekê destnivîsên di Muzexaneya Britanyayê, Kitêbxaneya Stenbol û çend ciyêñ din hatine parastin kiriye⁽¹⁵⁾.

Heta niha çend caran Şerefname ji zimanê farisî li çend zimanên din hatiye wergerandin. Li gor gotina Vasiliva, kevintirîn wergera Şerefnameyê ew herdu wergerandinê cihêkirî yên zimanê tirkî ne. Yek ji wan kurtebiriya Şerefnameyê ye, ya din jî temamê wê ye. Heta niha du destnivîsên yekê û destnivîsek jî ya diduyan hatine dîtin, lê yek ji wan jî nehatine weşandin. Kurtebiriya Şerefna-

meyê ji aliyê Mihemmed Begê Ehmed Begê Mîrza ve di sala 1078ê koçî (1667-1668ê zayînî) de hatiye wergerandin. Ya din jî di salên 1680 yên sedsala 17an de, ji aliyê kesekî ku navê wî Samî ye, hatiye wergerandin.⁽¹⁶⁾

Der û dora du sed sal pişte van, cilda yekem a Şerefnameyê ji aliyê rewşenbî-rekî herî zîrek ê sedsala 19an ê Kurdistanê, Mele Mehîmûdê Beyazîdî ve, yekem car wergerandiye kurdî. Mele Mehîmûd, der û dora salên 1858-1859an de, bi handana kurdnasê bi nav û deng ê rûsî, Aleksander Jaba ev kar kiriye. Destnîsa vê nusxeya kurdî ya Şerefnameyê di Kitêbxaneya Gişî ya Lenîngradê de hatiye parastin. Her di wan der û doran de jî li bajarê Viyanayê Şerefname ji aliyê G. A. Barbe ve bi almanî hatiye wergerandin û beş bi beş di navbera salên 1853 û 1859an de, bi pêşgotinek werger re hatiye weşandin.

Paşê karekî zanistî yê girîng di derheqê Şerefnameyê de hat kîrin ku ev karê han bû sebebê nasandina Şerefnameyê ji aliyê temamê akademiyê zanyarî yên rojava ve. Ev karê han Prof. F. B. Charmoy ku wê wextê mezintirîn fransîzanê Ewrupayê dihat zanîn, karî di navbera salên 1868 û 1875an de, li St. Petersbourgê herdu cildên Şerefnameyê bi zimanê fransîzî biweşîne.

Ev kar, berhemê bê rawestan ê berdewamî yê 30 salên Charmoy bû, Şerefname ji çapa Wilyaminov Zirnov wergerandiye, lê ji bilî wê ji du destnîvisên din ên kevin jî ıstîfade kiriye. Çapa fransîzî ya Şerefnameyê, çar cildên serbixwe ne, beşa yekem a cilda yekem di sala 1868an de, beşa diduyan a cilda yekem di sala 1870an de, beşa yekem a cilda diduyan di sala 1875an de hatine çap kîrin⁽¹⁹⁾. Charmoy, riayetê hemû prensibîn mercê zanyariyên wergerandinê kiriye. Bir û ray, rastkirin û ronîkirinê xwe yên pêwistî zaniye, di jêrnotê kitêbê de belav kiriye. Her wiha pêşgotinek jê re nivîsandiye ku tê de behsa Şerefnameyê, hînek milên jiyana kurdewarî û coxrafya Kurdistanê kiriye.

Vasiliva, çend rexnên di ciyê xwe de li pêşgotina F. B. Charmoy girtiye, lê li gel vê jî, ev yeka han qebûl kiriye ku ew wergerandina han “heta îro jî ji qîmeta xwe ya zanistiyê tiştek wenda nekiriye”⁽²⁰⁾.

Piştê van zanyariyê bi qîmet yên di derheqê wan de kêm hatine zanîn, Y. Vasiliva dikeve behsa pesn û giringiya Şerefnameyê, bîr û baweriya xwe di vî warî de radixe ber çav û bi vî awayî didomîne:

“Qîmeta zanyariya vê çavkanîyê ewqas zêde ye, pêwistî û îhtiyaca wê bi met-hê nîne, qet nebe ji ber vê ku, bi alîkariya Şerefnameyê mirov dikare ciyê girîng ê windabûyî yê gelê kurd di dîroka Rojhilata Navîn de diyar bike”⁽²¹⁾. Bêguman qîmeta vê yeka han jî nayê pîvan, ji ber ku gelê kurd, her wekî rojhilatnasê herî

bi nav û deng ê Rûsyâ û Sovyetê Orbeli⁽²²⁾ dibêje: "tesîreke bi yekcarî mezin li ser jiyana rewşenbîrên rojhilat kiriye. Kurd, gelek hebûnên xwe di bin navê farris, tîrk, erek û ermeyan⁽²³⁾ de ji destê xwe kirine. Wek wê ku, kesêni ji wan ên şair, hunermend û cengawerên nemir dîroka çend gelan xemilandine. Vê yeka han jî tesîreke wisan kiriye ser zanayê Ewrupa û Rûsyayê ku di nav wan de bibe adet û belav be; guya kurd, ne tenê nikare tiştekî di warê rewşenbîriyê de bîne holê, belko xwediyyê hêzek wisan jî nîne heta bikare tiştekî ji biyaniyan jî hîn be". Lê belê, wek Vasiliva dibêje: bi alîkariya Şerefnameyê mirov dikare vê valatiya mezin a dîroka gelên rojhilat tijî bike û ciyê rasteqînî yê neteweyê kurd tê de bide diyarkirin.

Yek ji wan encamên girîng ên ku zanayê Sovyetê Y. Vasiliva di derheqê nave-roka Şerefnameyê de daye fahm kîrin ev e ku, kurdnas bi alîkariya vê çavkanîya dîrokî ya esîl, dikarin bi awakî berfireh gelek rûyên jiyana siyasi û civakî ya îro ya kurdan tê bigihin, ra û rîşen xebata rewa ya vî gelê "ya di riya rizgariya ji bindestiya neteweyî û ji bo wekheviya wî li gel gelên din" diyar bike.

Ev tespitên Vasiliva gelek rast û durûst in, ji ber ku Şerefnameya Şeref Xanê Bedlisi, gelek milên girîng ên xebata asê ya neteweyê kurd ên sedsalên borî de weşandiye ku ji aliye dîroknaşen me û yên biyaniyan ve nedihatîn zanîn. Ji ber ku heta îro jî bi tevayî nehatine zanîn, ev jî bûye sebebek mezin ê tênegihiştina tevgera rizgarîxwazî ya netewî ya gelê kurd ji aliye biyaniyan ve.

Vasiliva, ji 120 rûpelan zêdetir ji dawiya kitêba xwe ji bo têbînî, ronî kîrin, muqayese û rastkirin, navê çavkanîyan, melbend û kurtebehsek jî di derheqê Şerefnameyê de amade kiriye. Bêguman, van hîn zêdetir bihayê zanyariya karê wî bilind kiriye. Hêjâyê gotinê ye ku rojhilatnaşen Sovyetê qîmeteke gelek zêde dan vî karê han ê Vasiliva û ev yeka han destkevtineke ronî ya kurdnasiyê hesibandin⁽²⁴⁾. Zanayê Azerî Memed (Mihemed) Şemsî, ji derveyê nameya xwe ya doktorayê, zencîrek gotarêñ zanistî di derheqê Şeref Xanê Bedlisi⁽²⁵⁾ û Şerefnameyê de, yên wekê "Dîroknivîsê Bi Nav û Deng ê kurd Şeref Xanê Bedlisi" û "Behsa Serîhildanêñ Sedsala Şanzdehan a Eşîrêñ Kurdan Di Şerefnameyê de" belav kir⁽²⁶⁾. Dr. Şemsî, di nameya xwe ya doktorayê de, bi dirêjî behsa jiyan û serpêhatiyêñ Şeref Xan û rewşa jiyana siyasi û civakî ya Kurdistanê ya sedsala 16an dike û li ser naveroka Şerefnameyê disekine. Ji bo ronîkirina van behsîn han hejmarek gelek zêde çavkanîyen wekê "Nuzhetu'l-Qulub" a Hemdullah Qezwînî û berhemên birek dîroknivîsêñ hevçaxê Şeref Xan ên wekî Qazî Ehmedê Xefarî bikar anîye.

Dr. Şemsî ji wekî Vasiliva, bi dirêjî behsa qîmeta Şerefnameyê kiriye û di vî warî de wiha dibêje: "Dîroknivîsên piştê Şeref Xan, ên wekê Katib Çelebî, Ewliya Çelebî û gelekên din, di berhemên xwe de ji hemû çavkanîyan zêdetir Şerefname bi kar anîne. Di eynî wextê de Şemsî ev şâşîya han ji rast kiriye ku wek grûbek dîroknivîs dibêjin, guya Şeref Xan Şerefname bi handana Şahê İranê nîvîsandiye. Di rastiya xwe de, wextê Şeref Xan Şerefname nîvîsandiye, nêzîkariya wî bi sultanên Osmaniyan re zêdetir bûye. Li gor gotina Dr. Şemsî, hera Osmaniyan alîkariya wî ji kirine. Li ser van tevan ji di naveroka Şerefnameyê de heta radeyek gelek zêde hîs bi bêalîgirî tê kîrin. Wekê mîsal, Şeref Xan mi-hêldariya Şah Tehmasb û ya Sultan Murad ê Sêyem bi yek awayî kiriye û xwe ji şer û tîrkêşana wan ji hev re bêdeng kiriye.

Şeref Xan, bi awakî gelek eşkere wan sebebên ku wî han dane ji bo nîvîsanda Şerefnameyê, ronî kirine. Di destpêka kitêba xwe de wiha dibêje: Ji bo ku heta îro dîroknivîsan qet tiştek di derheqê kurd û Kurdistanê de nenivîsandine, min xwest li gor îmkana xwe di vî warî de kitêbekê binivîsim û navê wê ji dey-nim Şerefname. Armanca min ji vê ji ew e ku navê xanedanê kurdan wenda nebin.

Madem wiha ye, berî her tişti û pêşîya hemû sebeban, ruh û hîsa kurdayetiyyê Şeref Xan han daye ku Şerefnameyê binvîse. Belgeyên vê rastiya han gelek caran di nav Şerefnameyê bi xwe de têrî dîtin. Weke mîsal, ji serî heta binî di Şerefnameyê de, bi awakî eşkere bê ku unvanê Sultan hilde, wiha dibêje:

"Kurdistan, welatek e ne ji aliyê kesekî de tê îsgalkîrin û ne ji bo kesekî ser-nizmiyê dike."

Ji derveyê van tevan, Şeref Xanê Bedlîsî yekem kes e bi awakî durûst sînorêñ Kurdistanê dane nişan. Berê Şeref Xan, bi taybetî di dema Selçûkiyan de Kurdistan ji wan herêman re dihat gotin ku ketibûn navbera Azerbaycan, Loristan û rojavayê zincîrên çiyayê Zagrosê. Lê di Şerefnameyê de, sînorêñ Kurdistanê ji Meletyê dest pê dike û qeraxêñ Xelîcê dawî tê. Ev ji di rastiya xwe de nişanêñ wan in ku her di sedsala 16an de, di destpêka çêbûna hîsa neteweyî di nav serokên kurdan de ber bi ajardanê de bûye. Milekî girîng ê din ê karê zanistî yê Dr. Şemsî yê di derheqê Şerefnameyê de ev e ku, bi alîkariya naverok û ser ronahiya rîbazezkî zanyarî ya durûst, kariye çend milekî aloz û kêmhatîzanîn ê jiyanâ civakî û aborî ya çend navçeyen Kurdistanê yêni dawiya Qerna Navîn de ronî bike. Li gor zanyariyêñ di Şerefnameyê de, bingehê jiyanâ aborî yê Fermanrewatîya Bedlîsê ya Qerna Navîn, ser hebûna axêñ biçûk hatibû damezrandin.

Bindestiya cotkaran jî qalibê xwe yê taybetî wergitibû, bi vî awayî ku tenê di çarçeveya berhemanînê de hatîbû girtin. Cotkaran, dibû bi ser vê de jî parêzgeriya berjewenda siyasi ya serokên xwe bikin û di hemû şerên axayêن xwe de beşdar bin. Ev şerên han beşek encamê dijitiyên serokên mîrîtiyan bi xwe bûn.

Hêjayê gotinê ye, Mamed Şemsî, nama doktoraya xwe wek kitêb jî bi eynî navî belav kiriye. Ev kitêba han jî, destkevtiyek din a Kurdnasiya Sovyetê ye. Kitêb ji 144 rûpelan pêk hatiye û 1 700 nusxe jê hatiye çapkiran. Dr. Şemsî, ji 134 çavkanîyên cure cure istifade kiriye û navêن wan di dawiya kitêbê de belav kiriye. Qanadê kurdo jî di sala 1972an de, di gotara xwe ya bi navê "Kurdnasi" de, behsa Şerefnameyê kiriye⁽²⁸⁾. Di vê gotarê de Q. Kurdo, bi taybetî bal kêşaye ser destnivîsên kevin ên Şerefnameyê⁽²⁹⁾.

Wekê Q. Kurdo dibêje: M. Volkov, yekem kes e ku di salên 20î yên sedsala 19an de, bi çend rûpelan behsa destnivîsên Şerefnameyê kiriye. X. D. Fren ji yekem kes e, her di wan salan de di gotarêن xwe de behsa qîmet û pêwistiya weşandin û wergerandina Şerefnameyê kiriye⁽³⁰⁾. Piştî vê, Mamoste Qanadê kurdo, tê ser behsa dîroka lêkolînên Şerefnameyê yên ku ji aliyê rojhilatnasên Rûsyâ û Sovyetê ve hatine kîrin.

Bi vî awayî em dibînin ku ciyekî bilind û hêja yê Şerefnameyê di kurdnasiya Sovyetê de heye. Ew rastiyêن ku me li jorê behs kîrin, heta dereceyekê alîkarvanânen diyarkirina qîmeta zêde ya çapêن kurdî yên Şerefnameyê ne⁽³¹⁾. Bêgurman, Mamoste Hejar, bi wergerandina Şerefnameyê bi ser zimanê kurdî, valatiyek mezin di kitêbxaneya kurdî de tijî kir û Akademiya Zanyarî ya Kurd jî bi weşandina wê, wezîfeyek girîng a ser milê xwe bi cî anî.

(*) Babê Zekerîya Muhyeddîn ê destê rastê yê Cemal Ebdulnnasir bû.

(*) Çapa Şerefnameyê ya farîş di sala 1930an de, li Misrê hatiye kîrin. (Hejar)

(*) Piştê vê behsa jiyana Mîr Şeref Xan û bab û bapîrêñ wî dîke. Ji bo ku em ê di dawiyê de vê binîşin, me li ser vê qîsmê re gav da û li vir cî nedayê. (M. 'Elî 'Ewnî).

(*) Li gor tarîxa nîvîsandina vê pêşgotinê 300 sal e. (Z. Avcî).

(*) Ev gotina han rast e. Çunkê di dawiya destnivîsê de wiha hatiye nîvîsandin: "Di dawiya meha şeşekan (Muherrem) a sala 1007an a koça pêxember -silavêñ Xwedâ li ser bin- li bajarê Bedlisê -Xwendê ji qeza belayêñ Şeytên biparêze- bi destê nîvîskarê kitêbê bi xwe -her wext payedar be û destê wî sax be- hatiye rast kîrin û dawî bi vê kitêbê hat.

(*) Li vir bi çend rêzan behsa terzê nivisandin û işaretên ser herfêñ kitêbê ya farisi dike. Vêca, ji ber ku di kurdî de karekî me pê tune, min xwest ez jê derbixim. (Hejar).

(*) Kanûna pêşî ne january ye, december e. Lê eger di orijinalê bi xwe de january be, wê çaxê dibe kurdiya wê kanûna paşî be. (Z. Avci).

(1) Rojhilatnasê Sovyetê F. P. Rastopiçin, di salên 30an de, çend berhemên bi qîmet di derheqê kurdan de weşandiye. Rastopiçin, di cîhanê de yekem zana ye ku yekem bîbliyografa li ser kurdan daniye û di wextê xwe de ev bi navê "Bîbliyografa Di Derheqê Mesela Kurd" de, di kovara Rojhilata Şoresger de belav kiriye. (Binêre: Rojhilata Şoresger, bi zimanê rûsi, hejmar: 3-4, sal: 1933, rûpel: 292-326 û hejmara eynê salê, rûpel: 159-173). Yek ji gotarêni bi qîmet ên Rastopiçin "Balkşek Di Derheqê Kurdan de" ye, ev di hejmara 13-14an ya sala 1932an de, di kovara "Deng û Behsên Rojhilata Navîn" de weşandiye. (Binêre: Kovara navê wê derbaz bû, rûpel: 72-93).

Rastopiçin, ev berhem ji bo lêkolina birek milên girîng ên jiyanâ aborî û civakî ya kurdan amade kiriye. Di destpêka vê gotarê de, Rastopiçin, êrîşke gelekî giran û hişk biriye ser wan dîroknîvîsên kurtbin ên ku xebata gelê kurd lekedar kirine. Di eynî wextê de Rastopiçin, bi awakî giran rexne li wan nivîskarêni Sovyetê ji kiriye ku bi nezanî, wekê dibêje: "di bin perdeyek teng a Marksîzmê de" tuhmeta kevneperestiyê kirine ser hemû tevgerên rizgarîxwazî yêndi kurd.

(2) Bi temambûna wergerandina cilda yekem a Şerefnameyê, Vasiliva dest bi wergerandina cilda diduyan ji kir û ew ji di sala 1976 (di vê tarîxê de şâsiyek heye. -Z. Avci) an de bi rûsi çap kir. Ji ber ku ev pêşgotina han berê weşandina cilda diduyan a Şerefnameyê hatiye nivîsandin, tê de behsa cilda diduyan nehatiye kirin. Di derheqê cilda diduyan a Şerefnameyê de, binêre: Dr. Kemal Mezher, Mêjû, Kurtebaskî Zanistî Mêjû, Bexdad 1983, rûpel: 110-126.

(3) Ev nameya han, bi zimanê azerî nivîsandiye. Kurtiya wê bi rûsi çapkiriye. Qasek şûn de nameyê bi xwe ji di kitêbek bi serê xwe de li Bakûyê çapkiriye.

(4) Hezar û sêsed (1 300) lib ji cilda yekem a Şerefnameyê bi rûsi bi awakî bi qîmet hatiye çapkiran û gelek bi zû hemû hatine firotin û niha bûye berhemek antike.

(5) Li gor zanyariyênu ku di Bîbliyografa J. S. Musaelyan de hatine belav kîrin, Hêrbilo, di pênc ciyêñ kitêba xwe de behsa kurdan û Şerefnameyê kiriye ku ew di rûpelên: 317, 706, 807, 836 û 841an de nin. (Binêre: J. S. Musaelyan, Bîbliyografa Kurdnasiyê, bi zimanê rûsi, Moskova 1963, rûpel: 55).

(6) Binêre rûpela 14an a pêşgotina Y. Vasiliva.

(7) J. Malcolm (1769-1833), yek ji karbdestêñ naskirî yê Britanya bû. Demek dirêj li Hindistan û Iranê kar kir. Şerezatiyek wî ya gelek zêde di derheqê welat û gelên rojhilatê de hebû, gelek nivîsên bi qîmet ên di van waran de li dû xwe hişt. Li Iranê, hejmarek gelek zêde çavkanî û destinivîsên kevin bi destê Malcolm ketine, Şerefnameya Şeref Xanê Bedlîsi ji yek ji wan bûye.

(8) J. Malcolm, "The history of Persia from the most early period to the present time", Vol. II, London, 1815, pp. 207-208.

(9) Mamoste K. Kurdo, di gotarekê de wiha dibêje: "M. Volkov, yekem kes e, ku di sala 1826an de, bi dirêjî behsa Şerefnameyê kirîye." Li gor zanyariyên Mamoste Kurdo, ji derveyê Fren ê ku navê wî derbaz bû, hejmarek din ji rojhilatnasen rûsi ji wê çaxê doza belavkirin û wergerandina Şerefnameyê kirine. (Binêre: K. K. Kurdayev, Kurdnasî, kitêba Muzexaneya Asya, Qismê Leningradê ya Universiteya Rojhilatnasê Akademiya Zanyarî ya Yekîtiya Sovyetê, Moskova 1972, rûpel: 386-387).

(10) Vilyaminov Zirnov (Vilâdimir Vilâdimireviç: 1830-1904) yek ji rojhilatnasen Rûsyâ yê naskirî ye, şerezayekî baş ê ziman, arkeolojî û dîrokê bû, bi gelek zimanan dizanibû. Di sala 1861an de, bûye endameki çalak ê Akademiya Zanyarî. Beşek zêde berhemên Vilyaminov Zirnov, ji bo lêkolîna ziman û dîroka gelên rojhilat ên nav Rûsyâ Çarîti de hatine amade kirin. Ji ber vê yekê, yek ji wan zimanen Zirnov bi awakî rewan dizanî, farisî bû û di saya wê de Şerefname weşandiye.

(11) Qismê farisi yê vê cilda han a Şerefnameyê, rûpel: 459.

(12) Qismê farisi yê cilda diduyan a Şerefnameyê, rûpel: 459.

(13) Binêre: rûpela 17an a pêşgotina Y. Vasiliya.

(14) Dûr nîne ku niha jî hejmarek zêde destnivîsen kevin ên Şerefnameyê li Kurdistanê yan jî di ciyanen din ên Rojhilata Navîn de hebin.

(15) Binêre: rûpelên 17-20an ên pêşgotina Y. Vasiliya.

(16) Rûpelên 20-21an a eynê çavkanî.

(17) Mele Mehmedê Bayezîdî, zanayekî payebilind ê kurd e. Der û dora dawîya sedsala 18an de ji dayik bûye. Gelek zimanen rojhilatek zaniye û hejmarek gelek zêde berhemên bi qîmet li dû xwe hîstîne ku diqeta kurdناسان keshayê û qîmetek zêde danê. Wergerandina Şerefnameyê bi kudî ji aliyê wî de, bi serê xwe karekî mezin e. Di derheqê jiyan û berhemên Mele Mehmedê Bayezîdî de binêre: Mêjû, rûpel: 126-131.

(18) Aleksander Jaba, di wextê xwe de konsolosê Rûsyayê bûye. Demekê di nav kurdan de jiya ye. Di nêzîk de kurd naskiriye û gelek berhemên bi qîmet di derheqê wan de nîvîsandiye.

Yek ji wan berhemên Jaba "Cam'îye Risalayan û Hikayatan Bi Zimanê Kurmancî" ye, ku ji hejmarek gelek zêde bend û çîrokên folklorî yên kurdi yên berhevkirî pêkhatiye. Ev tev kiriye fransîz û di sala 1869an de, li St. Petersbourgê di kitêbeke serbixwe de çapkiriye. Jaba, havrîyekî gelek nêzîkî Mele Mehmedê Bayezîdî bûye, bi alîkariya wî, karîbûye gelek destnivîsen bi qîmet peyda bike û gelek aliyen ziman û jiyana rewşenbirî ya gelê kurd bikole, ku ciyên wan di kitêbxaneya kurdnasiyê de diyar in.

(19) Binêre: rûpelên 21 û 49an a pêşgotina V. Vasiliya.

(20) Rûpela 23an a eynê çavkanî.

(21) Rûpela 37an a eynê çavkanî.

(22) Arkeolog û dîroknavîsê Sovyetî yê bi nav û deng Isuv Abgaroviç Orbeli (1887-1961), yek ji wan zanayen paye bilind e ku bi kûrayî û berfirehî ziman û dîroka gelê kurd û rewşa jiyana siyâsî û civakî

ya wan têgihîstiye, bi çavekî rêz li wan nêriye û xizmeteke zêde ji kurdnasiyê re kiriye. Destekî wî yê bilind di têgihandina hejmarek ji zanayên kurdên Sovyetê de heye. Hêjayê gotinê ye ku Isuv Abgaro-viç Orbeli, ermenî ye.

- (23) Hewce bû Azerbaycan jî têxe ser.
- (24) Binêre: rûpela 67an a pêşgotina Y. Vasiliva.
- (25) Binêre: Kovara Gelên Asya û Afrika, bi zimanê rûsi, hejmar: 6, sala 1968, rûpel: 201-202. Kovara navê wê derbaz bû, vê yeka han qebûl kiriye ku karê Y. Vasiliva, di hemû milan de destkevtinê girîng ên Rojhîlatnasiya Sovyetê ne.
- (26) Binêre: Kovara Hevalên Akademiya Zanyarî ya Azerbaycana Sovyetê, bi zimanê rûsi û azerî, hejmar: 1, sal: 1967, rûpel: 67-72.
- (27) Eynê kovar, hejmar: 1, sal: 1968, rûpel: 40-46.
- (28) Derheqê vê gotara Kurdohev de binêre: jêrnota 9an.
- (29) Bi taybetî yên ku di arşîvên Lenîngradê de hatine parastin.
- (30) K. K. Kurdohev, çavkanîya navê wê derbaz bû, rûpel: 386-387.
- (31) Mebest ji vê, wergera Mamoste Hejar ê şair e ku bi alîkariya Akademiya Zanistî ya Kurd weşand.

Her warek bi bilbilek

I. OMERİ

Her bilbilek bi dilek
Her bilbilek bi gulek
Bilbilê Kurdistanê
Yekî bêper û kulek

Her warek bi bilbilek
Her bilbilek bi gulek...

Xem nîn e, ew bilbil e
Evîndarê sorgul e
Bêper û bêperwaz e
Dilê wî jî bi kul e

Her warek bi bilbilek
Her bilbilek bi dilek...

Gula wî yek e sor e
Sed dirf li derdor e
Bo çi bijart gula han
Bi destxistin pîr zor e

Her warek bi bilbilek
Her bilbilek bi gulek...

Her çiqas sitemkaran
Bi tundî û bi daran
Çîm û pervaz şikandin
Lê, gul neda neyaran

Her warek bi bilbilek
Her bilbilek bi gulek...

Te awazek nerm heye
Bona gul qedîfe ye
Rabe hûrik bîlorîn
Dijmin re pir qebe ye

Her warek bi bilbilek
Her bilbilek bi gulek...

Bilbilê hêla Botan
Îro li te zivistan
Wê bîhaba te jî bê
War dê bibe gulîstan

Her warek bi bilbilek
Her bilbilek bi gulek...

Bilbilê warê Boşo
Li te dijmin qidoşo
Gulîstan lewitandin
Divê tu paqîj bişo

Her warek bi bilbilek
Her bilbilek bi gulek...

Bilbil! Tu jar û mest î
Bo gul bû kulmek hestî
Bi derdê te dikele
Dê çi kî, ew bindest î

Her warek bi bilbilek
Her bilbilek bi gulek...

Bilbilê lata gelî
Bigrî digel OMERî
Gulistan şewitandin
Tev bû rijî û xwelî

Her warek bi bilbilek
Her bilbilek bi gulek...

Bilbilê Kevrê Biqul
Serhed û warê kavil
Bes bixwîne bi kovan
Te heland hinav û dil

Her warek bi bilbilek
Her bilbilek bi gulek...

Ho bilbil, lo bilbilo!
Persikestî dîlbikulo
Va Bihar ser te de hat
Rabe bixwîn ji dilo

Her warek bi bilbilek
Her bilbilek bi gulek...

Bilbilê Şax û Şêbê
Vê bihara ku wê bê
Gul û çîçek devken bin
Gulîstna tu lê bê

Her warek bi bilbilek
Her bilbilek bi gulek
Bilbilê Kurdistanê
Yekî bêper û kulek

Adar, 1996

Şeva Sar

BEYHANİ ŞAHİN

Gava dest bi meşê kir, li dora malê, tê gîhîst ku di bin lingên wî de nermiyeke bê rave heye.

Dem 01.11.1988 e. Her der sar e. Zivistanê, ji zû va dest pê kiriye. Berfa sipî û hewa sar a zivistana bêiman, ji dijwariya xwe qet nerm nabe. Bednava demê jî hê li derdora saer yekê bû.

Li cem rîya sereke, daristanek û deverike bi cîhbûyî hebû. Em dikarin ji bo wê deverê, gundek an jî bajarokek bibêjin. Li keviya daristanê, li aliyê navenda wî bajarokî, maleke kevn a duqatî, dor çel mêtroyekî dirêj û bîst mêtroyekî jî fireh hebû. Dora malê bi çaman rapêçayî bû. Bi rastî wan çaman, di tarîbûna wê şevê de, ew mala xirabe, bi tirsehêztir dikir. Heger ciwanmerdiya wî nebûya, yek deqîqa din jî, wî dê li rex wê malê nema sebir bikira.

Diviyabû ew heta wê sibehê hişyar bima, raneketiba. Heger carekê jî bûba û wî çavên xwe bigirtina, wê careke din nikariba ji wê xewa şêrîn raba. Ji ber wê yekê dev ji meşin û gerê berda û dest bi bazdana bi şûn ve, ber bi jor ve kir. Bi vî awayî dixwest ku serma di laşê xwe de, piçekî jî be, ber bi germiyê ve bibe. Li dibistanê hîni vê metodê bûbû. Gava hermü şagirt li ber dibîstanê di serma wan zivistanan da rîz dibûn, mamostan, ji paş xwendina İstiklal Marşıyê (Merşâ Serxwebûnê a Tirkî-yeşî) çend deqîqan ew di cîh de dibezandin.

Hîna nû çend deqîqe rabirribûn. Ji xwe bi xwe re: »min li imana te xistê, demê, de rabe lê!« got û bi rastî jî bêriya tava spehî ya rojê dikir. Xwestina wî mezin bû. Di demêni wiha teng de, qanûnên xwezayê, ji sayku bi rikî dijwartir û êstir dibûn.

Wê şeva ne dost, gerokên ku ji aliyê rojhîlat ve, di ber malê re derbas dibûn bi vî û wî alî de, xwestina wî ya ku wê bîstikê di malekê de bûya, hîna xurttit dikir. Gel-lekî dixwest ku di nav wan gerokan de kesekî nas derketa û ew ji wê rewşa kambax xelas bikira. Bi dû re jî bi hevdu re biçûna maleke xweş û germ, li ser bûyerên ku haribûn serê wî, biaxivîna. Ramanên di derheqa tiştêni wisa de, bi rastî jî ji bo wê

demê, hew bi tenê xewnên pûç û vala bûn. Mîna kesênu di tengasiyê zor û xirab de alîkariyekê ji derekê dipêñ. Wî jî eynî wilo dikir. Lê divê ev yek çewt neyê têgihîştin. Wî xelaskerek dipa. Naaa! Di kesayetiya wî bi xwe de hêleke wiha tunebû. Hêviya wî ya di derheqa alîkariyeke bicûk de, tenê, ji bo ku wan demêne bê si-ûd hîna bê êstir derbas bike, bû.

Di nav wan ramanan da hê çend deqîqe rabirtibûn ew hinekî şâ bû. Ew çend deqîqe bûn, ne kifş bû. Ji ber ku saeteke wî jî tunebû. Ji bo wê yekê hinekî di nava xwe de hêrs bû û: »ma qey ez jî meriv im« got û di rewşike weha de bêsaetbûn, mîna sersariyeke mezin qebûl kir.

Ji ber nermbûna erdê di bin lingên wî de, çend mêtro ji dîwarê malê dûr çû. Bi qasî du-sê mêtroyan çûbû. Bi wê dûrkentinê re, li dora mala sehim û tirsehêz, dîsa dest bi lêgerînê kir. Gava hat ber deriyê malê, di nav deriyê vekirî -bi rastî ê şikan-dî- re çavên xwe bi beloqiyeyeke bê mane berdan hundir. Deriyê malê, ber bi bakur ve, yanî ber bi aliyê daristanê ve bû.

Li ber derî, di nav gengeşîyeke bê şîrove de, »ma ez derbasî hundur bibim an na« got û bi bîryareke ne aşîkar, ket nav ramanan.

Şeveke weha, ketina hundurekî weha, ne ewqes hêsan bû. Ew xorkekî piralî bû. Gava hîna tiştek nedikir, gellekî li ser dibêtiyan diramiya û paşê gaveke nûh diavêt. Li ber wî derî jî eynî weha kir û got: »ez di vî hundurê reş de buhusteke tenê jî ber xwe nabînim, nikarim bibînim. Yanî niha ez di vê tarîtiyê de, mîna yekî kor im. Di rewşike weha de derbasbûna min a hundur, ne karê aqilan e. Belkî jî binê malê ji rûyê erdê kûrtir e. Di maleke weha kevn de, divê tiştên ku tê da ne jî kevn bin. Mesela; texteya ku li ser çalekê hatiye taxistin. Gava min pê lê kir, xwedê neke, heger şkest wê çi bibe? Ma gelo tiştekî ji ketineke weha ya ji nifşkê ve bêûjdantir hebû? A xirabtîrîn, ku tiştê pişti ketineke weha, mirin bû... Tobe, tobee! Dîsa ew!«

Di jiyanâ herkesî de demêne weha bi şik wek ên wî hene. Ji alî xeterbûnê ve, kêm an jî zêde, ne ewqes girîng e. Gava mirov ket rewşike weha, divê mirov li gor fikrîn xwe, bi qasî ku têra xelasbûnê bike, rîyeke jê filîtinê bibîne. Ev bizava ji bo rîya rast, ne ji ber fireh û kûrfikirîna ku mirov dizane ye, lê di bin hişê mirov de, hew tenê gava xweparsatina ji tiştên ji bo jîna mirov xeter in, amade heye.

Xweparastin! Ji bo her însanî û heywanî, ji bo pêşerojê peyvek û bizaveke mane-dar e. Bi rastî diviyabû weha jî bûba.

Li ber derî, weha bê bizav sekînîbû. Pişti avêtina çend gavan ber bi hundur ve... »na, naaa!« got û ji bîryara çûna hundur vege riya. Ji xwe bi xwe re: »ma qey viyana min a jînê ewqes sivik e ku ez li hemberî serma şevekê û çend saetan nikarim xwe

bigirim û ez xwe weha berdidim nermiyekê bê binî û bê dawî. Ma ka buhayê ciwanîya min li ku ma? Ma gelo ez bi qasî heft saetan, yanî heta heyştê sibehê, carnan li vir û li wir bimeşim, carnan jî di cîhê xwe de hilpekim, bazbidim û bimînim wê ne çêtir be?« got û dev ji çûna hundur û deriyê malê berda.

Pantolekî jîns lê bû û bi ser wî de jî disa pantolekî qumaş li xwe kiribû. Li jora bedena xwe jî, binkirasek, serkirasek, fanêrak û çekêtê bedlê xwe yê sportifî lê hebûn. Kincêñ xwe yên din, li aliyê Awistiryayê, li cem malbateke kurd hiştibûn. Armanca wî ya ji hiştina wan a li wir, ji wî barê biçûk xelasbûna wî bû. Ji xwe di çente de, ji destek bêceme, serkirasekî, fanêrakî, sê cot gore, deh qasetan, du kart û pantolê bedlê wî yê sportifî pê ve tu tişt tunebûn. Ji ber neanîna çente gellekî poşman bû.

Li dora malê diçû û dihat. Carê li malên ku ji xwe hew dor sed mêtroyekî tenê dûrî wî bûn, dinerî. Bêşik bawer dikir ku di wan malan de kesên ku di xewa şérîn de bûn, hebûn. Çiqasî dixwest li malekê ji wan, di nav nivînên germ û nerm de bûya.

Bi hatin û çûyînan êdî qefilî û westiya. Ji bo demeke kin pişta xwe da çamekê û berê xwe da wan malan. Germa bedena wî, wek ava ku birije ser qûmê, xwe ber bi jêr ve berdida û diçû. Bi qasî ku hewce bû, di vê yekê neramiya. Bîstikeke din jî wilô ma. Sermê tesîra xwe li ser wî giran kir. Li ser çermê bedena wî û bi taybeti jî di bin kokêñ müyêñ çermê wî de, giraniya wê hîs dikir. Destpêka xewa şérîn, êdî jê re bû wek yareke xweşik, belkî ji wê jî xweşiktir û xwe bi hêzeke mezin li bedena wî dipêça. Xurtbûna bedena xurt, ber bi bêhêziyê ve dadiket û çog pûç dikirin. Êdî nema pirr ew radigirtin. Hêdî hêdî ditewiyan. Ew yek ji bo wî ne xêr bû. Gellekî baş zanîbû ku, ketina rewşike weha, destpêka hatina dawiyê bû. Ji xwe bi xwe re: »ez ê hinekî din weha bisekinim. Ma wê ci bibe? Ci dibe bila bibe ez ê çend deqî-qeyen din biceribînim« got û ma. Her ku diçû ricfa wî xurttir dibû.

Wî babetê sekina wî ya wilo mat û bêlebat, bîranînê wî yên ku bi naveroka xwe, bi sermê ve elqedar bûn hatin bîra wî. Dibûn wêne û dihatin ber çavêñ wî. Bi wê rewşa xwe ya qefilî, didît ku hemû bîranînê wî yên bi serê re, hemû xerabi-yêñ bê oxir ên di wê derheqê de, li ser hev diciviyan û temam dibûn. Didît ku ji sermê xurttir e. Tu sedema ku bitirse, tunebû.

Wê şeva bê oxir, bûyerên ku di nabêra salêñ xwe yên dozdeh û hijdehan de jiya-bûn, bi taybeti dihatin bîra wî. Piraniya wan bûyeran ne bi dilê wî bûn. Gava di wan difikirî, nikarîbû bi hêsanî qebûl bikirana. Ma gelo çima di demêñ ewqase kurt de sextiyêñ weha bê mane jiyabû? Bersiva vê pirsê him zanîbû û him jî nizanî-

bû. Di erê nayê de bû. Lê bawer dikir ku nexelet bû. Ma kîjan xortî di xortiya xwe ya gerîm de, nedixwest ku bi hevalên xwe yên hemdemêñ xwe re li gor dilê xwe, hin tiştêñ cuda bike? Lê çend kirinêñ pirr bi sînorî jî, bi hişkî dihatin rexne kirin. Ji xwe rexnêñ civatê, ji bilî qîrîn, çêr û kotekekê ne tu tiştekî din bûn. Di nav malbatan de jî, metodêñ rexnegirtinê, eynî wiha bûn. Ji ber rexneyên weha, çend caran wî û birayê xwe yê mezin dilê hevdu hiştibûn. Çend caran sîle jî jê xwaribûn. Di rewşen weha de, jinbira wî diket nav wan û ew ji nav destêñ birayê wî xelas dikir. Gava ku kekê xwe bi hêrseke weha ne bi dostanî êrîşî wî dikir, wî bi xwe tu tiş nedikir. Hew tenê dixwest xwe ji ber kulmêñ wî biparêze. Heger ji bo revê mecal di dest de hebûya, ew jî dikir. Her çiqasî biçûk jî bû, lê hêza beden û baskêñ wî li şûna xwe bûn. Ew jî ji wê yekê baş haydar bû. Heger bixwesta, wî jî karîbû çend kulmêñ bi hêz li kekê xwe bixe. Carnan xwe bi zorê digirt. Carekê di nav hengemeyeke weha de, xwestibû ku girmikekê, kulmekê lê bixe. Kulma xwe bi ser hev de givaştibû, hişk kiribû, xwe arnade kiribû... lê belê, nikarîbû tiştekî weha bikira û kulma xwe bi şûnde berdabû nermita vebûna destê xwe.

Ji ber rewşen weha ji malê bi dûr diket, dicû cem hevalên xwe. Ji xwe hejmara hevalên wî yên herî nêzik, çend kes bûn. A rastî li herêma wan, cîhêñ ku biçûna lê bigeriyana, zêde tunebûn. Tu cîhêñ xortan ên taybet jî tunebûn. Cîhêñ herî navdar û pirr, qahwe bûn. Rojêñ çile yên sar, ew qehwe stareke yezdanî bûn. Ji sibehê heta êvarê, belkî jî em heta şevê bibêjin wê baştır û rastir be, wextê xwe li wan qehwan derbas dikirin. Di derheqa peydekirina cîhê rûniştinê de, tu derdê wan ê mezin tunebû. Peydekirina cîhê razanê derdê herî mezin bû.

Li ber dara çamê bi ser hev de qijilî. Gava ber bi warê xewa şêrîn ve dicû, weha difikirî û bi nefreteke bê rave hêrsa xwe ya ji wan çend salêñ bihûrî, di mîjiyê hestiyêñ xwe de, bi lerziyeke pirr xirab hîs kir. Sedema wê lerizê, tenê ew pirsa wê «li ku raketina» bû. Dîsa ketibû lepê wî dijminê wê demê. Dijmin dîsa eynî dijmin bû. Wek wê demê, ji alî hêzê ve, dîsa ji dijminê xwe xurttit bû. Wî gellekî baş zanîbû ku kesên diketin rewşen weha, nikarin ji ber fermana mirinê bifilitin.

Wê demê li mala ku bi cîhbûyî bûn, du mezel, hêwanekê fireh û dirêj, killerek - di binê wê da du bîr hebûn- û dîsa odayeke mezin ya ku deriyê xwe li paş malê bû, an jî bi aliyê bêxçê de vedibû, hebûn. Zivistanan, razana li wê oda mezin, mixabin ne hêsan bû. Ji ber çi weha bû, ew baş nedihat zanîn. Lê tiştê ku bi esehî zanîbûn, zivistanan ew ode ji derve jî sartir û kaviltir dibû. Ji bedêla ku mirov li wê odê raketâ, mirov li derve li ser berfa sipî û sar raketa, çêtir bû. Ji ber vê yekê jî qet nedicû wê odê. Ji bo raketinê, biryara xwe ya dawîn li ser kîlerê dabû. Pişti ew biryara xwe

carekê girtibû, careke din jî nediguher.

Du deriyên wê kîlerê hebûn. Deriyek ji aliyê çepê, ber bi oda mezin ve vedibû û du perçê bû. Textên wî yên kevn, xwe nema li hemberî dijwariya demê digirtin û êdî şikestibûn. Deriyê din ê ku ber bi aliyê rastê ve vedibû, qet bi kar nedianîn. Zivistanan êzing û komira xwe li pişt wî derî kom dikirin. Ji ber wê yekê jî, heta ku ew êzing û komir xelas nebûna, heta havîn nehata, tu kesan ji wan nikarîbû di wî derî re derbasî wê kîlerê bibin.

Li wê kîlerê, embarék jî hebû. Embar gellek mezin û xweşikbû. Bilindbûna wê hema hema digihişt kérîn û bi qasî çar-penç metroyan jî dirêj hebû. Li dirêjiya embarê, di herdu serîyan de du dolab hebûn. Li ser wan dolaban jî du çaviyê din ên ku ji bo hacetan bûn, hebûn. Heta nîvê embarê, yanî bi qesî metro û nîvekê, herderê wê, ji bilî berê pêş, hatibû dagirtin. Bi vî awayî, di zikê embarê de ciyekî mezin -li beşê jorîn- afîribû. Li ser wir, hin çewalên zêd, kincêñ kevn, mînder, cacim û hin tiştên din ên ku hewcedariya rojane bi wan tunebû, hebûn.

Gava şevê sar, ji qehwê vedigeriya malê, rast diçû bexçê pişt malê, deriyê paşîn vedikir û diket hundir. Deriyê kîlerê yê şkestî her demê vekirî dima. Ji bo ku kilidê şkoz bikin, tu derman jê nemabû. Ji ber wê jî, gava ew deriyê şkestî bi şûn de tan dida, ji bo ku deng dernexe bi hêdîka dikir, paşê derbazî hundir dibû û dîsa bi eynî bêdengiyê karê xwe yê cîdanê dubare dikir. Darekî biçûk û hişk da pişt dêrî û asê dikir. Bi vê hereketê jî ewlekariya canê xwe dianî şûnê.

Di tarîtiyê de, heta embarê rêya xwe bi destêن xwe kontrol dikir û bê teşqele û meşqelete diçû. Çûna heta embarê ne pirr dijwar bû, lê li wir dijwariyeke din dest pê dikir. Derketina ser embarê weha ne hêsan bû. Gava bi jor ve hildifiriya, hêza xwe hemû dibir ser girika pê, paşê jî hêza xwe dibir ser bêçiyêñ lingan û xwe ji hereketa rabûnê kar dikir. Wî çaxî hîna berî ku bêçiyêñ xwe ji erdê bibire, bi lez hêza ku di bêçiyân de hebû hemû dibir nav pazûyêñ baskan û herdu mistêñ xwe. Xwe weha ji bo xweqevastinê kar dikir. Ji xwe bi xwe re: »heger ez pisik bûma, belkî wê başfir bûya; an jî pisik mirov bûna...« digot û henek jî li xwe dikirin.

Pişti ku çend caran di wê rêya tengo mengo re derbas dibû, êdî pêwîstiya wî ya ku bi destan vir û wir kontrol bike, nedima. Bi wan ceribandinêñ çend şevan, li ser wê bizûtê dibû xortekî hoste.

Li aliyê paş, di nav çiwalên zêd, kincêñ kevn, cil, cacim û mînderan da ji xwe re bi qasî dirêjiya mêtroyekê û sî-çel sentiman jî fireh cîhek çêkir û radiket. Nikarîbû nigêñ xwe dirêj bike. Nikarîbû li ser pişte jî bi rehetî rakeve. Li ser aliyê çepê û ê rastê tenê karîbû bikeve cihê xwe. Divabû herdu çogêñ xwe heta ber singa xwe bi-

kişandina. Ji bo ku tiştekî bikişîne ser xwe, di tarîtiyê de çi biketa ber destê wî, dikişand û bi ser xwe dadi-kir. Serê xwe jî dikir bin wî tiştê ji bedêla lihêfê ve û êdî qet dernedixist. Bi vê kîrinê jî dixwest ku bi ger-miya nefesa xwe, hêlîna xwe piçekî germtir bike.

Li aliyê din ê dîwarê ker-pîç guvûgûv û fîzîniya bayê bê îman hebû. Hin caran dengekî wilo xirab derdi-xist ku, mirov digot qey li pîpîkê dixe. Li aliyê dîwarê din, qesî mêtroyek ji herdu bîran bilindtir, pencereye-ke pir xirab hebû. Texte-yên ku dîwarê ker-pîç û pencere bi hev dizeliqan-din, êdî nikarîbûn li hem-berî demê li ber xwe bidin. Ji ber wî halê wan ê ne baş, bi çend kevir û textikên din bi dîwêr ve hatibû şî-dandin. Her çiqası camên kîlerê bi qiléra salan bûn jî, ruhniya hîvê di zelaliya ca-man de, hewayeke xwêş dida hundur. Lê ne ku hinekî jî neditirsîya.

Carekê gava kekê wî sibehê rabûbû, di kîlerê re derbasî aliyê bêxçê, ber avê bûbû, çavêن wî li wî karibûn. A rast, çavêن wî li cil, mînder û tiştên din ên li ser wî kom-bûyî ketibûn. Ji ber meraqê, çûbû wan serûbin dike û dibîne ku birayê di bin wan de xwe kijilandiye. Dilê wî pê dişewite, lê dîsa jî ew ranekiribû. Axîneke kûr kişi-dibû û dîsa ew cilên kevn bi ser bedena wî dakiribûn.



Desen: Serhad Bay

Piştî çend hefteyên bi wî awayî, jinbira wî cîhekî hîn baştir jê re li wir çêkiribû. Lê dîsa jî nexweşiyekê ji ber razana li wir, ew girt. Ew roj û ev roj e, hîna ji wê nexweşiyê xelas nebûye. Dev û rûyê wî perçifibûn. Gava sibehêن sar ji xewê şiyar dibû û diçû ber hêliyê, li wî dostê xwe yê nû bi xembariyeke neçar temaşe dikir. Lê »ça-wa be ew ê paşê dîsan baş bibe« digot û dilê xwe wilo xweş dikir.

Wext weha diçû û hin tiştên din pêk dihatin. Êdî wî wir ji xwe ra kiribû cih û war. Gava ji xewê şiyar dibû, ji bo ku şûna xwe paqij û rasttir bike, hêzeke xurt di hişê wî de serdestiya xwe lê dikir. Illehî dianî bîra wî û jê dixwest ku wî karî bike. Tê digihişt ku ji bo bikaribe li wir rakeve, divê rast û pak bike.

Piştî ku kekê wî sibehê zû radibû û diçû geringehê, ji wir dadiket. Tu kosp li ber çûna odêñ germ, nediman. Lê di destpêkê de, ew jî nedikir. Gava şiyar dibû, diçû dev û rûyê xwe dişuştin -hin caran nedîsuşt jî- û rêya qehwê digirt. Xuriniya xwe nedikir. Bi rojan bi wî zikê birçî dima.

Karê wî wilo bû. Razana li embarê, qehwê û dîsa razana li embarê. Tu kes nedidîtin. Ne kekê xwe, ne jinbira xwe, ne déya xwe û ne jî biraziyê xwe yê hê du salî. Wan jî qet ew nedidîtin. Lê dilê wî bi nedîtîna biraziyê wî yê şêrînok pirr diêsiya. Gellekî jê hez dikir. Lê bi hesreta ku carekê wî di hembêza xwe xe bû. Dixwest wî di himbêza xwe xe, demeke dûr û dirêj jê hez bike, hemû hezkirina dilê xwe pêşkêşî wî bike.

Dîsan rojek ji wan rojan ji qehwê vedigeriya. Li ser berfa spî û rû cemidî, bi nav fîkrîn tevlihev de bû û hêdî hêdî dimeşîya. Ruhniya hîva zer, li ser berfa sipî diçiri-sand. Saet dor dozdehan bû. Êdî qurrîniya zikê birçî digihişt heta guhêñ wî. Herdu destêñ wî di bêrikên pêntol de, serê wî di ber de û nêzîkî malê dibû. Hîva zer jî wer ruhnî dikir ku, Êdî hewcedariya wî bi tu çirayekê nemabû. Wek her carê dîsa deri-yê killerê vekir û bi hereketa xwe kîfş, dîsa hilkişıya ser embarê. Bi güçkê lihêfê gitribû û kişandibû. Xwestibû ku cih ji xwe re veke. Bi rakirina lihêfê re, destê wî li tiştê ku li cihê serê wî hatibû danîn, ketibû. Kaxiz lê hatibû pêçan. Bi gumanekê xurt tê derxistibû ku ji xwarinê pê ve ne tiştekî din bû. Belê, jinbira wî, şîv jê re hilanibû. Carnan gazî wî dikir, dixwest ku bê malê xwarinê bixwe û dîsa vegere. Lê wî dengê wê nedibir xwe û diçû.

Çend rojêñ din jî weha derbas bûbûn. Lê êdî jinbira wî nema razî dibû. Ji ber li-bergerînê wê, dev ji razîna li embarê berdabû. Wê ji bo wî di oda din de cîhek amede kiribû. Ji bo ku bêdeng bikaribe bikeve hundur, miftak jî dayê. Xwarin jî, ji şîva êvarê jê re amade dikir. Sibehan jî êdî bi hev re taştê dixwarin. Di rastiyê de, ne taştê bû, ew êdî firavîn bû. Bi dû re, içar derdiket û heta piştî ku hemû radizan,

ew ji nû ve dîsa vedigeriya malê. Her çiqesi di oda wî de sobeyek tunebû ji, ji cihê wî yê berê germtir û xweştir bû. Li oda ku sobe lê hebû, kekê wî, jinbira wî, birazî û dêya wî radiketin. Lâ belê boriyên wê di oda wî re dirêjî derive dibûn.

Dev ji bîranînên xwe berda. »Ma gelo tiştên wisa xirab bi kêt ci têñ ku em ademzade tînin bîra xwe?« got û hinekî bi ser xwe hat, ya jî bi wî bi xwe wisa dihat. Pişta wî hîna bi darê çamê ve zeliqî bû û tu guhertinên ku rewşa wî ber bi başiyê vi bibin, çenebûbûn. Mana wî ya wilo li ser nigan, çimên wî bê derman kiribû. Tevizîneke xurt jî ketibû çimên wî. Wê û wetanê, ew pûç kiribûn. Derman nedît ku rabe ser xwe. Tirseke nerm di ber sermê re ket bedena wî û lê geriya. Xwîna sor hîna di wê bedenê di digeriya. Bi wê yekê pir keyfxweş bû. »Ma heta ku ev xwîna di vî laşî de nesekine, mirina min heye?« û paşê ji; »helbet ku nabe biko! Qey ez hişê xwe wenda dikim, ev ci ye?« got û bersîva xwe da. Heke em rastiyê bibêjin; tişteki weha negot. Weha ket bîra wî.

Destêñ wî di himbêza wî de, bi hev ve girêdayî, di bin çekêtê wî de bûn. Germiya bedena xwe bi destan pîr baş hîs dikir. »Xwezi niha hemû bedena min weha ba« got û axînek kûr kişand. Carnan devê xwe dikir bin çekêt û germiya nefesê berdida hundurê wî. Bê çaretiya wî ya sosret, tiştên wisa ne biaqilane jî pê didan kirin. Ji ber ku li bin wê çamê, ji wî pê ve tu kesê ku bikara alîkarî pê bikira, tunebû.

Gava mirov dikeve rewşen weha, ramanêñ ne baş jî têñ bîra mirov. Herçi qasî dem bi hêdîka radibirî ji, li gor wî, sayku li şûna xwe eynî wer disekinî. Mad û mîrûzê xwe hinekî tirş kir. Destêñ xwe hêdîka ji paşila xwe derxistin, ber bi jêr ve, hehta ber bêrîkêñ pantolê xwe birin. Bi hêzeke bê mane û bê armanç xwest ku herdu mistêñ qerisî têxe bêrikêñ pantolê xwe yê mexmûr ê sorreng. Devêñ bêrikan jî ber bi keviyê ve hatibûn çêkirin. A rastî bi kijan alî ve dibû bila bîba, ferq jê tunebû. Çiqasî hewl û hêz da xwe jî, nikarîbû destêñ xwe yê qefili bixe wan bêrikan. Di rastiyê de wî nema karîbû hemû qeweta bedena xwe bide hereket kirin. Heke wî bikarîba ew kar bikara, belkî wî dê armanca xwe bi dest bixista. Ji ber ketina wî ya ser çogan, beşa bêrikan bi hev qurmûci bû. Dev jê berda. Ji bo ku bikaribe rîyekê bibîne, dest bi fikirandinê kir. Pişti demeke kurt rîyek dît.

Hêza bedena xwe hemû berda çogêñ xwe û pişta ku sipartibû çamê ber bi jor ve hilda. Tê derxist çogêñ wî dixebeitin. Hinekî kîfa wî hat. Qewetê da ruhê wî. Demeke weha, ruhekî geş alîkariyeke pir mezin mirov dike. Çogan hêdîka dest bi ragirtin û hilgirtina bedenê kiribûn. Pişta wî bi dara çamê ve rast dikirin. Çakêtê wî bi çamê ve dima. Xuşîna ku ji çakêt û qaşîle dara çamê dihat, dirêjtir û gellektir di-

bû, çögên ku li ser hev duqatîbûn, rast dibûn. Pişî demeke din, êdî dîsa li ser pêyan bû. Kêfa wî hat, lê li ber çakêtê xwe ji ket.

Gava rabû ser pêyan, baştir di serma ku ew tesîra pirr giran lê kiribû, derxist. Xwest êdî bi meşê, li şûna xwe hinekî liviya. Xwe veparimand. Xwest bedena xwe germ û nerm bike. Lê kokên mûyên bedena wî sayku tê radibûn. Ezabekî mezin didanê. Lerzeke sivik girt bedena wî. Lê tê derdixist ku bi ser xwe hatiye.

Piştî çend deqîqan, îcar nigê xwe ji şûna kevn rakir û gavek bi pêş de avêt. Lê pê wek gaveke pirr sext hat. Heger hinan ew weha di rewşê de bidîtina, bi gumanekê mezin wê bigotina: »binerin, binerin carekê, sayku xortê me nû gaveke dîrokî diavêj e.«

Bi wan hereketan, xew ji ser çavêن xwe avêt û hêdî hêdî ber bi şiyarbûnê ve çû. Bedena wî germa ku mirov dicoşîne ava dikir. Ew desten gava ku li ser çogan bûn, nikarîbû têxe bêrikên pantolê xwe, êdî bi şewqeke serkeftî, sayku heyfa xwe ji wê bednava sermê digirt, kir bêrikên pantolê xwe yê mexmûr. Herdu destan di bêrikên pantol de kêfeke belek û lîstikeke ges dikirin. Li wan ecêbmayî ma. Berî bi çend deqîqan wilo bê armanc li ser çokan sekinîbûn û niha ji wilo bikérhatî bûn. Fikreke din hatiyê. Ma gelo wî çawa çarenûsa xwe û ya malbata xwe dixist xetereke wisa? Serê xwe bi peykirina bersiva vê pirsê, pirr ne êşand. Tenê, »lawo hiş be« got û jê derbas bû.

Gelo çiqas wext derbas bûbû?

Saet hê li derdora duduyan bû.

...

Wênenê ji rojêñ zarotiyê



ŞAHİNÊ B. SOREKLÎ

Lawo, çawa bêhna bîsoffî ya şîrê diya te hîn di bêvilîn te de maye; tew bêhna simbêlên bavê te ji, tevî ku wî di jiyana xwe de tu tenê sê caran maç kiri-bû?! Ci bû ku tu li dareke hijrê digerî da destê xwe bi ser qaqilê wê re bixuşînî û pelên wê bêhn bikî? Dengê dahol û zurneya dawetêñ herêma te, stiranêñ şivan û naxirvanan, teqeteqa tifingêñ qaçaxciyan, axiftina gundiyan di odaya gund de, şîngerandin û gîriyê jinêñ li ser goran û dengê pîrejinêñ dema zarotiya te: çîma qe wenda nabin ji nav hişê te? Û hîrîniya hespan, zîrîniya keran, ewteewta segan û dengê çêrandina pezê li ser pirêzeyan: çîma weqa zindî mane di guhêñ te de?! Ma ne pirraniya van bêhn û dengan nema li welêt ji mane; de çîma ji wê demê û ji wê şûnê weqa dûr hîn bi wan re dimînî, û ew bi te re?!

Ha wa ye tu gihiştiye binê planêtê, temenê te nêzikiyê li payîza xwe dike, de çîma ev dilê te yê ciwan nikare xwe bigihîne aramîyê û hîn daye dû xewnêñ bihara jiyana te? Tu geh dibî kevok û di bin asîmanê sayî de li ser pêlên Okyanosyaya Hindî difirî, geh dibî xezaleke berrî û bi çolan dikevî û geh dibî komeke ji hestan û xwe di nav şevêñ vî bajarî de vedişêri. Bi ku de çûn armancêñ ciwantiya te, mebes-ta derçûna te, çemîn evîna te, deryaya avjiniya bîr û baweriyêñ te, û hevalêñ paş-rojêñ te?!

Û ci hat bi wan xewnêñ te yên rengîn, ew xewnêñ ku kesekî rengbûna wan bawer nedikir, xewnêñ wêrek û bêlîwan?

Şevê xwe ji nîvê xwe derbas kiriye lê xew nakeve çavêñ te, televizyonê xwe bi hemî baberêñ demderbaskirinê tiji kiriye lê tiştek nayê li xweşîya te, kasêt û CD'yen te li ser refan bêdeng mane, meyxane û lokalêñ bajêr ji te bêpar mane; deriyêñ cî-

hana mezin li ser piştê ne; de çîma bîrên meraqê di dilê te de bêav mane??!

Dilê te hîn bi hêz lêdixe, mêjiyê te ranaweste û tu dizanî tu dijî lê her du kurêne te ji nuha ve sêwî mane, û diya wan her tîne bîra te: "jiyan kurt e; ha wa ye zaro mezin bûn bêyî ku tu bi wan re têkevî nav lîztikekê." Tu dibêjî wê: "bi ya te ye, rêhevalê, lê kesekî ku bavê wî ew ji lîztiñê bêpar hiştibe dê çawa bibe besdarê lîzti-na li gel zarokêñ xwe?!"

Weqa raman di hişen te de li nav hev dikevin, weqa bûyer xwe vedijînin û ew qas wêne xwe diliñin. A nuha bi sedan mişk di wêneyekê de ne, mişkên biçûk ku li kêleka rûbara li rojhelatê bajarokê zarotiya te warê xwe çekiribûn, mişkên xwe bi derbasbûna mirovan re li bayê bezê digîhandin nav qulikên xwe; û hîn ew wêneya bi tevahî wenda nebûye wêneyeke din xwe diavêje ser wê, wêneya kulemoza li ser bîra gundê te; û lawê te yê biçûk ji nişkan ve dikeve hundir û ji bo kurtedemekê zincîra wêneyan dide rawestandin. Dipirse, tu dê wî sibe kengê bigihîni rawesteka trênenê, da ku biçe rojekê li gel dapîra xwe derbas bike. Day û brayê wî do çûn û ew ê dawiya hefteyê li wir bin. "Ez ê te katjimêr heft û nîvê sibeyê bi wir gîhînim," tu dibêjî; û hestê tawanê xwe di dilê te de dilipitîne. Ev bû demek tu nema diçî bajarokê xwesiya xwe ya pîr da ku serîkî li wê xî, ne jî diherî şûna ku we xweliya giyanê xezûrê te avêtibûyê. Dizanî, dilê jina te jî ji bo vê yekê ji te maye, lê meraq nakî biçî. Giraniya tabûta xezûrê xwe bi bîr tîmî û milê te yê rastê piçekî diêse. Xwedê di-zane, mirina jina wî jî êdî nêzik e, û qîza wan ê dîsa dest bi girî bike û mala we dê ji bo çend hefteyan tiji şîn bibe. "Qîzê, ez gundî me lê tu ji min gundîstir î," te gotibûyê li dû mirina bavê wê. Wê jî ev pirsa ji te kiribû: "ma tu ji min dipêyî ku ez li ser bavê xwe negirîm?!" Û li dû vê pirsa xwe bi bîra te anîbû ku çawa di dema seri-lêdanekê Kurdistanê de, berî dora bîst û du salan, hevaline te wîskî jê re anîbûn û mat mabûn ku ciwanjineke rojavayî wîskî venaxwe! Dema te ci peywendi di nav-bera giriyê wê yê pirr li ser mirina bavê wê û matmayîna hevaline te ku ew wîskî venaxe de nedîtbû, wê gotibû: "hevalên te mat mabûn ku çawa jineke rojavayî wîskî venaxwe û tu jî li dû mayîna weqa sal li gel kesên rojavayî û zewaceke bîst û sê salan li gel yekê ji wan mat dimînî ku çawa jineke di nav çandeke rojavayî de mezin bûye dikare weqa bi mirina bavê xwe bişê û hêstiran bibarîne." Tu li gotina xwe poşman bûbûyî. Û ji ber ku rewşa di dema mirina kesan de tête holê te weqa ditirsîne toreyên mirinê yêن "Hindiyêñ Sor" têne bîra te, û tu dibêjî xwe: "xwe-siyya her yek ji me jî biçûya li ser sîbata xwe veketa û can bida."

Wêneyeke mirina li welêt tête ber çavêne te: Kelandina avê di sîtila mezin ya reşde, giriyê jinan, bêdengiya peyan û çûna goristanê. Û goristan bizavê dike ku rûpe-



M. KOLGAK

la di kompiyûterê de têxe nav goreke xwe lê peyvên li ser rûpelê mîrzel dikişînin nav xwe, û ji nişkan ve mitêن kulindirê serên xwe di nav peyvan de radikin û dû re rêzên nivîsarê dibin xetêن cotê li ser kepirekê.

Saldemêن welêt têne bîra te û bihareke zarotiyê xwe dixe nav wêneyekê: Berê ko-

meke ji bêrîvanan bi qerêc de ye, bêrîvanên bi kiras û xeftan û bervanekên rengin, bêrîvanên bi tac û text: diaxîfîn, dikenin, mirov hişmekar dike li wan binihêre. Tu hewl didî ku xwe têxî nav vê wêneyê lê tu nikarî: tenê cîhê zarokekî tê de heye, û tê bîra te, tu nema zarok î; û agir li pêş çavêن te bi wêneyê dikeve û wêneya agirpêketî di nav talîzokeke payîzê de wenda dibe.

Ava Kaniya Ereban, Kaniya Murşid û ya Qineya Romanan xwe dixin nav wêneyekê, mijekî destpêka zivistanê bi ser wan dikeve, xwe di wêneyeke din de dike ewrekî û baranê ji xwe dibarîne. Çilekcke wê xunaviyê xwe digihîne lêvên te yên hiş û wan şil dike û bi şilbûna wan re Kobaniya îroj bêav mayî xwe dixe wêneyekê, û ji ber ku nema dikare gol û rûbara xwe di wêneyê de raber bike serê xwe ji şermê nimiz dike, û Kaşê Miştenûrê li başûrê wê dixewine, û Kaş birînê xwe xuya dike, şûnên ku kevirên xeta hesinî jê deranîbûn da ku Berlîn bigihê Bexdadê û giyanê geleki ji hev biqelişê; û wêneyeke qermiçî, yeke reşipî, gundiyeke wenda li wê deverê raber dike ku hewl didîye gavekê ber bi Qamışloya Cezîrê, yekê ber bi Efrîna Çiyayê Kurmênc û yekê ber bi mînên bakurê bi simbel rane lê ji ber ku her yek ji wan li aliyekekî cuda ye li hev şâş bûye û hindik maye li ser piştê bikeve.

Wêneya taxa serek ya bajarokê zarotiya te îcar xewan dibe û zarokek bi dengê dabenceyekê vedicinqe û peyak li pêş firoşgehekê dikeve û teqîn xwe ducar û sécar dike û xwedîyê dabenceyê direve. Zaro ber bi peyayê kerî dibeze û wî di sikranê de dibîne, û çığa dixwaze tiştekî ji bo hawara wî bike jî, ji dest nayê; dixwaze biqîre lê şerm dike, dil dike tiştekî bibêje lê ziman nafertile, û laşê yê mirî di nav komeke peyan de wenda dibe.

Wêneya rojeke zivistaneke bi berf xwe dixe şûna wêneya bi xwîn û erd gewrsipî dibe, beytik birç dimînin û ji neçariyê xwe diavêjin ser dehfîn zarokên gundê te û zarok wan hildiqetînin û xwîna çivîkan rengê sipî bi yê sor dineqîşîne: wêneya nû ji xwînî dibe; û bav ji zaroyênen xwe yên zîrek re dibêjin aferîn, û çivîkên azad mane li ser yên hatine kuştin difirin û digirin lê zarokên gund xwebêja girî nizanin ji ber ku bavênen wan her gotine: Girî ji bo peyan şerm e, û hemî zarok dizanin ku ew pena; ew ê jî rojekê li ser zeviyekê, di taxekê de, yan li ser sînorekî bikujin yan bêne kuştin: xwîn şana camêran e!

Wêneyêni siyasi dest pê dikin xwe di albûma şeva te de têxin rêzê lê vî beşî işev li cîh dihêli; ew wêneyan bêtir ji rojêni ciwantiyê dest pê dikin; ew ê kompiyûterê tiji neçakî, xwîn û gemara li nav hev ketinî bikin û "vîrosê" têxin nav mîjiyê wê yê elektronî. Şev jî wek dilê te êdî şikestiye û giyan xwe ber bi xewê radikişîne. □

Ronî mîna evînê tarî mîna mirinê

Beş: 3



MEHMED UZUN

Serpêhatiya Baz ku ew ê, bi xwe, bi misogerî, tu
carî pê nizanibe, weha dest pê dike. Bi mirin û
xwînê, saw û tirsê, sar û sermê.

Lê serpêhatiya Kevokê?

Serpêhatiya Kevokê ji, em ê bibêjin, bi qasî bihîst
salan bi dû serpêhatiya Baz re, dîsan li Welatê Çiyan,
di rojekê germ a dawîya biharê de, dest pê dike. Li bajarekî mezin û tevlihev ê We-
latê Çiyan. Li îstasyona mezin a trênenê.

Em niha li ber trêneke reş, dirêj û leşkerî ne. Em dîsan li rê ne. Em ê li trênenê si-
war bin û herin, dîsan herin, -ber bi deverên nedîyar, nenas, ber bi deverên xerîb.
Îstasyona kevnare û der û dorêñ wê tijî meriv in. Kal, pîr, zarok, jin, mêt ketine
nav hev, li ber deriyêñ kesk ên wagonêñ trênenê rêz bûne û li bendê ne ku navê wan
bê xwendin da ku ew li trênenê siwar bin û herin. Li ber her deriyekî trênenê çar zabit û
hin eskerêñ çekdar rawestiyane. Li ber deriyêñ mezin ê îstasyonê eskerêñ çekdar ra-
westiyane. Li hundirê salona îstasyonê û li ber gîşeyan esker rawestiyane. Li der û
dora îstasyonê eskerêñ çekdar rawestiyane. Dora îstasyonê bi tank û jîpêñ leşkerî
hatiye rapêçandin. Ji hoperlorêñ îstasyonê dengê marşen leşkerî, perde bi perde, bi-
lind dibe.

Roj, ne rojekê normal e. Roj, roja eskeran e; roja haşer û maşerê ye; roja barkirin
û koçkirinê ye.

Roj, roja sîrgûnê ye, sîrgûna ber bi diyarêñ xerîb...

Belê, roj, roja eskeran e, generalan e. Berî niha bi du mehan, li welatê fireh, şevekê, piştî razana segên kuçan û berî hisyarbûna dîkên malan, generalan, di bin serekiya serokê giştî yê ordiyê de (ku em ê jê re bibêjin General Serdar), li hember qiral û hukimeta wî, serî hildan û hukim xistin destê xwe; generalan û eskerên wan qiral û hin pisporêñ wî di cîh de kuştin. Serekwezir û hemû wezîrên hukimetê ji girtin û avêtin zîndanan. Ü dengê radyoya neteweyî, heta pêla dawîn, vekirin û desthilatiya xwe, bi marşen leşkerî, bi welatê fireh û cîhanê gîhandin. Perda destpêka serîhildana wan weha bi xwîn vebû. Dûmahikê ji bi xwîn dewam kir; Tevgerên karker, ronakbîr, xwendevan û zehmetkêşan hatin qedexekirin. Şanzdeh ji serekên wan hatin bidarvekirin. Yê din ketin zîndanan. Mafêñ grew, lokawt, xwepêşandan, meş, civînan rabûn. Gelek rojname, kovar, kitab û weşan hatin qedexekirin. (Yê ku diweşin, bi çavnîriya pisporêñ generalan, diweşin). Li hemû welêt hukmên awarte yêñ generalan li dar ket.

Ü iro herkes, hemû gel divê li gora van hukman rabe û rûne, here û were, bixwe û vexwe, razê û hisyar bibe, bifikire û biipeyive. Ü li welatên biçüktir ên welatê fireh ji, ji du mehan û vir ve ye, li jor balafrîren leşkerî li esmanan, di nav zikê ewran de, çîv didin, li jêr ji bi hezaran, bi deh hezaran, bi sed hezaran tank, top, esker, jîp û erebeyên leşkerî her û her li ser riyan, di nav bajaran, li ser çiya û zozanan, di deş û geliyan de çerx dibin. Teví çek û pûsadên giran. Teví marşen leşkerî. Teví xwepêşandana quwet û zorê, gur û fortê.

Li welatên biçüktir, ronakbîren wan ên pêşewa, navêñ wan ên zane yêñ siyasi û nasyonalist hatin girtin. Tevger, komel û pêwendiyêñ wan ên çandî û siyasi hatin qedexekirin. Dudo ji navdarêñ Welatê Çiyan hatin xeniqandin. Niha ji General Serdar û hevalêñ wî fermañeke nû derxistine; hema ci bigire hemû sergewer, mal û malbatêñ mezin û giregir ên Welatê Çiyan ê ji cîh û warêñ xwe bêñ derxistin. Ew ê herin neveren nû, herin sîrgûnê.

Iro roja çûyinê ye, roja vê sîrgûnê ye. Iro, roja fermanê ye.

Roj germ e. Teví ku ro hê baş bilind nebûye, dinya germ e. Esman şîn, ewr gewher in. Tav mîna yaqûteke sor dibiriqe, ewr mîna kevirêñ mercan ên çîkî spî dixuyin. Ronahî û zelaliya rojê li roja dilsoj a fermanê nayê. Lê fermaña însanêñ Welatê Çiyan rabûye, ew ê herin. Însanêñ Welatê Çiyan ku dê niha herin, di nav xewnekê de ne, -mîna ku ew di nav xewnekê de ne, mîna ku ew kabûsekî dibînin. Ew hê tê-nagîhêñ ka ci dibe, hê bawer nakin ku bi sedan mal û malbat ê, teví zar û zêçen xwe, di demeke weha kurt de, ji cîh û warêñ xwe, ji reh û rêçen xwe, bêñ vejetandin. Ew hê fahm nakin ka çîma ew ê herin. Çîma? Ji bo çî? Lê iro, roja wan a herî

dirêj a jiyana
 wan, ne xewnek
 e. Ev roja germ,
 ev eskerên çek-
 dar ên maxrûr,
 ev trêna reş a ku
 mîna cinawirekî
 çillingî dixuye û
 hatin, hebûn û
 rawestana wan a
 vê derê, îstasyon-
 nê, rastî ye. Ras-
 tiya wan e. Ew
 tu kabûsî nabî-
 nin, lê kabûs bû-
 ye jiyana wan,
 qulipiye ser jiya-
 na wan. Însanên
 Welatê Çiyan û
 jiyana wan; tenê,
 belengaz, nezan;
 rûyên qemerî,
 simbelên badayî,
 bejnên şox û ger-
 denên zirav; hez-
 karên zinar, çiya,
 zozan, newal û
 geliyan, hezka-
 rên tebiyetê, hezkarên tenê û tenêtiyê; merivên serîhildar, merivên şer û şervaniyê;
 qederek ku hertim di şer de ye hertim di berxwedanê de ye, hertim ferman lê rabû-
 ye, hertim di nav pêlên kabûsekî de dere û tê. Mîna niha. Ew li ber deriyên wago-
 nîn trêne rêz bûne û dipên. Stûxwar, westiyayî, çavqerimî. Eskeran du roj, bi tenê
 du roj wext dan wan ku ew haziriya xwe û çûyinê bikin. Berî du rojan zabît û esker
 hatin ber mal, war, kar û cîhêwan û bîryara fermana generalan ji wan re gotin;
 "hûn ê, ji bo demeke kurt, bar bikin û herin. Gava dinya aş bû, aram bû, hûn ê dî-



Desen: Serhad Bapir

san vejerin malên xwe... Ferman weha ye..." Ji bo demeke kurt... Lê heta kengî? Herin... Lê ber bi kû, bi ci, çawan? Gava dinya aram bû... Kengî, çawan, bi ci şê-weyê? Kî dê biryar bide ku dinya aram bûye yan na? Aramî? Çawan? Li gora kê? Û di nav cil û heyşt saetan de ew ê, ji bo çûyinê, hazır bin. Ew ci bi xwe re bibin? Ew ci bikin? Birevin, xwe bidin alî, derkevin ser çiyan? Mîna ku bav û kalên wan kiri-ne, ew jî xwe bispêrin gelî û newalên xwe? Paşê ew ê ci bibe? Dawî? Çil û heyşt sa-et... Çil û heyşt saetên keft û leftê, çûn û hatinê, geremolê, fikr û gumanê, pirs û si-walê. Çil û heyşt saetên ketin û bindestiyê, teresiya bêgaviyê. Ne tiştekî din, bi tenê ketin û bindestiyê. Bi tenê bêgaviyê...

Piştî cil û heyşt saetan, spêdê, di berbanga sibê de, zabît û eskerên çekdar ew ji mal û cihêن wan wergirtin, li trombêlên leşkerî siwar kirin û anîn ıstasyona trênen. Wan ê ci bikira?.. Hîç, hîç tiştekî... Ew bi qedera xwe razî bûn. Bêyî ku ew, şeva dawîn, serê xwe dayinin ser balîfan, xew bikeve çavê wan, kincêن wan li wan, sandûq û walîzêن wan hazır, di destê sibê de, bi dengê dîkan re, ew li benda hatina es-keran bûn. Bi tenê sandûq û walîzêن wan ên biçük bi wan re bûn. Ji çend taxim cil û berg, zér û zîner, pere û pûl, morîk û kevirên buha pê ve, wan tu tiştekî xwe bar nekirin. Ne sandûqên cil û bergen, ne aman û firaqêن malê, ne kûp û dîzikêن rûn û xwarinan, ne boxçîrêن lehîf û balîfan, ne kedik û meşkêن şîr û mastan, ne tûr û kîsikêن yadîgaran, ne ref û rehleyên kitab û defteran, ne kitab û defterên dizî yên li paş dîwar û kadînan, ne jî resim û lewheyen bav û kal, hezkir û qedirbilindan. Û ne jî hespên kihêl ên seglavî ku li deşrên kesk û zer û li zozanên hêşîn û spî, bi lez û beza xwe dibûn teyrêن eylo. Û ne jî segên gurêx û tajiyêن belek ên zirav ku di nav newal, gelî, zixur, zinar û çiyan de dibûn piling. Û ne jî keriyêن pezên mêsîn, dîk û keleşerên sor ên kumikdirêj, kew û kevokêن belek... Û ne jî tiştekî din. Di bin çav-nêriya eskerên libaskesk de, wan terkî malên xwe yên germ, warêن xwe yên bav û kalan kirin û ketin rê.

Ew ne li benda fermañeke weha bûn. Ji bervajiyê, ew li hêviyê bûn ku dinya hi-nekî aş bibe, eskerên li ser kolan, cade û gundan hinekî kêmtrî bibin, ew vejerin barakayêن xwe yên leşkerî. Di ser cûntayê re du meh derbas bûbûn. Generalan we-kî xwe kîribûn, daxwaza xwe anibûn pê, her der, bi darê zoร, kontrol dikirin, her gotina xwe, biryar û fermana xwe, bêyî dengekî muxalîf, liberxwedaneke xuya, bi cih danîn. Hingî wan ê çîma, bi ferman, zor û şîdet, desthilatiya xwe bişidandina? Merivêن Welatê Çiyan, wekî her carî weha saf, lê şas, difikirîn.

Mîna her carî, içar jî ew dîsan ketine ser riyan; ew niha li rê ne. Zarok geh digi-rîn, geh di xew re diçin, geh ji delingên diyêن xwe dikîşînin. Kal û pîr li ser kursi-

yên dirêj ên li ber deriyêن îstasyonê û li ser kevirêن reş ên perona îstasyonê rûniştine. Kal qelûn û cixare dikişînin, pîr dipojinin. Hinêن wan jî li ser bankêن îstasyonê xwe pal dane, dihênijin û heye ku li rojêن borî, li fermanêن borî, li şer û pevçûnêن borî û li qir û qetliyamêن borî difikirin. Heye ku ew li hîç tiştekî jî nafikirin, naxwazin li tiştekî jî bifikirin, yan jî em weha bibêjin, heye ku ew li jiyanâ xwe ya dirêj û valahiya wê, bêkêriya wê, bêmanebûna wê difikirin. Herçî mêtren wan ên rûtiş, jinêن wan ên rûgirtî, xorî û ciwanêن wan ên rûqemirî ne, ew di rêzen li ber deriyêن wagonan de li dorê ne. Bi beden û mêtjiyêن westiyayî, bi çav û ruhêن westiyayî.

Lê çav, çavêن wan. Bi taybetî çavêن wan; xem, kerb, endîse, west û tirs. Nemaze tirs. Tîrsa aloziya îro. Tîrsa kirin, qewimandin, bûyer û serboriyêن do. Tîrsa nezaniya pêşerojê, mij û dûmâna ku li ber wan e, pêşıya wan biriye. Bi tenê tiştekî van însanêن ku niha li rê ne, dike şîrîkêن hevûdu; tirs û qedereke yekgirtî ku ji tîrsê hatiye pê. Ji bili vê yeka müşterek, ew hevûdu nas nakin. Her yek ji van mal û malbatan ji derekê hatiye anîn. Hinêن wan beg û axalerên gundan in, ji gundan hatine. Hinêن wan eşîr û serekêşîr in, ji bajarêن biçûk ên Welatê Çiyan hatine. Hinêن wan şêx û serekêن wan ên ruhanî ne, ji warêن xwe yên dûr ên zikê çiyan hatine. Hinêن wan jî xwendeyêن wan in -bijîşk, awukat, muhendîs, dermandar...- ku piraniya wan ji malêن xwe yên vî bajarê mezin ku ew ê niha bi trênen terk bikin, hatine.

Belê, ev trêna pêşîn e ku wê niha here. Kî dizane ka çend trênen din ê rabin! Jîber ku fermana bilind fireh e. Bi sedan mal û binemal dikevin ber fermanê. Trênen ê hê bi rojan, bi heftan, heye ku bi mehan herin û werin, bar bikin û peya bikin.

Niha, gava tîrêjên tavê êdî xwe digihînin ser qermîten sor ên banê îstasyonê, ji nişkekê ve, dengê tîz ê marşen hoperloran disekine. Bi qasî bîskekê dinya bêdeng dimîne. Bi tenê çend zarok digirîn, hin kal û kokim dikuxin, hin jin bisemt dinihi-rînin û eskerek, bi dengekî berz, li dûr, hin kesen nûhatî, dixe rêzê. Herkes, pirs, şik, guman li ser rûyê wan, dipê. Pişî payina bêdeng a çendekê, ji deriyêن mezin ên îstasyonê generalek û li pey wî jî şes zabît dixuyin. Bi saw, bi xof, cidî. Zabît û eskerên îstasyonê xwe didin hev, qama xwe rast dikan û li silavê disekinin. General û zabît, giran giran, çavê wan li ser şeniyêن li ber deriyan rawestiyane, têن û li na-venda perona îstasyonê disekinin. Bi qasî kîliyekê General, bi nêrîneke sert, max-rûr û serbilind, li der û dora xwe, li herdu aliyên dirêj ên trênen dinihêre û paşê dos-ya ku di destê wî de ye, vedike û lê dinihêre. Zabîten ku li dorê ne, hinekî din nêzî-kî wî dibin û ew bi hev re li dosyê, li kaxizên nav dosyê dinihêrin. Paşê jî, sê zabît, hin kaxiz di desten wan de, ber bi aliyê paşî yê trênen, sisiyêن mayî jî ber bi aliyê pê-şî, bi gavêن revê, derin. General jî, pêda, çend esker li dorê, bi hêdîka, berepaş, dere

û li ber deriyê mezin ê istasyonê disekine.

Niha koç dest pê dike. Zabît, li ber deriyê wagonên trênenê, bi dengekî berz, navan dixwînin. Nav, navê wan, navê koçbaran; paşnav, navê bav û bavik, kal û kalik, navê binemal û eşîr, navê war û wêran, navê kevnare yên sedsalan... Navê wan; qedera wan, fermana wan. Herkesê ku navî wî tê xwendin, bi qîrin û bi zimanê zabîtan, "li vir e" dibêje û berepêş dere. Tevî jin, zarok, sandûq û walîzên xwe yên biçûk û eger hebe kal û pîrên xwe. Ew tê ber derî, li pêşıya zabîtan disekinin. Zabît careke din nav û paşnavê wan, war û wargehê wan dipirse, wan dihijmêre, li kaxizên destê xwe dinihêre, tiştine dinivise û di rêberiya eskerekî de wan siwar dike. Saetek-du saet bi vê heyteholê, bang, qîrîn, hatin û siwarbûnê derbas dibe. Paşê ji meydana istasyonê, pêşıya peronên trênenê, der û dora istasyonê, ji nişkekê ve, vala dibe. Ew insan, ew mahşera berî çend saetan, bi carekê, winda dabin. Ew şeniyên boş nema dixuyin. Bi tenê segek-du segên beredayî, bi sistî, xwe li istasyonê dilivinin. Û ew generalê maxrûr ku bi awirê insanên serfiraz li trênenê dinihêre, bi qasî deh zabîtan li dorê, destên wî li paş, hê li ber deriyê istasyonê ye. Şixul meşiyaye; koçbarê Welatê Çiyan ketine trênenê, trênenê pişta xwe daye Welatê Çiyan ê bakûr û berê xwe daye deverên nû yên başûr. Dengê marşen leşkerî dîsan dest pê dike. Lî pişti çendekê dengekî din ku di ser hemû dengan re, xwe bi hemû bajêr, hemû aleme digihîne, bilind dibe; dengê tîz û dirêj ê trênenê.

Trên dest bi rê dike, hêdî hêdî, mîna şahmeranekî çîrokan ê heft qat binê erdê, xwe dilivine û xwe dirêjî hesinêni raxistî yên rê dike. İstasyona kevnare ku bi kevirîn mezin ên reş û şehkirî lêbûye, li pey dimîne. Qermîten sor ên banê istasyonê ku bi rengê tîrêjîn tavê şewq dide, li pey dimîne. Bandûra alaya welatê fireh ku bi sê rengan di bilindahiyan de li ba dibe, bi hêdîka winda dibe. Xaniyên kevn, peregende û neçar ên bajarê mezin ku bi kevirîn granît ên reş, bi du-sê qatan lêbûne, li pey hev têr û winda dabin. Şeniyên bajêr, meriv û xism, nas û nenasenê koçbaran ku bi cil û bergên xwe yên meheli li kolan û kuçeyên bajêr digerin, li ber mal û deriyen xwe rawestane, li bexçe û parîzen bajêr rûniştine, qor bi qor, dixuyin û winda dabin. Çend dibistan û xwendegehêni ku zarokên koçbaran bi zimanê zabîtan perwerde dikin, li herdu milen trênenê dixuyin û li pey dimînin. Û berî ku trênen, bi temamî, ji bajêr derkeve, garnîzona leşkerî ya zabit û eskeren ku derketiyan niha dixin, dixuye. Trênen dere, tanq û top, trombêl û kamyonen leşkerî, bereqe û cebirxane, komên esker û zabîtan, eskeren nobedar û çekdar, war û meydanen temrin û jîmnastîka leşkerî, talîmgeh û nîşangehêni leşkerî, yek bi yek, li pey xwe dihêle û dere. Trênen ji bajêr derdikeye, berê xwe dide aliyê başûrê welêt û dikeve nav deşteke

hêşin a bêser û bêber. Trêna ku em niha tê de ne, ji yanzdeh wagonên dirêj hatiye pê. Wagoneke gelekî dirêj ji bo zabitan e. Yek jî aşxane ye. Yê mayî jî ji bo koçeran û pasevanê wan ên zabit û eskeran in. Di her vagonekê de, bi qasî cil kesî he-ne. Rêwî bi cîh bûne, herkes di komprtimana ku jê re hatiye nîşandan, rûniştiye. Em di wagonâ sisiyan a trêne de ne, - ku ji bo serpêhatiya Kevokê û herweha ya Baz girîng e.

Baz? Belê, ji bo serpêhatiya Baz jî. Ji lewre Baz jî di trêne de, li eynî wagonê ye. Lê ne mîna yek ji rêvingan, mîna çavnîrê wan, pasevanê wan. Baz, nobedarê zabít ê wagonê ye. Di ser wê roja ku ji devê şikeftê agir û dûman radibû re bi qasî bihîst salan derbas bûye. Niha umrê Baz, em ê bibêjin, bi qasî bihîst û du sal, du sal û nî-vî ye. Umrekî di ser wê roja şewat û mirinê re bîhuriye. Sal bîhurîne, wext bîhuriye. Êdî ne dengê top û mîtralyozên wê rojê têن bihîstin, ne jî dû û dûmana gule û şewatê dixuyin. Kes, ji me pê ve tu kes, nema bi wê rojê dizane. Ew roj ketiye ber pêlên têkûz ên wextê û ji bîr bûye. Lê Baz maye, mîna siya wê roja giran, mîna şopa mirin, şewat, windabûn, kîn û wahşetê.

Îro Baz zabít e, tegmenekî nû yê dilgerm, serîgerm e. Tegmenekî xort, maxrûr, bixwebawer, kelekel, dûrbîn, jîr û serwext. Çawan weha bû? Çawan Baz di ordiya ku bav û kalên wî qir kirin de îro bûye zabít? Çiroka vê yekê ku em ê carina lê ve-gerin, dirêj e. Lê ew, îro, kumekî kesk ê leşkerî li serî, di nav kincêñ xwe yên tenik ên leşkerî de, li ber deriyê wagonâ sisiyan a trêne sekiniye, li rîwiyêñ ku teslimî wî bûne, dînihîre û bi serbilindî li erk û berpirsiyariyêñ xwe yên mezin û miqedes difikire; çavê wî êdî li pêş e, berê wî, bîr û bala wî, mîna vê trêna ku niha dere, ber bi pêş e. Rojêñ tenê, sar û qaswettijî êdî li pey mane. Ew ê êdî li pey xwe nenihîre. Xewna wî bi cîh bûye, ew bûye zabít, wî kincêñ leşkerî li xwe kirine, çek û pûsat giredane û dest bi kar û şixulên giranbiha, miqedes kiriye. Jiyana wî niha dest pê dike, ew niha dikeve nava afirîn û avakirina jiyanê, sir û sihêren jiyanê. Ew ê niha jiyanê ava bike, jiyanekî, jiyanan biafirîne. Ew, zabít û kumanadarê nûgîhîştî, dê niha bibe kumandarê jiyanê... Ev trêñ, ev însan, ev rîwîtî, ev rojêñ germ ên girîng ên welatê fireh... ev hemû gava yekemîn a xewna wî ne ku îro êdî dibe rast, dibe rastiya jiyana wî. Ü ew ê, di rojêñ bê de, bibe rastiya jiyana welatê wî yê fireh jî. Ev rîwîtî, wezîfa wî ya yekemîn e. Destpêk e. Destpêka kumandariya wî, desthilatiya wî. Ji niha ve, ew desthilat e, hakîm e, fermandar e. Destê wî yê rastê li ser (qefdi-ka) demanca li ber wî, bi nizmahî, ew li rîwiyêñ xwe, na ne rîwî, li girtiyêñ xwe dînihîre. Bele, ew desthilat e.

Baz; êdî ne zarokê mirinê yê berî bihîst salan e, tegmenê xort ê desthilat e îro; bal

û bejneke dirêj, awir û nêrîneke xurt û tûj; rûyekî qemerî ku bi rûyê girtiyên wî di-şibe, rûyekî paqîj, rîh û simbelên kurkirî, dev û levên dirêj û zirav; pozekî dirêj û zirav; eniyeke fireh. Û çav, çavêن belek û biçûk mîna du libêن nokê, mîna çavêن teyrê baz. Çav; xof, saw, bawerî, cidiyet, disiplîn, sar û rengîn. Çav; rengîn sar ên tenêtiyê, rengîn mirinê. Çav; tenêtiya dil û ruh. Dil û ruhê tenê yê Baz... Lê ew ne-ma tenê ye. Ew mensûbê ordiyeke mezin e, zabît û kumandarê hêzeke desthilat a hemû heremê ye. Mala Zarokêن Sêwî, Dibistana Navîn a Dewletê, Xwendegeha Leşkerî ya Ordîyê û Akademiya Leşkerî niha tên bîra wî. Mala wî, cîh û warêن wî ew der bûn. Ne maleke wî ya germ hebû ne jî dê û bavekî wî yê dilgerm. Ne xweh û birayêن wî, ne ap û birarzî, ne jî xal û xwarzî. Hîç kesekî wî, hîç tiştekî wî nîn bû. Ew bi tenê bû. Ruhekî tenê û stûxwar. Ruhekî sêwî. Belê, sêwî. Li gora ku wî dizanibû, li gora ku bi kitekit jê re hatibû gotin, bav û diya wî, gava ew hê zarokekî ge-lekî biçûk bû, di qezayeke trafikê de miribûn. Kesekî wî nemabû, ku lê xwedî der-keta. Loma jî berpirsiyarêñ dezgehêñ dewletê ew teslîmî Mala Zarokêن Sêwî kiri-bûn. Bi tenê, carina, zabîtekî simbelqît ku ji dûr ve xismê wî bû, dihate serîdana wî. Jiyana wî ya li ser bihîst salan weha, di nav çembera kûr û kambax a tenêtiyê de derbas bûbû. Lê iro êdî her tiş guheriye, êdî ne bi tenê ye, ne jî sêwî. Jiyaneke di-rej, mîna vê deşta fireh ku ew niha tê re dibuhurin, li pêşıya wî ye. Erk û wezîfeyêñ mezin û giran, mîna çiyayêñ ku wan li pey xwe hîştine, li hîviya wî ne. Xweşî, başî, bedewî, ımkân û heyinêñ jiyânê, yêñ welat, millet, dewlet û ordiyê li benda wî ne. Bextiyarî, serfirazî, xwarin û vexwarin, ger û lixwekirin, kêf û henek, keç û jin, evîn û hezkirin, mîna van darêñ ku ji pencereyêñ trînê dixuyin, dest li Baz dikin, bang li wî dikin. Û keç û jin, bi taybetî jî keç û jinêñ ku wî di şevêñ tenê û sar ên salo-nêñ razanê yêñ dibistan û xwendegehan de, di bin lehîfîn tenik de, destê wî yê ras-tê di nav şeqan de, her û her, xeyal dikirin. Ax ew keç û jin, tahma jiyânê, reng û bîhna hebûnê, neqsa cîhanê... Ew keç û jin... Ew bisk û guliyêñ wan ên hevresim, çavêñ wan ên kilkirî, lêvîn wan ên goştîn, stûyê wan ê dirêj, sîng û berê wan ê ve-kişiyayî, memikêñ wan ên xweşik, ber û berzikêñ wan ên nerm û germ, reşahî û qelşekêñ berzikê yêñ sir û sihêrtijî, hêt û şeqêñ wan ên mîna pişta masiyan nerm, bedenêñ spehî û bedew... ev hemû li benda Baz in. Baz ê di guhê wan de, bi hêdi-ka, binihîwêre, gotinêñ herî dizî ku wî bi salan dubare kiribûn, jiber kiribûn, bibê-je. Ji guhê wan, ew ê, bi gotinêñ xwe yêñ mehrem, bi hilma xwe ya germ, dakeve bedena wan, dilê wan, ruhê wan. Baz ê wan bixwe, wan vexwe, bi hemû hebûna xwe, bi hemû bedena xwe bikeve nava wan û di nava wan de bimîne. Bi deqan. Na, ne bi deqan, bi saetan. Na, ne bi saetan, bi rojan, Belê, bi rojan, bi mehan, bi

salan, bi dirêjahiya umtrekî. Ew ê di nav wan de bimîne, li wir hêlinkekê çêke û bimîne. Êdî Baz kê bixwaze, ji kîjan jinê re dest bike, ew ê, bi kêf, were û xwe li ber Baz bike erd. Êdî quweta Baz heye, aboriya wî li cih, apoletên nîşanên wî li ser mil, hêz û quweta ordiyê û dewletê li pişta wî ye. Hêdî hêdî, yek bi yek, kite bi kite, ew ê hemû van xeyalan, daxwazan bi cih bîne. Ne lez, ne jî bez, giran giran. Jiyana wî ya rastîn hê nû dest pê dike. Roja ku ew li bendê bû û dizanîbû ku ew ê were, îro, hê nû, hariye. Rojbaş roja nû, jiyana nû!

Ü heyecana îro! Ji kêf û serbilindahiya Baz re payan nîn e. Coş û heyecana wî ya îro bêsinor e. Di rojên weha tarîxî de wî dest bi wezîfê kiriye. Ev yeka hanê nasibî kê dibe? Esker û ordî, îro, bi saya cesareta General Serdar, hukimdar e. Karê dewletê bi destê ordiyê digere, gotina ordiyê ferman e. Heke ordiyê qiral û berdevkên wî ji hukim nexista, Xwedê agah e, ci dê bi serê welat û dewletêbihata! Heye ku dewlet ji hev biketa, welat perçê bûya, şerekî navxweyi dest pe bikira. Lê ordiyê rê li hemû van ihtimalên neçê girt. Bi xêra ordiyê, îro, dîsan, rêkûpêkî û dûzaneke têkûz tê pê. Lê şixul giran e, berpirsiyari mezin e. Tu şâşî navê. Dudîlî, şik, guman, súzenî, rûbadan, qelsî, sistî, sergêji navê. Tevlihevî, bêdûzanî navê. Bernama ordiyê divê here serî, ci dibe bila bibe, divê ew bi cih were.

Ü ji ber bextê Baz ê çê, ew di rojêن weha de dest bi xizmetê dike.

Ew roja ku wî diplomaya xwe ya leskerî wergirt û pirpirikên apoletên wî pê ve bûn, niha, li ber deriyê wagona sisiyan a trêna koçê, tê bîra wî; wê şevê xew nekete çavê wî. Dotira rojê ew ê bûbûya zabît! Ew ê ji vê jiyana girtî rizgar bûya, deriyên jiyân û cihanê li ber xwe vekira! Ew ê bûbûya xwedanmesûliyet... Li ber destê sibê, berî ku hilma berbangê dakeve ser dinyê, ew ji nivînan rabû, ji cihê xwe yê razanê peya bû, li hevalên xwe yên razayî yên li salona razanê nihêri, bêyî ku deng derxe, bi gavên sivik, berê xwe da cihê serşokê. Tevî ku meha gulanê jî êdî diqulipî, serşoka dirêj hûnik bû. Wî lampayêن serşokê pêxistin û çendekê li ber destşokê rawesta û li neynika hember xwe nihêri. Belê, ew bû. Ev kesê këfxweş, xor, porqusiyayı û lihevhâtî ku di nav pîjarnayêñ erzan ên leskerî de lê dinihêri, ew bi xwe bû. "Rojbaş" Baz ji kesê neynikê re got, "rojbaş tegmen... rojbaş zabitê nû, serdarê nû..." Ü ew keniya, "rojbaş dinya, rojbaş jiyana derve, li hêviya min bin, ez têm, ji bo daqultandina we, vegirtina we..." Bi dû re, ew çû li avdestxana ku jê bîhneke rûnt a mîzê dihat, rawesta. Wî pîjama û derpiyê xwe, hetan ajnoyan, daxist û li pêşıya xwe, tiştê ku di nav şeqan de diliviya û mîna "serbilindiya min" bi nav dikir, nihêri. Ew keniya û çend caran, bi pêçiya xwe ya mezin lê xist û "rojbaş ji te re jî, serbilindiya min" wî got. Bi destê xwe yê rastê, wî pê list, hêdî hêdî. Bi pêlistinê, tiştê

nav şeqan mezintir bû, serî rakir û piştî kêliyekî rep bû. Baz dîsan lê nihêrî, bi heyret, bi maxrûrî. "Roja te jî iro dest pê dike" wî got, "em divê vê rojê pîroz bikin..." Paşê wî çavên xwe girtin, li periyên tahzî yên xewn û xeyalên xwe yên salan fikirî û destê xwe yê rastê li ser û doraliyên mîraniya xwe, serbilindahiya xwe bir û anî. Pêşî bi giranî, paşê bi lez, heta ku hin dilopên avikê, mîna berikên demançeyekê, ber bi qulika avdestxanê firiyan. Çavê wî girtî, heşê wî li bihuştên wî yên veşartî, ew heziya, bi zelzeleyeke germ û kûr ket. Paşê, gava bedena wî hinekî aram bû, wî çavê xwe vekir. Dilopeke avikê negihştibû cihê xwe, ew bi delingê pîjamayê wî ve zeli-qibû. Wî bi tiliya xwe dilop ji pîjamayê jêkir û ji nêzîk ve, lê nihêrî. Sir û sihêrên vê dilopa bêreng ci bûn ku jê jiyanek, çend jiyan, gelek jiyan dihatin pê? Lê her ci jî bûya, wî dê ev av, ev avika ecêb bireşanda, mîna tovên zeviyê, ew di kûrahiyên tarî û germ de biçanda û jiyan jê rakira. "Roja te ya jiyanê pîroz be, ey hukimdarê jiyanê" wî got û li ser kevirê lawaboyê rûnişt û bi qasî demeke dirêj xwe vala kir. Sakîn, bi aramî, bi hizûr. Ne tu bîhn dihate difnên wî, ne jî kevirê sar ê avdestxanê ew eciz dikir. Ji bervajiyê, wî, bi kêfxweşî, marşeve leşkerî fitikand. Ü bi fitik, wî şixulên xwe yên din, kurbûn, şuştin, vegera salona razanê, bir serî. Gava ew vege riya hundir, ew çû ber cihê xwe yê kincan ku li kêleka cihê wî bû. Wî bi hêdîka derî ve kir; kinc li wir bûn. Taximek kincen nû yên zabîtan di dolabê de hilawestî bû. Xwedayo! Ji heyecanan, wî, çend caran, got "Xwedayo..." Dengê hilavetina dilê wî dihate wî. Wî dê, niha, ev kinc li xwe bikirina. Ew kincen ku wî hertim xeyal kiri-bûn, niha, li ber wî, li benda lixwekirinê bûn. Li ber çavên wî kinc, mîna kincen keysaran bûn, mîna zirxên hebûn û parastinê bûn, mîna libasen siherîn ên biserkestin, pêşketin û vegirtinê bûn. Mîna ku gava wî ev kinc li xwe kirin, her celeb daxwaz, xewn û xeyalên wî dê bihatina pê. Berî herkesî wî kincen nû û tenik ên kesk li xwe kirin. Gava hevalên wî hişyar bûn, wî di nav kincen xwe yên nû de, li bexçê yekta yê Akademiya Leşkerî, dest bi piyasê kiribû jî. Bi dû sond, marş, xwirînî, tallîm û jîmnastika sibê re, ew hemû, qor bi qor ku ji çar kesan dihate pê, daketin meydana mezin a merasimên leşkerî. Herkes li wir bû, generalekî ji serekatiya cûntaya ku nû dest bi kar kiribû, kumandarê Akademiye, general û zabîten giregir ku li Akademiye ders didan, du wezîr, bi dehan karbideşten sivil ên dewletê, serekê belediya girava ku Akademî lê bû û gelek kesen din. Dora meydanê bi topen ku dibiriqin rapêçayî bû. Top bi alaya sêrengîn hatibûn xemilandin. Di hemû aliyen bilindahiye meydane de jî ala, bi zehmetî, li ba dibû. Ü marş neteweyî ya dewlet û welêt, bi musika orkestrayeke leşkerî, dihate xwendin. Wan ê li wir, di wê roja germ a destpêka havînê de, ala ramûsana, bi navê dewlet, milet û ordiyê sond bix-

warina û nîşana xwe ya yekemîn a ordiyê, ji destê kumandarê Akademiya Leşkerî werbigirtana.

Dê, bav û xismên herkesî, ji bo merasimê, hatibû. Ji yên Baz pê ve. Kî dêbihata? Kî dê kincen xwe yên cejn û merasiman li xwe bikira û bihata? Çi kesê Baz hebû ku bihata? Lî ne xem bû. Wê rojê Baz dibû endamê malbateke pir mezin, mezintirîn a hemû cîhanê. Ew dibû mensûbê ordiyê. Ev mensûbiyet, ev aîdiyet têra wî û hemû jiyana wî dikir!. Lî ew dema ku generalê kumandar hate ber wî û lê nihîri? Ma ew dem ê tu carî ji bîra wî biç? Xwezî yekî fotografake wê demê bikişanda. Wê demê, hingî rûpeleke nû ya jiyana wî vedibû, jiyana wî riyeke nû dida ber xwe. Qama wî rast, serê wî rast, nêrîna wî li pêsiyê, bi rawestaneke pir qehîm, bi rêz û rêzdariyeke mezin û bi heyecaneke bêşinor, wî şewqa nîşanên hesinî ku di destê kumandar de bûn, dît. Nîşan, yên wî bûn! Belê, wext hatibû, kumandar ê nîşan bi herdu milên wî ve kira. Paşê? Piştî wê kurte-demê, tiştekî zêde nayê bîra Baz. Ji coş û heyecanê, êdî, çavên wî tu tiş nedîtin, êdî bala wî ne li ser tiştekî bû. Nîşan pê ve bûbûn û ew bûbû zabît...

Trêna kevn, gemarî ya leşkerî, giran giran, bi dengê xwe yên taybetî, dere. Deş, ji mêj ve ye ku li pey maye. Çend deşten din, erd û zeviyên din, dar û dahlên din, deverên çiyayî û zincîreçiyayên din, av û çemên din, lehî û şelaleyên din, ziving û gundên din, bajar û qesebeyên din li pey mane. Wext çûye, saet çûne, dan çûne. Rêwî gihiştine dawiya danê êvarê. Trêna gihiştîye ser tixûbênen Welatê Çiyan ku bi çemeki fetloke vediguheze ser welatekî din ê cîran ê Welatê Fireh. Ew, niha, Welatê Çiyan jî li pey xwe dihêlin û di nav erdenê Welatê Fireh de, ber bi jêr, ber bi başûr, ber bi welatêne deş û çolê derin. Welatê sar li pey e, welatê germ li pêş. Ro dere ava. Dinya, hawirdor, di nav rengekî çıkış sor de, bi hêdîka, paralelî trêne, diherike û dere. Keriyek xezal û kahrxezalan, hinekî ji trêne dûr, li ber devê daristanekê diçerin. Gava ew trêne dibilîn, bi lez, direvin û di nav daristanê de winda dibil. Di jor re, çend refen teyran, ji aliyê başûr ê trêne ber bi aliyê bakûr, cîhê ku rêwî jê têr, difirin û derin. Li dûr, li ber lingên zinarekî hespin, stûyê wan ê reş, spî û belek ber bi jêr, digerin. Ü piştî keliyekê, ji hespan hinekî dûr, li aliyê cepê yê trêne gundek dixuye. Gundekî neçar, kavil, xaniyên wî ji kevirên gome lêbûyi. Ji bixeriyan hin xaniyan dûman radibe, -dûmana ku ji agirê insanên gund bilind dibe. Hic kesek ji gund dernakeve ber deriyê xwe û li trêna ku di ber gundê wan re derbas di-be, nanihêre. Haya wan ji koça insanên Welatê Çiyan nîn e. Koça insanên Welatê Çiyan bala wan nakişine. Ew li gundê xwe ne, koçbar jî li wagonen xwe.

Eskerên nobedar ên wagona sisiyan, li her çar aliyê wagonê, circa vêxistine. Ro-

nahiya çiran, tevî ronahiya qels a dawîn a tava ku li derve, li pişta zinar û daristanan, winda dibe, şewqekê direşine nava wagonê. Baz, li ber derî, li ser du kursiyan, paldayı, rûniştiye. Kursiyên wagonê ku textîn in, hişk in. Lê Baz, ji bo xwe, çare dîtiye; eskeran du mînder danîne ser kursiyê Baz.

Eniyên wagonê eciz in; cîhê wan teng, hişk, û nerehet e; bircî ne, tî ne, westiyayî ne. Ü ew hê ji nizanin ka ew ber bi kû de derin. Ji niha ve, bîhn, bîhna cixarê, bîhna verişê, bîhna xwîdana wan û gû û mîza zarokên wan ên berşîr li wagonê belav bûye. Hilmeke giran a bîhnbed wagon vegirtiye. Nefesa wan diçike. Pencereyên fi-reh ên wagonê, qehîm lehîmkirî, girtî ne. Herdu deriyên wagonê ku nobedar li ber in, girtî ne. Bi tenê deriyê pêş ku Baz li kêlekê rûniştiye, carina, gava pir pêwist be, vedibe. Her der girtî ye; dor li girtiyan hatiye girtin. Xwelivandin, razan, paldan, rabûn, çûyin ne mumkin e. Ew dikarin, bi tenê, carekê, herin avdestxana trênen, - bêguman di bin çavnêriya eskeran de. Lingên pîrejinekê werimîne. Yekî ku kul û qînorên wî hene di navbera herdu aliyên wagonê de dirêj bûye, tevî ku esker hewl didin, ji erdê ranabe. Zarok digirîn. Diyên wan, bi zimanê xwe, wan dilorînin. Kal û pîr, bi zimanê xwe, pitepitê dikin. Yekî xort, mîna ku tiştek ne xema wî ye, mîna ku ew naçe sîrgûnê û ne di nav vê wagonê de ye, her, bi zimanê xwe, bi hêdîka, strana dibêje. Ev çi hal e ku bi serê wan de hatiye? Ev rîwîtiya nediyar ê heta kengî, heta kû dewam bike? Welat, ev welatê fireh ku téra herkesi dike, çima weha ye, çima weha hertim aloz e, mîna ku bi zelzelê ketibe, dere û tê? Çima ev welat nikare mîna van çiya, zinar, gir, gelî, dahl, daristan, gol, çem, deş, erd, zevî, çol û kepiran, sakîn be, aram be, di cîhê xwe de qehîm be, nekeve ber pêlîn ba û bahozên ci-vakî û siyasî? Sebeb çi ye? Sebeb kî ye? Ev eskerên hanê? Ev zabitê xort ku li kêleka derî, bi pozbilindî, rûniştiye? General? Ordî? Qiralê ku hate kuştin? Xelkên welêt? Ewana bi xwe? Kî? Kî?.. Heye ku ne tu kes. Heye ku ev hemû misûbet, bi tenê, qeder e, qedera wan e.

Êvar dadikeve. Tav dere, stêr derdikevin, yek bi yek, li vir, li wir, esmanan dîne-qışının. Ew, pişta wan, hestiyê wan ê qorikê, êşiyayî, li hev, li zarokên xwe yên razayî û li stêrên ku li dûr, geleki dûr geş dîbin, dinihêrin. Ma ev stêr, ne stêrên wan in? Ne stêrên zozan, gelî, çiya û newalên wan in? Niha çavê wan li stêran, ew ji zozan, gelî, çiya û newalên xwe bi dûr dikevin. Bi qasî dûrahiya stêran, ew dûr in niha, û trêna ku bi xuşexus dere, wan hîn dûrtir dike. Ew ê kengî vegerin nava wan bîhnên nas ên zozan, gelî, çiya û newalan? Ew pê nizanin. Zabît û esker nabêjin. Kes, tu kes pê nizane. Lê ew derin, li ser riya hesînî ya nediyar, bêyî zanîna roj, wext û dewra vegevê, ew derin. Stêr, nebixêrên stêran dilê wan diguvişînin, mal û

warên wan tînin bîra wan; agirê sor ê tifîkên wan, ava zelal a lehiyên wan, berfa spî ya ciyayê wan, hawayê paqîj ê gund û zozanên wan dûmana çayxane û meyxanen wan û hilma şehwetê ya şevêن wan ên stêrtijî tînin bîra wan. Û ne bi tenê evçend, stêrên bêdeng, aram û tenê qedera wan tînin bîra wan.

Xwarin tê, -eger meriv bikaribe jê re bibêje xwarin. Ji bilî hin tiştên sivik ku bi wan re bû, wan hîç tiştek nexwarine. Niha esker xwarinê didin wan; serê meriv pariyekî nanê hişk, deh lib zeytûn û di nav taseke biçûk a aliminyumê de hinekçay ku êdî sar bûye. Û esker tembih li wan dikin; wan tevdîr divê, heta tahstê êdî tu xwarin nîn e. Ew ci bibêjin? Hîç, hîç tiştekî. Bi hatina nan û zeytûnê re gotinên wan, dengê wan, pitepit û xirecirên wan, kuxik û xirexira wan tê birîn. Nan, nan e, ci germ ci sar, ci nerm ci hişk.

Baz, ku lingê xwe yê rastê yê tevizî, dilivîne, bi dîqet, li van merivan dinihêre, li tevgerên wan, nanxwarina wan, rû û rûcikên wan dinihêre. Ma ev merivên neçar, belengaz ku hê nizanin nêن bixwin, bi ci cesareti, dixwazin li hember dewletê rabin? Bi ci zanîn, hêz û quwetê, ev ê gotina dewletê bi cih neyinin û doza tiştên din bikin? Ma van hê zanîn, hêz û quwera dewletê fahm nekirine? Ma ev nizanin ku dewlet, ordî dikare van, hebûn û heyinên van, mal û mulk, war û welatê van, bi leza birûskê, bi carekê, hilbiweise, bi erdê ve bike yek? Ma van ji tecrubêن xwe ji ders dernexistine? Çendîn caran serê van hatiye hinciqandin. Ma haya van ji wan dersan ji nîn e? Ev reben û nezanîn hanê kî ne ku dev davêjin yekitiya welat, milet û dewletê? Baz divê van binase, pit baş binase. Wi ev merivên ku ji rê derketine, hatine xapandin û bûne leyistokên dijminên derve hîç neditime, di hemû jiyanâ xwe de, nc carekê hatiye deverên van, ne ji van kesek nas kiriye. Lî wî li ser van, alozî, teşqelete û xirecirên van gelek tiş xwendine. Di Akademyê de qal û behs her tim li ser van û kesen mîna van bûn. Ev ji perçeyekî wan dersên ku li ser yekîtiya welat û dewletê, dijmin û dijminahiyê, şer û parastinê bûn. Ma ev merivên hanê, jixwe, ne yek ji sebebên hatina General Serdar û ordiyê bûn? Ma ev ji ne di nava wan dek û dolabên ku li hember dewletê dihatin gerandin, bûn ku Generalan her behs dikirin? Niha ew derin. Heq û musteheqê wan e. Ders divê, terbiye divê. Tîrs û dûzan divê. Pergal divê.

Baz, ji pencerê, li der dinihêre; heyya ku di şevêن wî yên tenê de, hertim heval û hogira wî bû, niha, di vê rîwitiya dirêj de ji dibe hevala wî. Hevaleke evçend dilsoz ku di her rewş, her hîsiyat, her cih û hertim pê re ye. Baz li dosta xwe ya sadiq ku niha di nav stêran de diçirûse, bi germahî, dinihêre. Ev xwesikî, bedewî û ev dûrî, bihîsiyarî û zizîya ku ji dûriyê tê pê! "Eynî mîna şûrekî xwar

û tûj ê ji kalanan kişandî”, Baz, bala wî ya westiyayî li derive, difikire, ”şûrekî tûj ku jê şewq radibe, ku hîsên rêz û rêzdari, saw û tirs, serîdanîn û hurmetê tîne pê, ku tîmsala quwet û qudretê, heq û edaletê ye...” Di nav hemû stêrên zêrhêli de, heyv, aram, giran, zelal, vekişiyayî, ji hemû stêran mezintir, bedewtit û xurttir, dibiriqe. Heyv; ronahiya şevêner nerm û germ; serdara stêran, tarîhî û şevan; rîbera rîvingan, koçberan, kumandar û serdaran; nobedara dahl û daristan, zinar û çiya, deşt û Gund, civat û bajar, însaniyet û însanan; şewqa welatê fireh ê bêdawîn ku wê her û her li ser lingan be, bimîne û xurt be. Heyv; li wir, li dûr; evçend bêdeng, evçend pejnê xurt ê dengan, - ku di dil û heşê merivan de tîne pê.

Laşê Baz sist dibe, çavêñ wî têñ girtin.

Lê trêñ dere, cografya fireh a bêser û bêber, tabiyata bêdawîn, navçe û heremên Welatê Fireh dide ber xwe, giran giran, dere. Evar dibe şev, şev dibe sibe, sibe dibe nîvro, nîvro diqulipe ser danê evarê, trêñ, her bi xuşexuş, bi kufekuf, dere. Hawa sar a Welatê Çiyan diqulipe ser hawa hûnik a navçeyêñ nû yên Welatê Fireh, hawa hûnik diqulipe ser hawa nerm, hawa nerm diqulipe ser hawa germ û hawa germ jî ser qijeqija germahiyê, lê trêñ dûmana xwe li pey xwe berdide, diherike û dere. ”Trêñê, malkambaxê, ho trêñê, riya te ber bi kû ye, lê trêñê...” Niha, di vî danê evarê yê dudiyen ê rîwîtiyê de, ku tav, dîsan, bi rengekî helesor ê aram û bêqusûr, dere ava, xortê ku bi zimanê xwe yê kevnar ê bav û kalan, hertim, stran digotin, bi şêwe û awazê bav û kalan, strana trêñê dibêje, ”azar û eşâ dilê minê, trêñê, stûxwarî û rebeniya minê, trêñê, de bibêje, ez ketime bextê te, bibêje...”

Koçbar eciz in. Ne taqeta wan, ne sebra wan maye, ne jî daxwaza xeberdan û qisê. Ji xortê dengbêj, çend kal û pîrên ku nalenalê dikin û zarokên wan pê ve, deng, hew, ji kesî derdikeve. Rûyêñ wan ên qemerî ku bi tîrêjêñ dawîn ên tavê ku xwe di pencereyêñ fireh re digihînin hundir, dibiriqin, di nava xwîdanê de ne. Dilopêñ xwîdanê li ser enî, cênik û stûyêñ wan dibiriqin. Rû jar bûne, laş sist bûne, beden tevizî ne. Û zik birçî ne. Lê ya herî dijwar, herî kambax, gewri tî ne. Tî, pir tî. Heta niha, di hemû dirêjahiya rîwîtiyê de, wan, her yekî ji wan, bi tenê du tas av vexwarine. Taseke nû jî, dê, piştî bîskekê were. Lê ne tas, stîl û dewl jî nikare tîna wan bişkîne. Lêv, ziman û gewriyêñ wan zuha ne. Edî xwezi jî nemaye ku pê gewriya xwe, hinekî, şil bikin. Av, taseke av, dilopeke av, çilkeke av... Av... Dinya dişewite, hundirê wagonê dikizire. Wan cil û bergêñ germ ji xwe kirine, tiştîn zêde, yek bi yek, ji xwe kirine, hema çi bigire bi tena kiras mane. Lê germ e, zahf germ. Edî ne bilindahî û zinarek, zevî û deviyek, ne dar û dahlek ne jî av û çemek, li der û doran dixuye. Bi tenê erdekî qiraç ê boz ku leyлан dide, dixuye. Av, ka ew ava co û gol,

çem û lehiyên wan ên boş? Ka ew ava hûnik a kahnî, rûbar û çîqên wan, ka dengê wan? Av, bi qasî kulmekê, mistekê... ji ava mend, pingav... ji ci dibe bila bibe, hinekî av... Ew însanên zînde yên çiyayî, niha, sist bûne, mîna ku li ber mirinê bin, hema ci bigire ji xwe ve çûne. Ji dengê nalenalê û ji dengê tewş ê stranê pê ve deng dernakeve; ew bûne mirizindi.

Baz, li pê, li ber derî, lingên xwe li ba dike. Wî ji çakêtê tenik ê leşkerî daniye, qumçikên gomlegê xwe yê xakî ku hertim girtîne, heta sîngê, vekirine. Dilopên xwîdanê di nav pirçen reş ên sîngê re, ber bi jér dibin. Binçengê wî, berzikê wî, navşeqê wî, ji xwîdanê, şil bûne. Baz eciz e, ji germe, hawa giran û gemarî ya wagonê, ji van însanên bêkêr û bêpergal, ji dengê wî xortê keleş, ji zimanê van ê hîç û pûç, eciz e. Lê ew nikare eciziya xwe diyar bike. Nabe, ne li gora ûsilên kargerandin û berpirsiyarê ye. Lê Baz bi wan re napeyive, têkilî wan nabe, nakeve nava wan, bi tenê, ji ber devê derî, bi lêhûrbûn û kûrahi, li wan hûr dibe. Belê, Baz ê xwe bi-gihîne kûrahiya dilê wan û têbigihê ka di kûrahiya tarî ya dilê wan de ci heye.

Yek ji wan ku li koşa herî dawîn a wagonê rûniştiye, ji cîhê xwe radibe, tê û bi rezdarî, herdu desten wî li ser hev, li ber Baz disekine. Baz xwîdânia eniya xwe paqij dike, bêdeng, li vî zilamê dirêj, zirav, çavmezin û simbelzirav dinihêre. Ji zilamê ku hinekî stûyê xwe xwar kiriye, deng dernakeve, welê radiweste. Baz, bi cesibiyet, "ci ye" dibêje. Zilam hinekî xwe dide hev, bi şermokî, bi zimanê Baz, "av" dibêje, "tegmenê birêz... hinek av... ne ji bo min, lê ji bo bermaliya min ku li ber welidan-dinê ye... ew zahf giran e, bi zarok e, dixewire... iro, sibê... hema piçikek av..." Gotinên nîvçeyen Zilam bi feraset in, devoka wî ji ne mîna devoka yên din xirab û şelto şehetî ye. Pantolon û gomlegê lê, rawestana wî diyar dike ku zilam xwenda ye. "Tu, şixulê te ci ye? Çima tu di nav van de yî?" Baz, bi dengekî nermtir, jê dipirse.

"Awiyat, awiqatî... Ez nizanim... diyar e, şasyiek bûye", zilam, di nav xwîdanê de, bêyî ku xwe bilivîne, nîvî gotinan dadiqultînc u dibêje û bi lawa û mîhnet li Baz dinihêre. Baz, bi çend gotinên kurt, eskerê kêleka xwe dişîne aliyê aşxanê da ku ew tasek av bîne û zilam ji, bi paş de, dişîne koşê, cîhê wî. Jiyana trêñ û wagonâ sisîyan weha zîz e ku gav bi gav ber bi mirinê dere, dewam dike, - ta ku em digihêن gava dawîn a rîwîtiyê; roja sisîyan, piştî nîvroyê ye. Di ser rîwîtiyê re sê roj û du şev derbas bûne. Kes ji rîvingan nemiriye, lê kesekî sax ji nemaye. Nîvmirî û bi hemû halet, xusûsiyet û aliyêñ kesen nîvmirî, ew ji trêñ peya dibin. Ew gihîştine da-wiya seferê û destpêka jiyana nû ya sirgûnê, gihîştine warê nû yê jiyana wan a wela-tê xerîbiyê. Piştî qîrîn, ferman û gotinên zabîtan, tiştê yekemîn ku xêrhatinî li wan

dike, tav û ronahî ye, şewqa ronahiyê ye. Her der tav e, dinya di nav tavê de gêr di-be, hawirdor di nav geremola tavê de ye. Şewqeke pir xurt a nedîti çavên wan digi-re. Piştî çendeke dirêj, ew dikarin çavên xwe, bi hêdîka vekin û li dora xwe, li ware-xwe yê nû binihêrin. Ew li dora xwe dinihêrin, vedigerin li hev dinihêrin û dîsan li hawirdor dinihêrin û germahiyeye boş bi bedena wan dikeve. Bedena wan diheze, dil û mîjiyê wan diguvişe û kal û pîrên wan, li ser çogan, hildiweşin erdê. Na, ne erdê, ser qûmê.

Belê, qûm, xîz, bi tenê qûm û xîz. Heta ku çav dibîne, esman dixuye qûm e, bi tenê qûm e. Qûmeke zer ku wan hîç nedîtiye. Qûmeke germ ê qijqijikî ku wan bi tenê di çîrokan de bihîstine. Çoleke bêdawîn li ber wan leyлан dide. Ne ax, hêsinahî, zevî, bax, bexçe, bostan, ne jî dar, devî, reh û rêç. Ne gol, çem, rûbar, lehî, co, lîç, kahnî û bîr, ne jî derya. Na, hîç tiştek, ji qûmê pê ve, hîç tiştek nîn e; ev hemû tiştên ku ew pê re, tê de hatine dinê, mezin bûne, nîn in. Ev hemû, li welatê wan mane. Siya kelehêن kevnare ku li gopikên zinaran û li ber devê çeman lê-bûbûn, dahlde û stariya zivîng û şikeftên wan ên di kûrahiyên newal û gelîyan de, hûnikahiya zozanê wan ên bilind ên hêşin ku bi konêwan ên teş dineqîşîn, hu-zûra ziyaretgahêwan ên dînî ku ji hezaran salan mabûn, ferehiya pirêwan ên tarîxî ku li ser ava çem û lehiyan, riyênen welatê bêbihur bi hev ve digîhandin, li dûr, pir dûr mane. Ruh û canêwan, jiyana wan li welatê wan maye. Ew hatine welatê çol û qûmê. Ew niha fahm dikin; ew sirgûnî welatê boş ê windabûnê bûne, -da ku tê de winda bibin. Naxwe, ev welatê ku bi tenê ji qûmê hatiye pê, ev germahiya ku ne tenê laş û beden, ruh û mëjjî jî dikizirîne, ev ronahiya ku ne mîna ronahiya wan e û bi tîrêjên xwe hîs û hestê merivan dikuje, dê bibe welatê wan ê nû, bibe welatê wan ê tenêtî, hilweşin û windabûnê. Ew niha têdigihê; ev welatê bêdeng, bêav, bêşî, bêdahilde, bêjiyan ê bibe welatê wan ê mirinê. Ji kû heta kû! Ji bakûr heta vê derê, dawiya Welatê Fireh, dawiya dinyayê û jiyanê!

Çare? Çare nîn e. Ew, welê, hin li ser qûmê, hin li piyan, bi sedan kes, li welatê bêdawîn ê qûmê dinihêrin. Bayekî sivik ê başûr li rûyê wan ê matbûyî dixe. Lê ba jî, ne bayê wan e; germ e, nefesa wan diçikîne. Germahî, germahiya tav, ronahî, qûm û bayê wan dişewitîne, bedena wan, dilê wan dikizirîne, xwîna wan dikelîne û hêz û taqeta wan a dawîn, tafilê, ji wan dibe. Hin jin û pîrejinên wan, li ser qûma şewitî, li ser çogan rûniştî, şasbûyî, beden û stû xwîdandayî, rû terikî, lêv qelişî, westiyayî, tî, birçî, digirîn û bi zimanê xwe, bi dengekî zîz ê şînan, dînehwîrinin, "Çima? Gidiyê qedera bingorî çîma?... Ma mirin ne ji vê çêtir bû? Ma me bi saxî bixistina gora sar a welatê zozanen, ne ji vê gora germ baştit bû?..."

Ne însan û mehlûqek, ne jî teyr û tilûrek. Ji esker û zabîtan pê ve tu tiştek, ne li esman ne li ser zemîn naxuye. Esker û zabit wan, dîsan, qor bi qor, dikin rêz, peyati, ji ıstasyona dawîn a xirbe a trênen bi dûr dixînin. Di wê germahiya dûjehê de, piştî bîskekê, li pey girekî ku ji xîzê hatiye pê, çend darênu ku rêvingan di jiyana xwe nedîtine û baraqe dixuyin. Baraqeyek, dudo, pênc, deh, bihîst, pênce, sed... Û esker, eger ne bi qasî qûmê be jî esker, li pêşî, paşî, der û dorêna baraqe yê textîn di xuyin. Ev baraqe, malên wan ên nû ne. Ew ê li vir, di nav qûma mirî, welatê mirî de, bijîn. Lî belê di destpêka jiyana mirî de, jiyaneke nû ya zindî heye; yek ji lehen-gêna romana me. Bi dû hijmartin, teslîmkirin û cîwarbûna koçeran re, dotira rojê, piştî seqema şeva çolê û berî germahiya rojê, berbangê, gava Baz û zabîtan din ji baraqeyen zabîtan derdikevin da ku bikevin rê û vegeerin, Baz li ber deriyê biçükê û baraqeyekê wî zilamê simbelzirav ê awiqat dibîne. Awiqat silavê dide Baz. Baz silavê lê vedigerîne, ji koma zabîtan hinekî vediqete û ber bi awiqat tê. Bêyî ku tu awirekî diyar li ser rûyê wî bixuye, Baz halê awiqat û jina wî dipirse. "Xew neketiye çavê me û xismîn me... zarokeke me hate dinê", awiqat, bi rûkenî, dibêje, "ji rehma xwedê hêvî nayê birîn, meriv nizane ci li ser riya meriv e... keçikeke me hate dinê..." Baz ci bibêje? Bi tenê li ser bîbikên çavê wî çîrûskeke kêfxweşiyê, Baz serê xwe li ba dike. "Fermo, were hundir" awiqat, bêyî ku li benda bersivekê be, dibêje û xwe dide ali da ku Baz bikeve hundir. Hundirê baraqê ku ji mitbax û odayeke biçük hatiye pê, ronî ye. Jina awiqat li ser textê ku li koşê ye, dirêj bûye û şîr dide zaroka nûbûyî. Gava çavê wê bi Baz dikeve, ew xwe û dergûşa xwe ber bi aliyê din dike da ku Baz pêşîren wê nebîne. Awiqat dere ba wê, zarokê, bi hêdîka, jê werdi-gire, tîne û nîşanî Baz dide.

Baz li zaroka hembêza bavê, heyirî û hinekî şasbûyî, dinihêre; zarokek, pariyek can... çavên wê yên biçük hê baş venebûne, rûyê biçük ê gulover ronî dike, difn mîna difnîn kewroşka dilerizin, destên wê yên biçük dilivin, tilî û pêçiyêne wê dilîzin, bîhneke germ, tirşokî ya taybetî ku Baz hîç lê rast nehatiye, jê difûre. Baz tiliya xwe ya mezin a destê rastê ber bi destê wê dike. Zarok pihêt bi tiliyê digire û dixe nava destê xwe yê çepê ku di bazindê de şahnikeke biçük a reş dixuye.


Belê, ev zarok, Kevok e.

Belê, serpêhatiya Kevokê weha dest pê dike. □

Ev beşa 3. ya romana M. Uzun Ronî mîna evînê tarî mîna mirinê ye. Di hejmara Nûdemê ya 20'an de jî beşa 1. derketibû. Ew ê di hejmara 23 û 24'an de jî beşen 4 û 5'an bêne weşandin.

Marks û Manîfesto

ŞEREFXAN CİZİRİ



Manîfesto ya Kominîst navê pirtûkek Marks û Engels e. Manîfesto pirtûkek pirr biçûk e lê belê pirr jî bi nav û deng e. Manîfesto, di nav xebata Marks û Engels ya entellektuelî de, dikare weke pelek ji pirtûkeke mezin were dîtin. Dema ku Manîfesto hate nîvîsandin, tekoşîna politîk li hemû welatên Ewrupa gelek xurt bû. Li pirr welatan tevgera şoressgerî li deriyê burjuvazî dixist. Burjuvazî jî dî oda xwe ya germ de ji serma diricifîn!..

Ji pirr aliyan de Ewrûpa di guhertinêng bingehîn re derbas dibû. Rûwê civatê roj bi roj dihat guherandin. Di pirr beşen civatê de kapitalîzm hakimiyeta xwe datanî. Hemû tiştên ku ji aliyê civatî de girîngiya xwe hebûn, li gora danûstandinêng kapitalîstî dihat guherandin. Ekonomî kapitalist bû, armanca berhemê qezenc bû û ev jî, bi taybeti ji bo bazarê weke mal dihat çêkirin. Di bin van danûstandinêng bingehîn de du çînên mezin kristalîze bûbûn; proletarya û burjuvazî. Ev her dû çînên sosyal, ji bo desthilatdariya ekonomî û politîk li himberî hevdû tekoşîneke germ diajotin.

Tevgera çîna karker xwe li hemû Ewrûpayê organîze kir û komela xwe ya navnetewî ava kir. Bi navê Enternasyonala Karkeran tevgera çîna zahmetkêş xwe bi çek û rêxistin kir. Parola Enternasyonala Karkeran "Karkerên hemû welatan bibin yek" bû simbol ji bo tekoşîna sosyalîzmê. Di vir de tiştê herî girîng ev bû; "Karkerên hemû welata bi yek bin" gotina herî dawî ya Manîfesto ya

komünîst jî bû. Ev rastî nîşanî mirovan dide ku li ba Marks û Engels xebata zanyarî û polîtikî diviyabû bi hev re bimeşîyan. Manifestoya komünîst di rastiya xwe de weke programa Internasyonala Karkeran dihat pejirandin. Ji xwe Manifesto jî weke xeba-teke kolektif dihat dîtin. Manifesto berjewendî û ideoolojiya çîna zahmetkêş dianî ziman. Aliyê Manifesto yê zanyarî û aliyê wê yê polîtik hebû. Ji aliyê polîtik de Manifesto bang çîna karkeran dikir ku xwe organîze bike û tekoşînê bide. Ji aliyê zanyariyê de jî Manifesto, materyalîzma dîrokî li dema xwe û li dîroka kevnare diceriband. Li gora Manifesto Burjuvazî di dema pêşketina kapitalizmê de, rolekî pêşverû dîlize. Burjuvazî di civatê de pirr tiştên nuh û hêja pêk tîne. Ji aliyê ekonomî de bazar dibe faktoreke polîtik ya mezîn û girîng. Burjuvaziya nûjen ji bo azadiya bazırganiyê kar dikir, hewl dida ku komînîkasyon û hêzên berhem pêşxîne. Bi çewsandina bazara cîhanê, îmkanîn pirr wela-tan çêdibû ku berhem û konsumsiyonâ xwe zêde bike. Bi alîkariya burjuvazî bazara cîhanê dest pê dike ku formekî kozmopolit bigre. Globalîzekiri-



na kapitalizmê bi xwe re pirr netewan û wela-tan dixe tevgerê û cîha-nê hîn bêtir nêzikî hevdu dike. Bi başkirina teknîkê re, mirov dikarin ji aliyekî de xebata xwe bibertir û wextê karê xwe jî kurttir bi-kin.

Bi pêşketina kapita-lizmê re, pirr danûstan-dinê sosyal, feodal û kevnare, danûstandinê malbatî û pederşahî, exlaq û danûstan-dinê mirovayî ji hevdu hatine qet-tandin û perçekirin. Di navbera mirovan de formen nû hatine afirandin, li şûna dezgehê kollektif û feodal, dezge-hêن kesayetî û burjuvazî hatiye rûniş-tandin. Qayısa ku di navbra hêza kapitalîst de li dar ketiye, ji bo pirr mirovan feqîrî û hejartî afirandiye. Pirr kesen xwedî meslek weke textor, hi-qûqzan, zanyar, teknîsyen, nivîskar û wh. bûne karmend ji bo burjuvazî. Kesen senetkar bûne bê qîmet û qapaniya wan ya bi sedsalan jî hatiye wûndakirin. Armanca hemû tevgerên ekonomî bûye zêdekirina qezencê. Ji bo vê armancê hinek azadiyên nû pêde bûne. Kesen karker ji aliyekî de "azad" bûye, lê belê divê karker hêza xwe ya kar karibe li bazarê bifiroşe. Karker bi kapitalizmê re bûne xwefi-

roş. Hêza kar bûye weke malekî normal ku li bazara mirovatiyê dikare bê firotin. Danûstandinên kapitalistî mirov ji hevdû ûzole kirine û di civatê de dualîtî pêkanîne. Ev her du alî bûne dijminê hevdû. Li aliye karker û hêzên zahmetkêş bi feqirtî, hejartî, birçûbûn û çewsandina xwe ve li miqabil hevdû sekinîne. Burjuvazî di qesr û koşkên xwe de ne û Kkarker ji di xanîkên xwe de dijîn. Jiyana sosyal ûzole kiriye. Tenê wexta kar ew herdû aliye mirovan dikarin hevdû bînîn.

Di Manifesto de hinek gotinên zanyarî û bingehîn hene, weke mînak; danûstandinên berhem û hêzên berhem. Hêzên berhemê kapasiteya teknikî ye, komînîkasyon û mekîne ne, kontrolkirina hêzên xwezayê ji, weke hêza berhemê têne hejmartin. Li aliye din ji axa ku ji bo çandiniyê tê amadekirin, keşifkirina elektrik û paqijkirina çeman ji bo trafikê û hemû aletên ku ji bo hêsankirina kar têne bikaranîn, weke hêzên berhemê têne pejîrandin.

Ji bo danûstandinên berhemê ji mirov dikare wiha bibêje; danûstandinên mirovî ku li ser hîmê mal ava dîbin û tesîrê li tevahiya civatê dikin. Ev mal dikare malê feodal be, dikare male komunal be, dikare malê burjuvazî be,

bi kurtî hemû danûstadinên ku li ser, danûstandinên mal ava dîbin, weke danûstandinên di navbera kapîtal û keda mirovan de, weke komkirina dewlemendî û kapîtal di destê hinek kesan de û hemû babetên tekoşîna çînayetî di rastiya xwe de weke hêzên berhemê têne danasandin. Bi alikariya van tiştên ku me li jor hejmartin ji burjuvazî di civata kapitalistî de, bandora xwe li ser bazarê, li ser febrîqa û bazirganiyê, ûhw datîne.

Wexta ku mirov bixwaze dîrok û civatê baş fêr bibe, divê hergav mirov van herdu gotinan li ber çavan bigire. Ev herdu gotin bingeha civatê pêktînin. Li ser vî bingehî formasyonên civatî pektîn û avaniya jorîn tê damezrandin. Di civata berî komunîstî de hêzên berhem û danûstandinên berhemî tesîr li hev dikirin û di navbera wan de hergav nakokî hebûn. Lê bi avakirina civata komunîstî re, nakokîya di navbera hêzên berhem û danûstandinên berhemî de dawiya wan tê. Di civata komunîstî de, li gora ku Marks dibêje; harmonî di navbera wan her du gotinan de çêdibe. Mirov bi xwe dikarin jiyana xwe organîze bikin û li ser wê biryar bidin. Heger mirov bixwaze vê bi awayekî din bibêje, ew dê wiha bê gotin; Mirovê bikaribin dîroka xwe bi awayekî hismendî û azadî biafirînin. Pêşketina civatê ew e ji welatê pêwistiya derbasî welatê aza-

diyê bibe. Bi civata komünîstî re ew ê pêşketin jî derbasî azadiyê bibe.

Civata kapitalistî û burjuvazî jî bi xwe re gelek tiştên nû anîbûn. Yek ji van ev bû; çîna serdest ku jê re digot burjuvazî bûbû xwediyê gelek dijmînên nû; Li aliyekî arîstokrat û kevneperest, li aliyekî tebeqa navîn û gundi ji ber hinek sebebêن civatî û sosyal bûbûn dijminê burjuvazî. Van grub û çînên sosyal, bi pêşketina kapitalizmê re gelek mal, milk, hebûn, heq û berjewendiyên xwe wûnda kiribûn. Gelek ji van bûbûn qurbanê kapitalizmê. Îmkanêن wan yêن bingehîn ji meydânê hatibûn takirin. Dewlemendên do, bi pêşketina civatê re bûbûn feqîrên iro...

Di eynî wextê de mirov dikare di civatê de hêzeke politîk yê nû jî bibîne. Ew çîna karker bûn, kesen bê milk û mal bûn, kesen ku hêza xwe ya kar di-firotin, kesen ku ji wan re te gotin; proletarya. Proletarya jî, weke hemû çîn û tebeqên din, ji bo berjewendiyên xwe ya ekonomik û sosyal li himberî burjuvazî tekoşin dide. Di nav hemû tebeqe û çînên sosyal ku me li vir hejmartin, ew e ku bi rastî şoreşger bû, tenê proletarya bû. Pirraniya xelkê dikete vê kategoriyê. Proletarya, di ey-nî wextê de daxwaz nedikir ku civateke ji çînê nû pêk bîne. Armance wan ew bû ku hemû çînan ji meydanê rakin û mercen çînayetiyê ji navê hilî-

nin. Li aliyê din mirov dikare bibêje ku, di nav çînên sosyal de ne tenê tekoşin lê belê hevkarî jî hebû. Pîr caran burjuvazî û arîstokratan, ji bo berjewendiyên çînî bi hev re kar dikirin. Bihevrekarkirin di navbera proletariat, gundî û burjuvaziya biçük de jî hebû. Hemû çîn û tebeqên sosyal li gora berjewendiyên xwe jî xwe re tifaq çedikirin. Pêşketina civatê, teknolojî û felsefa nû hergav dikarîbû, li gora konjuktura rojane tifaqêni nû pêk bînin. Ev rastî jî normekî polîtikayê bû.

Gelo Marks ji bo ci behsa pêşverûtiya burjuvazî dike?

Wexte ku mirov li pratîka burjuvazî meyeze bike, dikare pîr tiştên nû û pêşketî derbikevin miqabilî çavan. Burjuvazî bi rastî pîr guherandin kirin, weke guherandinê ekonomik, politîk û sosyal. Ji bo mirovatîyê îmkanêن nû peyda kirin. Her gav daxwaz kirin ku hêzên berhem nûjentir bikin. Teknik û zanyariyê pêşde bibin. Li himber feodalizmê û şahîtiyê tekoşin dan. Daxwaz kirin ku azadiya burjuvazî jî bo hemû kesan derbas bibe. Pêşveçûn û guherandin bû felsefa wan ya bingehîn. Ji ber vê yekê jî Marks behsa pêşverûtiya burjuvazî dikir û ew dipesinand.

Li aliyê din jî li hemberî vê pêşveçûnê, literatureke sosyalist pêk hatibû. Wan bawer dikirin ku sosyalizm wiha ye. Lê Marks jî, ji bo vê tevgera lîtera-

turî digot; kevneperek û paşverû! Ji ber ku wan daxwaz dikirin ku çerxa dîrokê bi paş de vegeŕin. Kî dibe bîla bibe, ew ê ku daxwaz bike ku çerxa dîroke bi paş de vegeŕine, rasterast di-be kevneperek. Ev tevgera kevneperek-i ku di bin navê "sosyalîzma feodal, sosyalîzma burjuvaziya biçûk, sosyalîzma 'rastî' an jî sosyalîzma burjuvazî" xwe organîze kiribû, daxwaz dikirin ku civatê bi paş de vegeŕin. Wan daxwaz nedikirin ku bibin temsîla çîna karker. Polîtikaya wan ne zelal bû. Mirov dikare bibêje ku polîtikaya wan hergav di karakter û felsefa xwe de sosyalîzm, daxwaziya burjuvazî û romantîzma gûndiyân dicivand.

Baş e, çîma divê sosyalîst Marks û xebata wî biparêzin?

Marks di sala 1818'an de li Germanîstanê li bajarê Trier hate cîhanê û di 1838'an de jî li İnglîzstanê mir. Di dema ku Marks li jiyanê bû, hemû Ewropa serûbino bûbû. Marks bi xwe zaroke dema ronahiyê bû. Baweriya wî bi pêşerojê, bi aqil û bi zanyariyê di-hat. Marks tucarî bi çavê pêximbera li xwe meyze nedikir. Lê mixabin pirr kes û tevgeran xwestin Marks bikin weke pêximber. Netîca vê çewtiyê jî iro baş diyar e. Marks divê bi hemû awayî ji qonaxa pêximbertiyyê derkeve û bibe ilmzan. Divê Marksizm wek ilm bê pejirandin ya na ew ê Marksizm bibe weke dîn û dîndar jî weke

tê zanîn li pêximberan digerin.

Li ba Marks hîna jî tiştên pîr hêja hene. Yek ji van tiştên hêja jî teoriya Marks ya biyanîbûnê ye. Xebata Marks li ser biyanîbûnê wek pirtûk di 1932'an de hate çap kirin. Cara pêşî li Sovyetê di bin navê Manuskrîpta Ekonomî û Felsefi de ev pirtûk hate weşandin. Dengê vê xebatê li Sovyetê, weke tê zanîn zû hate birin. Ji ber ku bi alkarîya vê xebatê, sistema Stalinîst dihate rexnekirin. Li ser vê xebatê pîr gotûbêj hatin kirin. Pişti vê gotûbêjê mirovan dest pê kirin behsa Marksê xort û Marksê gihiştî kirin. Lê di rastiya xwe de Marks, hey Marks bû, çi xort û çi gihiştî. Hîn jî ev gotûbêja kûr û pirralî berdewam e.

Li aliyê din, dîtinê Marks li ser kapital û keda mirovan iro jî bi hemû awayan rê nîşanî mirovan didin. Sosyalîzm weke teorî û praktika xelasbûnê, iro bûye pêwistîyeke sosyal. Dewlemendîya cîhanê divê di nav hemû gelan de bi awayekî adil bê parvekirin. Ji bo azadkirina mirovatiyê jî şer, barbarî ye, ji çewsandina mirovan bi des-tê mirovan, dîsa sosyalîzm û îdeolojiya Marks pêwistiyek e.

Ji aliyê ilmî de Marks dîsa xwedî go-tin e. Materyalîzma dîrokî û modela şere çînayeti iro jî teoriyek û metode-ke di cih de ye. Tu dîrokzanê modern û biaqil iro nikarin bêjin ku dîrok û qeder wek hev in. Yê ku dîrokê dixe

tevgerê ne xwedê û ne ji maneviyat e. Herkes dizane ku mercen maddi û berhemâ ku di civatê de tê afirandin, dibe bingeh ji bo pêşveçûna dîrokê. Weke tê zanîn danûstandin di navbera hêzên maddi û hêzên manevî de hene. Dîsa mirov dikare bibêje ku kultur û ideolojî roleke mezin di civatê de dilizin. Lî bingehê civatê ji berhem û mercen maddi pêk tê. Ev yek pirr eşkere ye. Di pirr aliyan de teorî û praktika Marks rast derket û ew ê ku digotin Marks miriye û nema paş de tê, bi rastî xapiyan. Rast e, Marks fizikî miribû lê belê teorî û ideolojiya wî di nav me de bû û riya rast nîşanî me dida.

Yek ji dîtina Marks ya helî girîng ji ev bû; kapitalizm hemû danûstandinê mirovî dikir danûstandinê peran. Pere diketin şûna hemû danûstandinê mirovî. Baş e, kes dikare iro bêje kapitalizm ne wiha ye!? Pere, di civata kapitalistî de ketiye şûna hemû cûre ideolojî, kultur û exlaq. Pere, di rastiya xwe de bûye ideolojî!

Li aliyê din Komonîzm hergav wek ideolojiyekê dihate nîşandan. Lî li gorra Marks Komonîzm tucara ne ideolojî bû. Komonîzm wek tevgerekê tenê berê wê bi pêş de bû. Ev tevgera berbipêşde diviyabû rewşa ku iro heye ji meydanê rakiriba. Ev yek li ba Marks pirr eşkere ye. Wexta ku Marks behsa civata sosyalistî û komünistî di-

ke, bêtirîn wek taslak pirs tê meydanê. Sosyalizm gelek caran li ba Marks wek utopya tê dîtin. Ez nabêjim utopik lê belê utopya. Yanî tiştekî ku li pêsiya mirova ye û dikare tişten baş di xwe de kom bike.

Ji bo ku civata sosyalist karibe tişte baş bike, divê berf pirr tiştan mercen maddi yên civatê baş bistewîne. An na ew ê avakirina sosyalizmê tije çewti, zehmetî û ecemîti be. Hata iro li şûna sosyalizmê wek tê zanîn Stalînîzm û diktatorî pêş ket. Sosyalizma ku diviyabû li ser hîmê civatek sivilayetî û kulturî ava bûbûya, militârîzm û dagirkerî bi pêş xist. Prensîbê enternasionalizmê ketin nav ligan û berjewendiyên dewletê di ser hemû tiştan re hatibûn girtin...

Di dema şoreşa oktoberê de, bavê Marksîzma Rûsî û mameste Lenin, Georgi Plechanov wiha digot: "Heger ev dîtinê çewt bêne serî, ewê gotina sosyalizmê heta sedsalî krediya xwe winda bike".

Ji ber vê yekê ji ez dibêjim; Ji bo Marksîzmeke ilmî û sosyalizmeke mirovî divê em dîsa li Marks vejerin! □

Delal: "Musîk ji bo min jiyan e"

Delal di sala 1961'ê de li Stenbolê hatiye dinyayê. Wê digel xwendina konser-vatuarê kosmetologî jî xwendiye. Heta niha çar kasetên wê û LP'yeke wê derketiye. Ji bili xebatên wê yên çapkirî, ew beşdarî gelek şevêne kultûri, pîrozkiri-nêne newrozan û şahiyên kurdan û biyaniyan bûye. Herweha me dengê wê ji rádio û televizyonan jî bihîstiye. Delal niha li Swêdê dijî û xebata xwe ya hunermen-dî li Swêdê û li derveyî sînorêni Swêdê didomîne. Em li Delalê bûne mîvan û me ji bo xwendevanê Nûdemê pê re sohbetek kir:

Nûdem- *Em dizanin ku tu li Stenbolê çêbûyi. Bi gelempêri muzîkê kengî bala te kişand û te kengî dest bi çekirina muzîka kurdî kir?*

Delal- Belê, ez li Stenbolê hatim dinê û li wir jî mezin bûm. Di zaroktiya min de li mala me, li gel radyoya Êrivanê, stranên tirkî yên gelêrî jî dihatin guhda-rîkirin. Lê ji ber ku cîranêni me, hevalêni me û ew kesêni ku li der û dora me rû-diniştin hemû tirk bûn, atmosfera kur-dî tenê bi hundirê mala me ve sînorkirî bû. Înteresa min a musîkê wek perçeyek ji hebûna min bû û di xwîna min

de hebû. Li gor gotinêni diya min û xwişka min a mezin, dema ku ez du-sê salî bûme, gramafona di mala me de her weki, yek ji leyistikêni min bûye. Min bi awazeke bilind sibê hera êvarê strana "kara tren gelmez ola" û "kizil-ciklalar oldu mu" gotiye.

Dûra bi pêşteçûyîna teknîkê pîqab derketin û şûna gramafonê girtin. Di gel plaqêni din, plaqêni Eyşe Şan ên kur-dî ku di mala me de dihatin guhda-rîkirinê, hê weki do di bîra min de ne. Min pir ji dengê wê hez dikir. Ji ber vê yekê, di kaseta min a pêşîn de, min strana wê

ya "Cemile" xwendibû. Ez bi xebera mirina wê ve pir xemgîn bûm.

Dema ku meyla min a li ser musikê ber bi çav bûbû û her diçû zêdetir di-bû, him li malê ji aliye dê û baye min, him ji li dibistanê ji mamostayê xwe, ez dihatim teşwîq kirin. Min di yanz-deh saliya xwe de dest bi xwendina xwe ya konservatuvarê ya musikê kir. Ji wê demê pê de êdî musik bûbû perçek ji ji-yana min. Her çiqas di wan deman da ïnteresa min li ser musika kurdi hebû ji, perwerdekirina min a musikê bi zimanê tirkî û bi stranê tirkî bû. Piştî bi ser-wextbûyîna şexsiyeta (identiteta) kurdi, min biryar da ku ez bi tenê musika kurdi çêbikim. Lê belê ew imkan cara ewilê li dervayî welêt bi destê min ket.

— *Te kengî biryara xwe da ku tu muzikê ji xwe re bikî mîna kar?*

— Li gorî dîtina min ji bo piraniya ew kesên stranbêj an ji musikvan in, mijûl-bûyina musikê proseseke wisa ye ku, ji hebûnê (an ji çêbûnê) hetanî mirinê dom dike. Ev tişt di rojekê de nabe. Ji serî heta dawiyê di xwîna merivan de heye. Ji ber vê yekê ji wexta em li hin stranbêjên bi nav û deng dînihêrin, doktorî ji xwendibin, mîmarî ji xwendibin, dîsa ew li musikê vedigerin û destê wan ji jiyana musikê nabe. Biryardayîna min ya xebata musikê ji wisa bû. Yanî di nava rojekê de an ji piştî merhalekê min biryar neda. Ji piçûktiya min pê de wekî tiştakî tabî bû û her wisa form da

jiyana min û bû karê min ê eslî.

— *Çekirina stranekê ji bo te demeke çiqas dirêj digire?*

— Ev yek li gor kapasîta şexsan û li gor mekan û deman û li gor ruhiyeta meriv tê guhartin. Kesek carna di nava nîv saetê de carna ji di nava mehekê de dikare stranekê biafirîne. Ez nikarim behsa tu pîvanekê bikim.

— *Gava tu muzikê çedikî tu li ku û bi ci awayî dixebeitî?*

— Ez xebata xwe ya musikê, ji der xebatêni li studyoyê, li malê çedikim. Berê li malê bi sazê dixebeitim, ev demeke ku ez bi piyanoyê kar dikim.

— *Tu cara pêşî li ku û bi ci awayî derketî ser sehneyê? Ji bo te hîseke çawan bû?*

— Dema ku ez heşt salî bûm, cara pêşîn li dibistanê di musamerekê de derketim sahnê. Ji ber ku ew mîvanenê ku dihatin mala me, her tim ji min stran daxwaz dikirin û min daxwaza wan bi cih dianî, stranbêjî ji bo min tiştakî tabî bû û ez hîn bûbûm. Dibe ku ji ber vê sedemê ew serpêhatiya min ya ewilê li ser derketina sehnê, hîs û tesîreke taybetî li ser min nehiştibe. Lê ew tiştê ku tê bîra min, derketina sehnê zêdetirin hisseke ciddiyet û berpirsiyari bi xwe re anîbû.

— *Bi pêşketina tevgera kurdi re, her ku çû muzika kurdi bû muzikeke politîk, ew ji estetika muzikê bi dûr ket û bû muzikeke sloganî. Di eyînî wextê de hûnermendên kurd li ser sehneyan ne mîna*



muzîkkaran lê belê ew mîna şerkeran xu-ya bûn. Em dizanin ku tu ji bo sehneyê xweş li xwe dikî, tu dikarî ji aliyê nave-rok û sekil de hebekî gala muzîka xwe biki?

– Meseleya polîtîzebûyîna musîka kurdî xusûsiyetekê ku, ne tenê xasê kurda ye. Her neteweke ku şerê azadiyê di-de, di nav proseseke wisa de derbas di-be. Ji ber rewşa kurd û Kurdistanê ya taybetî ya siyastî, zimanê me û stranên me heta roja îroyîn, ji nav qeyd û ben-dan derneketiye. Dema ku hereketa netewî ges dibe û pêş de diçê, pir normal e ku di qada musikê de jî polîtîzebuyn çêbibe. Ez, ji ber vê yekê, polîtîzebûyîna stranan jî, wek yek ji wan metodên şerê li dijî kolonyalîzmê dibînim û herwekî hurmetê nîşan didim. Lê belê li gel vê yekê kêmasiyeke din jî heye ku divê bê krîtîzekirinê. Dema ku stranên polîtîk wekî berhemên fabrîkasyonî, bi nave-rok û stîlên wekî hev tev bi qaydekî têngotin, tema wan namîne û meriv di demeke kurt de jî wan têr dibe.

Ez bi tevayî stranên klasîk û gelêri di-bêjim. Wek prensîb naveroka stranan naguhîrînim, lê wekî hûn jî dizanin her stranbêjek li gor xwe xwedî stîl û qayde-kê ye, xwedî şiroveyekê ye. Ez bêî ku ferqê têxim nav, ji çar perçen Kurdistanê, ew stranên ku diecibînim û dixwa-zim bistirêm, ez wan hildibîjêrim û distirêm. Armanca min ew e ku, di jî-yandina musîka kurdî de, piçûk be jî,

heta ji destê min bê ez jî xwedî par bi-bim. Ji ber sedemên wê zorbetiya ku ji aliyê dijmin de, li dijî zimanê me, li dijî stranên me û bi tevayî li dijî kultura me tê kirin, xwedî derketina musîka me û pêştebirina wê, bi serê xwe dibe helwes-teke polîtîk.

– *Her ku dem derbas dibe, ji bo te çê-kirina muzîkê û derketina ser sehneyê zehmettir dibe an jî hêsanfir dibe?*

– Ew şert û imkanên ku ez di nav de dijîm, ji bo xebata min a musikê berê jî dijwar bû tro jî dijwar e. Hûn hemû dizanin ku ez bi imkanên xwe yên şexsî kar dikim.

– *Tu bi xwe li muzîkeke çawan guh-darî dikî? Hunermendên ku tu jê hez dikî hene?*

– Ez li her celeb musikê guhdarî dikim. Ez heyrana hemû dengê xweş im. Ne hewcye ku ew dengê ku ez di-ecibînim dengê yekî/yeke bi nav û deng be. Wekî nîmûne dikarim bêjim ku, ji piçûktiya xwe û bi vir de ez heyrana dengê diya xwe me. Xên jî wê, di nav kesên bi nav û deng de, Ümmü Gülsüm, Whitney Houston û Sezen Aksu favoriyên min in.

– *Zimanê te yê serdest tirkî ye, lê tu bi kurmancî dipeyivî; digel vê tu piraniya stranên xwe bi kurdiya soranî distirê. Ci-ma?*

– Ez di van demên dawî de gelek caran ji aliyê kurdên bakûr de bûm mu-hatabê vê pirsê. Bi rastî ez li hemberê vê

pirsê pir ecêbmayî dimînim. Dema ku hin stranbêjên kurd radibin bi zimanê îngilizî distirêن ji kesî re xerîb nayê, lê dema kurdeke kurmanc bi zaravayê soranî bistirê balê dikşîne.

Wekî têzanîn ez bi xwe kurdê kurmanc im û malbata min ji hêla Mûşê çûye Stenbolê. Ji ber vê yekê jî di nav xebata min a heta iro de, çi kaset be, çi jî LP, giranî li ser zaravayê kurmancî bû. Lê di nava van xebatên min de, pir kêm be jî min cîh dabû devoka behdînanî û zaravayê soranî. Ev çend salêndawiyê, li gor îmkanêن xwe, ez di repertuara xwe de bi qasî kurmancî cîh didim stranêن soranî jî. Ev yek ji ber sedemêن curbecur in. Ji alîkî de ez naxwazim cudabûyin di nav du zaravayên kurdî yên mezin de bikim. Berpirsiyariya me hemû kurdan e, ku em herdu zaravayan biaxifin, stranan bêjin û wan nêzîkî hev bikin. Ji aliye din ve jî, wekî têzanîn di nava nuansêن kurmancî û soranî de ferqeke mezin heye. Xwendina stranan tenê bi jiberkirina tekstan ve nabe. Dema ku meriv stranên zaravayekî distirê, divê meriv bi nuansêن wan ve sadiq bimîne û li gor orijinalê bistirê. Ez li gor wan krîtikên ku pozitîv ji guhdarêن xwe dibîhisim, hereket dikim. Ger ji destê meriva bê û meriv bi ser bîkeve, çîma tenê bi zaravayekî bistirê û yê din îhmal bike? Xêن ji vê yekê, di nav hin stranbêjên ku zaravayê soranî diaxifin de, kêm be jî kesen ku bi kur-

mancî dibêjin hene.

Ji bo min serfirazî û serbilindiyekê mezin e ku ji çar aliyêن Kurdistanê insanêن me li dengê min guhdarî dikin.

— *Jiyana surgunê, hinek hunermendan dixwe, wan pûç dike, ji hinehan re jî riya unîversalê vedike. Ji bo te çawa ye?*

— Ji bo min ya girîng ew e ku divê meriv di şertêن dervayî welat de bikaribe xwe pêş de bibe, xwedî li şexsiyeta xwe ya kurdî û kultur û hunera kurdî derkeve û dev ji van xebatan bernede. Bi taybetî li welatêن Ewrupayê ger meriv xwedî prensîb nebe, dikare pir zû dejenerê bibe û dev ji her tiştî berde. Di baweriya min de em jin di vê meselê de ji mîran hassastir in û xwedîprensîb in.

Li gor dîtina min wek her şaxêن hunermendî, di xebata musikê de jî hin pîvanêن/krîterêن unîversalbûyinê hene. Unîversalbûyin bi xwe bêsinorbûyin e û sînorêن dewleta û netewan nas nake. Divê, fikrek an jî hunerek çiqas di nav kurdan de bê qebûlkirin, ewqasî jî, ji aliye dînyayê de bê naskirin û qebûlkirin ku bigihîje merhela unîversalbûnê. Iro wexta em mîze dikin "star" bûyin edî têra unîversalbûyinê nake. Bi pêşde-çûyina teknolojiyê û bi globalîzebûyina komunikasyonê, her roj superstarke nuh li seranserê dînyayê lanse dibe.

Pir mixabin, ji ber hin sedemêن berbicav, ew rewşa ku welatê me û gelê me iro di nav de ye, dikare bibe neynika rewşa me hunermend û hozanên kurd.



Delal: "Stranbêjîya kurdî ji bo min serbilindiyeke mezin e"

(Foto: Şîrvân Nûrây)

Bê dewleteke kurd, bê piştgiriyên dezgeh û muesseseyên pêwîst, tenê bi xebatên şexsi gîhîştina merhela unîversaliyê ji bo me wekî xewneke xweş dimîne. Dibe ku sibe-dusibe hunermendeke kurd derkeve û bi bingehêke baş lê bi zimanekî ewrupî xwe bide naskirin. Ew nayê wê manê ku hunera kurdî unîversal bûlye. Bê zimanê kurdî unîversalbûyîna ne nivîskarekî kurd, ne jî stranbêjekî kurd mumkun e. Em dikarin Yaşar Kemal wekî nîmûne bidin. Her çiqas jî ew bi xwe şexsiyetekî kurd e, lê belê ji ber ku bi zimanê tîrkî berhemên xwe dinivîse, ji aliyê cîhanê de wekî romanvanekî tîrk tê naskirin. Ji aliyê din ve rast e, hin hunermendên kurd piştî xebata gelek salan ber bi wendabûyînê de çûn û hatin jîbîrkirin. Lê ew ne sûc û

gunehê wan bû. Wekî min gava din jî got, bê muessesên kulturî û bê xebateke bi rîk û pêk liserpîyamayîn dijwar e. Em tev dizanin ku, karêñ kulturî û siyasî, du xebatêni ji hev cuda ne. Ev nayê wê manê ku, ew kesêñ ku bi xebata kulturî ve mijûl dîbin siyasetê nakin, an jî siyasetvan xwe ji xebata çandî bi dûr dixin. Ez dixwazim girîngiya ekspertbûyînê bînim zimên. Derna ku stranbêj, tenê bi şevêñ ku ji aliyê rêxistinêni siyasî yên kurd ve tên çêkirin ve girêdayî di-mînin, piştî demekê xebata wan tê xitimandin û dumahîk nayê. Ji me re, dezgehê rûniştî û piştgiriyên profesyoneli hewce ye. Bi siyaseta kulturî ya rojane ve em nikarin xwe pir pêşda bibin. Ew îmkanê bisînorkirî ku carna bi riya rêxistinêni kurd ên demokratik li Ewrupa

tên bidestxistin jî, pir mixabin, gelek caran di bin înisiyatîfa hin kesan de bi awayekî kêfi tê bikaranin û çarçûr dibe.

– *Muzîk jî bo te çi ıfade dike?*

– Ev sîh û sê sal in ez distirêm. Pir ta-bî ye ku müsîk ji bo min jiyanek e û jiyanê ıfade dike.

– *Ger tu nebûya hunermenda muzîkê te ê bixwesta tu bibî çi?*

– Dibe ku ji we re hinekî xerib bê, lê ez ji masigirtinê pir hez dikim. Masigirtin vê gavê ji bo min hobîyeke sereke ye. Ger ez nebûma hunermend, min ê hewl bida ku karê masigirtinê bi awayekî profesyonelî bînim cîh.

– *Gelo tu qet poşman büyî ku te bi kurdî strayî?*

– Ez stranbêjiya kurdî ji xwe re wekî wezîfekê ferz dikim. Ev panzdeh sal in ku ez stranen kurdî distirêm û heta ew roja ku deng û awaza min derkeve jî ez ê berdewam bikim. Bavê min li gorista-neke Stenbolê radizê û li ser kevirê wî, li ber navê wî kurd dinivîse. Kurdbûyîn û stranbêjiya kurdî, serbilindiyeye mezin e ji bo min. Poşmanbûyîn tu caran di mêjiyê min de derbas nebûye.

– *Reuşa müsîka kurdî ya iro çawa ye? Tu pêşeroja müsîka kurdî çawan dibinî?*

– Berî ku ez bersiva vê pirsê bidim, ez dixwazim kêfxweşîya xwe li hember wan hevalen ku müsîka kurdî çedikin û li gor îmkanen xwe yên bi sînorkirî hewl didin ku müsîka kurdî bijînin û pêş de bixin, bînim ziman û ji bo xeba-

ta wan a hêja sipasî wan bikim. Ji bo ku pêşeroja müsîka kurdî ne baş be tu se-bebê nabînim. Lî li gel vê yekê kembûna îmkanan heye. Ev jî girêdayî rastiya me ye. Pêşdeçûyîn û serketina müsîka kurdî girêdayî pêşdeçûyîn û serketina doza me û welatê me ye.

Di roja îtroyin de, wekî min berê ji anî ziman, ji her aliyan ve îmkanen me kêm in. Bingeh nîn e. Dezgeh an jî dibistanen ku dersa müsîkê didin tunene. Yek- du cihen ku hene jî, têrê nakin. Ji ber vê yekê jî, müsîkzan an jî stranbêjîn kurd yên otorîte zû bi zû peyda nabin. Ji aliyekevî ve ez dixwazim rastiyekê bînim ziman. Wekî her milleten paşdemayî di nav hin însanen me de jî, kompleksek heye. Hin kes kultura xwe û müsîka xwe nizim dibînin û bi riya müsîka welatên din ji xwe re pirestîj digerin. Ger ev meyl zêde bibe, wê ji bo nifşê nû bibe xetereke mezin. Riya jibîr-kirina müsîka kurdî û kultura kurdî ve-dike. Ji me re di vê merhalê de xwedî derketin û pêşdebirina hebûnen netewî divê, bê netewîbûyîn em nikarin navnetewî bibin.

Ji aliyê din ve dema ku em mîze di-kin, li gel kemasî û realita me ya îtroyin, xebat û gavê pir mezin jî dibînin. Televizyona kurdî jî yek ji wan gavê mezin e ku ji me re îmkanen mezin û perspektîven nû vedike. Gavê wisa jî nîşan dide ku ger em bixwazin em ê di her tiştî de bi ser bikevin. Ji bo vê yekê jî ez

dibêjim ku ji bo pesimîstbûyînê tu sebeb tuneye.

– *Têkiliya te bi edebiyatê re çawa ye? Tu ji kijan nivîskaran hez dikî?*

– Ez pir ji edebiyatê hez dikim. Ez bi piranî klasikan dixwînim. Çend nivîskarên ku ez jê hez dikim û dixwazim her tim bixwînim ev in; Solohov, Balzac û Jane Austen...

– *Gotina te ya dawî?...*

– Ez kovara NÜDEMê ji bo rewşen-bîrên kurdan û herweha ji bo xwendevanên kurdan mîna platformeke dostane û avahiyeke germ dibînim. Dema ku meriv Nûdemê vedike û dikeve nav cîhana wê, mirov germ dibe û dilgeş dibe. Hêviya min ew e ku, bi piştgiriya nivîskar û xwendevanan Nûdem herbijî. Daxwaza min ne bi tenê Nûdemek, lê bi hezaran Nûdem in. □

AGAHDARIYEK

Em ji der û doran dibihîzin ku gelek kurdan navê NÜDEMê li zarokên xwe yên keçik kirine. Niha, ji bo ku em van keçikên xwe ku hêviyên me yên pêşerojê ne xelar bikin, em dixwazin wan bêpere bikin aboneyên NÜDEMê.

Ji kerema xwe re kopyaya kesnama keçikên xwe digel adresa xwe ji me re bişînin. Hûn li kijan perçeyê welêt an ji li kijan devera cihanê bijîn, ferq nake, gava adresa we bigihîje me, em ê NÜDEMê bêpere ji we re bişînin û we bikin aboneyên NÜDEMê yên berdewam.



XEBAT ARIF

Bînîn

Ballinney tenyayî
le rûnakî nêw çawanit exwatewe u
xewinekanit le binarî dûdillî u tirs u gumana
becê dêlê.
Naûmêdît, gîrreke u
lenêw deste reşekanî birrwawe helleka,
sîmat le merg egiрet u bînayît eka be sûtû.
Dille şikênraweket lenêw azarekanî xoyda gîr egiрet u
tenyayîş ebête hawdemî rohî şikiste u nesirewtût.
Dest le jîyekanî naxit edey
rengî winbûnî xakêkî wêrane pêş çawanit daegirêt u
dengî helldêranî rewe esipêkî spît dête ber gwê.
Ebînît:
Minallêk egerrêtewe u
ebê be tinokê awî pîroz.
Daykêk le kollanî sillemîneweda win ebê.
Dest le jîyekanî naxit edeyt u
namobûn ekey be niştimanî tirs u

niştimanîş: gulldanêkî let lete u
kerrûy namobûnêkî ebedyî lê niştîwe.
Taray guman
beser rûxsarta helledey,
gullêkî sûr le qîjî reşî tenyayî
ekeytewe u sîmay xewine sewzekanitî
pê reng ekey.
Ebînît: çawêk le tarîkistanî xoyda
be dway bînînda egerrê u
kwêrbûn eka
be niştimanî xewbînîn.
Semayek leşit daegirê.
Dest bo jêyekanî naxit drêj ekey,
ne awazêkî şîrînit dête ber gwê u
ne nalleyek bo dwayîn car lenêw xoyda winit eka.
"Serit germe u
bitillekeş le dabezînêkî seyraye!!"

1995/10/5

Tarîkistan

Çirayekey destit hellke,
ta le minda xot bibînî u dabigîrsêy.

1996/2/20

Têkellbûn

Ke leşiman têkell yek ebê, lezet ebête baran u wa hest
ekem: xak bonî evînî lê dê, agir bedem jiyanewe
pêkenê u ba ebêtewê be minall.
Awîş egirî.

1995/4/12

To

Bo: Sergull

Le tîrifey pêkenin u
daney mirwarî firmêskanit
tara bo bûkî rohim çê ekem
ta le sermay jîn
le girrey merg
dûrim xatewe

Miştê şinebay nêw pirçî xawit
lenêw qefezi dillda bend ekem
ta leser dundî naûmêdiya
be rûy jiyana hellimkatewe
destî lerzokî temenim
bigrê u
be nûrî eşiqit
ciwanim katewe

1996/1/9

Xemê û Xemgîn

Beş: 3

ŞEFİK KAYA

Li mîrgan çayır şîn bûbû, bihostekê kişiyabû. Hespên gund êdî ji tewlan hatîbûn berdan. Lê hê ji mehîna wan ya nûzayî di tewlê de bû, êm û ava wê diçû ber. Dinya germ bûbû, çayır bilindir bûbû. Bala xwe danê wisan nabe, mehînê berdane çolê, nav hespan. Gava cînarân li pey wê mehîna pîr cahniyekî wek karê xezalan dît, şaş man; çawan bûbû, ku hera wê rojê pê nehesiyabûn. Lê cahniyê li pey têr delal bû. Gava dîtin tev ji xwe re devvekirî man, ku wê mehîna pîr ew cahniyê delal ankiye.

Wext û dem derbas bûn. Tûran dîsan li gundan, li bertîlan digeriya, xûgî ji wan distend. Ew rojekê hate gundê ku mala Xemgîn lê bû. Dema Tûran Çawîş ew cahni di nav hespan de, li pey mehînê dît, gundî dane hev, ji wan pîrsî, got:

– Ev cahnî yê kî ye?

Yekî ji gundiyan bersiva wî da, got:

– Yê Xemgîno ye, Tûran qumandar.

Tûran weke hercar bi hêrs got:

Zû herin, gazî wî bikin, bila were vir!

Xortek bezî, çû xeberê da wî. Xemgîn da pey xortik, hatin cem Tûran. Lê wî ji şîklê gazîkirina Tûran dizanibû, ku ji bo wî ne xér e. Belê tu carî bîra ku dê Tûran rabe cahniyê jê bixwaze, nedibir. Wî di dilê xwe de got: "Tûran dê dîsan hêk û mirîşkan ji min bixwaze", lê texmîna Xemgîn rast derneket, Tûran cahniyê jê xwest. Ew û Tûran êdî nêzî hev bûn, rûbirû Xemgîn ji Tûran Çawîş pîrsî, got:

– Tu vê carê çi dixazî, Tûran Çawîş?

Tûran, ji xwe jê aciz bû, got:

– Li gorî salixdanê, ew cahniyê delal yê di nav hespan de, yê mehîna te ye? Ez li ser navê dewletê, wî cahniyî ji te dixwazim...! Hera çend rojên din bigire û ji min re bîne ber derê qereqolê! Heke tu neynî, ez dê bêm! Hûn bi hatina min dizanîn; ez mirîşkan li dîkan siwar dikim!

Gava bahsa cahnî bû, pirtînî ji dilê Xemgîn çû, dilê wî wek dahola aşiqan li ser hev lêxist, ji xwe re got: "Vî seyê han mehîna min ji kuştin xerabtir kir, niha jî doza cahniyê wê li min dike?". Bi hêrs, li nav çavên Tûran nihêrî û got:

– Tûran qumandar, tu dizanî cahnî hê piçûk e, ne yê siwarbûnê ye. Ev dewleta te çi dewllete e xwe dike hevalê wî heywanî, hûn jê çi dixwazin? Hûn ji min çi...

Lê Tûran nehişt, ku Xemgîn xeberdana xwe temam bike, gotinên wî di nêvî de hişt, got:

– Ez cahniyê dixwazim, dirêjkirina zêde ji te re ne baş e!

Di pey re, wî çend awirên bedbextî dane Xemgîn û ji wir bi aliyê rasta nav gund ve çû. Tûran li wir, li bin siya dareka tûyê rûnişt, xwe bi benikê potîna xwe ve lipikand. Di wê navekê de cendirmê jî çûbûn nava gund, li savar, nîsk, penîr, arvan hêk û xwarina hazır digeriyan. Parsa xw xistin têran, li hêstiran bar kirin. Mirışkan jî bi lingên wan ve, bi zênen hespên xwe ve daleqandin. Bi çêr, pêçariyên Tûran û qireteqirta mirışkan ji gund dûr bûn.

Tûran di pêşıya cendirmeyên xwe de, ji gund kişiyan, ji ber çavan wenda bûn. Xwedîyên hêstiran jî li pey qirteqirta mirışkan diçûn.

Çend mêt jî, li perrê bênderan civiyabûn, ji paş ve li wan dinihêrtin. Xemgîn jî di nav wan de bû, ji dûr ve li wan nihêrt, got:

– Diziya şevê hinek tê qebûl kirin, lê ya toj li nîvro? Ya van Romiya ne dizî ye, raste rast şêlandin û xûgî ye. Welleh şeytan dibibêje rojekê... Niha Tûran tenê be rehet e, lê ji vir heta paytextê dewleta wan dê Romî li ser vî yê ku nehêjaye navika pîvazekê, biqewimînin, tîrsa min ji wê ye. Welleh ew tenê be, bi min nikare, lê ez çi bikim, ez bêpişt im! Kifş e, ku ev Romî zahf ji axayên xwe ditirsin, bi ya mîrên xwe dikin, ji gotina giregirên xwe dernakevin. Hûn nabînin çawan pişta hev digirin? Ci cara ev ji gund bikişe, cendirmên wî li pey kaşerêz dibin, tu kes nakeve pêşıya wî, xuya ye ew jî nade pêşıya mezinên xwe. Lê em tev ji hev bela bela ne, riye ka tenê têra me nake, her yek ji me dide ser şiveriyekê. Na, na... Yek ji nav me rabe deh bi hev re bi tepan li nav serê wî dixînin, heta ku ew jî dîsan weke me dikeve. Ez dizanim ew bi pişt e, ka dê kî bê alîkariya min? Ma ne wisân e, lo? Lê xweziya ji xêra mala Xwedê re ez û Tûranî ji hev re li newala kuştıyan bikerana...

Bi hêrs destê xwe avîte kîsê titûnê ji ber pişta xwe derxist, çıxarekê jê pêça û ji wir dûr ket, ber bi malê ve çû.

Xemê li derive, li pawika Xemgîn bû. Bala xwe dayê, ku Xemgîn serê wî di ber de, dûyê çıxarê bi ser ketiye, ji wir ve hat. Wê di rêveçûna wî de fêm kir, ku tiştek qewimî ye. Wê dizanîbû gava ew serbazên Romiyan dibîne, kuştına kekê wî Silê-

man dikeve bîra wî, xwe wenda dike. Carekê, yekî Turk ji paş ve xencerek li nav qolincê kekê wî Silêman dabû, kete bîra wî... Ji hêrsan girîn ketibû qitrikê, diricîfî. Li Xemê nesekinî, derbas bû, çû li ser dika li ber derî rûnişt. Xemê dizanîbû, gava xemgîn hêrs dibe dikeve ber pêlên kîn û nefretê. Bayê kîn û nefretê ew da ber xwe, bi paş ve, ber bi sosretên ku ditiye ve bir. Ji ber vê yekê, sebebê hêrsa wî jê nepîrsî, çû li cem rûnişt. Qederek ma paşê pîrsî:

– Ew dîsan ci dixwaze?

Xemgîn bi hêrs got:

– Hermet, tu çîma nabêjî ew ci naxwaze? Her tiştî dixwaze mal, can, namûs... Devê ku Xwedê daye Tûran qefla xwe daye ser. Ez nedîwêrim bigirîm, ne jî diwêrim li ser halê xwe bilorînim! Mehînê birin, ji kuştin xerabtir kirin, niha dor hatiye cahniyê wê. Min li ser mehînê biqewimanda, mehînê neda wî, niha nedihat cahniyê wê jî min nedixwest.

Qê cahnî ne layiqê min e, layiqî Tûrano ye? Dinyayê tu xerabî, ez kurê mîr û began ew kurê... Mirov nizane ji kîjan kotromê hatiye!

Xemê şas ma, got:

– Hiş be, bi dengê bilind nebêje, dê hinek bibihîzin, herin ji Tûrano re bibêjin! Tu ci dozê li me dikî?

Xemgîn zahftir hêrs bû, got:

– De êdî kî diçe dibêje bila here, bibêje, cîhê gotinan êdî di zikê min de nemaye, ez ci bikim? Hema di kur de zirav e bila di wir de biqete! Ma ez nizanim, ku kûçikênen dostêr guran di gund de hene? Welleh şeytan dibêje rojekê...

Xemê dudilî bû. Ew hem li ber cahniyê diket û hem jî li ser rewşa malxuyê xwe difikiri. Heke Xemgîn cahniyê nede, dê Tûran ci bîne serê wî? Ew difikiri, lê hêviya wê di dewla Tûran Çawîş de dakete binê bîreka kûr û tarî. Paşê ji Xemgîn pîrsî, got:

– Xemgîn, ma tu dê cahnî bidî wî?

Xemgîn lê zivirî, got:

– Min gotiye: Ez bi benê qirika xwe razî me, lê bi dana cahniyê na! Heke min mehînê bi reherî neda wî, dê niha nehata cahnî jî min nexwesta.

Bi hêrs hilîm li çıxara nûpêçayî xist. cigare li ser çıxarê kişand, cigare di nav diranên xwe de şidand heta ku diranên wî li ser hev sekînîn. Dinya lê teng bû, bala xwe dayê, ku ji nişka ve qêrînek ji Xemê çû. Ew di cîhê xwe de şemîrî. Hêrsa wî daket, tirs û xofeka giran weka tavanê teyrokê xwe berda ser rihe wî. Qêrîneka wişan ji Xemê diçû weke yeka ku birûsk lê bikeve. Xemgîn ha dît, ku Xemê terayî er-

dê bû. Destê xwe bi aliyê Xemgîn ve dirêj kir, alîkarî jê xwest, got:

– Xemgîno, malik neşewityo! Zû... Zû here pey Pîra Sêvê! Li taxa jorîn, li bal mala kekê min Çelebî ye.

Xemgîn xwe şas kir, nizanîbû ci bikira, ci bigota, lew cara yekem bû, ku diçû pey

pîrikê. Wî bi ya ber-maliya xwe kir, rabû bi lez ber bi taxa jorîn ve çû.

Pîra Sêvê zendik girêdabûn, li ber tendifrê nan dipijand. Ew hê ji dûr ve bi bînfişka ku bi ser Xemgîn ketibû, hesiya, şik bir, ku hewalekî Xemê heye. Ji dûr ve bang li Xemgîn kir, got:

– Xêr e, birê min? Ev ci bînfişk e bi ser te ketiye?

Xemgîn bi kelogirî bersiva wê da, got:

– Pîra Sêvê... Pîra Sêvê, Xemê...

Pîra Sêvê, fêm kir, ku Xemgîn hatiye pey wê, zêde dirêj ne-kir. Deng li bûkeka cînaran kir, ew anî ser tendûrê, zendikên xwe derxist, dayê û

da ber kîleka Xemgîn ber bi taxa xwarîn ve çûn. Xemê êdi ji qam û qidûm ketibû. Xwîdana sar dilop dilop ji eniya wê berjêr dibû, li ser dawa fistanê wê diket. Tîrs û lerzê ew girtibû. Dêmên wê bûbûn wek berfemotka nîvê havînê. Aliyekî rûyê wê



sor, aliyê din jî qerisî bû. Tirsê di dilê wê de hêlin çêkiribû. Kêf û tirs bi hev re, di dilê wê de, dîlanê digirtin, lew bi salan bû, ku ew li benda rojeka wisan bi hêvî bû.

Di demeka kurt de nava malê ji jinên cînar tije bû, li ber derî, ji zarûkan dîware-kî bi ruh hat lêkîrin, li jinan kom bûn. Xemgîn jî wê rojê yek ji wan bû, ew jî mîna wan li ber derî, li benda mîzgîna nûhatiyek bû. Ji bêsebrî her qasê carek serê xwe dixiste nava derê navmalê, dînihîrt û li halê Xemê dipirsî. Lê bala xwe dayê wisan nabe, pêl benda şermê kir, çû navmalê, wê odeya ku Xemê lê bû. Pîra Sêvê hêdî jê re got:

– Birê min, tu halê vê jarê dibînî, tu li derive bî, baştir e.

Di pey wan gotinan re, Xemgîn bi paş ve vege riya dîsan hate nav zarûkan. Xemgîn û yên cem wî bi kêf bûn. Li bendê bûn, ku jinek derkeve û mîzgînê bide wan, bibêje: "Zarûkino, va hevalek din jî li we zêde bû!"

Lê ew qederek bû ew li pawika yekê bûn.

Xemê eziyetekî giran kişand. Xemgîn di eziyetkişandinê de pê re bû. Ew di nav koma zarûkan de rûniştibû, cigare li ser çixarê dikişand û çavên wî li derî bûn, ka dê xebera xêrê kengê bê. Ew wisan di mitalan de, bala xwe dayê, ku çend xortik ji taxa jorîn ve bi bazdan ber bi wî ve hatin. Yekî ji wan got:

– Apê Xemgîn, Tûran Çawîş bi qefleyek serbazên xwe ve dîsan hatiye, pirsa te dike.

Gava zarûkên ber derî hatina cendirmanbihîstin, li hev çûn- hatn, çavê wan lê bû, ku keys li wan bînin, dîlên hespêñ wan bîqusûnîn da zivistanê ji xwe re bikine dafik, kew û kevokan pê bigirin. Ci cara Tûran bi serbazên xwe ve bihata gund, keysa zarûkan li wan dihat, ji bo zivistanê bijî peyda dikirin. Çavên wan lê bû, ku cendirme hespêñ xwe bi darêñ tûyan ve girê bidin, herin li odayê danışın, da ji wan re firset derbîkeve. Wan jî bi wî awayî toleya hêk û mirîşkên xwe ji cendirme- yêñ Romiyan hildidan.

Ew moleta ku Tûran Çawîş dabû Xemgîn xelas bûbû, wext bi ser ketibû. Tûran hatibû cahniyê. Xemgîn şaş mabû, nizanîbû çi bikira. Hêdî ji nav zarûkan rabû, bi aliyê malê ve çû, li wir di quncikekî tarî de rûnişt; xwe ji ber Tûran veşart. Di wî quncikê tarî de, eniya xwe danî ser çogêñ xwe û fikirî, lê rê ji rê dernexist. Hemû rê û dirb lê hatibûn girtin. Careka din fikirî, ku rabe derbekê li Tûran Çawîş bixe dê tu kes li ser wî neqewimîne, piştgiriya wî neke. Li aliyekî rewşa Xemê, li aliyê din jî Tûran Çawîş û cahnikê wî yê ber şîr...

Hêrsê ew girt, xwîdaneke cemidî di eniyê de avît, hêşir ji çavên wî bariyan. Hêz da xwe ji quncikê tarî derket, ji xwe re got: "Ez bi revê û bi veşartina di quncikê

tarî de, ji destê Tûrano xelas nabim". Ber bi odayê çû, li Xemê nihêri. Dilê wî bi halê wê şewitî. Xemê dirêjkirî, nalenala wê bû. Jinên li bal wê, ji halê wê re digiriyan û jê re dua dikirin. Xemgîn xwe hazir kir, ku bi alî Tûran ve here, lê bala xwe dayê, ku Tûran bi serbazên xwe ve hat ber derî û qêrîn lê kir. Yekê got:

– Xemgîn, Tûrano dîsan hatiye ber derê te.

Lê guhêñ Xemgîn li ser girfna zarûkek piçûk hatibûn tapêl kirin. Tu tiştêñ din nedibihîstin. Bala wî li ser nalînêñ Xemê ku ji odayê dihatine derva, bû. Wî ew guhdarî dikir û pê re sitêrk dibarandin.

Taqet pê re nema, vege riya dîsan çû navmalê, li halê Xemê nihêrt. Nalînêñ Xemê tu hiş di serê wî de nehiştibû û dawiya sebra Tûran hatibû.

Gava Tûran Çawîş dît, ku wa Xemgîn derbasî odayê bû, ew jî li pey wî kete odayê. Şeşderba wî di dest de, rahişte sitûkura Xemgîn û ew ji odayê kişkişande derva. Diranêñ xwe lê sîqirand û ew da ber sersiman; xwe zeft nekir, li bal jinan ji Xemgîn re dijûn kirin. Kef bi ser devê wî keribû, bûbû mîna segê har. Dilê wî bi çêr û pêçariyan jî rehet nebû, rabû li wir ew da ber qamçıyan... Xemgînê jar ji xwe kal, bêtaqet bû û ketibû heyra Xemê, bi qamçıyan re li erdê dirêj bû. Jineke navsere ji berdevkiyê Tûran re got:

– Tu ji vî re bibêje: "Jina Xemgîn ketiye ber zarûya, divê ew li malê be".

Mêrik xwest van gotinan jê re bibêje, lê Tûran dengê wî nebir xwe û xwest çend qamçıyên din jî daweşîne Xemgîn. Jinikê hew xwe zevt kir, dada pêşîra Tûran û ew da ber şemaqan... Paşê rahişte milê Xemgîn, ku wî ji nav lepêñ Tûran xelas bi-ke. Tûran dev ji Xemgîn berda, bi qamçî çû jinikê. Wê jî dîsan bi pêşîra wî girt, ew da ber şemaqan û tawa tije dimsa kelândî, ku ji Xemê re hazir kiribû, ji ser kuçik hilda, heliqande set çavê wî; ew ji wir qewirand. Di vê xirecirê de şewqa Tûran ji serê wî ket, gêndir bû, kete nav lingan. Tûran bi alîkariya serbazên xwe ji nav lepêñ jinikê xelas bû, bi çapelûkan çû, xwe da ber dîwarekî ketî. Xwîn ji dev û bêvila wî hat, tevî wê dimsa germ bû û herikî. Herdu milêñ saqoyê wî di nav lepêñ jinikê de mabûn, şewqa wî jî di bin lingan de hat perçiqandin. Tarika wê qet bû. Heyv û sitêrkâ raserî tarika şewqê di nava xwîna herikî de ma, tê de wenda bû. Jinikê rahişt wê heyv û sitêrkê, li hev tewand û bi lingan pêl kir, perçiqand û avîte ber. Çavêñ Tûran mîna yêñ çeqelêñ miraxur ji dûr ve diçîrisîn. Tûran bû mîna roviyê ku ji seyda xwe ditirse, li ber dîwar nalîn kir û bi dengekî nizim got:

– Gidîno, ez li bextê we û Mîrê we me! Şewqe ne ya min e, ya dewletê ye. Di bin lingan de neperçiqînin! Ew şewqe... ax... Ew heyv û sitêrik... Şerefa min bi wan e. Ew herin dê min daleqînin! Ew şerefa dewletê ne!

Paşê zirt kirin, got:

– Haya we jê heye, ku hûn li hemberî dewletê radibin? Hûn didin ser riya Seydo û ya Yado. Bîna serhildanê ji şerê we tê! Ez xwe nakim hevalê jinan, lê hûn dê bibînin...! Ez... ez Tûran Çawîş im, ez dê tîlekê bidime Enqera, serokê cimûryetê!

Jinikê got:

Tu mîna gurên birçî diavîjî ser malan, tu toximê guran î, tu çiyî? Lawo te mirîşk bi me ve nehiştin. Ci heqê te li me heye? Ka li vî feqîri binihêre te ci anî serê wî? Hûn xwedîşeref in, lê Xemgîn na? Weyla Tûrano çapiliya serê sibê li serê kezeba te bikeve! Tu venegerê nav jin û zarûkên xwe! De ka ci heqê te li vî jarî heye, te ev sosret anî serê wî?

Jinê odayê jî tev hatîbûn derva, Tûran ji wan tîrsiya, got:

– Ez li bextê we me, hûn wê heyy û sitêrkê neperçiqînin, nexin bin lingan! Ew şerefa dewleta min in!

Jineka din got:

– Wê şewqa mîna tara rêxê biperçiqînin û bidine wî. Ew heyy û stêrk ne niha ketîne xwînê, pîr caran di xwîna yêñ weka Xemgîn de hatine da kirin, bidine wî, tev bi xwîn û xerar e!

Tûran Çawîş bû wek tûleyên ku li ber tendûran ji bo perçeyek qermûşk li ber kebaniyan dûv dihejînin. Serbazên wî rahîştinê ew ji wit birin, birin ser kaniyê ser û çavêن wî şûştin û ji bo tirs ji ser bifire, tasek ava sar bi ser devê wî da kirin. Yekî ji wan dewlek tije ava sar kir û serê wî xiste nav dewlê. Piştî qederekî hişê wî hate serê wî û qise kir. Berê xwe da berdevkiyê xwe û xeberên pîs jê re got. Ji ber ku wî pê re alîkarî nekiribû û ji serbazan re gotibû, ku ew jî nekin; li ber jinan dest hil-neynin. Ji wan weyê ku peyayêñ bi çek, ew jin bi fen şandine şerrê wan. Serbazan jî bi gotina berdevk kiribûn û nexwestibûn xwe ji bo xatirê Tûran bidin kuştin.

Lê di dawiyê de fêm kirin, ku tu peyayêñ bi çek di gund de nîn in. Xemgîn bi xap anîn bal xwe û ji gund birin. Piştî ku ji gund dûr ketin, herdu destenê wî bi we-rîsekî girêdan, bi kulm, pehîn û sersiman dane pêşîya xwe birin.

Tûran dîsan jê re got:

– Xemgîno, te çîma cahnî neanîbû?

Xemgîn hebekî sekinî, lê fitilî, got:

– Tûran Çawîş, ne min ji te re gotibû, ma ez dê çend carêñ din bibêjim?

Tûran, bi hêrs got:

– Ma tu min nas nakin? Hûn dizanîn mayê ku ez bibêjim, dê weke min be!

Bi çêr û pêçariyan ferman da serbazên xwe da Xemgîn jê re biavîjin erdê.

Serbazanf ermanê wî bi cîh anîn, ew jê re avîti erdê. Yekî ji nav wan bazda nav baxçeyekû, şivek hinarê çinî, anî û da destê Tûran. Wî şivê ji destê serbaz girt, bê ku bibêje ser û çav e, Xemgîn da ber şivan...

Hal di Xemgîn de nema, Tûran ji westiya, dev ji lêdanê berda. Paşê Tûran berê xwe da serbazên xwe bi quretiya qumandarekî tirsonek, weke yekî ku di cengê de bi bedbextî bi ser ketibe, got:

– Tûran ne qumandarekî henek e! Bila ev feqîr careka din bizav neke, li ber min ranebe! Min wisan anî serê wî da here li her derî bibêje, ku yên nebîhistine ji bibi-hîzin. Cîhê ez ne li wir bim, bila tirsa min li wir fermanêñ min pêk bîne. De bila careke din bizav bike û li ber min rabe, ez şerefa dewleta xwe naxim bin lingê Xemgîno! Ez nahêlim ew li serê min bi Yado û Seydo be!

Şivê ji dest xwe avît û ji ser laşê Xemgîn yê terrmkî dûr ket, ew mirîkî li wir his-tin, kişiyan û çûn.

Xemgîn ji hal ketibû, nikarîbû xwe ji cîhê xwe bileqanda; bûbû terrm û li erdê dirêj bûbû.

Tûran Çawîş, laş lê kiribû mîna fatereşkê. Serçavê wî di nav xwîna gewez de ma-bû. Mirov digot qê devê wî bi ser hev de hatiye mîx kirin, bi zor vekir, got:

– Tûran..., Tûran, bila wisan be... Welleh şeytan dibêje rojekê...

Tûran vege riya hat ser laşê wî, sersimek lê da û bi hêrs got:

– Heftiyeka tenê ji te re maye!

Paşê bi mirûzekî tehl ji bal dûr ket, çûn.

Hinek gundî ew ji dûr ve dîtibûn. Bala xwe danê, ku Xemgîn li erdê bûye terrm, nikare ji cîhê xwe rabe, man hetâ Tûran û serbazên xwe ji wir dûr ketin, pa-şê çûn ew bi çardarê anîn.

Qasid şandin pey hekîmekî, anîn ser Xemgîn. Dema hekîm hat, halê wî dît, şas-ma, çawan sax hiştine. Hekîm destê xwe da kîjan weseleyê laşê wî qêrin jê çû, got:

– Laşê vî pepûkî bûye mîna danê kutayî, mirov dibêje qê ferê aş bi ser wî de keti-ye.

Berê xwe da xortan û got:

– Ha bayê xalê xwe, rabin bi lez herin serê miyekê jê bikin, eyarê wê ji min re bî-nin, divê ez eyar bigirime laşê wî.

Hekîm dest pê kir dermanê janbirê dayê. Xortan ji pezek serjê kirin û eyar anîn bal hekîm. Yekî ji wan got:

– Xalê Avedîs, me eyar anî.

Xemgîn piçûk bûbû, lepekk mabû. Di nav lepê Avedîs de wek zarûkekî piçûk li

vî alî, li wî alî diqulibû. Xalê Avedîs pê girt û bê alîkariya hinekî din, bi tenê ew ayar kişandê û li ser dikê dirêj kir. Pişî ku karê xwe xelas kir, got:

– Divê heta vê îniya bê di vî eyarî de bimîne, belkî parsûyên wî bicebirin.

Heta ku wî destêن xwe şûşt, xortan tasek dewê sar jê re hazir kir... Avedîs tasa dew bi ser devê xwe da kir; xatir ji civatê xwest, xwe berda biniya malan da ser şiveriyekê, kurtebir çû.

Xemgîn hêdî hêdî cavêن xwe vekir. Gundî û cîran lê civiyan. Hinekan li ber dilê wî dida, hinek ji, jê re digirîyan. Gundî hê wisan bi xemgîn ve lepikî bûn, bala xwe danê zarûkek bi bînfişkê kete hundir, got:

– Ka Xalê Xemgîn..., ka xalê Xemgîn?

Ji civatê yekî pirsi, got:

– Kuro, tu ci dixwazî?

Lawik bi kêf, lê bi bînfişkê, got:

– Mizgîna min..., mizgîna min...?

Tevan bi hev re got:

– Kuro, mizgîna ci? Ev jar di ber mirinê de ye!

Di wê maweyê de, deng çû Xemgîn ji. Dema Xemgîn gotina “mizgîn”ê bihîst, mayê êşê di laşê wî de nema. Xwe livand, ku j nav eyar derkeve, lê yên li dorê nehiştin. Jinek, bi lez çû bal Xemê û bi lez vegeriya hat, got:

– Kur e...

Tûran ji baş dizanîbû, ku ew lêdana li Xemgîn daye, ne ya ku Xemgîn di heftiye-kê de rabe piyan, lew ew heftî neçû.

Di ser wê bûyerê re demek derbas bû, Xemgîn hebekî bi ser xwe ve hatibû, kuli-kuli bi rê ve diçû. Ew hesreta ku bi salan di dilê wî de bû, cîhê xwe ji şahiyê re berdabû.

Xemê ji nav livînê rabûbû, karê nav malê dikir. Lê Tûran dîsan bi berdevkê xwe re xeber şandibû ser wan. Wî dîsan cahniyê dixwest. Berdevkê wî gotibû: “Ku hûn vê carê cahniyê nedîn, Tûran tê û di gerewa cahniyê de tiştekî din dibe. Tûran ji pê hesiya ye, ku kurek ji we re çêbûye...”.

Wan nizanîbû ci bersivê bidin. Lew Tûrano gotibû: “Yan cahniyê didin û yan ji kurê wan!”. Xemgîn dizanîbû, ku ew cahniyê bide Tûran, dê ew lê siwar bibe û li wan derdoran bêtir zilmê bike. Xemgîn dudilî bû, tu carî nedixwest Tûrano siwarê cahniyê xwe bibîne, lê mefera wî nemabû. Kur ji kezeb bû. Wî baş bi Tûran dizanîbû, ku wî xerabiyênen mestirîn kiriye. Bi sedan xorten terr û ciwan şandiye leşkriya

Romê. Ji ber van tiştan, wî bawer dikir, ku rojekê Tûran were di gerewa cahniyê de kurikê pêçekê bigire, bibe.

Xemê bala xwe dayê, ku Xemgîn ketiye rewşeka pirr xerab, got:

– Xemgîn, heke tu bi ya min bikî, em serê xwe hildin û ji ber vî segî birevin, herein, terkeserî dinyayê bibin?

Xemgîn nedixwest here, cîh û warê xwe ji Tûran re bihêle, lê nedixwest ku kurê di destê Tûran de dîl bimîne. Wî dixwest nûhatiyê xwe Xemrevîn biavîje cîhê ku hikmê Tûran lê nabe, got:

– Xemê, ma qê ez naxwazim? Ma ez jî naxwazim vî dergûşî ji dîlîtiyê, ji ber destê van hovan xelas bikim? Ez jî dixwazim, lê ez vî cîh û warî ji kî re bihêlim? Min gelk pismam, dotmam, kurxal û birayên çavreş li ser dane. Bila mîratê min ji Tûrano re bimîne? Na, Xemê ez weka bavê xwe nakim. Tu kesek nizane Tûrano ji kîjan kotromê hetiye vir. Ew dê bibe xwediyê mala min, ez dê bibim tirûdiyê serê çol û çiyan. Ez bi tu ciyî ve naçim, bila cahnî jî, ji wî re be. Welleh Şeytan dibêje rojekê...

Xemgîn bi halekî perişan rabû piya, derket derva, ber bi hespêni li mîrgê ve çû. Mehîna wî bi cahniya xwe ve di nav hespan de bû, çû nêzîkî hespan bû. Gava mehînê ew dît, ber pê hat. Xemgîn milê xwe avîte ser sitûyê wê û kelogîn bû, got:

– Me bi hev re gelk rojên xweş û reş derbas kirine. Cahniyê pey te heqê te ye, lê divê ku hûn ji hev biqetin. Fermana Tûran Çawîş e. Xwedê jê re nehêle! Ji ser bîkeve sitûyê wî bibe heftê perçê!

Hevsarekî rengîn bi xwe re biribû, li serê cahnî ediland, ew ji diya wî qetan, anî malê.

Tûran Çawîş bi serbazên xwe ve li ber derî, li pawika wî sekînî bû. Gundiyân ne-wêribû xwe nêzîkî wan bikira, tev derketibûne ser banê xaniyan û li wan dinhêrtin. Bala xwe danê, ku Xemgîn bi cahniyê ve hat, nêzî Tûran û serbazên wî bû. Cahnî, bûbû mîna karekî xezalan binê Beriyê. Yekî noqzirav î belek bû. Xemgîn hevsarê wî da destê Tûran û got:

– Kerem bike! Tûran qumandar, zanibe ev ji te re nabe hesp! Ez bawer nakim, ev karê xezalan zâlimen wek te siwarê xwe qebûl bike.

Tûran, bi van gotinên wî gelek hêrs bû, diranên xwe lê sîqirand û bi hêrs hevsar ji destê wî kişkişand û dehfek li sînga wî da... Xemgîn li ser hêsanê piştê li erdê direj bû.

Bînaka pirr pîs ji Tûran difûriya. Ew bîn çû pozê cahniyê jî. Ew cahniyê ku li gi-yayên bînxwêş li mîrgên rengîn çêriyabû, bîna pîs hilneda, ji ber wê bîna pîs idare nekir, çû-hat, rabû ser herdu simên paşin û hîriya. Tûran şaqiz ma û li cahniyê ni-

hêrt. Wî heta wê rojê tu ecêbên wisan nedîtibû. Cahniyê ji ber wê bîna pîs refes avitîn, Tûran şaqiz ma, nizanîbû ci bike, xwe di kur de veşêre da ji ber refesên cahniyê xelas bibe. Xwe ji ber veşêre. Tûran, berê xwe da Xemgîn û got:

– Kî ev cahniyê han şîret kiriye? Mirov dibêje qey ev ji dola hespên Seydo û Yado ye. Ev çîma weha li min bi kîn e? Jê re bibêje, ew li ber dewletê serê radike!

Lê Tûran tenê li meydanê ma, yên li dorê tev reviyan, xwe xistine taldê dîwarn. Lê Tûran gêj bûbû, tu hiş di serê wî de namabû; di wê meydanê de bûbû mîna sekeyeka zengarî, zoq mabû li cahniyê dinhêrt. Cahñî jî rabû ser herdu simêñ dawîn li dora Tûran çû– hat û bi ser de hîriya. Ha dîtin ku cahniyê ji paş ve cotrefesek avîte Tûran, ew li erdê dirêj kir. Simêñ dawîn di eniya Tûran de du heyvik kolan. Xwîn û xîrar pê de hate xwarê, mîna qurmekî pûç li erdê dirêj bû... ruh jê kişiya. Cahñî jî bi hîre hîr, ber bi mîrgê ve, bi çargavî wek birûskê ji ber çavan wenda bû.

Tûran li erdê, alem li ser terrmê wî civiya. Lê ji bîna genî tu kes nikarîbû nêzî terrmê wî bûbûya. Pîrekê çarîka xwe da ber bêvíla xwe, nêzîkî terrmê wî bû, ji yên derdorê xwe re, got:

– Ev çî bîna genî ye ji terrmê vî tê? Mirov dibêje qê kurm ketine xwîna wî!

Xemgîn ji dûr ve bangî pîrê kir, got:

– Dapîra hêja, vî segê ev xwîn bi zilmê, bi malêñ me dabû hev, ev bîn ji xwîna wî tê; nexe sitûyê kurmêñ bêguneh. Xemgîn nêzîkî terrmê Tûran bû, baş lê nihêrî û di dilê xwe de got: "Çi mirin, çi mirin!". Ev çendeyek bû, ku vî segî xwîna xwe xis-tibû kevçî û li ber deriyê min digerand. Lê min nedixwest ez destê xwe pê gemarî bikim, destê xwe li kevçiyê wî bixim. Belê cahniyê min... Cahniyê ji min re nehişt.

Serbaz ji wir reviyabûn. Her yek ketibû heyra rihe xwe, ji tırsan diricîfîn.

Xemgîn çû Xemê û zarok anî, xatir ji haziran xwestin û berê xwe dane bi aliyê çi-yê ve, bi lez ji gund dûr ketin.

Piştî ew ji gund dûr bûn, serbazên Tûran hêdî hêdî bi ser hişen xwe ve hatin. Ji quî û bexşan derketin.

Bala xwe danê, ku Xemgîn û Xemê bi aliyê çiyê ve diçin, dikin ji ber çavan wenda bibin. Ew zeftiyê ku Xemê bastêq dabûyê, ji nav wan derket, da pey Xemê û Xemgîn. Ji dûr ve tiving li wan teqand. Xemgîn lê fitilî, bang kir, got:

– Vegere...veger! Vegere tu çi ji me dixwazî? Li pey me meyê!

Lê serbaz guh nedayê, bi bez li pey wan çû. Édî gihabûn ber zinaran. Xemgîn kal bû lê kalekî çeleng bû, çeleng û mîrxas bû, hilkişıya ser şiverêyekê, çû xwe avîte talda zinarekî û hîmek ji erdê hilanî. Serbaz ber pê çû, lê nedît, ku ew di talda zinar de ye; xwe veşartîye. Xemê, Xemrevîn dabû ber sînga xwe, dilezand li cîhekî nepe-

nî, ku zeftî wan nebîne, digeriya. Li pişt xwe fitilî, ku Xemgîn ne pê re ye, sekinî, gazî kir, got:

– Xemgîno... Tu li kur î, taqet di çökên min de neman, were vî tifalî ji destê vî hovî xelas bike! Ev hatiye kuştinê, bilezîne!

Xemgîn dizanîbû ku yê Romî li pey kuştina wan e. Lê wî bersiva wê neda. Di talde de bêdeng ma. Zeftî êdî ketibû fesala wî. Dilê Xemgîn pê şewitî, serê xwe di ber zinar de derxist, got:

– Lo Zeftiyo, Xwedâ bela te ji ber lingên te bide, ma ez dê heta kur ji ber te birevim? Li pey min meyê!

Gava zeftî dengê wî bihîst, di cîh de sekinî, çokda, berê kemaliya xwe ber pê da û tiliya wî çû ser tetikê... Lê haya wî jê tunebû, ku li serê firînekê ye. Ji nişka ve kevirê ku pêl kiribû ji bin lingê wî şemîtî...

Kuçê destê Xemgîn jî ,bi hêza zinarekî, di şiverêkê de ber pê gêndir bûbû, çûbû...

Xemgîn xwest, rabe ber bi zevftî here, lê qudûmên wî negirtin. Xwîdaneka sar di eniya wî de avît, çökên wî sist bûn. Hêdî hêdî bi çapelûkan çû ser wê firînekê, da ji jor ve li terrmê zeftî binihêre. Lê çavêن xwe girt, nexwest zêde li terrmê wî binêre. Paşê, weka tu bînî kulavekî rengîn li ser gurnîkan raxî, li ser axê dirêj bû. Nema dikarîbû xwe bilivîne, xwîna germ û xwîdana sar tevlihev bûbûn û jê diherikîn. Xemmê hate bal, kire qêrîn, bi ser de giriya. Wê hewar kir. Xemgîn destê xwe paland, qevdek giya çinî, kire devê birîna xwe û tasek ava sar ji Xemê xwest. Ew daxwaziya wî ya dawîn bû. Lê heta ku wê Xemrevîn ji milê xwe danî, devê kun vekir, dereng ma... □

Dawî

Çinara min

SERKAN BRÜSK

Ey çinara min
Min di bedena te ya xav de
berikên Roma reş hiştin
Min li ser kaniya binya te
gotinêñ welatî, evînî û xorstanî hiştin
Min di nava axa binya te de
rehêñ xwe hiştin
Min li dora te kevirên xwe hiştin
Min bêhna rihan, sosin û nêrgîzan
di nav belgên te de hiştin
û ey Çinara min ya mezin
Min tu û erda xwe
ji hevalan re hişt
û ez min baz da.

Jiyan

Dilop bi dilop niqutîn
Herikîn terkêñ bejahiya
dilê dayika xwe
Dagirtin qelsêñ ziwa
Bûn rewa ketin warê çiyan
Bûn zîpik û germ kirin axa beriyan
Dilop bi dilop
Navber bi navber
niqutîn
ser birînêñ dayika xwe
di damarêñ wê re herikîn
bûn jiyan
û rakirin meyta merhûm

Trajediya tirkîfizebûyiyan û minaqeşeya li ser »î« û »î«-ya kurdiyê

ARIF ZÉREVAN

zerevan@algonet.se

Di dawiya sala 1996-ê de pirtûka Celadet Çelîkerî ya di heqê hinek pirsên elfabeya kurdiyê de der ket. Herçend di pirtûkê de hinek agahdarî di heqê dîroka elfabeya kurdiyê de hebin ji, kitêb pirtir li ser herfîn kurdiyê »î« û »î«-yê ye.

Celadet Çelîker bi navê »zanahiyê« parêzkarên elfabeya kurdiyê mat dike û herwiha bi navê zanahiyê guhortina herfîn kurdiyê »î« û »î«-yê dixwaze.

Di vê nivîsarê de ez dê yek bi yek li ser argûmentên parêzkar û hevrikên van du herfîn kurdiyê rawestim û bidim diyar kirin ka Celadet Çelîker çawa bi na-vê zanahiyê destdirêjiyê li zanahiyê dike.

Argûmentên Celadet Bedir-Xanî ji bo nivîsandina du dengê kurdiyê bi »î« û »î«-yê pir eßkere ne. Argûmenta wî ya ewil tenê (denganiya kurdiyê) bi serê xwe têra wê yekê dike ko mirov van herfan wekî tirkan nenivîsîne.

Lê belê hevrikên elfabeya kurdiyê di minaqeşeyan de pirê caran ji argûmenta denganiyê pirtir li ser argûmenta windabûna »î«-ya bêniqte li kêleka hinek herfan disekinin û dibêjin argûmenta Celadet Bedir-Xanî hingê di cihê xwe de bit ji, piştî ko tirkan dest ji nîşandeka berî »î«-ya bêniqte berdayîn ew argûment hêdî ne di cihê xwe de ye.

Denganiya zimanê kurdî

Ka em ewil behsa denganiya zimanê kurdî û van du herfan bikin. Delîlên Celadet Bedir-Xanî hêjayî hezarbarekîrinê ne û ew wiha dinivîsîne:

»Lê herwekî me berê ji goti bû, di dengayiya kurdî de, dengdêrek carinan drêj nabit, yanî herçî dengdêrên ko kin in drêjên wan nîne û herçî drêj in kinên wan peyda nabin.

Ber vê yekê dengdêra »e« herçend bête drêj kirin ticar nabit »ê« ji ber ko cihderkên wan ji hev cida ne. Herwekî »i« ji bi drêjxwendinê nabit »î«.

Di destê me de ti herfêن din ne ma bûn, û gora destûreke me diviya bû em bi herfêن hevduanî emel mekin. Ji lewra ji bona nîşankirina tofa paşin me ev »^« nîşana ha pejirand û navê wê kir bilindek.

Ev nîşana ha di hin elfabêyên din de jî heye. Lé bi vê ferqa ko di elfabêyên din de dengê dengdêran weke xwe dihéle, cihderkên wan naguhêrîne, tinê bilind dide xwendin. Di elfabêya me de du karêن wê hene: Dengê dengdêran diguhêrîne û bilind dide xwendin. Lewma dengdêrên bi bilindek hemî ji drêj in û ticar kin nayêن xwendin.

[---]

Jê pê ve, herwekî heta niho xuya bû, ji lewra ko dengayiyêن van du ziman nan cida ne, isûlê dengdêrên kurdî bivê nevê ji isûlê tirkan dûr ketiye.«


Celadet Bedir-Xan di benda ewil ya destûrên elfabeya kurdiyê de jî behsa den-ganiyê dike û denganiyê ji nîzîkkirina bo tirkîyê girîngtir dibîne:

»Ji wan niqtan pê ve ko xasê denganiya zimanê kurdî ne, di şikl û dengên herfan de, herçend heye, xwe li elfabeya tirkan nîzik xistin û jê nedûrketin. [reşkirina min, Arif]«

Wekî ko dixwehî Celadet Bedir-Xanî nîşandeka bilindekê »^« ji bo sê dengdêrên kurdiyê (ê, î, û) çêkiriye û ev nîşandek wan dengan bilind dide xwendin. Ev bilindek ne ji bo »î«-yê tenê ye. Bilindek wekhevî û istiqrarekê di van dengdêrên bilindek de çêdike. Ko yek ji van bête guhortin divêt yên dî jî bêñ guhortin. Ta niho jî min fêm nekiriye ka çîma hevrikên elfabeya kurdiyê minaqeşeya bilindeka li ser »î«-yê dikin. Heger minaqeşê bibit divêt ne li ser »î«-yê, lê tenê li ser hûreka herfa »i«-yê bêt kirin. Hûreka herfa kurdiyê »i« û herfa tirkîyê »i« di şiklê xwe de wekî hev in. Ne kurdek û ne jî tirkek nikare »î«-ya kurdiyê »xelet« fêm bike.

Cihderka »î«-ya kurdiyê ji »i«-ya tirkîyê cida ye û dengê herfê jî ne wekî ya tirkîyê ye.

Hemî kes li ser vê hemfikir in. Hevrikên elfabeya kurdiyê dibêjin erê em vê qebûl dikin, lê ma ne em in yên dengan li herfan bar dikin. Ew jî rast e, lê belê cardî jî mirov nikare (i) û (i)-ya kurdiyê bike wekî yên tirkîyê. Çîma? Lewra he-



ger mirov van herdu herfan bike wekî yên tirkîyê hingê dê piraniya kurdên bakurê wan wekî yên tirkîyê bi lêv (telefiz) bikin. Şona bibêjin »kirin« dê bibêjin »kirin«. Hemî kes dizane çiqes ferq di nêvbera »kirin=yapmak« û »kirin=bisikênin« de heye. Nimûneyeka pir balkêş di vî warî de filîmê Mem û Zînê ye; yê ko li Tirkîyê hatibû kişandin û ji aliyê kurdên tirkîzan ve hatibû duble kirin bo kurdîyê. Gava mirov guhdariya diyalogan û den-gên kesen di filîmî de diaxivin dike, mirov dibêje qey ew bi tirkîyê diaxivin.

Yê ko bixwaze vê rastiyê fêm bike bila teksteka bi kurdî bi »i« û »i«-ya tirkîyê binivise û bide yekê tirk ko bi dengê bilind jê re bixwîne. Hingê ew dê bibihîse ka yê tirk van dengan çawa bi lêv dike.

Windabûna »i«-ya bêniqte û prosesa xwendinê

Celadet Bedir-Xan wiha dinivisîne:

»Gora destûrên me ên bingehî, ko ji bona çêkirina elfabêya xwe me pêk anî û di pêsiya vê bendê de me da zanîn, diviya bû ko em bê sebebeke zor ji elfabêya tirkan dûr mekevin.

Li hire, di herfên »i« û »i« de em ji ya wan dûr ketin.

Tirk[an] »i«-ya kin bi »i«-ke bê niqte nîşan kirin. Heke me welê bikira û »i«-ya kin bi »i«-ke bê niqte û ya drêj bi »i«-ke adetî nîşan bikira çêtir ne dibû.

No, ji ber ko »i« ke bê niqte di nav herfên »u, n, m« û di pêş- û paşê hin herfan de tevlî wan dibe û ji wan derêxistana wê dikeve dişwariyê. Ji xwe tirk ji piştî çêkirina elfabêya xwe pê hesiyan û ji bona vegetandina »i«-ke bê niqte ji herfên jorîn – ko ketiye rex an nava wan – ser herfa ko berî »i«-yê dihat işaretek berdidan.

Bêşik e ko me nikarî bû em bikevin nerastîyeke welê ko ji aliyê daniyê xwe ve hatî bû nîşan kirin.«

Wekî min berê jî got, hevrikên elfabeya kurdîyê di minaqeşeyan de pirê caran li

ser windabûna »i«-ya bêniqte li kêleka hinek herfan disekinin û dibêjin argûmenta Celadet Bedir-Xanî hingê di cihê xwe de bit jî, piştî ko tirkan dest ji nîşandeka berî »i«-ya bêniqte berdayîn ew problem hêdî nemaye.

Rast e tirkan nîşandeka berî »i«-ya bêniqte rakirine, lê belê problem bi xwe her maye. Problem çî ye? Li gor lêkolînên hatîn kirin gava ko mirov tekstekê dixwîne mirov ne herfan lê resimê bêjeyan nas dike û dixwîne. Wextê ko Celadet Bedir-Xan behsa windabûna »i«-ya bêniqte di nîv hinek herfan de dike ew bi-heq e. Ji ber ko bi nimûneyeka pir hêsanî jî mirov dikare isbat bike ko ka çawa »i«-ya bêniqte xwendinê zehmet dike.

Ez nikarim hin nimûneyan bidim te.

Serê xwe bilind bikin û alayê hildin!

Ez nikarim hin nimûneyan bidim te.

Serê xwe bilind bikin û alayê hildin!

Di nimûneya ewili de çav bi hêsanî nikare nas bike ka di bêjeya »nikarimê« de herfa li pey »a«-yê têt »n« ye an »r« ye.

Celadet Çelikerî di kitêba xwe de behsa prosesa xwendinê kiriye lê belê qet behsa ka çav ci dibînin û mejî çawa tiştên ko çav dibînin zeft dike nekiriye. Heger ko wî kitêbek li ser prosesa xwendinê xwendibe divêt hayê wî ji vê agahdarî-yê hebe, heger ne em dikarin bibêjin ko ew bizanî rastiyê vedisêre da idiaya xwe ya bêbingeh biparêze.

Ka em hinekê bi teoriyên prosesa xwendinê ve mijûl bibin. Du teoriyên cida di heqê prosesa xwendinê de hene: *teoriya bîevyorîst û teoriya kognitîf*.

1. Teoriya bîevyorîst atomîk e û dibêje ko mirov ewil »besan« paşê »giştê« dibîne. Ji aliyê pedagojîk ve encamên vê teoriyê bi »rastxwendina« tekstê têr pîvan, ne bi »rastfêmkirina« tekstê. Yek ji xeterên vê teoriyê ew e ko mirov dikare tekstekê rast bixwîne bêyî ko ti tiştê jê fêm bike. Ev teorî heta destpêka salên şo-yê raser (domînant) bû. Herfa tirkîyê »i« ji ber ko di nîv bêjeyan de winda dibe nahêle ko mirov bêjeyan rast bixwîne.

2. Teoriya kognitîf lê dikole ka mirov çawa enformasyonê zeft dike û bi kar

tîne, ka mirov çawa vê enformasyonê vediguhorîne dike zanîn û di hafizeya xwe de qeyd dike û herwiha ka mirov vê zanînê çawa ji bo idarekirina reftarên xwe bi kar tîne.


Nêrîna vê teoriyê nêrîneka holîstîk (gişti) ye. Li gor vê nêrînê mirov ji »giştê« ber bi besan ve diçe: hevok, bêje, kît û fonem (deng) û careka dî vegera li »giştê«. Ji aliyê pedagojîk ve başiyêن vê teoriyê pir in: xwendevan tekstê xweştit fêm dike, motîvasyona xwendinê li nik xwendevanan pirtir dibe, baweriya xwendenvanan bi wan xurttir dibe û hw.d.

Li gor teoriya kognitif sê hafize ji bo xwendinê têne bi kar anîn:

a) **Hafizeya ikonik.** Ev hafizeya he di demekê gelek kurt de – di nêvbera 200 û 500 milisaniyeyan de – dikare drûvên resimê tekstekê zeft bike û ji lewra jê re »hafizeya resimî« dibêjin. Karê vê hafizeyê ew e ko resimê bêjeyê di serê mirovî de biparêze ta ko mirov pê re bigihît ko herfan nas bike.

b) **Hafizeya demê kurt.** Navekê dî yê vê hafizeyê »hafizeya kari« ye, ji ber karê wê bikaranîna nêveroka enformasyona di tekstê de û guhortina enformasyonê bi hafizeya demê dirêj re ye, da ko em nêveroka fikra tekstê fêm bikin.

c) **Hafizeya demê dirêj.** Karê vê hafizeyê yê bingehîn ew e ko wê enformasyona ko ji bo jinûvenaskirina herf û bêjeyan lazim e, qeyd bike. Demê vê hafizeyê gelek dirêj e.



Niqteya li ser »i«-ya kurdiyê welê dike ko mirov resimê bêjeyen ko »i« tê de he-ne zûtir nas dike û li xwendinê na likûme. Herwiha li gor lêkolinan mirov tekstekê çiqes zû bixwîne ewqes pirtir jê fêm dike. Rakirina niqteya li ser »i«-ya kurdiyê dê hem xwendinê dereng bêxe hem jî fêmkirinê kêmtir bike.

xwen-	tempo	hejmara	hejmara	hejmara	hejmara
din	bêje/deq.	yên rast	yên xelet	seregavkirîyan	pirsan
1.	200	21	13	6	40
2.	400	25	9	6	40
3.	800	34	3	3	40

Ev tablo ji kitêba Åke W. Edfeldt »Lästeknikê« hatiye girtin. Rûper 46.

Dengdêrên kurt »i« û »e« bi hev re bingehêñ dengdêrên kurt yên kurdiyê pêk tînin. Dengdêra »u« wekî Celadet Bedir-Xanî gotiye dengek biyanî ye ko ji »w« û »i«-yê çêbûye. Ji xwe ew »u« di kurdiyê de kêm têt bi kar anîn.

Bi rastî jî ji aliyê prosesa xwendinê ve bikaranîna »i«-ya bêniqte dê katastrofek bit ko divêt mirov ticaran wê belayê neîne serê xwe.

Li gor lêkolinan mejî dikare di saniyeyekê de şes yan heft »parçeyan« nas bike. Ev parça dikarin herf, bêje an jî ji bêjeyekê dirêjtir bin. Hafizeya demê kurt wan parçeyan vediguhêze bo hafizeya demê dirêj û şes yan heft parçeyên dî nas dike. Baş e, heger ko welê bit diyar e kes nikare di deqîqeyekê de ji 420 herfan pirtir bixwîne û ev jî katastrofek e ji bo xwendinê. Lê belê dilê xwe li xwe neşewitînin, lewra mejî di saniyeyekê de dikare şes yan heft bêjeyan jî nas bike û hingê tempoya xwendinê di deqîqeyekê de dîbit 420 bêje. Lê belê em dizanin ko mejî dikare di saniyeyekê de şes yan heft »parçeyen« ji bêjeyekê dirêjtir jî nas bike. Û bi vî awayî mejîyê mirovekê dikare di deqîqeyekê de 800 bêjeyan nas bike. Zûxwendina tekstekê bi zûnaskirina bêje û parçeyen ji bêjeyan dirêjtir ve girêdayî ye.

Heger ko em bi »i«-ya bêniqte rabin resmê bêjeyan xirab bikin û welê bikin ko xwendevan serê xwe bi herfan ve biêşîne hingê em dê tempoya xwendinê pir kêm bikin û welê bikin ko xwendevan ji xwendinê hem sar bibe hem jî teksta ko dixwîne baş fêm neke.

Xeletiya Çelîkerî ew e ko ew dihesibîne ko çav ewil herfan û paşê bêjeyan dibîne. Wekî li jorê jî hat nivîsandin çav resmê bêjeyê berî herfê dibîne. Piştî ko çav resmê bêjeyê dibîne mejî wî resmî rave dike û herfan nas dike. Lê belê di xwendineka normal de piştî ko mejî resmê bêjeyekê nas dike resmî wekî parçeyeka pêkvegirêdayî dihesibîne û lê naxebite ko nas bike ka kîj herf di wê bêjeyê de hebûn.

Hêsanî an zehmet

Argûmentek ya hevrikên elfabeya kurdîyê ew e ko kurdên bakurê Kurdistanê ji ber ko elfabeya zimanê tirkî dizanin dê bi hêsanî bikarin kurdîyê bixwînin heger ko em »i« û »i«-ya xwe bikin wekî yên tirkan.

Ev argûment bêbingeh e; ji ber guhortina van du herfan (i, i) bi yên tirkiyê (i, i) otomatikmen rastxwendina dengen herdu herfîn kurdîyê bi xwe re naîne. Heger ko em van herdu herfan bikin wekî yên tirkan dê kurdên tirkîaxêv û kurdên di bin tehsîra zimanê tirkî de mayîn dengen van herdu herfan ne li gor denganiya kurdîyê lê li gor denganiya tirkiyê bi lêv bikin û bêjeya »kirin«-ê ko bi maneya »yapmak«-a tirkiyê ye dê bikin »kirin« ko bi tirkiyê maneya wê »bişikênen« e.

Yanî her ci dabit bila bibit divêt dersdêrên kurdîyê xwendekaran fêrî dengen kurdîyê bikin. Heger em »i«-ya xwe bêniqte binivîsinin divêt em xwendekarê kurd li bakurê Kurdistanê fêr bikin ko dengê wê herfî ji ya tirkan bilindir bi lêv bikin. Herwiha herger em »i«-ya xwe bi »i«-ye ka biniqte binivîsinin divêt em xwendekaran fêr bikin ko ew wê ji ya tirkan bilindir bi lêv bikin.

Wekî min berê ji got, hevrikên elfabeya kurdîyê gelek caran dibêjin ko Celadet Bedir-Xan bi nivîsandina »i« û »i«-yê ji »i«-ya adetî bi dûr ketiye. Divêt mirrov ji van hevrikan bipirse ka »i«-ya adetî ci ye.

Carekê divêt bêt gotin ko di latîniyê bi xwe de »i« bi sê şiklan têt nivîsandin. Di latîniyê de dengê »i«-ya kurt bi kevanekaka berê wê li jor, wekî nîşandeka li ser »g«-ya tirkiyê (‘), nîşan dikin. Bêjeya »criticus« bi rakirina niqteya li ser hetdu »i«-yan û danîna kevanekak wekî ya li ser »g«-ya tirkiyê (‘) têt nivîsandin. Herwiha di latîniyê de dengdêrên dirêj bi danîna xêzekê li ser herfî têr nivîsandin. Wekî: »invitâmentum«. Vêca »i«-ya adetî ci ye? Heger ko hevrik difikirin ko »i«-ya adetî di zimanê ko bi elfabeya latîni dinivîsinin de hertim dengê »i«-ya kurdîyê dide, ne rast e. Lewra di ingiliziyê de »i«-ya adetî carinan »i«-ye kurt e, carinan »ay« e û carinan jî dibe »ö«. Yanî ingilîz bêjeya »pile«-yê wekî »payl« bi lêv dikin û bêjeya »first«-ê jî wekî »först« bi lêv dikin. Heger ko em li gor mantîqa Celadet Çelîkerî bifikirin divêt em bêjeya kurdîyê »pile«-yê wekî »pile« binivîsinin. Pir diyar e zarokê kurdan yên ko li Ingiltereyê mezin bûne dê bêjeya »pile«-yê ne wekî »hîle« lê wekî bêjeyeka ingilîzî fêm bikin û wekî »payl« bi lêv bikin. Di ingilîziyê de maneyê »pile«-yê gelek in. Yek ji wan »hirî« ye, yeka dî »tilm, gir« e û yeka dî »baterî« ye.

Di fransiyê de jî »i« hertim dengê »i«-yê nade. Bo nimûne bêjeya »internati-

onal« wekî »enternasyonal« têt bi lêv kîrin. Yanî »i«-ya ewil dîbit »e« û ya piştî »t«-yê jî digel »o« û »t«-yê du dengên dî çêdikin.

Mebesta min bi van ravek û nimûneyan ew e ko divêt em elfabeya xwe ne li gor ka kurd li kîj welatî dijîn çékin. Ya girîn denganiya kurdiyê ye û denganî jî bi fêrkirinê têt zanîn, ne bi nivîsandina wekî tîrkan.

Ji ber ko tîrkan »i«-ya bêniqte bi kar anîne û dengê wê ji yê »i«-ya me cida ye divêt em wekî wan nekin. Wekîtîrkannekirin bi serê xwe argûmentek têra xwe xurt e ji bo ko em ya xwe biparêzin.

Jixwe wekî ko min di benda didoyê de jî got rakirina niqteyê ji aliyê xwendînê ve jî dê tenê zererê bide me.

Celadet Çeliker di kitêba xwe de dibêje »bi danîna bilindeka li ser »i«-yê Mîr Celadet ji çend destûrên xwe bi dûr dikeve«. Ev idiaya Çelikerî ne rast e. Heger Celadet Bedir-Xanî wekî tîrkan kiribûya dê ji destûra xwe bi dûr biketa. Destûra Celadet Bedir-Xanî ya ko bi van herfan ve girêdayî ye ev e:

»Ji wan niqtan pê ve ko xasê denganiya zimanê kurdî ne, di şîkl û dengên herfan de, herçend heye, xwe li elfabeya tîrkan nîzîk xistin û jê nedürketin. [reşkirina min, Arif]«

Yanî denganiya zimanê kurdî berî hertişte ye.

Celadet Çeliker di kitêba xwe de ne tenê bi navê zanahiyê bêbextiyê li zanahiyê dike herwiha ew bêbextiyan li Celadet Bedir-Xanî jî dike gava ko ew holê di-nivîsîne:

»Gava tipa »i«-ya bêbilindek, xwendin û nivîsandina kurdiyê jî bo kurdên barkurê Kurdistanê hêsanîtir bike, ev tişteka qenc e û bi dilê Mîr Celadetî bi xwe ye jî. (Çeliker, Celadet, (1996), Çend pîrsên elfabeya kurdî, rûp. 75)« [Min zimanê Çelikerî serast kiriye, Arif]

Celadet Bedir-Xanî ji sala 1932-ê ta sala 1943-ê »Hawar« bi elfabeya kurdiyê nivîsî û tenê guhortinek tê de çekir. Ew jî guhortina herfa »q«-yê bi »k«-yê ye. Ew jî bo tesbîtkirina deng û herfan gelek bi sexbît bû. Ji bo tesbîtkirina herfa »k«-yê wî bêjeya »krîstal« li pênc kesêن cida bi xerê erebî da nivîsandin. Wî herfa kurdiyê »ş« wekî ya tîrkan nivîsî û heger wî xwestibûya û rast dîtibûya dê herfîn kurdiyê »i« û »î« jî bikirina wekî yên tîrkiyê. Yanî Çeliker bêbextiyê li Celadet Bedir-Xanî dike.

Font, Internet û teknik

Heçî ji aliyê teknikî ve ye têra xwe sebeb hene ko em wekî tîrkan nekin. Di wan destxetê (fontê) ko ji zimanê ewropî re – yê slawî ne tê de – hatine çêkirin de herfên kurdîyê (ç, Ç), (ê, È), (î, Î), (û, Ü) henin lêbelê (ş, Ş) nînin. Di van fontan de herfên tîrkiyê (ı, İ), (ğ, Ğ) û (ş, Ş) nînin.

Ji bo kurdîyê girdek û hûreka herfa »ş«-yê nînin, lê belê ji bo tîrkiyê girdek û hûrekê sê herfan (ı, İ), (ğ, Ğ) û (ş, Ş) nînin.

Di komûnîkasyona nêvneteweyî de – nemaze ya bi riya Internetê – îro problemeka mezin ji tîrkan re derketiye. Hinek ji wan dest pê kirine ko »i«-yê bê-niqte jî bi »i«-ya biniqte dinivîsinin, herfa »ğ«-yê bi »g«-yê dinivîsinin û herfa »ş«-yê jî bi »ş«-yê dinivîsinin.

Li jêrê dê du nimûneyan ji du tekstê bi zimanê tîrkî ko di Internetê de çap bûne binivîsinim:

»Susurluk kazasînîn ardîndan ortaya çîkan devlet - mafya - aflareller arasîndaki »karanlık iliflîkiler yuma>şna« Jî TEM elemanlarînîn adînîn karîflimasî Türk Silahlî Kuvvetleri'nde büyük rahatsîzlîk yarattî. (Milliyet, 21-ê sibata 1997-ê)«

»Türkiye Yardımsevenler Derneği'nin 69. kuruluş yıldönümü dolayısıyla düzenlenen törende konusan Cumhurbaskani Demirel, "Bulundugumuz günlerde tartışmalar yapılıyor ve bu tartışmaların çoğu bilgisizce, öfkeyle yapılıyor. Saniyorum ki, birbirimizi anlamaya çalışırsak, birbirimizi daha iyi anlarız, daha az kırarız" dedi. (Ajansa Anadoluyê, 19-ê sibata 1997-ê)«

Li jêrê jî nimûneyeka ko di Internetê de bi kurdîyê hatiye weşandin dinivîsinim:

»Em kurd elfabeyên cida bi kar tînin. Bi taybetî kurdên Tîrkîyeyê herfên elfaba erebî nîzanîn, ji ber vê yekê, ew romanênu ku kurdên Îranê, Sûriyê an jî yêngî Iraqê nivîsîne, em nikarin wan bixwînin. Bi vî tehrî yêngî Sovyetîstana berê jî bi tîpêñ krîlî ne. Her çîqasî kurdên Îran, Iraq, Rûsyayê û Sûriyê tîpêñ latînî bizanibin, dîsa jî zehmetîyê dikisîlinin, bi tîpêñ latînî re pir kêfxwefî nînin. (Kutlay, Nacî, Kurdish Documentation and Publishing Centre, Nûdem «

Têbînî:

Celadet Çelîker di kitêba xwe de gelek caran bi maneya »zanahiyê« bêjeyên »zaniست« û »zanyariyê« bi kar tîne. Bi ya min ew van bêjeyan istismar dike.


Celadet Çelîker dibêje »i«-ya kurdî û »i«-ya tirkî ne malê babê kurdan û tirkan in. Ew bi latînî ne. Lî bila Çelîker ji bîr neke ko ew ne malê babê ewropiyan e jî, lewra orjîna alfabeşa latînî alfabeşa fenîkiyan e.

Ji pêşgotina Mirad Ciwanî diyar dibe ko hayê wî ne ji prosesa xwendinê heye, ne jî destûr û argûmentên Celadet Bedir-Xanî fêm kiriye.

Serkanî:

1. Bedir-Xan, Celadet Ali (1932–1943) »Hawar«, Şam, Çapxana Tereqî
2. Edfeldt, Åke W. (1956) »Lästeknik«, Stockholm, K F:s Bokförlag
3. Gaur, Albertine (1992) »A History of Writing«, London, The British Library
4. Smith, Frank (1986) »Läsning«, Stockholm, Almqvist & Wiksell
5. Åkerblom, Hans (1988) »Läsinlärning – från teori till praktik«, Stockholm, Almqvist & Wiksell
6. Çelîker, C. (1996) »Çend pirsên Alfabeşa Kurdi«, Stockholm, Weşanên Roja Nû

Di hejmara bê de dê bersiva Celadet Çelîker bête weşandin.



Cîhana Sofie

JOSTEIN GAARDER / Werger: FIRAT CEWERİ

BAXÇEYÊ BUHUŞTÊ

...divê her tişt demekê ji tune de çêbûbe...

Sofie Amundsen ji dibistanê vedigeriya malê. Gava ew di rê de hinekî bi keçika hevala xwe Jorunnê re meşiyabû, wan behsa robotan kiri-bûn. Li gora Jorunnê mîjîyê mirovan mîna komputureke pêşkerî bû. Heçî Sofie bû zêde ne êmin bû. Ma ne diviyabû mirov ji makînan wêdetir tiştekî din bûya?

Ew ji ba dikana mezin ji hev veqeriyabûn. Sofie di maleke yekqaî ya ku li firehmeydanekê bû dima. Mala wê bi du carî ji mala Jorunnê dûrî dibistanê bû. Gava piştî mala wan tu mal nediman û daristaneke fireh dest pê dikir, ji Sofeyê re mala wan li serê cîhanê yê din dihat.

Sofie kete "kuçeya Nefelê". Li dawiya kuçeyê, bi navê zîvironeka Kapten, zîvironekek heye. Bi tenê rojên şermî û yekşeman mirov bi meşê diçû heta wir.

Ji rojên gulanê yên pêşî bûn. Li bin darêن hin baxçeyan bi komikan nêrgiz hêşin hatibûn. Dar bi şelteyekî kesk î tenik ve hatibûn nixumandin.

Çi ecêb bû ku her tişt di vê dema demsalê de mezin û geş dibûn! Piştî helandina berfê û germbûna rojê, ya ku dikir evqas pel û pincar ji erda bêcan bipijiqe çi bû?

Sofeyê deriyê baxçe vekir û li qutiya posteyê nihêri. Di qutiya postê

de, ji bilî çend broşurên reklamê û çend zerfên mezin ku ji diya wê re hatibûn tiştek tunebû. Berî ku Sofie here jor û dest bi xwendina der-sen xwe bike, wê ji van, li ser maseya **mutfaxâ** komek çêdikir.

Carinan jî ji bankê çend name ji bavê wê re dihatin û hew. Lê bavê wê nedîşibiya bavê din! Bavê wê yê ku kaptanê tankereke mezin ya petrolê bû, piraniya wextê wî li derve derbas dibû. Gava ew çend hef-teyan dihate malê, li vir û wir digeriya û demeke xweş bi Sofie û diya Sofieyê re dibuhurand. Lê gava ew diçû ser keştiyê, ew gelekî ji wan bi dûr diket.

Îro di qutiya posteyê de bi tenê nameyek hebû û ew jî ji Sofieyê re bû.

Li ser zerfa biçûk "Sofie Amundsen" hatibû nivîsandin. "Kuçeya Nefelê, No: 3". Di zerfê de tiştekî din, an jî şanderê nameyê kî bû, nehatibû nivîsandin. Heta li ser zerfê pûl jî tunebû.

Hema ku Sofie deriyê baxçe li dû xwe kişand û girt, wê name vekir. Di hundurê zerfa biçûk de, bi qasî biçûkbûna zerfê kaxezek derket. Li ser kaxezê wilo hatibû nivîsandin: *Tu kî yi?*

Ji vê pê ve tiştek li ser kaxezê nehatibû nivîsandin. Ne silavek, ne jî bê kê ew şandibû... Bi tenê ev gotina ku bi niqtepirsekê dawî hatibû û hew.

Sofie dîsan li zerfê nihêrî. Erê, name ji wê re hatibû şandin. Lê kê ev name xistibû qutiya wê ya postê?

Sofie bi lez deriyê mala xwe ya sor vekir. Psîka wê Shere Khan, bi xurtiya her demê xwe ji nava deviyan hol kir, bi pêlikan ve rapelikî û tam wê Sofie derî bigirta, ew kete hundur.

– Were pişo pişo pişo!

Gava diya Sofie ji tiştekî aciz dibû, wê digot ku mala wan bûye mîna baxçeyê heywanan. Bi rastî jî baxçekî Sofieyê yê heywanan hebû. Berê masiyêن wê yên sor çêbûbûn - Gurrî, Kumsorê û Reşo. Paşê çû-kên wê yên muhabbetê Edî û Budu, Kisoyê wê Govinda û pisîka wê ya zer û qehweyî Shere Khan. Wê ev hemû heywanêن han ji ber ku diya wê dereng ji kar vedigeriya malê û bavê wê jî li dûr, di deryan de dixebeitî, peyda kiribûn.

Piştî ku Sofieyê çenteyê xwe ji milê xwe kir, xwarina Shere Khan

xiste sênikekê. Nameya wê ya bi sirr di destê wê de bû û ew li mutfa-
xê li ser tabûreyekê rûnişt.

Tu kî yî?

Ax, ger wê bizanîba! Ji xwe ew Sofie Amundsen bû, lê ew kî bû? Hê
wê ev keşif nekiribû.

Ger navê wê ne Sofie lê tiştekî din bûya? Mesele Anna Knutsen.
Ma ew ê wê çaxê bibûya yeke *din*?

Di wê kêliyê de hate bîra wê ku bavê wê dixwest navê wê bike
Synnöve. Gava Sofie xwe mîna Synnöve Amundsen da naskirin,
xwest ku bîne ber çavêن xwe. Na, nedibû. Ya ku xwe wilo dida naski-
rin, ne ew, lê dibû keçikeke din.

Sofieyê xwe çem kir xwarê û bi nameya ecêb ya di destê xwe de çû
serşokê. Ew li hemberî neynikê rawestiya û li hundurê çavêن xwe ni-
hêri.

– Ez Sofie Amundsen im, got.

Keçika di neynikê de rûyê xwe qermiçand û bersiv neda. Sofie ci
bikira wê jî eynî wilô dikir. Wê dixwest bi lez keçika di neynikê de
bixapîne, lê keçika di neynikê de jî mîna wê bi lez bû.

Sofie:

– Tu kî yî? pirsî.

Pirsa wê dîsan bê bersiv ma, lê Sofie ket şuphê gelo bê ya ku pirsî
ew bû an jî resimê wê yê di neynikê de bû.

Wê tiliya xwe ya eşedê danî ser pozê xwe yê di neynikê de:

– Tu ez im, got.

Gava wê bersiv negirt, wê gotin berevajî kir:

– Ez tu me, got.

Sofie Amundsen xwe zêde nedieciband. Digotin ku çavêن wê xwe-
şik û behîvî ne, lê wê texmîn dikir ku ji ber pozê wê yê biçûk û devê
wê yê mezin jê re wilô digotin. Di ser re jî guhên wê pir nêzîkî çavên
wê bûn. Lê ya herî xerab ew porê wê yê rast bû, ku wê dikir nedikir
nikarîbû formek bidayê. Bavê wê carinan destê xwe di ser porê wê re
dibir û jê re digot keçika bi porê jê dêla hespê. Gotin hêsan bû; wê
hemû jiyanê ev porê reş û rast neketa ser milên wî, lê wê bi ser milên
Sofieyê debihata xwarê. Sprey û jîle jî alîkarî nedikir!

Ew carinan difikirî ku di dema çêbûna wê de wê şaşıyek bûbe. Ji

xwe diya wê jê re behsa zehmetiya çêbûna wê kiribû. Baş e, gelo dema zayînê ye ya ku dike mirov dê çawan bixuye?

Ma ne ecêb bû ku wê nizanîbû bê ew kî bû? Ne karê aqilan bû ku wê nikaribû xuyabûna xwe ya derve jî bi xwe bida kifşkirin. Ev e, ew bûbû xwe. Wê dikarîbî hevalên xwe hilbijarta, lê wê xwe nehilbijartibû. Mirovbûyina wê jî ne fikra wê bû!

Mirov çi bû?

Sofie dîsan li keçika di neynikê de nihêrî. Mîna ku uzra xwe jê bixwaze got ku ew ê here derza xwe ya fenê çêbike û bi carekê ve çû korîdorê.

Na, ya baş ew e ez herim baxçe, wê paşê got.

– Were pişo pişo pişo!

Wê psîk di pêlikan de dehf da û derî girt.

Gava ew bi nameya xwe ya sirrtijî rawestiya, hîseke ecêb di hundurê wê de peyda bû. Te digot qey yekî sihêrbaz ew ji bûkikekê kiriye ben-deruhek.

Ew niha li dinyayê bû, ma ne ecêb bû ku ew di serpêhatiyeke wilo muthîş de dijiya?

Shere Khan xwe ji ser sêncê avêt û ket nava deviyan. Shere Khan psîkeke jîndar bû; Ji simbêlê spî bigire heta teriya ku li dawiya laşê şâhîk dihejiya, ew tijî jîn bû. Psîk jî li baxçe bû, lê herhal wê mîna Sofie ev ferq nedikir.

Gava Sofie li hebûna xwe fikirî, hate bîra wê ku ew ê her tim wilo nemîne.

Ez niha heme, ew fikirî, lê ez ê rojekê nemînim.

Gelo piştî mirinê jiyan hebû? Herhal haya wê ji vê yekê jî tunebû.

Berî bi kurtedemekê pîrika Sofiye miribû. Zêdeyî şes mehan e ku ew her tim li pîrika xwe difikirî û bêriya wê dikir. Ma ne neheqiye e ku demekê dawiya jiyanê tê?

Sofie li ser riya bi zuxur rawestiya û fikirî. Ji bo ew wê fikra ku ew ê her tim li jiyanê nemîne ji bîr bike, wê dixwest ew li hebûna xwe bifirkire, lê nikarîbû. Gava ew li kûraniya hebûna xwe difikirî, tavilê dawiya jiyanê dihate bîra wê. Ü berevajiyê wê: gava ew difikirî ku ew ê rojekê nemîne, hingî ew têdighîst ku jiyan çîqasî bi qîmet e. Te digot

qey ew rû û pişta pereyekî hesinî diqlibîne. Hêlek çiqasî mezin û xuyayî be, hêla din jî wilo mezin û xuyayî dibû. Jiyan û mirin du rûyên madalyonê bûn.

Ger mirov bîra mirinê nebe, jiyan bêîmkan e, ew fikirî. Ger mirov li muhtesembûn û ecêba jiyanê nefikire, mirov nikare li mirinê jî bifikiere.

Sofie gotinê pîrika xwe gava wê ji doktor bihîstibû ku ew nexwes e, bibîr anî: "Ez niha fêhm dikim bê jiyan çiqasî xwes e".

Ji bo fêhmkirina xweşiya jiyanê, pêwîstiya nexweskîtinê çi xemgîniyeke ecêb e! Binêrin, ji hinekan re nameyeke sîrrî ji qutiya postê derdiker!

Gelo ew biçûya û li qutiyê binihêriya bê tiştekî din jê re hatibû? Ew tavilê reviya ber derfî û qapaxa qutîka şîn bilind kir. Gava wê dît ku di qutîkê de zerfeke eyñî mîna zerfa berê heye, ew ecêbmâyî ma. Gelo wextra wê zerfa pêşî biribû ma wê baş hundurê qutîkê kontrol nekiri-bû?

Li ser vê zerfê jî navê Sofieyê nivîsandibû. Gava wê zerf vekir, mîna ya din ji hundurê wê jî kaxezake spî derket.

Li ser kaxezê, *Dinya çawa çêbû?* hatibû nivîsandin.

Ez qet nizanim, Sofie fikirî. Ma kî bi tiştekî wilo dizane? Lê dîsan jî ev pirseke di cih de bû. Ew cara pêşî di jiyana xwe de li pirseke wilo, qet nebe li pêwîstiya *pirskirina* pirseke wilo fikirî.

Van nameyên sirrtîjî serê Sofieyê ewqasî tevlihev kiribûn ku, wê xwest ew bîskê li bihurê rûnê.

Bihur, cihê Sofieyê yê bi dizî bû. Ew gava pir hêrs dibû, pir xemgîn dibû, an jî pir dilşa dibû dihate vê derê. Heçî iro bû, ew tenê ecêbmâyî mabû.

Xaniyê wan yê sor di hundurê baxçeyekî mezin de bû. Di baxçe de pir celebên gulan, deviyêñ dirîreşan, darêñ mîweyan, mîrgeke mezin ku di nava wê de hêlkanek hebû, û gava pîrka wê zaroka xwe ya pêşî anîbû û zarok tavilê miribû, ji bo teselîkirinê wan kulûbeyeke biçûk çêkiribûn. Navê keçika reben Marie bû. Li ser kevirê ber serê wê wilo nivîsandibûn: "Marie me ya biçûk hat, wilo xuya bû û dîsan bi paş de vegeriya."

Li binê quncika baxçe, nêzîkî deviyên dirîreşan, devîne tov yên ku ne dirîreş pê ve dihatin ne jî gul vedidan, hebûn. Di eslê xwe de ew çepera han ji bo ku baxçe ji daristanê vejetînin hatibû çekirin, lê paşê, piştî ku guh nedanê û lê miqate nebûn, ew devî gelekî tov bûbû. Pîrika wê behs dikir ku di dema şer de, bi xêra van deviyan, rovî nikarîbûn têketina baxçe û têkilî mirışkên li hewşê bibûna.

Eynî mîna qulika kîroşkan ya li jorî baxçe, ev deviyên han jî ji her kesî re bêmane dixuyan. Ji ber ku haya kesî ji cihê Sofie yê dizî tûnebû.

Ji mêj ve di nava çeperê de riyeke tengik çêbûbû. Gava mirov bi zikkêşkê dikete hundur, ji nava deviyan mirov dikete meydanekî fi-reh. Ev der mîna kulûbeyeke biçûk bû. Sofie dikarîbû êmin bûya ku wê kes wê li wir nebîne.

Sofie bi her du nameyên di destê xwe de baz da, ji baxçe derbas bû, xwe daqûl kir û kete nava deviyan. Bihur bi qasî bejna wê bilind bû, lê wê vê carê bi hin hejikan ser xwe nixumand. Wê dikarîbû di nava qulukên pel û deviyan de derve bidîta. Tu quluk ji mezînbûna pereyekî hesinî ne mezintir bû, lê dîsan jî gava wê di qulukan de li baxçe dînihîrî, wê dikarîbû hemû baxçe bidîta. Gava ew biçûk bû ew li vir rûdinişt, û gava dê û bavê wê li wê digeriyan wê bi kêf li wan temaşe dikir.

Sofie her difikirî ku ev baxçe bi serê xwe cîhanek e. Her gava ku wê di çîroka afirandinê de Baxçeyê Buhûstê dibihîst, ew li vê bihurê rû-dinişt û temâşekirina bihura xwe dianî ber çavêن xwe.

"Dinya çawa çêbû?

Ax, ger wê bizanîba! Wê dizanîbû ku dinya di zirecêba gerdûnê de stérkeke biçûcik bû. Lî, ma gerdûn bi xwe çawan çêbûbû?

Mirov dikare bifikire ku gerdûn her hebûye, wê çaxê pêwîst nedikir mirov li bersiva vê pirsê bigeriya. Lî ma tiştek *dikarîbû* her tim hebû-ya? Dengê ji hundurê wê digot ku ew baweriya xwe bi vê nayne. Diviyabû destpêka her tiştekî heyî hebûya, ne wilo? Diviyabû gerdûn jî demekê ji tiştekî din pêk hatibûya.

Baş e, ger gerdûn jî tiştekî pêk hatibe, ma ne diviyabû ew tiştekî din jî ji tiştekî din pêk hatibûya? Sofie têgihîst ku ew bi vî awayî tenê dix-waze pirsgirêkê hebekî bi paş bixîne. Dawî dawî diviyabû her tiş de-

mekê ji tune de destpêbûbu. Ma ev mumkun bû? Ma ev jî ne mîna fikra herhebûna cîhanê tiştekî bêimkan bû?

Ew li dibistanê fêr bûbûn ku dinya ji aliyê Xwedê ve hatiye afirandin. Ji ber ku bersiva herî baş ya hemû pirsgirêkan ev bû, hebekî bêhna Sofieyê hate ber wê. Lê pişti kîliyekê dîsan wê dest pê kir û ew fikirî. Ew dikarîbû bifikiriya ku Xwedê gerdûn afirandiye, lê ma kê Xwedê afirandiye? Ma wî xwe ji tune de çêkiribû? Dîsan dengek ji hundurê wê li dijî vê derket. Bêşik Xwedê dikarîbû her tişt biafiranda, lê ma wî dikarîbû xwe ji tune de biafiranda? Ger Xwedê her tişt afirandibe jî, wî ê xwe neafirandibe, ji ber ku ew ê nikaribe "xwe" berî hebûna xwe biafirine. Wê çaxê bi tenê bersivek dimîne: Hebûna Xwedê ya herdemî. Lê wê berî bi kîliyekê behsa vê tesadufê kiribû! Diviyabû destpêka her tişti hebûya.

– Xwedêyo!

Wê dîsan herdu name vekirin.

"Tu kî yî?"

"Dinya çawan çêbûye?"

Çi pirsên ecêb! Lê kê name jê re şandibûn? Ev jî mîna pirsan mijareke veşirî bû.

Yê ku Sofie ji jiyanâ rojane bi dûr xistibû û ew bi carekê ve spartibû sîrrîn gerdûnê kî bû?

Sofie cara sisiyan çû li qutîka posta xwe nihêri.

Nameger hê nû nameyêñ rojê anîbûn. Sofie destê xwe dirêjî hundûrê qutîkê kir û broşûren reklamê, rojname û nameyêñ ku ji diya wê re hatibûn şandin derxistin. Ji qutîkê karteke bi wêneyê peravî derket. Wê li pişta kartê nihêri. Kart bi pûleke norvecî hatibû şandin, bi "tabûra FN" hatibû mohirkirin. Gelo bavê wê ew kart neşandibe? Ma bavê wê niha ne li kujekî cîhanê yê din bû? Wekî din destnivîs jî ne ya bavê wê bû.

Sofie bi bêhnîkandin adres xwend. "Hilde Möller Knag, c/o Sofie Amundsen, Kuçeya Nefelê 3..." Dûmahiya adresê mîna ya Sofieyê bû. Li ser kartê ev nivîs hebû:

Hildeya delal.

Ez 15 saliya te ji dil pîroz dikim. Mîna ku tu ê jî bibînî, min xwest ji bo pêşdexistina te diyariyekê bidim te. Bibuhure ku min kart ji Sofieyê re şandiye. Ya herî hêsan ev bû.

Bî silavên evînî. Bavê te.

Sofie dîsan ber bi malê ve bazda û çû mûtfaxê. Ew pir bi kelecan bû.

Gelo ev Hildeya ku berî panzdeh saliya wê bi mehekê panzdeh saliya xwe dadigirt, kî bû?

Sofie ji korîdorê rahişt kataloga telefonê. Pir kesên ku paşnavê wan Möller û navê wan Knag bûn, hebûn. Lê di vê zirecêba katalogê de, yek jî nebû ku nav û paşnavê wê Möller Knag bûya.

Wê dîsan li karta nezelal nihêrî. Erê, rast bû, karteke bi pûl û bi mohr bû!

Wê ji bo çi bavekî karta ji keça xwe re li ser adresâ Sofieyê bişanda? Kijan bav, di rojbûyina keça xwe de, karteke wilo di riyên bi zîvironek de ji keça xwe re dişîne? Wilo çawan dibû "ya herî hêsan"? Ya ji her tiştî girîngtir: wê Sofie çawan şopa Hildeyê bidîta?

Bi vî awayî pirseke din jî li pirsên Sofieyê zêde bû. Wê dîsan fîkrêne xwe civandin ser hev:

Di çend saetên piştî nîvro de, sê sirr derketibûn pêşberî wê. Ya yekemîn, kê ew herdu zerfên spî avêtibûn qutiya postê. Ya duwemîn, pirsên zor ku di wan de hatibûn nivîsandin bûn. Sirra sêyemîn jî, bê Hilde Möller Knag kî bû, û karta ku ji vê keçîka nenas re hatibû şandin, li ser navê Sofieyê hatibû birêkirin.

Ew ji sedî sed bi têkiliyên van hersê pirsan êmin bû, ji ber ku ew heta roja îro tam jiyanekî normal jiyabû.

ŞEWQETAR

... Ya ku mirov dike filozof meraq e...

Sofie dizanîbû ya ku name jê re şandiye ew ê dîsan bi wê te têkeve têkiliyê. Wê birtyara xwe da ku ew ji kesî re behsa nameyan neke.

Wê li dibistanê nikarîbû baş guh bidaya mamostê xwe, tiştên ku

mamoste behs dikirin jê re pir bêmane dihatin. Ji bo çi mamoste qala çibûna mirovan û çêbûna dinyayê nedikir?

Hîseke ku wê heta niha qet hîs nekiribû pê re çêbûbû; li dibistanê û li derveyî dibistanê her kes bi tişên basid mijûl dibûn. An na ji dersên dibistanê yên normal wêdetir, pirsên mezin û zehmet ku diviyabû bi-hatina bersivandin hebûn.

Gelo mirovên ku bikarîbûna bersiva pirsên wilo bidana hebûn? Qet nebe ji berdêla jiberkirina kişandina lêkeran, Sofieyê fikirandina van pirsan girîngtir didît.

Gava zengil lêket, ew wilo pengizî derive ku ji bo Jorunn bigihîştayê diviyabû wê bi dû de baz bida.

Piştî demekê Jorunn ji Sofieyê pirsî:

– Em êvarî bi îskambîlan bilîzin?

Sofieyê milên xwe hejandin.

– Ez bawer nakim ku ez êdî bi lîstina îskambîlan mijûl dibim.

Ji ecêbmâyînê devê Jorunnê bihustekê vekirî ma.

– Baş e, tu ji lîstina tenîsê re çi dibêjî?

Sofieyê pêşî li asfalta erdê, paşê jî li hevala xwe nihêrî.

– Ez bawer nakim ku ez zêde bi tenîsê re jî mijûl dibim.

– Ha? Baş e bila wilo be!

Sofie aciziya dengê Jorunnê ferq kir.

– Wê çaxê behsa tiştên ku ji van biqîmettir e bike!

Sofie hêdîka serê xwe hejand.

– Ev... ev sirrek e.

– Hah! Qey tu dildar bûyî!

Ew kêliyekê bê ku tiştekî ji hev re bibêjin meşîyan. Gava ew gîhîştin ber seha fotbolê, Jorunn:

– Ez ê di sehê re herim, got.

“Çûyina di sehê re” riya herî kurt ya mala Jorunnê bû, lê belê Jorunn bi tenê gava ku mîvanê wan dihatin an jî gava ew diçû ser di-ranker ew di wir re diçû.

Ji ber ku Sofieyê dilê Jorunn hiştibû ew xemgîn bû. Ew bi carekê ve ewqasî xayizî bê ew kî ye û cihan çawan hatiye afirandin bûbû ku qet wextê wê ji lîstina tenîsê re nemabû. Gelo hevala wê dikarîbû ev fêhm bikira?

Ji bo çi bi pirsa herî girîng, belkî jî ya herî xwezayî re mijûlbûn ew-qasî zehmet bû?

Gava wê qutika postê vekir, wê lêdana dilê xwe yê bilez bihîst. Wê di qutiyê de pêşî nameyek ji bankê û çend zerfên zer yên ku ji diya wê re hatibûn şandin, dîtin. Sofie bi hêvî bû ku wê dîsan kesê nedîyar jê re name şandibe.

Gava wê deriyê baxçe girt, wê ji nişkê ve navê xwe li ser zerfeke zer ya mezin dît. Li pişt zerfê, "Kursa felsefeyê. Pir bi baldarî tevbigerin," nivîsandibû.

Soficeyê ji riya bi zuxur derbas bû û çenteyê xwe danî ser pêlikan. Wê ew nameyên din xist binê paspasa ber derî û bazda bihura xwe. Diviyabû nameya mezin li wir vebûya.

Sofie destûr da ku Shere Khan jî bi dû wê de baz bide. Çawan be psik ji kesî re behs nake.

Di zerfê de sê rûpelên ku bi deqtîlo hatibûn nivîsandin hebûn. Sofie dest pê kir û xwend.

Felsefe çi ye?

Sofieya delal. Hobiyên mirovan yên celeb bi celeb hene. Hinek ji mirovan kevnepereyan an jî pûlan didin hev, hinek bi hunera des-tan ve mijûl dibin, hinek jî bi şaxekî sporê re mijûl dibin.

Gelek mirov jî ji xwendinê hez dikin. Lê tiştên em dixwînin jî cihê cihê ne. Hinek tenê rojnameyan û romanên xêzikan dixwînin, hinek ji xwendina romanan hez dikin, hinek jî ji astronomiyê an jî ji pirtû-kên ku li ser heywan û keşifên teknîkê hatine nivîsandin hez dikin.

Yekî ku bi hespan an jî bi kevirên bi qîmet re mijûl dibe, divê ne li bende be ku her kesê pê mijûl bibe. Yekî ku ji televizyonê li hemû şaxên sporê temaşe dike, divê ew qebûl bike ku bêhna hinekan pir ji sporê teng dibe.

Gelo tiştên ku hemû mirovan eleqeder dikin hene? Kî dibe bila bi-be û li ku dijî bila bijî, gelo tiştekî ku hemû mirovan eleqeder bike heye? Erê, Sofieya delal, hin pirsên ku divê hemû mirov bipirsin he-ne. Ev kursa ha jî di derheqa van pirsan de ye.

Li jiyanê tiştê herî girîng çi ye? Ger mirov vê pirsê ji yekî birçî bîpirse ew ê bibêje xwarin e. Ger ji yekî ku ji serman li ber qefilandiye bê pirsîn ew ê bibêje, germahî. Ger ji yên ku xwe bi tenê dibînin re were pirsîn, ew ê bibêjin jiyana bi mirovên din re.

Gelo piştî ev hewcedarî hemû hatin cih, tiştên ku hê jî mirov hewcedar in hene? Li gorî filozofan, erê, hene. Filozof dibêjin ku mirov nikarin tenê xwarinê bixwin û bijîn. Helbet divê hemû mirov xwarinê bixwin. Hewcedariya her kesî bi hezkirin û balê heye. Lê ji derveyî van jî, hewcedariya mirovan bi tiştekî din heye. Mirov dixwazin fêr bibin bê ew kî ne û ji bo çi dijîn.

Mijûlbûna bi pirsâ ji bo çi em dijîn ne mîna hevdana pûlan "tesadûfî" ye. Kesênu ku bi pirsên wilo re mijûl dîbin, ew bi tiştekî ku ji çêbûna dinyayê û vir de li ser minaçeşe tê kirin ve mijûl dîbin. Zanebûna çawabûna gerdûnê, cîhanê û jiyanê, ji zanebûna ku kê di olimpiyadên par de çiqas zér girtine, girîngtir e.

Riya naskirina felsefeyê di pirskirina hin pirsên felsefi re derbas di-be: Dinya çawan hate afirandin? Ma hêz an jî maneyeke van kirinan heye? Ji bo çi divê em pirsên wilo bipirsin? Ya ji her tiştî girîngtir: divê em çawan bijîn?

Pirsên wilo di her deman de mirov mijûl kirine. Tu medeniyetênu li çêbûna mirovan û li afirandina dinyayê nepirsîbin tuneye.

Di eslê xwe de zêde pirsên felsefi ku em bikarîbin bipirsin tunene. Me ji van pirsan pirsên herî girîng pirsîn jî. Lê dîrok nişan dide ku her pirsâ tê pirsîn, bersivêن cihê distîne.

Yanî pirskirina pirsên felsefi, ji bersivdayîna van pirsan hêsanter e.

Di roja me de, divê her kes berisva van pirsan bi xwe bide. Em nikarin bi nêrîna li ansiklopediyekê fêrî hebûna Xwedê an jî hebûn û nebûna jiyana piştî mirinê bibin. Ansiklopedî nikare ji me re bêje bê divê em çawan bijîn. Wekî din gava mirov bizanibe yên berî me çawan fikirîne, dikare di avakirina nêrîna me ya dinyayî de bibe aîkar.

Mirov dikare têkoşîna filozofan ya dîtina rastiyê bişibîme romaneke dedektif. Li gorî hinekan yê mîrkuj Andersen e, li gorî hinekan Nielsen e û li gorî hinekan jî Jepsen e. Di çîrokeke polisi ya rastin de, rojek tê, polis pirsgirêkê çareser dike. An jî polis qet pirsgirêkê çareser nake. Çi dibe bila bibe, çareserkirineke pirsgirêkê heye.

Ger bersivdayina pirsekê zehmet be jî, dikare were fikirandin ku

bi tenê bersiveke pirsê heye. Piştî mirinê bi celebekî jiyan an heye an jî tuneye.

Hinek pirsên ku berê hatine pirsîn, zanistiyê ew bersivandine. Demekek çawabûna rûyê heyvê ji mirovan re sirreke mezin bû. Mirov qet nikarîbû li ser mijarêni wilo bipeyiviya jî; Her kesî dikarîbû li gorî hêza xeyala xwe bersiva xwe bida. Lê em îro dizanin bê heyv çawa e. Ëdî em bawer nakin ku li ser heyvê peyayek dijî an jî heyv ji penîr pêkhatiye.

Li gorî filozofekî yunanî ku berî niha bi du hezar salan jiyaye, felsefe ji meraqa mirovan zaye. Li gorî wî, mirov li hebûna xwe ecêbmayî dimîne; piraniya pirsgirêkên felsefi jî wilo ji ber xwe ve derdikevin holê.

Mirov mîna temâşevanên sihêrbaziyekê ne: Em fêhm nakin bê sihêrbaz çawan dike. Em dixwazin bizanibin çawan ji cotek destmalen spî kîroşk derdikevin.

Ji bo gelek mirovan cîhan, mîna şewqetarê ku sihêrbaz kîroşk jê derxistiye; ne karê aqilan e.

Di mesela kîroşkê de em dizanin ku sihêrbaz me dixapîne. Tiştê em meraq dikan ew e ku sihêrbaz çawan dikare wilo bike. Gava em behsa dinyayê bikin, rewş hebekî guherî ye. Em dizanin dinya ne ji sihêrbaziyê ava bûye, ji ber ku em jî li dinyayê dijîn û em perçeyek ji dinyayê ne. Di eslê xwe de yê ku ji şewqetarê sihêrbêz derdikeve em in. Ferqa me û kîroşkê ew e ku, kîroşk nizane ku ew jî daxili lîstika sihêrbaziyê ye. Heçî em in em bawer dikan em perçeyek ji tiştên sîrrî ne û em dixwazin fêrî peywendiyêni navbera tiştan de bibin.

Not: Me behsa kîroşka spî kir, baştir e em kîroşka spî beramberî hemû gerdûnê bikin. Em yên ku li vir dijîn, em mîna kêzikên biçûk yên ku di rehêni pirça kîroşkê de dijîn in. Heçî filozof in, ew bi ziravmûyen kîroşkê ve radipelikin û li hundurê çavêni sihêrbêz dinihêrin.

Ma tiştê ku dibêjim tu fêhm dikî Sofie? Wê dewama wê were.

Sofie mehû bûbû. Fêhmkirin? Gava wê dixwend nedihat bîra wê ku wê bêhna xwe digit û berdida.

Kê name anîbû? Kê, kê?

Ev ne ew ê ku ji bo Hilde Möller Knagê karta rojbûnê şandibû, ji ber ku kart hem pûlkirî û hem jî mohrkirî bû. Wan ev zerfa zer jî mî-

na herdu nameyê din dîrek xistibûn qutîka postê.

Sofieyê li saeta xwe nihêrî. Saet sisê kêm çarîkek bû. Hê du saet mabûn ku diya wê ji kar vege riya.

Sofie dîsan çû baxçe û ber bi qutiya xwe ya postê ve bazda. Gelo dîsan jê re name hebû?

Di qutîkê de dîsan zerfeke zer hebû. Sofieyê li dora xwe nihêrî, lê wê kes nedît. Ew ber bi hêla daristanê ve reviya û li şiveriyê nihêrî. Kes li wir jî tunebû.

Mîna ku dengek ji daristanê hatiyê. Lê ew baş bi deng ne bawer bû, wekî din ger yekî baz bida û bixwesta bi dûr bikeve jî ew nikarîbû bi dû wî de baz bida û ew bigirta.

Sofie çû hundur, çenteyê xwe danî û nameyê diya xwe bi cih kirin. Wê paşê bazda odeya xwe, qutîka biskiwîta ya ku wê tije kevirên xwesik kiribû, vala kir û ew herdu zerfên xwe yên mezin xistinê. Wê paşê rahişt qutîkê û bazda baxçe. Berî ew derkeve jî, wê xwarina Shere Khanê dayê.

– Were pişo pişo pişo!

Hema ku ew gihişte bîhurê, wê zerf vekir. Dîsan kaxezênu ku bi deqtilo hatibûn nivîsandin di zerfê de hebûn. Wê dest pê kir û xwend:

Benderuheke ecêb

Va ye em dîsan bi hev re ne. Wê ev kursa filozofiyê perçê bi perçê were, ez ê di vir de jî mîna destpêkê behsa hin tiştan bikim.

Min gotibû, ji bo ku mirov bikaribe bibe filozofekî baş ya herî gîring hebûna hêza meraqê ye, ne wilo? Ger min berê negotibe, va ye ez niha dibêjim: JI BO KU MIROV BIKARIBE BIBE FİLOZOFEKÎ BAŞ TENÊ TIŞTEK PÊWÎST E, EW JÎ QABILIYETA MERAQÊ YE.

Ev qabiliyet li ba hemû zarokên biçük heye. Na bila tunebûya! Pişti zarok çêdibin û bi çend mehan ew bi rastiyeye pir cihê ve rûbirû dîbin. Gava ew mezin dîbin, mîna ku qabiliyeta wan ya meraqê kêm dibe. Gelo ji bo ci wilo dibe? Ma Sofie Amundsen bersiva vê pîrsê dizane?

Yanî, ger zarokeke nûçêbûyî bikarîba bipeyiviya, wê ji me re bigota bê ew hatiye cîhaneke çiqasî ecêb. Ji ber ku em dibînin ger zarak nepeyivin jî, ew bi tilîkan tiştên der û dora xwe nîşan didin, ew bi meraq dest davêjin alavêr der û dora xwe.

Gava zarok fêrî çend gotinan dibin, her cara ku ew kûçikan dibînin, ew li ber wan radiwestin û dibêjin: "Haw haw!" Gava em zarokekî di erebeya xwe de ku çav li kûçikekî dikeve û dest û lingên xwe li ba dike û dibêje: "Haw haw! Haw haw!" dibînin, em yên ku ewqas sal jiyane, vê tevgera zarokê hebekî zêde dibînin. Em dibêjin: "Erê, erê" "Haw haw lê! Lê tu niha di erebeya xwe de rûne." Kellecana me bi qasî ya zarokê ranabe, ji ber ku me gelek kûçik dîtine.

Gava zarok çav li kûçikan dikevin, heta bala wan belav nebe, belkî ew sed carî vê dînîtiya xwe dubare dikin. Hê berî zarok fêrî peyvê bibin, an jî hê berî ew -tam fêrî ramana felsefî bibin- ew fêrî cîhanê dibin.

Cî heyf e, ger tu ji min bipirsî!

Sofieya delal, ez naxwazim tu bîbî yek ji wanênu ku cîhanê hazır dibînin û wê wilo qebûl dikin. Ji bo ku em ji vê êmin bin, berî em dest bi kursa felsefeyê bikin, em ê hebekî din jî serê xwe biêşînin.

Bifikirî ku tu rojekê derketiyî daristanê. Tu bi carekê ve, li ser şive-rêkê keştiyeke biçûk ya esmanî dibîni. Ji keştiya esmanî benderuhêkî marsî (ji gerestêra marsê) derketiye, rawestiyaye û li te dinihêre...

Te ê wê çaxê ci bigota? Guh mediyê, ev zêde ne girîng e. Gelo tu get li hebûna benderuhêkî marsî fikiriyi?

Îmkanê ku tu rojek ji rojan pêrgî mirovêkî ji gerestêreke din werî pir kêm e. Em hê nizanin bê li gerestêrkên din jiyan heye an na. Lê belê şansê ku tu pêrgî xwe werî bilind e. Kî zane, belkî rojekê, tu xwe ji nişkê ve bi çavekî din bibîni. Belkî tu wê kêliyê li daristanê bî.



Ez benderuheke ecêb im, tu ê bifikirî. Ez heywaneke mîstîk im...

Tu ê bibî mîna tu ji xeweke xweş ya sedsalî şiyar dibî. Ez kî me? tu ê bipirsî. Tu dizanî tu li devereke gerdûnê yî. Baş e, lê gerdûn çi ye?

Ger tu rojekê wilo pêrgî xwe werî, tê wê manê ku mîna pêrgîhatîna benderuhê marsî te tiştekî sîrrî keşif kiriye. Ji berdêla dîtina benderuheki ji gerestêrkeke din, tu ê ji hundurê xwe hîs bikî ku tu bi xwe ji benderuheke wilo ecêb î.

Ma tiştên ez dibêjim tu fêhm dikî Sofie? Em li tiştekî din jî bifiki-rin:

Sibehhekê dê û bav û Tomasê 2-3 salî li mûtfaxê rûniştine û taşte dixwin. Dê radibe ser xwe, paşê xwe bi masê vedike û bi dezgehê re mijûl dibe. Çi dibe di wê de demê dibe, bav ber bi zikê xêñî ve bilind dibe û bi zikê xêñî ve dizîvire. Tomas radiweste û li bavê xwe temâşê dike.

Bi te Tomas wê çaxê çi dibêje? Belkî ew destê xwe ber bi bavê xwe ve dirêj dike, - Binere, bavo difire! dibêje.

Bêşik wê Tomas ecêbmâyî bimîne, lê ji xwe ew hertim ecêbmâyî dimîne! Bavê wî her tim tiştên wilo ecêb dike, firrîna wî ya ji ser masê wê jê re ecêb neyê. Ma ne bavê wî ye yê ku her sibeh bi makîneye-ke komîk riya xwe kurr dike, yê ku derdikeye ser xêñî û antêna tele-vizyonê dizîvirîne û yê ku daqûlî motora erebeyê dibe û mîna zenci-yekî derdikeye?

Niha dora dayikê ye. Tiştê Tomas dibêje ew dibihîze û bi lez li wan dizîvire. Bi te wê reaksiyona wê çawan be?

Ji nişkê ve şûşa rîçalê ji destê wê dikeye û ew bi ecêbmâyîn diqîre. Ger bav careke din li ser kursiya xwe rûne jî, belkî dîsan pêwîstiya dê bi çûyîna ser doktor hebe. (Ev mîrik hê jî fêrî rûniştinê nebûye!)

Bi te reaksiyona Tomas û diya wî ji bo çi wilô ji hev cûda ye?

Têkiliya vê bi hîmbûnê re heye. (Vê not bike!) Dê fêr bûye ku mirrov nikarin bifirin. Heçî Tomas e ew fêr nebûye. Ew hê nizane li dinyayê çi mumkun e û çi ne mumkun e.

Lê cîhan bi xwe çawa ye, Sofie? Ma bi te ew mumkun e? Çawan be ew dizîvire!

Hêla vê ya xemgînî ew e ku gava em mezin dibin em fêrî qanûnên erdkêşanê dibin. Em di eynî wextê de fêrî hemû dinyayê jî dibin.

Tiştê tê fêhmîrin, gava em mezin dibin, em qabileyata xwe ya meraqkirina dinyayê winda dikin. Em bi vê yekê tiştekî xwe yê gele-

kî bi qîmet winda dîkin, ya ku filozof dixwazin dîsan di me de jîndar bikin, ev e. Digel her tişti, dengek ji hundurê me ji me re dibêje ku jiyan sîrreke mezin e. Ev hîseke ku hê berî em fêrî fikirandinê bûbûn e.

Ez binê wê xêz dikim: Digel ku pirsên felsefi her kesî eleqeder dike, lê her kes nikare bibe filozof. Ji ber gelek sebebên cihê pirr mîrov wilo dibin hêşîrên jiyanâ rojane ku, mehkemekirina jiyanê li dû xwe dihêlin. (Ew ji xwe re di bin pirçika kîroşkan de jiyanâ bi dilê xwe dijin û heta dawiya jiyanâ xwe ji di wir de dimînin.)

Ji bo zarokan dinya û her tiştên li dînyayê *nû* ne, her tişt balkêş in. Heçî ji bo mezinan e rewş qet ne wilo ye: ji bo piraniya mezinan dinya tiştekî normal e.

Heçî filozof in ne wek mezinên din in. Filozofek qet nikare fêrî dînyayê bibe. Dînya ji bo wî hê ji ne karê aqilan e, erê, hê tiji sîrr e, tiştekî mîstîk e. Hêlên filozofan û yên zarokêni piçûk ku pir dişibin hev ev e; tu dikarî vê bibêjî, ku filozofek di hemû jiyanâ xwe de mîna zarokekî diltenik dimîne.

Niha dora hilbijartinê ya te ye Sofie: Gelo tu hê ji zarokeke biyaniyê cîhanê yî, an ji tu filozofek i ku naxwazî fêrî cîhanê bibî?

Ger tu bi bersiva vê pirsê milê xwe bihejînî û xwe ne mîna zarokekê ne ji mîna filozofekî bibînî, sebeba wê ew e tu hînî dînyayê bûyi, loma tu ecêbmayî namînî. Ger rewş wilo be, talûke ye. Û loma tu vê dersa felsefeyê dibînî. Ez naxwazim tu bibî yek ji wan mirovên pûç û guhnedêr, lê ez dixwazim tu jiyanekî şiyar bidomînî.

Ev kurs belaş e. Wekî din şertekî ku tu kursê nedomînî tu ê perên xwe bi şûn de bistînî ji tuneye. Ger tu bixwazî kursê nîvcî bihêlî ji tu û kêfa xwe yî. Ger tu bixwazî dev ji kursê berdî, bi riya qutîka postê haya min bigîhînê. Mesele tu dikarî beqekî têxî qutîkê. Lê di-vê tiştekî di rengê qutîkê de be. An na yê nameger dikare ji tırsan bêhiş bikeve.

Ger em bi kurtî bibêjin: Ji şewqetarekî vala kîroşkek derdikeve. Ji ber ku kîroşk pir mezin e, ev lîstîka sihêrbaziyê wê bi milyaran sal bigire. Ji serê ziravmûyen kîroşkan zarok têne dînyayê. Loma zarok di rewşekî ecêbmayîna vê sihêrbaziya mezin de ne. Lê gava ew mezin dibin, ew xwe diepişinin binê eyarê kîroşkê. Ü ew li wir dimînin. Wir ewqas rehet e ku, ew careke din cesaret nakin bi ziravmûyan ve rapelikin. Bi tenê filozof cesaret dîkin têkevin riyekî wilo talûke ku

diçe serê sînorêñ zemên û hebûnê. Ger hinek negihîjin û li dawiyê bimînîn jî, piranî xwe bi ziravmûyêñ kîroşkê digirin û bangî yên li jîr ku li ser çermê kîroşkê yê nerm belav bûne û li gora dilê xwe dixwin û vedixwin dike:

– Gelî Mîrza û Stiyan, dibêjin. Em di gerdûneke vala de dizîvirin! Lê yên di bin çerm de ne, ew guh nadin gotinêñ filozofan.

– Ev çîma wilo qerebalixê dikin! dibêjin. Ew paşê jî peyva xwe di-domînin: Tu dikarî ji kerema re rûn dirêjî me bikî? Îro borsa çiqasî bilind bûye? Kîloya firingiyan bi çiqasî ye? Dibêjin wê zarokeke din jî Lady Di re çêbibe, ma we bihîstiye?

Gava diya wê hat malê Sofie di rewşike pir şâşmayî de bû. Nameyên mîstîk yên ku filozofan jê re şandibûn, wê di bihurê de veşartibûn. Sofie hewl dabû ku dersa xwe çêbike, lê tiştê ku xwendibû, tenê lê fi-kirîbû.

Çiqas tişt hebûn ku ew heta niha qet lê nefikirîbû! Ew êdî ne zarok bû, lê ew tam mezin jî nedihate hesibandin. Sofie têgihîst ku wê dest pê kiribû û ew diket bin postê kîroşkê yê tov ku ji şewqetarê gerdûnê derketibû. Filozof (gelo ew jin bû an mîr bû?), bi qemçika paş stûyê wê girtibû û ew derxistibû ser rûyê çerm, ew derxistibû wan deverên ku wê di zaroktiya xwe de lê lîstibû. Te digot qey Sofie cara pêşî li ser ziravmûyan dinya didît.

Bêşik filozof Sofie xelas kiribû. Xwediyê nameyan, wî mirovê nedîyar Sofie ji jiyanra rojane û basîd rizgar kiribû.

Gava diya wê saet li dor pêncê piştî nîvro hate malê, Sofieyê bi destê wê girt û ew li ser kursiyê da rûniştandin:

– Yadê, got. Ma bi te jiyan ne ecêb û fantastîk e?

Serê diya wê wilo tevlihev bû ku nizanîbû wê ci bersiv bidayê. Ji ber ku bi piranî gava ew dihate malê, Sofie rûniştibû û dersa xwe dixwend.

– Çîk... erê, diya wê got, carinan wilo ye bi rastî.

– Carinan? Tiştê ez dibêjim ne ev e: ma *hebûna* vê dînyayê ne tiştekî ecêb e?

– Lî Sofieyê, ev tu ci dibêjî wilo!

– Çîma? Ma bi te dînya tiştékî pir normal e?

– E, jî xwe. Qet nebe piraniya caran.

Sofie heq da filozof. Mezinan dinya normal didîtin. Ew ji mêt ve ketibûn xewa xweş ya rojane ï sedsalane.

- Hah! Tu wilô fêrî dinyayê bûyî ku êdî dinya bi te ecêb nayê.
- Tu çi dibêjî!
- Ez dibêjim tu fêrî dinyayê bûyî. Tu ji tiştekî fêhm nakî!
- Na Sofie, tu nikânî wilô bi min re bipeyivî!
- Wê çaxê ez bi şiklekî din ji te re behs bikim: tu niha di binê çermê kîroşka spî ku di şewqetarê gerdûnî de dijî de yi. Tu ê bêhnek din patatan deynî ser êgir. Paşê tu ê rojnameyê bixwînî û piştî ku tu nîv-saetekê çavêن xwe nerm bikî tu ê li nûçeyan guhdarî bikî.

Di rûyê diya wê de îfadeyeke şikdar xuya bû. Tam mîna Sofieyê gotibû ew çû mutfaxâ û wê patat danî ser êgir. Paşê ew vege riya odê û vê carê wê Sofie li ser kursiyekê da rûniştandin.

- Ez di xwazîm li ser mijarekê bi te re bipeyivim, wê got.
- Sofie ji dengê diya xwe fêhm kir ku ev tiştekî cidî ye.
- Têkiliyên te bi narkomanan re çênebûne, ne wilô cana min?
- Sofie keniya, lê wê dizanibû bê çîma diya wê niha ev pirs jê pirsî.
- Ma tu dîn ï yadê? wê got. Wê çaxê wê mirov hê pûçtir be!
- Piştî wê nîvroyê ne behsa narkomanan ne jî behsa kîroşkên spî hate kirin.

MIT

...dengeyeke nazik di navbera hêzên baş û xerab de...

Dotira rojê ji Sofieyê re tu name nehatibû. Wê li dibistanê rojeke dirêj û nexweş buhurand. Di navbiran de wê xwest ku bi Jorunnê re be. Di vege ra malê de, wan biryar dan ku hema şılı rabe ew ê bi hev re bi çadiran kampê bikin.

Ev e, Sofieyê dîsan li ber qutîka xwe ya postê bû. Wê pêşî zerfeke piçûk ya bi mohra Meksîkayê dît. Bavê wê ew kart şandibû. Bavê wê nivîsandibû ku wî bêriya malê kiriye û cara pêşî wî bi satrançê zora kaptanê xwe biriye. Wekî din jî wî ew pirtûkên di giraniya bîst kîloyan de ku ji malê bi xwe re biribûn, hemû xwendibûn.

Ü erê, di qutîka postê de, zerfeke zer ku navê wê li ser nivîsî bû jî hebû! Sofie çenteyê xwe û nameyên din danîn malê û bazda bihura

xwe. Wê ji zerfan rûpelên ku bi deqtiloyê hatibûn nivîsandin derxistin û dest pê kir û xwend:

Wêneya mîtî ya cihanî

Rojbaş Sofiel Karê me gelek e, divê gelek tişt werin gotin, ya baş ew
e demekê zûtir dest pê bibe.

Gava em dibêjin felsefe, em ramana nû ya ku berî Îsa bi 600 salî li Yunanîstanê zaye, qest dikan. Berî vê, dînên cihê cihê ji hemû pirsgirêkên mirovan re dibûn bersiv. Ev celeb şiroveyên dînî, bi riya mîtan ji nifşan gihişte nifşan. Mît, di şirovekirina jiyanê de Xwedayî ye.

Bi hezarsalan, pirsên felsefi bi dînî hatine şirovekirin. Heçî filozofen yunanî ne, xwestine nîşan bidin ku divê mirov baweriya xwe bi van bersivan neyne.

Ji bo em bikaribin ramana filozofên pêşî fêhm bikin, divê em fêrî nêrîna cihanê ya mîtî bibin. Em vê bi hin termên mînakên mîtî yên Skandinavyayê şirove bikin. Tiştê em lê digerin piraniya caran li ber me ye!

Ji sedî sed tebihîtiye ku behsa Tor'ê xwedî çakûç hatiye kirin. Li Norvecê, berî belavbüna xirîstaniyê, xelkê bawer dikirin ku Tor li esmanan bi erebeyeke ku du nêrî dikişînin siwar e û digere. Gava Tor çakûçê xwe li ba dikir, birûskê vedida û bahoz radibû. Gotina "bahoz" ji vê tê: "Tordön" an jî teqîna Tor. Bi swêdî jî birûsk "âska" ye û li esmanan tê mana "gera Xwedê"

Piştî brûsk û bahozan baran dibare. Bêşik di dema Vîkîngan de, ji bo yên ku bi cotkariyê û bi zeviyan re mijûl bûn, baran pir muhîm bû. Loma wan mîna Xwedayê bereketê baweriya xwe bi Tor dianîn.

Yanî, ji bo ci baran dibare?, bersiva vê pirsê ya mîtî hejandina çakûçê Tor bû. Gava baran bibare wê zevî şîn bibin û zad bilind bibin.

Nebatênu ku ji erdê çêdibin, fêhmkirina mezînbûn û mîwedayîna wan jî zehmet bû. Lê mirov têdigihîstin ku têkiliyeke vê bi baranê re heye. Û têkiliyeke baranê bi Tor re hebû. Vê yekê jî nîşan dida ku Tor yek ji Xwedayên girîng e. Yek ji sebebêñ din jî yê ku Tor dikir Xwedayekî girîng pergala cihanê bû.

Vîkîngan wilo bawer dikirin ku li cihanê cihê ku mirov lê dijîn gîraveke ku her tim di bin tehdîda talûkeyên derveyî de ye. Wan ji vî beşê cihanê re Midgård digotin. Ev gotina han tê maneya qiraliyeta hundurî. Li Midgårdê, mala Xwedayan Asgård jî hebû. Li derveyî

Midgårdê Utgård, yanî qiralê derveyî cih digirt. Li vir, Hûtên mezin yên ku di her firsendê de dixwestin cihanê mehû bikin, dijyan. Em ji benderuhêن wilo tiji xerabî re "hêzên kaos" jî dibêjin. Di dinê Skandinavî de û hema bêje di hemû kulturan de, mirovan di nava hêzên çê û xerab de dengeyeke nazik didîtin.

Yek ji xerabiyêñ ku Hûtan (dewan) dikaribûn li cihanê bikirana ji revandina Xwedaya bereketê Fröja bû. Ger wan bikaribûna Xwedaya bereketê birevandina êdî wê tiştek şîn nehata û wê jinan hew zarak bianîna. Loma pir girîng bû ku Xwedayê qencyî li dijî van derketa.

Tor li vir jî roleke girîng dileyîst. Çakûçê wî ne tenê ji bo barandina baranê bû, ger pêwîst bibuya wî çakûçê xwe mîna silehekê li dijî hêzên talûke bi kar tanî, û hêzeke bêsinor dida wî. Gava wî çakûçê xwe davete Hûtan, Hût dimirin. Tırsa wî ji wendakirina çêkûç jî tûnebû, ji ber ku çakûçê wî her li wî vedigeriya.

Ev, şirovekirineke mîtî ya çawan parastina pergala xwezayê bû. Filozofan jî dixwestin ji van celeb şiroveyan xelas bibin.

Lê pirsgirêk ne bi tenê şirove bûn.

Mirov nikanîbûn rûniştana û li benda ziwhiyê û nexweşiyêñ ku ji hev derbas dibûn rawestiyana. Diviyabû wan li dijî xerabiyê şer bikirana. Wan ev jî bi hin kirinêñ dînî an jî bi duan dikirin.

Di dema Víkîngan de, yek ji kirinêñ herî girîng dayîna qurbanan bû. Ger mirov qurbanek bidaya Xwedayekî wê qurbêñ ew Xweda bi hêztir bikira. Ji bo ku Xwedayan bikaribûna zora hêzên kaos bibirana, wan qurban didan Xwedayan. Bi piranî mirovan heywanek dikirin qurban. Bi gelempêrî bizin ji Tor re dikirin qurban. Carinan însan jî ji Xweda Odin re dihatin qurbankirin.

Li Norvecê, yek ji mîtîn ku pir tê zanîn, di destana Trymskvida de ye. Li gorî destanê carekê Tor di xew re diçe; gava şiyar dibe dibîne ku çakûçê wî tuneye. Tor ji vê rewşa ha pir hêrs dibe, desten wî ji hêrsan dilerizin, riha wî ji hêrsan tevdilive. Ew bi hevalê xwe Loke re diçe ba Fröjayê û dixwaze baskên wê deyn bike. Ew ê Loke bi van baskan bifire Jotunheimenê û fêr bibe ka bê Hûtan çakûçê Tor dizî ne an na. Loke li wir pêrgî qiralê Hûtan Trym dibe. Trym bi fort dibêje ku wî çakûç di bin heft tebaqên erdê de veşartiye. Û, ew dibêje ku ger ew bi Fröjayê re nezewice ew ê çêkûç nede wan.

Ma tu fêhm dikî Sofie? Xwedayêñ qenc her tim di talûkeyeke ecêb ya rehîngirtinê de ne. Hûtan sîlahêñ Xwedayan yên herî girîng bi

dest xistine ku ev ne karê aqila ye. Gava çakûçê Tor dikeve destên Hûtan, ew li ser cihana mirov û Xwedayan dibin xwediyê hêzeke xurt. Ew ji berdêla çêkûç Fröjayê dixwazin. Lê guhaztineke wilo ji tiştekî bêimkan e: Ger Xweda, Xweda bereketê bidin Hûtan, ew ê hêşnayî hişk bibe û ew ê mirov û Xweda bimirin. Dawî dawî wê pir nebaş here. Ger xwesteka wan bi cih neyê, wê bobelatên ecêb çêbin, Ger tu li grûbeke terorîst ya ku bi tehdîdî dibêjin ku ew ê li na-venda Londrayê an jî Parîsê bombeyekê biteqînin, bifikirî, tu ê têbi-gihêjî ku ez ci dibêjîm.

Li gorî Mítolojiyê, Loke vedigere Asgårdê. Ew ji Fröjayê re dibêje ku divê ew kincêن bûkaniyê li xwe bike û dê wê ji Hûtan re bibe. (Lê belê! Ci heyf!) Fröja pir hêrs dibe û ger ew here bi Hûtekî re bizewice wê her kes bibêjin ew mîrhez e.

Di vê navê de fikreke rohnî tê Xweda Heimdal. Ew pêşniyaz dike ku ji berdêla Fröja Tor kincêن bûkaniyê li xwe bike. Ger porê Tor were girêdan û ji berdêla pêşiran keviran têxin sînga wî, ew ê Tor bi-şibe jinan. Kêfa Tor ji vê pêşniyazê re nayê, lê belê ji ber ku ew di-zane ancax Fröja bi vê riyê ji destên Hûtan xelas bibe ew bi a Heimdal dike.

Dawî dawî Tor kincêن jinan li xwe dike û Loke jî mîna alîkar pê re diçe.

"Wê çaxê em herdu jin bi hev re herin Jotunheimenê", Loke dibêje.

Bi zimanê modern mirov dikare bibêje ku Tor û Loke "polisê an-tîterorê ne". Ew ê bi kincêن jinan herin warê Hûtan û ew ê çakûçê Tor ji wir rizgar bikin.

Hema ku ew digihîjin Jotunheimenê, Hût dest bi amadekirina da-wetê dikan. Li dawetê bûk -yanî Tor- gayekî sihê û heyşt laksan (cû-re masiyek) dixwe. Û bi xwarinê re ew sê kûp bîra vedixwe. Ev yeka han Trym ecêbmayî dihêle, û tu nemaye "komandoyên" ku kincên jinan li xwe kirine eşkere bibin. Lê Loke zora vê rewşa talûke dibe. Ew dibêje ku ji bêrîkirina Fröja ya hatina Jotunheimenê, ev heyşt ro-jen wê ne ku wê tiştek nexwariye.

Trym devrûka ser rûyê bûkê bilind dike da wê maçî bike, lê gava ew çav li tûjeawirêñ Tor dikeve, ew poşman dibe. Loke vê carê ji rewşê xelas dike. Ew dibêje ji ber kêfa dawetê heyşt şevan xew neke-tiye çavên bûkê. Trym emir dike da çêkûç bînin û di dema mehrbirî-nê de deynin ser çonga bûkê.

Tê gotin ku gava çêkûç datînin ser çonga Tor, Tor bi pirqînî dikene. Ew pêşî Trym bi çêkûç dikuje, paşê ji ew hemû malbata Jotun dikuje. Ew drama terorî ya ne xweş bi xweşî dawî tê. Tor, "Superman" an ji "James Bondê" Xwedayan zora hêzên neqenc biribû.

Ev mît weha bû Sofie. Lê bi rastî ew dixwaze ci bibêje? Ew ne ji këfi hatiye lihevanîn. Ev mîta ha ji dixwaze tiştekî rohnî bike.

Şirovekirinek dikare weha be: Gava li her derê welêt ziwhahiyê dest pê dikir, mirovan dixwestin bizanibin ku ji bo ci baran nabare. Belkî qey Hûtan çakûçê Tor dizibûn?

Mirov dikare bifikire ku mîtan hewl didan ku guherandinê dem-salan şirove bikin. Xweza zivistanan dimire, ji ber ku çakûçê Tor li Jotunheimenê ye. Lê biharan ew çêkûç bi dest dixe. Bi vî awayî mît dixwazin tiştên ku nayêñ fêhmkirin ji mirovan re şirove bikin.

Lê mît tenê şirove nave. Mirovan bi mîtan ve girêdayî merasimên dînî yên cihê dikirin. Mirov dikare bifikire ku mît dihatin dramatî-zekirin û ew di demên zehmet û demên ziwhahiyê de jîndar dibûn. Belkî peyayekî ji gund kincen jinan li xwe dikir -kevir dixist şûna pêşiran- ji bo ku ew bikaribe çêkûç ji Hûtan bidize. Ev ji bo mirovan riyek bû ku wan dixwestin pê baranê bibarînin û bikin ku li zeviyan zad hêşin werin.

Em bi esehî dizanin mirovan li perçeyên cîhanê yên din "mîten demsalan" dramatîze kirine da tevgera xwezayê bi lez bikin.

Heta vir me tenê çavek li cîhana mîtolojiya Skandinavyayê gerand. Bêhejmar mît li ser Tor û Oden, Frej û Freja, Höder û Balder hene - û li ser gelek, gelek Xwedayan. Berî filozof têkili vê yekê bibin, kiri-nêñ wilo mîti li her devera cîhanê hebûn. Li Yunanîstanê ji di dema zayîna filozofiyê de, wêneyekî mîti yê cîhanê hebû. Bi sedsalan çiro-kên wan yên Xwedayî ji nifşan gîhîştibû nifşan. Li Yunanîstanê navê Xwedayan Zeus, Apolon, Hera, Athena, Dionysos, Herakles û He-faistos bû. Ev tenê hinek ji wan bûn.

Bi texmîni 700 salî berî İsa piraniya mîtolojiya kevneyunanê ji ali-yê Homeros û Heseiodos ve hate nivîsandin. Vê yekê rewseke nû afirand. Gava mît hatin nivîsandin, êdî mirov dikarîbû li ser wan minaqeşe ji bikira.

Filozofen pêşî yên yunanî teoriya Homeros ya Xwedê rexne kirin, ji ber ku ew hem dişibîyan mirovan û hem ji ew mîna mirovan bêba-werî û egoist bûn. Ew cara pêşî bû hat gotin ku mît ji ali-yê mirovan

ve hatiye afirandin.

Filozof Xenophanes ku bi texmînî berî Isa bi 570 salî jiyaye, yek ji rexnegirê vê mîtê bû. Ew dibêje: "Mirovan Xweda li gora xwe çêkirine, û wilo bawer dikin ku Xweda mîna me çêbûne, û mîna me bûne xwediyên laş, ziman û kincan. Neger (çermreş) bawer dikin Xweda reş in û pozplexî ne, lê trakyayî dibêjin ku Xwedayêwan çavşîn û zer in. Belê, ger ga, hesp û şêran bikarîbûna resim çêbikiranâ, wan ê Xweda mîna ga, hesp û şêran çêbikirana!"

Tam di van deman de yunaniyan li Yunanîstanê, li koloniyen Yunanîstanê, başûrê İtalyayê û Asyaya biçûk gelek dewletên bajarî ava kirin. Li van dewletan hemû xebata bi dest û bi bedenê ji aliyê koleyan ve dihate kirin û hevwelatiyên azad ji wextê xwe bi politika û bi kultûrê re dibuhurandin.

Li dorhêla vê jiyana bajaran di şiklê ramana mirovan de guherti-nêñ mezin çêbûn. Kesekî bi serê xwe dikarîbû pirsên organîzasiyona civakê bikira. Û herweha kesekî bi serê xwe, bê ku ew guh bide mîta kevin, dikarîbû pirsên felsefi ji bikira.

Em dibêjin bi vî awayî em ji ramanên mîstîk derbasî ramanênu ku li ser tecrubeyan û êgil ava bûbûn, bûn. Armanca filozofen yunanî yên destpêkê ew bû, ku ew şiroveyen xwezayî ji bûyer û tevgerên xwezayê re bînin.

Sofie di wî baxçeyê mezin de diçû û dihat. Wê hewl dida ku hemû tiş-têñ li dibistanê fîr bûye ji bîr bike. Ya herî girîng ew bû ku ew hemû tiştêñ dersa ilmê xwezayê ji bîr bike.

Ger bê ku ew tiştekî ji xwezayê fêhm bike û ew di vî baxçeyî de bijî, wê hebûna biharê çawan fêhm bikira?

Gelo wê ji bo barandina baranê şiroveyek li hev bianiya ku baran rojekê ji nişkê ve bariyaye? Gelo wê fantazî bikira ku helandina berfê û bilindbûna rojê ya ber bi perê esmên fêhm bike?

Belê, ji sedî sed wê wilo bikira.

Wê wilo li hev anî: Zivistanê hemû welat di bin sermayê de hiştibû, ji ber ku Muriatê neqenc Xatûna Sikitayê di cihekî sar de heps kiribû. Lê sibehêkê Mîr Bravatoyê mîrxas hat û ew rizgar kir. Wê çaxê Sikita wilo dilşa bû ku wê ji kîfa dest bi reqsê kir û ew strana ku wê di girtî-gehê de li hev anîbû, stra. Tesîrek wilo li zevî û daran kir ku hemû berf bûn hêşir. Lê roj ber bi esmên ve bilind bû û hemû hêşir ziwa

kir, çûkan strana Sikitayê gotin, û gava Xatûna spehî lûlên porê xwe yê zer hejandin, çend mû ji porê wê ketin erdê û ew mûyên porê wê bûn sosin...

Sofie çîroka xwe eciband. Ger wê nizanîbûya bê çawan demsal têne guhertin, dibe ku wê baweriya xwe bi çîroka xwe bianîya.

Ew têgihîst ku mirov şirovekirineke bûyerên xwezayê dixwaze. Di-be ku mirov bê zanebûna xwezayê nikarîbûn bijiyana. Û gava tu şiro-veyên zanistî tunebûn, mirovan ji xwe re mît çêkiribûn.

...

Jostein Gaarder di sala 1952'an de hatiye dinyayê û li Norvecê mamos-tetiya dîn û felsefeyê kiriye. Wî ji bo pirtûka xwe "Kabalmysteriet" di sala 1990'ı de xelata rexnegiriyê ya Norvecê û xelata edebiyatê ya wezareta kulturê girtiye. Ji bo Cihana Sofie jî wî di sala 1994'an de li Almanyayê xelata mezin ya xortan Deutscher Jugendliteraturpreis girtiye.

Cihana Sofie gelek xelatên din ji girtiye û di kurtedemekê de wergeriya-ye zêdeyi sî (30) zimanên cîhanî û li gelek welatan bûye pirtûka herî pir tê xwendin.

Bi kurdî hebûna vê pirtûka ku bi forma romanê dîroka felsefeyê ya çend hezar salan tîne ziman, serbililindiyek e. Lî me tenê ji destpêka vê pirtûkê beşekî biçûk wergerand. Ger imkan û taqeta me çêbibe em ê vê pirtûka hêja wergerînin kurdî û pêşkêşî we xwendevanên dilovan bikin.

Evîta û Madonna

SÜLEYMAN DEMİR

Filmê Evîta, bû yek ji wan filmên ku him bi başî û him jî bi nebaşî gellekî li ser hat payivîn û nîvîsandin. Ev yek ji ber du sedeman wilo bû. A yekem, bilindbûna Eva Peron bû. A duyem jî ku Madonna ro-la Evîta listibû.

Arjantînî, Evîta xelaskera xwe dizanîn, rûmeteke bilind didinîn. Pîrekeke ku ji jêra jînê, ji nav êşen jînê dest pê kiribû û hilkişiyabû heta cihê duyem, gellek caran ê yekem ê desthilatdariya welêt.

Eva Peron bi esil klambêj û listikvan bû. Navê wê, Eva Duarte bû. Hîna di temenê ciwan de biserketinêن xwe bal kîşandibû ser xwe û rê li ber vebûbûn. Zû ketibû nav ke-sên xwedî desthilata rîcarî, hunermendî û siyasî. Di salon û şahiyêن Buenos Aires de cih ji xwe re çêkiribû. Di bîstûsê saliya xwe de, bi Juan Peron re zewicibû. Êdî bi ser hemû biserketinêن xwe de bûbû jîna serokomarê Arjantînê. Êdî bûbû Eva Peron. Jîr û şareze bû. Di îdara welêt de bûbû xwediya desthilateke bilind.

Heçî Juan Peron bû, berî ku bibe serok-

komar, bi faşistên Ewrûpayê re ketibû nava hin peywendiyan, tesîra faşistan lê bûbû. Gava ew bûbû serokkomar jî wî xwe ji bari-yên faşizmê pak nekiribû.

Lê çawan be jî wî berjewendiyên gundî û xebatkaran diparastin. Eva tesîreke xurt lê dikir. Arjantîn ji bin bandora Emerîkayê û Brîtanyayê derdixistin. Arjantînî dikirin xwedîyên Arjantînê. Nan û av û kar û mecal didan reben û belengaz û xebatkarên Arjantînê. Ew Arjantînî ne ên ku wê ji bîra nakin. Ew, pirraniya Arjantîniyan bûn. He-ta iro jî mirîdên wê hene. Ji ber ku bûbû sembola hemû hêjayî û biserketinêن wê demê.

Evîta, bi hezkirin guhertina navê Eva ye. Arjantîniyan wilo jê re digitin û hîna jî willo dibêjin. 1952-an gava di sîhsaliya xwe de bi canserê mir, dor 40 000 name ji Papa ye Vatikanê rê hatin rîkirin. Jê dihat xwestin ku wê bike ruhanî.

Eva Peron tesîreke wilo li ser Arjantîniyan kiribû. Îcar gava derket ku wê Madonna ku navê wê bi seksê û skandalan derketi-

bû Evîta bilîze, gellek Arjan-tînî aciz bûn. Di çapemeniya Arjantînê de tiştên giran ji bo wê hatin nivîsandin. Madonna şeytan e, bêexlaq e, lewîti ye û rezîl e. Yeke wilo di rola Evîta de, Evîta me dilewitîne dihat gotin. Ji bo ku Madonna rola Evîta nelîze û filmê ku hatibû plankirin neyê çekirin, dengê protestoyan hatin bilindkirin. Em nahêlin ku film li vir bê çekirin hat gotin. Lê van jî Madonna ji bîryara wê venegerandin.

Ji bo Madonna, pîrekeke ku xwestiye ci bike, tê de biserketiye tê gotin. Gava ez ê bikim dibêje û dest bi karê xwe dike, li tu tiştan naheyire, tê gotin. Wê ev yek rast be. Madonna li tu sansur û tu prensibên exlaqî û tu tabûyan nasekinê, tu tiştên ku neke tune ye. Xwestina wê ya biserketinê, bêderman e. Dermanê wê hêla wê, hew biserketina wê tenê ye. Cesareteke mezin di nava wê de heye. Dike û bi ser dikewe.

Ji ber vê yekê bi xwe, di ber gellek dost û hezkirêñ wê re, gellek dijminêñ wê jî li çar aliyên dinyê hene. Ez bi xwe jî, ji vê hêla wê hez dikim û ji ber vê hêla wê rûmetê didimê. Pişti ku min ev hêla wê nas kir, min bi baldariyeke şiyartir li müsîka wê guhdarî kir. Min bi këfxweşî li kurtefilmêñ jiyanâ



Gava arjantîniyan bîhistin ku wê Madonna rola Evîta bilîze, wan dengê xwe protestoyê bilind kirin. Lê protestoya wan, ji rolgirtina Madonnayê re nebû ke

wê temaşe kir. Min kasetên wê kîrrîn. Ev çend salek in ez bi baldañ li klamên ku nû çekirine guhdarî dikirm. Ci gava ku radio klama wê gotiye, min guhêñ xwe dane ber û ez mame. Çend klamên wê yên ku lerza dengê wan xweşîyeke nedîtî didin min he-ne.

Madonna berê di çend filman de lîstibû, lê tê gotin ku di lîstikvaniyê de ne biserkeñ bû. Lê vê yekê nekiribû ku dev jî wî karî berde. Wê her dixwest ku di lista navdarêñ Hoolywood de, li herî jor cih bigire. Dixwest bi qasî ku wek stranvana pop tê naskirin û hezkirin, wek lîstikvana Hollywood jî bê naskirin. Serketinêñ wê yên di warê müsîkê de, têra wê nedikirin. Ji ber vê yekê ga-va berî du salan li Hollywood eßkere bû ku

wê filmê Evita bê çekirin, ew yek ji bo xwe fersenda herî baş dît. Zû daw û deling hilidan û xwest wê rolê bilîze. Lê Rejisore film Alan Parker nedixwest rola Evita bide wê. Wî, ji Michelle Pfeiffer û Meryl Streep yek dixwest. Madonna hîna nepeyitandibû ku dê bikaribe ji bin giraniya roleke wilo derkeve. Û bi ser de ducanî ji bû. Mezinbûna zikê wê, wek astengeke mezin li ber wê bû. Lê wê ew yek û a din qebûl nekir û rabû nameyeke heşt rûpel bi destnîvisa xwe ji A. Parker re rêkir û jê re rave kir bê ji ber çi di-
vê ew bi xwe rola Evita bilîze. Xuyaye xebe-
ra wê bû. Namê kir ku A. Parker biryara
xwe biguhere û rolê bide wê.

Ji bo ku îcar Madonna bikaribe rola xwe herî baş bilîze, dest bi karê xwe kir; dîroka Arjantînê xwend, xwe ferî axavtinê û klam-
bêjiya hewce û tango kir. Bi dû re çû Arjan-
tinê. Li wir bi dost û dijminên Eva re peyi-
vi, xwest wê bastır binase. Bi serokkomar Carlos Menem re şiv xwar û li wî guhdarî kir. Madonna bi enerjiyeke mezin xwe amade kir. Berî ku dest bi kişandina film bikin bi sê mehan dest bi provan û klamgo-
tinê kir. Xwe bi awayekî profesyonel, ji her hêlê ve amade kir. Taba wê qet bi avê de neçû. Dema çekirina film, derket ku Ma-
donna xwediya hêzeke xurt e û di listikvani-
yê de ji bi qasî di stranbêjiyê de jîr e. Bi maktyaj û kincen taybetî, avisbûna wê ji ve-
şartin û dest bi film kîrin. Film, ji dinyê re da xuyakîrin ku Madonna rola xwe xweş
listkiye.

Film, roja 1996. 12. 14, cara yekem li

Emerîkayê ji temashevanan te hat eşkere ki-
rin. Piştî yazdeh rojan ji li Swêdê list. Min
bi xwe, hinekî dereng, piştî du mehan dît.

Hîna berî ku xelas bibe û bê eşkerekirin,
min çend nivîs di derheqa Evita de xwendibûn. Bala min li ser bû û çavên min li rê bûn. Min dixwest û min pîlan kiribû ku ez ê zûtir bibînim. Lê mixabin ji ber hin asten-
gêñ taybetî, wek ku min dixwest nebû. Lê bi baweriya min dîsa ji qet ne dereng e. Gava min ev nivîs dîniyî, sê mch çûbûn lê hî-
na ji li sîneman dilist.

Evita projeyeke mezin bû û berhemek
mezin jê derket. Gellek deng da. Bi destpê-
ka film re mirov ked û perên ku lê hatine
xerckirin dibîne. Ev yek, xwestina mirov a
bibaldarî lêtemâsekirinê xurttir dike. Bi
destpêka film re min bêhn li xwe çikand û
min lê temasê kir.

Ez di derheqa filman û sînemevaniyê de
nezan im, lê dîsa ji ez dixwazim bibêjim ku
bi a min çend sahne hinekî dirêj bûn. Hi-
nekî dirêj bûn, lê hêza listikvaniya Madon-
na dikir ku devê min ji hev bimîne û ez dîsa
ji bi baldarî lê binerim. Di tevaya film de
bûyer xurt didin dû hev û film diherike.
Du saet û nîv, wek bîsükeke kin çûn.

Piştî ku min film û Madonna dîtin, ez
wek temashevân giham biryara ku min ê qet
nexwesta ez hinêñ din ji bedêla wê ve, di
rola Evita de bibînim. Bi enerjiyeke mezin
dilist û xweş dikir. Gava di hewala qesra se-
rokkomar de, ji komeke Arjantînî re klama
Don't cry for me Argentina digot, wek ku
ne film bû, rastî bû, hêşir dirijandin nava

mirov. Bi sextiyeke mezin dibêje. Lê ew wî çaxî di halê mirinê de ye. Meydana pêsiya qesra serokkomar tije mirov in. Bi şev û rojan ji bo wê li wir in, duan jê re dikan, hêsiyan ji bo wê dibarînin, li pacâ wê dinerin û li ber wê ne. Juan Peron û berdestên wê, ji bo ku wê pêş wan bikin, wê ji nav nivînên wê radikin, kincên wê lê dikan, wê bi pûte spehî dikan, şeh dikan û Juan Peron dikeve bin çengê wê û wê tîne ser hewalê. Di destê wî de hêdî hêdî tê wir. Ji ser wir klama Julie Covington a ku 1978-an hatibû belavkirin û hatibû hezkirin, *Don't cry for me* Argentina dibêje û xatir ji wan dixwaze. Ji xwe piştî wê sahnê ne bi gellekî, îcar çira pacâ oda wê vedimire û qêrin û girt bi Arjantîniyan dikeve. Dizanin ku îcar canê şêrin da û dev ji wan berda.

Film hemû muzîkal e. Hemû kesen ku tê de rol girtine, bi stranî diaxivin. Hemû klamên di film de 31 in. Wek sêlikeke dubel, bi navê Evita li sûkê têni firotin. Gellekan ji wan Madonna tenê dibêje. A bi navê *you must love me*, wek klama herî baş xelata Oscar girt. Andrew Lloyd Webber û Tim Rice ji bo film nîvisin û Madonna dibêje.

Ji Madonna pê ve, ên ku di film de rolên girîng girtine, Antonio Banderas, Jonathan Pryce û Jimmy Nail in. Tê gotin ku yek ji filmên muzîkal ên herî biserketî ye. □

The Boss xelata Polar girt

The Boss, navê Bruce Springsteen e. Navê bi rûmet mezinkirina wî ye. Guhdar û hezkirên wî salên heftêyi ev nav lê kirine. Bruce Springsteen, Amerikan e, lê klambêjê feqîr, birçî û bidestên dînyê tevan e. Klambêjê ku bê tirs li hemberî bêedaletiya dînyê şer kiriye ye. İro hîna jî wî şerî dike, qet ne westiyaye. Heta iro ji bo birçî û bindestên dînyê bêhejmar konsêr li dar xistine. Bi wê kirina xwe, dijmin jî ji xwe re çekirinê, lê neşkestiye. Ji ber ku The Boss xwedîyê hêzeke müsikî a xurt e. Xweş dibêje û guhdarên wî pirr in. Gellek xelat girtine, mezin e. Îsal xelat ji Swêdê jî girt.

Swêd di warê biserketinê edebî û hunermendî de, bi *Xelata Nobel* tê naskirin. Lê li Swêdê her salê xelateke din jî tê dayin. Ew jî navneteweyî ye lê mixabin ew gellekî bala xelkê nakişîne. Navê wê *Xelata Polar* e. 1997.01.15 hat eşkerekirin ku Bruce Springsteen xelata îsal girtiye.

Xelata Polar, her salê didin klambêjekî, müsikvanekî ya jî hin klambêj, hin müsikvanên biserketî. Şirketa sêlikan a bi navê Polar vê xelatê dide.


Şirketa Polar (hevâl) sala 1963-an ava bû. Cara pêsi bi Hootenanny Singers navdar bû û bi ABBA jî bû xwedî otoriteyeke mezin.

Ji sala 1989-an bi vir de a Holandiyen û Swédiyan e.

Xelata 1997-an Bruce Springsteen û serokê koro ê Swédi Eric Ericsson bi hev re wergirtin. Her yek ji wan milyonek kronê Swédi distîne. Bruce Springsteen 5-ê meha gulanê, xelata xwe li Stockholmê, ji destê qralê Swédi girt. Sala 1997-an xelat dan dengan. Hat gotin ku ji bo ku Bruce Springsteen dikare bi dengê xwe yê xwes çiyan biqelêse û dengê Eric Ericsson jî digihije ezmanan, xelat girtine. Îcar bi dengê xwe ci kirine! Sedema bingehîn û ferrîn a ku Bruce Springsteen xelat girt, ku bi serê xwe tenê xwediyyê navdariya kompositoriyê û artîsiya rock e. Serokê komîta Xelata Polar, Stig »Stilkkan« Andersson, ji bo Bruce Springsteen, xwediyyê musîka rock e, dibêje. Bruce Springsteen iro 47 salî ye û hîna bi aktîfi musîkê diafirîne û dibêje.

1992-an gava sêlika xwe ya bi navê *Human Touch* belav kir, guhdarên wî kaset û sêlikên wî li hevdu hilanîn. Hezkirên wî roja pêşî çûn li ber deriyên butîkên sêlikan ketin dorê. Roja duyem sêlik xelas bûbûn.

Sêlika wî bala çapemeniyê pirr kişandibû. Televizyona Swédi, derketina sêlika wî hîna êvarê wek xeber da. Di rojname û kovarê



Bruce Springsteen xelata xwe ji destê qralê Swédi Carl XVI Gustaf

Swédi de gellekî li ser hat nivîsin. Tiştên ku ji wî çaxî hîna têr bîra min, ku dihat gotin ku Bruce Springsteen bi sêlika xwe gellekî biserketî ye. Rock gellekî bi pêş de biriye. Dengên têlên gîtara İspanî, di rockê de dewlemendit kirîye û xwes bi hevdu ve girêdane. Dengên bindestan ji klamên xwe dernexistine, bilinditir kirine. Ew dengbêjê belengazan ê li hemberî zaliman e, ew yekî ji gel e.

Yekî wilo, xelatên musîkê berî gellekên din heq dike. □

Turkiskt kaffe

Şanoyek li ser penaberên li Swêdê

MIHEMED DEHSIWAR

Nivîskar: Claude Kayat

Regi: Franciska von Born

Producent: Maria Fors

Şanoger: Mehmet Tatal, Eva Maria Myhrlin, Öz Nüjen, Lily Bigestans, Toma Olsson, Hilda Lundgren, Tomas Engberg û hinên din...

Van salên dawî li Ewrûpayê nijadperes-tî û dijîtiya li hember penaberan bi awayekî kesnedîti zêde bûye. Íro li gelek welatên Ewrûpayê partiyên nijadperest ku li dijî penaberan e, hejmarên ałşigirên xwe gelek bilind kirine. Li gelek bajarên Ewrûpayê serokatiya belediyeyan kertiye destê wan û her wiha di gelek meclisên neteweyî de jî cih girtine.

Rewşa aborî ya van salên dawî, roj bi roj ber bi xerabiyê ve diçe û ev jî tesîreke mezin li ser dîtin û baweriyên gel dike. Gelên ku bi salan di xweşî û rehetiyê de jiyane, bi kêmketina kar û xerabketina rewşa aborî, hîssên ku bi salan e di hundirê xwe de vêştarî hiştine, derdixin meydanê; di partiyên nijadperest de cih digrin an jî rayên xwe yên nerazîbûnê didin wan. Bêşik derew û propogandayên grûbêñ biçûk ên rasîst, di vê guhertinê de cihê herfî girîng digrin.

Lê digel vê, li dijî nijadperestiyê dijeberi-yeke mezin jî dest pê kiriye. Bi taybetî di nav rewşenbiran de, li hember nijadperestî û dijîtiya penaberan, tekoşîneke hêja û berbiçav tête meşandin. Curbecur filimên ew-rûpî li ser vê babetê diseokinin û xetera rojên pêş, talûkeyên ku dikarin di nav ehlicih û biyaniyan de derkevin, tînin zimên.

Yek ji van rewşenbiran jî Claud Kayad e ku bi eslê xwe cihûyekî frensi ye û ji salên 1958'yan ve li Swêdê dijî. Nivîsa wî ya bi navê Qehwexaneya tirk (turkisk café) demek berê (ir'ê nisanê) li Stockholmê leyist.

Cihê bûyerê, bajarekî li Swêdê ye. Penaberê tirk Ahmet Korkmaz ku ji teref şanogerê Kurd Mehmed Tatal ve tê leyîstin, di belediyeya bajêr de weke paqîkerê çopê kar dike. Ahmed û malbata xwe bi wergirtina hemwelatiya swêdi re, dixwaze bi cîranên xwe yên swêdi re piroz bike û bi vî awayî pêwendîyan xurt bike. Kêfa Ahmet û malbata wî, bi kuştina penaberê hevalê wî yê kurd dişikê. Jiyana wî tevlîhev dibe. Pişti ku çend penaberên din jî ji teref nijadperestan ve tê kuştin, Ahmed şoke dibe û lerz dikeve laşê wî. Jî tirsa kuştinê, êdî hew diçe kar.

Swêdî bi giştî karê paqîkirinê nakin lê

dixwazin ku bajar paqîj jî bimîne. Tevî gotin û bîryarêن wan jî, Ahmet ji tîrsa naçe kar û bajar jî roj bi roj gemarî û qirêjî dibe. Bêhn dikeve bajêr û zaboqêن bajêr dibe warê rawîl û pîsîtiyê. Nexweşiyêن curbecur gîhîştine qamê û ji bêhna genî kes nikare ji malan derkeve.

Carbicar ji Ahmet rica dikin ku here ser karê xwe û paqijiya xwe bike, lê ew ji tîrsa naxwaze wê bifikire jî; ew ji tîrsa ketiye taya mirinê, wê çawa derkeve derive! Malbat bi xwe jî ji bêhna elemen dike, lê ev jî fîkrêن Ahmet nade guhartin. Qatil li derive li hêviya wî ye û ger ew derkeve, wê weke biyaniyê din bê kus-tin. Dawî qatil bi xwe jî ji bêhna nexweş ya bajêr idare nake û diçê mala wî ku wî bi zor bişîne ser kar. Lê Ahmet bîryar daye, ew na-çe kar, ew amade ye ku vegere welêt. Qatil kurê wî zeft dike û ger ew neçe kar, dê wî bikuje. Çaxê Fatmaya jina wî dibîne ku ku-re wê di destê qatil de ye, ew ji qatil re qeh-weyeke tirkî ya bi Jahr tîne.

Piştî mirina qatil, xelk ji melaîket dipirsin ka wê qatil bi ku de bişînin, melaîket dibê-je ku ew ê wî bişînin »Swêdê«.

Şanoyeke germ û leystikeke sipehî, nave-rokeke aktuel ku temaşevanan carina dide



Ewa Maria Myhrlin û Mehmet Tatal du heb ji liştikvanêن "Turkiskt kaffé"

fikirandin û carina jî dikenîne. Pêwendî û nakokiyêن di nava swêdî û biyaniyan de, tiştên wan ên mişterek, hevalbendî û dijîtî û her wiha pîrsên civakî, naveroka babeta vê şanoyê ye.

Leystikvanê şanoyê, ji neteweyên têkel pêk tê. Lê rola sereke ji teref şanogerê kurd Mehmed Tatal ve tê leyîstin. Ji bilî Mehmed, xortê kurd Özgür di rola kurê wî de dileyîze. Jina wî Fatma jî, ji teref leystikvana swêdî Eva-Mari Myhrlin ve tê leyîstin. Mehmed bi leyistika xwe ya xweş, mirov gelek caran dikenîne lê her wiha dide fiki-randin jî. Weke ku tê zanîn ev çend sal in Mehmet bi karê şanogeriyê ve mijûl dibe û di gelek programên rêzefilim a televîzyona Swêdê de leyîstiye. Niha jî ew xwe ji proje-yeke din re amade dike. □

NÜDEM No: 23

di yekê tebaxê de derdikeve!

Di hejmara 23'än de bi nivîs, werger û hevpeyînên xwe ev navênlî jér hene:

- ✓ FIRAT CEWERİ
- ✓ ROJEN BARNAS
- ✓ SABAH KARA
- ✓ XEBAT ARIF
- ✓ MEHMED UZUN
- ✓ ARTUR LUNDKVIST
- ✓ ZINARÊ XAMO
- ✓ KENDAL NEZAN
- ✓ MAHMUD BAKŞI
- ✓ OLOF LAGERCRANTZ
- ✓ ŞEREFXAN CİZİRİ
- ✓ FATİH EL-MUDARRIS
- ✓ SERDAR ROŞAN
- ✓ Dr. CUWAN BATU
- ✓ LALEŞ QASO
- ✓ SULEYMAN DEMİR
- ✓ FAWAZ HUSËN
- ✓ XEMGİN TEMË
- ✓ ADİL DÜRAN
- ✓ BORIS EJCHENBAUM
- ✓ MIHEMED DEHSIWAR
- ✓ MARIA PARADOWSKA
- ✓ SIDQÎ HIRORİ
- ✓ Dr. CELADET ÇELİKER
- ✓ AHMET ARAS
- ✓ MUSTAFA ALADAG
- ✓ ÜSERHAD BAPIR bi kataloga xwe ya resimên bireng û reş û spî

BIBE ABONEYÊ NÛDEMÊ!

GER HEWESA TE LI SER HELBEST, ÇIROK, ROMAN, HEVPEYİN, LÉKOLIN,
HUNER, SINEMA Ú HWD. HEBE, PESNIYAZEKE ME HEYE, BIBE ABONEYÊ
NÛDEMÊ!

GER TU DIXWAZÎ JI TEVGERA HUNER Ú EDEBIYATÊ YA HER ÇAR PERÇEYEN
WELËT HAYDAR BIBI Ú EDEBIYATA DINYAYE YA KEVNAR Ú NÜJEN BI ZIMANÊ
KURDI BIXWİNÎ, DİSAN BIBE ABONEYÊ NÛDEMÊ!

NÛDEM DIXWAZE JI AVAKIRINA EDEBIYATA KURDI RE BIBE ALIKAR, TU JI
ALIKARIYA WÊ BIKE, BIBE ABONE!

Ez dixwazim ji avakirina edebiyata kurdi re bibim alîkar. Ji kerema xwe
re min bikin aboneyê/aboneya Nûdemê.

Ji bo Swêdê salek 240 Sek, Skandinavya 280 Sek, Ewrûpa 100 DM,
Amerika, Australya ú Kanada 50 \$.

Nav û paşnav.....

Navnîşan.....

Vê kartê dagirin ú kopya wê li ser navnîşana Nûdemê bişînin. Çer ku ew bigihîje
me, em ê Nûdemê digel karta abonetiyê ji we re bişînin.

"...Ew kesên ku di bazara nivîsandinê de xwedî cewher in, ew dîrokzanênu ku lehengênu nav şekerîstana serpêhafî, çîrok, deng û behsan in, heta niha riya xwe ber bi Kurdistanê ve nekirine, behs û den-gênu gernas û sernasênu kurdan nekirine bin devê pênuşê, ew dîroka ku pir bi şanazî û xweşiyê ku bi tam û bêhna xwe wek hingiv û gezo ye, gelekî mixabin ji aliyê wan ve nayê naskirin û ketiye bin lin-gan û bi tu awayî dest û devênu xwe lê nêzîk nekirine. Ez û jar, bêta-qet, bêdest û bêziman ketim ser wê xeyalê ku vê mijara han ku ji ta-qet û qudraşa min gelekî der e; behs û serpêhatiyênu mirovên mezin, kesên bi nav û deng, serdar û fermanwerên kurd û Kurdistanê ber-hev bikim, yên ku min bi xwe di dîroka Eceman de dîtine û yên ku min ji mirovên bi hiş û zîrek û ji derewan dûr raste rast bihîstine, bini-vîsînim û navê wê bikim: ŞEREFNAME..."

Şeref Xanê Bedlîsî